HÊVÎ

KOVARA ÇANDIYA GIŞTÎ

$ 12 HEJMAR 8 / HAVÎN 1992 60 FF

ESPOIR

HÊVÎ

Revue culturelle kurde

N° 8 - Eté 1992

Directeur de la publication : Reşo Zîlan
Réalisation : Sacha Ilitch & Xanî.

SOMMAIRE

— Les mémoires de*Nûredîn Zaza* 5
— Le voyageur turc Evlia Çelebi (XVIIèeme siècle) à Diyarbekr, *Reşo Zîlan* 21
— 40ème anniversaire de disparition de l'émir Djeladet Bedir-Khan, *Konê Reş* 42
— L'exil, essais, *Mehmed Uzun* 46
— La femme du berger une nouvelle de *Henry Lawson, traduit par Ş. B. Soreklî* 61
— Le sans papier, une nouvelle*Ferhadê Çelebî* 69
— Emer, conte populaire recuilli par Joyce Blau 72

— Un entretien avec le poète kurde Hejar, *Ahmedî Şerîfî* 202
— La déclaration des gouvernements britannique et irakien de 1922 sur le gouvernement de sud du Kurdistan, *Hawar* 185
— Les journaux et périodiques kurdes dans les bibliothèques de Londres, Enwar Sultanî 170
— L'introduction du théâtre dans la littérature kurde, *Ferhad Pirbal* 153
— L'histoire de la kurdologie au Danmark, *Rébwar Sîweylî* 141
— Kurdistan dans les livres des voyages de Nasir Xusrow, *Messûrî Tokmeçî* 134
— Un regard sur la vie de T.S. Eliot et et un de ses poèmes, *Nezend Begîxanî* 129
— Raman, une nouvelle de *Mihsîn Amhed Omer* 125

La revue *Hêvî* (Espoir) est une publication bi-annuelle de l'Institut Kurde.
Elle est ouverte à tous les courants de la vie culturelle kurde.
Les textes publiés n'engagent que la responsabilité de leur auteur.

Pour toute correspondance, écrire à :
Institut Kurde de Paris, 106, rue La Fayette, 75010-PARIS / FRANCE.
Tél. : (1) 48 24 64 64 — Fax : 47 70 99 04

HÊVÎ

KOVARA ÇANDIYA GIŞTÎ

HEJMAR 8 / HAVÎN 1992

© INSTITUT KURDE PARIS — 1992 — ISSN 0761-1242

Kurmanc di dewleta dinê da
Aya bi çi wechî mane mehrûm ?
Bîlcimle ji bo çi bûne mehkûm ?

Ehmedê Xanî
(sedsala XVII)

SERECEM

Kurmancî

Bîranînên *Nûredîn Zaza* 5
Ewliya Çelebî li Diyarbekrê, *Reşo Zîlan* 21
40 saliya bîranîna Mîr Celadet Bedirxan, *Konê Reş* 42
Welatê xerîbiyê..., *Mehmed Uzun* 46
Jina şivên, *Henry Lawson (wergrandin şahînê B. Soreklî)* 61
Karbidest, Çîrokek folklorî, *Ferhadê Çêlebî* 69
'Emer, *Joyce Blau* 72

Kurmanciya xwarê

Witûwêj le gel Mamosta Hejar, *Ahmedî Şerîfî* 202
Beyanî hikûmetî Brîtanî û Iraq le salî 1922 da derbarey hikûmetî xwarûy Kurdistan, *Hawar* 185
Rojname û govarî kurdî le kîtêbxanekanî şarî Lenden, *Enwer Sultanî* 170
Kurte pêşekiyek bo serhildanî şanoname le edebiyatî kurdî da, *Ferhad Pirbal* 153
Mêjûy kurdnasî le Danmark, *Rêbwar Sîweylî* 141
Cegay Kurdistan le serfernamey Nasir Xusrow da, *Mensûrî Tokmeçî* 134
Kurteyek le jiyanî T. S. Eliot û şeîrekî wergerdiraw, *Nezend Begîxanî* 129
Raman, *Mihsîn Ahmed Omer* 125

Bîranînên Nûredîn ZAZA



Ronakbîr û welatparêzê navdar Dr. Nûredîn Zaza yek ji hîmdarên Enstîtuya Kurdî bû. Ew di 7. 10. 1988 de çû rehmetê. Xanima wî, Stî Gilberte Zaza, ku bi xwe nivîskar û rojnamevaneke swîsî ya bijare ye, destnivîsa bîranînên wî bi kurmancî, ji Enstîtuyê re diyarî kir. Ev bîranîn roniyek nû davêjin ser hin sexsiyetên kurd û bûyerên dîroka me ya nêzîk, em dê wan di kovara Hêvî *de belav bikin.*


gote min ku di xaniyê xwe de
odeyek xira kiriye û jê dika-
nek pêk aniye. Bi pereyê ku,
piştî ava kirina dikanê, di
destê wî de maye, mal kiriye
û xistiye dikanê de. Bi
sermiyana xwe sed, çar sed
lîre îdare kirina malekê ne
hêsanî bû. Bi xwe, H.X. di
dikanê de kêm dima. Ew ji
bavê xwe yî kal re dihişt û
diçû xwe li gihandin û tenzîm
kirina Kurdên Tazê mijul di-
kir. Di dilê wî de agirekî we
lê gur hatibû pêxistin ku di-
xwest pê Ereba li timamî bike
Xulî. Hevalê wî, E.I. jê hin dilşe-
witîtir, tûjtir û xwîngermtir bû.
Piştî ku H.X. çûbû Cezîrê Kurman-
ciya wî piçik paktir bûbû. Lê ga-
va li bez dipeyivî Kurmanciya
wî ya Şamî bi ya Cezîrê re tev-

rûpelek ji destnivîsa *Bîranînen Nûredîn Zaza*

Gihaştina min a mala Mihemed Elî Wanlî

Saet yanzdehê şevê me li deriyê wan da. Derî di cî de venebû. Me li dora xwe nêrî di kolana (cada) teng de tu kes nîn bû. Li hember deriyê mala Mihemed Eli Wanlî dîwarên bilind, bê pencere bûn. Herwekî derî venedibû, careke din, me hin xurtir li zingilê xist û bêhn çikayî, sekinîn. Bîstekî din, li hundir çira vebû û pêjin bi ser me ket. Pişt re bêî ku tiştekî ji me bê pirsîn derî vebû. Li pêşiya me, bi pîjama û çav li xew, bavê Ebû Adil, pê xweşhatinî da me û em dibirin hundir. Em ketin oda pêşîn, a ji aliyê derî. Bi roj ev ode ya mêvana bû. Lê, xuya kir ku bi şev, Ebû Adil, bi jin û neviya xwe ya piçûk ve, li wê radiza. Gava em çûnê, Diya Adil nivîna wê ji erdê rakiribû û ji bo min nivîneke din datanî. Ewê dil dikir ku nivîna mêrê xwe jî bibe oda piçûk a bi wî alî, li ser rêza odê em tê de. Ew odeya ha gelek teng bû, û digel vê yekê du kur û keçeke wan a gihaştî tê de radizan. Bi hêvî û rica min kir ku Diya Adil û bi neviya xwe Hêvî ve here oda din û nivîna mêrê xwe li cem a min bihêle.

Piştî ku ewê nivîn û neviya wê ya di xew de birin oda din, bi tebsiyeke xwarinê dîsa vegeriya cem me. Tevê ku ji êvarê de min tu tişt nexistibû devê xwe, dilê min nediçû xwarinê. Bi kotekî, min û Mihemed Xeyr me du sê parî nan û penêr xwarin û hew...

Her wekî ez bê pîjama bûm, Diya Adil geriya ku tiştekî peyda bike ku ez li xwe bikim. Ebû Adil û zaroyên wî tev de merivên hûrik bûn. Welê xuya dikir ku di laşê wan de ji reh, damar û çerm pê ve tu tiştê din nîne. Ji lewre pîjamayên wan

ji min re nedibûn. Diya Adil pir hej zaroyê xwe dikir û qedrê wî digirt. Ji tirsa ku keça wê ji heq dernekeve, ewê cilên wî jê re dişûştin û ûtî dikirin. Zavayê wan, Ebû Mehmed, ji min bilintir û girtir bû.

Bejna min 173 cm. ye, lê ya wî bêtirî 180 cm. bû. Zilamekî bi bejn û bal, çeleng, bi îştexalî û gelek hejxwekirî bû. Di wezareta çandiniyê de dergevan bû, dijê wezirê xwe bû, gelekî quretir û bi heybetir bû. Berî ku ez xwe veşêrim, gava li wezaretê, an li derve rastî wî dibûm, dihate pêşiya min û bi kurmanciya Kurdên taxê, ya bi erebî re tevlihev bûyî, digote min : «*Emir bike ! Şi ji te re lazim be, bêje, ezê xadimek ! Exbarê Melê şi ne, exebarê Melê ya sif emrê wan Şîprûtan kiribe ! Ma heya kengê ciyê me bihikimînin ? Bes e ! Ev bes e !...*»

Ebû Mehmûd, berî ku keça Bavê Adil bîne, du, sê jinên din anîbûn. Ew berdabûn û nihû, bi tenê bi diya Hêvî re dijî. Bi kurtî, wê şevê, ev mêrik bi kêrî min hat, ji ber ku Diya Adil çû ji nav cilên wî yên şûştî, ji min re pîjameyek, derêxist û anî. Her wekî çakêt qetayî û dinya jî germ bû, min bi tenê pantalon li xwe kir û ketim nav nivînê. Mihemed jî xatir ji me xwest û çû.

Piştî ku me çirê vemirand, di cîde bû xirxira Bavê Adil. Ê min bi xwe, heya nêzîkî sibe, xew nekete çavên min. Reva min, guhirandina cî, zehmeta ku min dida xelkê, halê miletê kurdê perîşan û gelek tiştên din, di serê min de li hev diketin û nedihiştin ku ez binivim.

Serê sibê zû gava ez şiyar bûm, Bavê Adil çûbû ser karê xwe. Lê kurê wî Ekrem hîn li mal bû. Her du jî, wek zavayê xwe li Wezareta Çandiniyê karbidestên piçûk bûn. Kurê wî yê piçûktir, Mistefa, 12 salî bû. Lê wek hemî zaroyên Serê Harê (Serê Taxê), ji nihû da heybeta zilaman lê diket û ji rûyê wî yê awir piling tirs dikete dilê xelkê. Sê, çar salên wî bûn ku diçû dibistanê, lê hêj nizanibû bixwîne, sê caran bi mamosteyên xwe re şer kiribû û li wan xistibû. Wê dawiyê jî mamostekî wî hin tişt jê pirsîbûn, û gava dîbû ku tu tişt nizane, jê xeyidî bû û jê re gotibû : «*Mijiyê te ne yê xwendinê ye. Tu bê sebeb wextê xwe li dibistanê winda dikî !...*» Li ser vaya, Mistefayê me, xeber dabûn mamosteyê xwe, ji dibistanê reviyabû, û sond xwaribû ku cardî venegere wê derê.

Bav, dê, bira, xwişk, ap û xalên wî dikirin, nedikirin nikaribûn ew baniyana ser rê. Serê sibê zû, ji mal winda dibû û êvarê, dereng, vedigeriyayê. Mistefayê me bi hevalên xwe re diçû û dikete nav baxçeyên Şamê û li wê, bi kêfa xwe û bê pere zikê xwe bi fêkî û heşinayî dadigirt. Ma ji heqê bexçevanan bû ku bera wî û hevalên wî bidin û bi ya wan nekin ?! Di cî de dar, kûç û kevir bi ser serê wan de dibarandin,

kêr û demençe li wan dikişandin, fêkiyên wan tanîn xwar û sêlizeyên wan ji erdê hildikişandin. Cama jî, hin ji wan, ji bo parastina fêkî û hêşinayiyên bexçevanan ji talana hevalên xwe, ji van bexçevanên reben xûgî bi xwe distandin. An jî xwe bi zor dikirin natûrên (bekçî) wan. Berî çend salan, tu bexçeyê Şamê yê nêzîkî Taxa Kurdan bê natûrekî kurd nedima. Ji ber ku Kurmancên dorav wî, her cara ku kêfa wan dixwest, diketin nav wî û wekî kuliya ew rût dikirin.

Lê, vê dawiyê, her wekî li şûna dar û hêşinahiyên bexçeyên nêzîkî taxa avahiyên bi bilind rabûbûn û kolanên fireh di erdê wan re çûbûn, û herwekî rewşa taxê jî guhirî bû, êdî, bi tenê zarokên wek Mistefa serhişk, bê tirs û şersewaz kêfa xwe bi vî karê beradayî tanîn û xwe pê mêr, serbilind û serfiraz, didîtin.

Gava ez hîn li mala wan bûm, êvarekê, Mistefa dîsa dereng hate mal. Berî ku bikeve hundir, diya wî giliyê wî li cem bavê wî kiribû û jê xwestibû ku kurê xwe ji vê rêya xwar vegerîne. Lê her gazin, lewman û qirînên dê, bav, wek adetê, devê xwe venekiribû, bê dengê dom bi xurandina destê xwe yê çep kiribû, bijangên xwe yên şewitî anîbûn ser çavên xwe, serê xwe ber bi jêr kiribû û çavên xwe ji erdê hilnedabûn. Lê, êvarê gava Mistefa kete hundir, qiyametek rabû. Bavê wî, bêî ku em pê bihesin, şivikek peyda kiribû û pê bi kurê xwe xistibû. Heta şivik di destê wî de neşikiya û Mistefa sond nexwar ku tu cara bê destûr ji mal dernakeve, ewî dev jê berneda. Piştî ku bav bîna xwe derxist, vegeriya cem me. Îcar destê xwe ji her gav bêtir diricifand. Gava min baş bala xwe da destê wî, min dî ku ciyê şewatê deriziye û xwînek reş jê davêje. Em hingê li «Qesrê» bûn «eczaxaneya» malê jî li jêr bû. Ez di cî de rabûm, lezîm jêr ava «oksîjên», pembû û tozeke «tetrasîklîn» derêxistin û anên jor. Min destê Bavê Adil bi ava oksîjênê şûşt û piştre toza tetrasiklîn wer kir, gaz danê ser û ew girêda. Rehên dengê xwe nedikir, lê bê hemdê wî, laşê wî dilerizî û sînga wî hildibû û dadiket. Welê xuya dikir ku ji lêxistinê ku li kurê xwe kiribû gelekî êşiyabû û jê poşman jî bûbû. Ne ji adeta Bavê Adil bû ku li zaroyên xwe xe...

Rojekê, Mistefa dîsa winda bû ; gava, êvarê bi derengî zivirî mal, cilên wî gemar, dest û rûyê wî reş û bi zeyt û pozê wî gij û bi toz bûn. Dê, bav, xwişk û bira tevde, bi endîşe, xwe pêkanîbûn ku şerê wî bikin. Lê ew bi xwe, bi awakî welê kete hundir ku xelkê malê hemî, li ber wî şaş û mat man. Keneke welê bi rûyê wî hebû ku hemî dranên wî yên spî li derve bûn. Hundirê çavên wî yên reş û hinekî mongolwarî diçirisîn û laşê wî yê hûrik û glover diliviya. Welê dihate me ku ewê xwe çeng ke hêmbêza dê, bav, xwişk û brayên xwe wan maçî bike û ji kêfxweşiya xwe bigirî. Lê Mistefa ji kurdên Serê Taxê bû. Tiştekî welê ne layiqî wî bû, lê karê

«zaro» û «pîrekan» bû . Bi xwe ra dipeyive, lê zimanê wî jî nedigeriya. Her wekî bav û dê jî bê deng diman, brayê wî Ednan xwe nêzîkî wî kir, bi dengekî nerm jê pirsî «*Mistefa, bira, bêje me çi bi te hatiye ?*». — «*Miz.. Miz... gî... niya .... min li we ! Min ji xwe ra ciyek peyda kir, ezê xwe hênî mêkanîkê bikim. Min ji îro de dest bi karê xwe kir. Mehiya min nihû bi tenê 30 lîre ye, lê ewê paşê bêtir bibe !...*» Mistefa li birayê xwe vegerand.

Dê û bav heyirî bûn û şaş mabûn, nedizanîn çi bêjin. Ewan dixwest ku kurê wan bixwîne û bibe «efendî»... Lê, niha' mekanîsyenek jê derketa. Ev kar jî ji serserîtî û talana bexçeyên Şamê çêtir bû.

Lê !...

Gava min gote wan ku di wextê me de mekanîk karekî hêja û giranbiha ye, dilê wan hinek hênik vebû, serê xwe hejandin û bi nîvbawerî, gotin kurê xwe :

«*Baş e, baş e ! Sibê tu yê otomobîl û traktorên me yên şikestî ji me re çêkî !*»...

Mistefê yê donzde salî, xuha wî ya şanzde û brayê wî ê nozde salî tevî ku ji Serê Taxê bûn, bi kurmancî nedizanîn. Digel vê yekê, her sê jî hema bi koranî, ji ber kurdîtiyê dîn dibûn. Lê her du brayên wan ên ji wan mestir, Ednan bîst û du û Adil, bîst û şeş salî, dikarîn bi kurmanciyeke giran û xwar bipeyivin, vê dawiyê, her du bira kitêbên kurmancî ji xwe re peyda kiribûn û xistibûn serê xwe ku xweş hînî zimanê xwe bibin. Adil bi xwe, sê salên wî bûn ku li hepsê bû. Ewî li wê, ji kurmancî pêve, erebî û îngilîzî jî dixwend. Berî salekê ewî jî «brevet» (dîploma xwendegeha navôin), biribû û xwe ji bo «bakaloriya» (dîploma lîseyê) hazir dikir.

Beriya 30-35 salan Kurmancên Taxê, heya bi Cêzir Nehas, bi kurmancî dizanîn û di mala xwe de bi vî zimanî diaxiftin. Lê piştre, li ber pêlên çavsoriya «El-Ciwmirye El Erebiye» pirbûna dibistan, kitêb û rojnameyên erebî, bendkirina rojname, kovar û kitêbên kurdî; kêm kesan, ji xortan zor didan xwe ku ji dê û bavê xwe hinekî kurmancî bielimin. Piraniya van xortan ketibûn Partiya Xalid Begdaş, bûbûn *kominîstên kozmopolît*.

Ên manî jî, hin ji wan xwe gihandibûn partiyên erebî yên din, wek «Hizb el-Şeîb», «Hizb-el-Sûrî-el-Qewmî», an jî «Hizb-el -Baas-el îştrakî-el-Erebî», ya Mişel Eflaq. Hinka jî ji tirsa xwe, an jî ji bo wezîfe û karên ne hêja, xwe ji her tiştên kurdreng bi dûr dixistin, xwenda û halê wan xweş, ji Taxê bar dikirin û diçûn, li Şamê, di nav Ereban de xanî digirtin.

Mala Qotreş, mesalan malbateke mezin heya nihû peya û pîrekên wan ên jorê sî salan tevde bi kurmancî dizanin. Dê û bavê wan xweş bi erebî nedizanîn, di nav xwe de û bi zarokên xwe re bi kurmancî xeber didan. Xortên wan jê hingê kurdperwerên xwîngerm bûn. Lê, nihû zaroyên wan ku kêmtirî sî salî ne, ne tenê pirsekî jî bi zimanê dê û bav nizanin lê xwe nêzîkî kurdîtiyê jî nakin. Bi tenê keçeke wan ku Kurmancek ji Cezîrê kiriye, nihû gelek baş bi kurmancî dizane. Lê herwekî, ji çend salan de, li Şamê rûdinên, zaroyên wan heya nihû bi kurmancî nizanin.

Lê di van 5-6 salên dawîn de rewş guhirî. Bi paş ji sala 1958 an vir de. Di vê salê de, piştî ku Evdilkerim Qasim hate ser hikim, destê xwe xiste destê Kurdan, deriyên zîndanan li ber wan vekirin û serbestiya xebat, civîn, sazî, ger, axaftin û nivîsandinê da wan. Bi ser de jî di Destûra Iraqê ya demînî de mikûr hat ku Iraq erdê du mileta ye û ku Komara Iraqê Komara Kurd û Ereba ye. Gava Iraq ji Kurdan re bûbû bihiştek û jê pesindnameyên Mehdawî û spasnameyên Berzanî digihan guhên Kurdên Cihanê, Sûriya ji Kurdan re dibû dojeheke dijwar. Ev welat ketibû destê Cemal Evdinasir û peyayên wî yên Ba'asî û qewmiyên qirêj û xwîn xwar de. Bi navê «El-Qewmiye-el-Erebiye» û «Wahda-el-Erabiye» dixwestin hikmekî xwînrêj bajon, dengê azadixwazan bidin birîn, miletên ne rereb, nemaze Kurdan, belawela, perîşan û şerpeze bikin û destê xwe direjî welatên Ereban yên din bikin û wan bixine bin lepên xwe.

Evdilhemîd Serac xwe ji zû da pêktanî ku derba xwe li Kurdên Suriyê xe. Piştî yekitiya Sûriyê û Misir bi çend rojan, min ji hevalekî xwe yê zabit bihîst ku emir «mekteb-elxas» derketiye da nehêlin ku ez ji Suriyê derkevim. Di 25ê îlona 1958 an de bi peseporta ku min berî salekê derxistibû, bi vîzeya iraqî li ser û bi bilêta balafirê bi min re gava ez çûm balafirgeha Şamê ku herime Iraqê. Lê, li balafirgehê Emin-el-A'ma sûrî nehişt ku ez siwarî balafirê bibim û peseporta min ji min sitend. Gava min zor da zabitê Emin-el-Am, Fexrî Zemberekçî, nasekî min î kevn, ew ku paseporta min ji min re vegerîne û bihêle ez herim, ewî, emrê resmî şanî min da û şîret li min kir ku ez herim Evdil-Hemîd Serac bi xwe bibînim.

Roja dîtir, gava ez çûm ku yawerê wî, Neqîb Burhan Şireytek bibînim û dawa xwe jê re bêjim, ewî, piştî ku karê min û ji ber çi hatibûm ji min pirsîn, çû dîwana Serac hinekî tê de ma û derket.

Rûyê wî yê bê ken tirştir, quretî û pozbilindahiya wî hîn tehiltir bûbûn. Bi nerînên *hîtlerî* li min nêrî û bi hişkî gote min: «Emê kaxitekê bidin te, sibê vegere vir !...» paşê nav û daxwaza min di defterêkê de nivîsîn û hejmara wê da min. Min

spasên xwe pêşkeşî wan serekên «nerm» û nefispiçûk kirin û ji wê derê derketim. Serac hingê wezîrê hindirkariyê bû, lê di serayê de ewî ciyê serekwezîrên Sûriyeyê bi serxwe xistibû destê xwe. Bi rastî jî Sûriye hingê di nav lepên wî de bû.

Wê rojê, piştî ku ez ji cem yawerê wî derketim û ez hin li dehlîzê, li dora min tevleheviyeke mezin çêbû. Pejna salên eskerî û ya tifinga ku datînin ser mila û tînin xwar kete guhê min. Gava min serê xwe rakir û li milê xwe yê rast nêrî, min dît ku nêzîkî deh peyayên «mebahis» ên bijarte tifingên otomatîk di dest de, dora Serac girtine. Ew jî, wek adeta xwe, li erdê dinêre û bi gavên lez dimeşe. Min ew der xweş nas dikir. Gelo ev tevdîra ha di hundirê serayê de ji bo çi bû ? Ma Serac diçû kû ? Min xweş bala xwe da, min dit ku Serac evdesxane daniye ber çavên xwe...

Roja dîtir, gava di saeta gotî de, ez vegeriyam wê derê û min doza peseporta xwe kir, karbidestên ku li wê bûn pozê xwe xwar kirin, devê xwe badan û gotin min ku şixulê min ne li ba wan bû. Diviya bû ku ez herim ji fermandariya «Mekteb-el-Xas» bipirsim. «Mekteb-el-Xas» di destê eskeran de bû, lê rast bi rast bi serde re girêdayî bû û xwe têkilî gelek tiştan dikir, tevliheviya Libnaniya 1958 bi destê vê mektebê çêbûbû. Ciyê wê ji hingê li ser kolana Bexdayê, piştê dibistana Layîk bû.

Ez çûm wê derê û li ber avahiya mezin ku tê de bi cî bûbû sekinim. Lê ber deriyê derve, di hewşê de, ji dar holikeke piçûk çêkiribûn, tê de eskerek li ber «sentrala» telefonê rûniştîbû. Tifingeke otomatîk li ser milê wî bû. Navê min û qesda hatina min ji min pirsîn. Navê zabitekî dabûn min. Min gote esker ku ji bo işê peseporta xwe, ez dixwazim Neqîb Xeyredîn bibînim. Eskerê me denguhêz (telefon) rakir, bi hundir re peyivî û navê min da. Mideteke telefon kerr ma. Piştre dîsa deng jê hat û ciwaba paşvan da. Ewî jî telefon danî, zivirî û gote min ku zilamê min ne li wê ye. Min gotê ku ez ji cem Serac têm û divê ku ez Naqîb Xeyredîn bibînim û ji esker xwest ku dîsa bipirse. Lê hêvî û ricayên min bê tesîr man. Ji hundir, ji bin erdê, ji ciyekî kûr, wek nalînê pêjnek kete guhê min. Qey dîsa li girtiyan dixistin ? An jî ev rebenên ha ji êşa lêdana şevê dinalîn ?!...

Min êdî nexwest pir li wan deran bimînim. Roja dîtir, ez dîsa çûm cem yawerê Serac û bi xurtî jê xwest ku şuxilê min safî bike. Ewî bi çavên bel, ji xwînrijandin, ji kêf û tolazî sor bûyî, li min nêrî û bi dengekî bilind gote min :

«Ez ji te re dibêjim ku şuxilê te ne li cem me, lê li cem Mekteb-el-Xas e. Here wê derê, ewê daxwaza te bi cî bînin !..». - *«Ez çûm, ciyê ku tu behsa wî ji min re dikî, lê tevî ku Neqîb Xeyredîn li wê bû, hebûna wî ji min re înkar kirin. Ez bê*

sebeb pêncî carî herim wê derê û bêm çi jê derdikeve ?... Ez dixwazim rast bi rast bi Evdilhemîd Serac re biaxivim û mesela xwe jê re bibêjim. Ji kerema xwe min bibe dîwana wî !». Min lê vegerand. *«Siyadet Evdilhemîd Serac pir mijûl e, nikare wextê xwe bi îşê te winda bike. Here Mekteb-el-Xas, ez dibêjime te !».* Ewî dîsa gote min û bi zingilê li ser masê xist. Di cî de du peyayên Mebahis, tifingên otomatîk li ser milên wan, li pişt derî sekinîn. *«Efendî dixwaze derkeve, rê şanî wî bidin, ji kerema xwe re !... Burhan Şineyetî gote wan. Hingê, her du zilamên bi çek xwe nêzîkî min kirin, bi nermî, lê bi kenekî bêmeres gotin min : Keremke îdî derkeve...». «Çi heqê we heye ku hunê min bigirin ? Ez hatime vê dawa işekî xwe yî rast û adil dikim. Ez insanekî ji vî welatî me ; ji heqê min e ku ez bibime xwedî peseport û pê herim li derveyê Sûriyê bigerim û bi kar û şuxilên xwe yên ticarî rabim. Peseporta min bidine min û dev ji min berdin !».* Min qîr kire wan. - *«Nikû keremke bi me re derkeve, tu yê paşê bê û doza peseporta xwe bikî»*, her du zilamên çek hilgirtî gotin min û ez ber bi derî ve birim. Gava ez derêxistim derve, destên xwe anîn xwar û li her du aliyên min bi min re meşiyan. Welê dihate min ku ewê min hilîne bibine zindaneke mehabisan û li min xin.

Em ji qata pêşîn hatin xwar û ji deriyê der ve yê mezin jî derketin. Xelkê ku ez di vî halî de didîtim disekinîn, bi melûlî li min dinêrîn û serê xwe dihejandin. Li ber serayê, li aliyê rojava otomobîlên polis, mebahis û yên Mekteb-el-Xas disekinîn. Ez ber bi wan re birim. Gava em nêzîkî otomobîlekî mebashisan bûn, bû kûtkûta dilê min û qirika min hate givaştin. Lê peyayên min li ba otomobîla nesekinîn. Di pişt Emin-il-Amê re ez birim heya pêşiya nexweşxanê. Li wê : *«Nikû here mala xwe û pir serhişk mebe !»* gotin min, ez berdam û vegeriyan Serayê. Ez bîstekî li ciyê xwe şaş û gêj mam. Ji alî kî ez kêfxweş bûm, ji ber ku ez ji zindan û lêdanê filitîbûm. Ji aliyê din jî halê ku Sûriyaya reben bi timamî û nemaze Kurmancên wê tê de bûn, dilê min dêşand, rojên hên reştir dixistin her çavên min û xwîna min dida kelandin. Ji wê rojê bi şun da, min êdî pirsa peseporta xwe nekir...

* * *

Bûyereke dî di sala 19 58 an de çêbû ; ew jî, tiştê ku di heqê Kurdan de di serê Serac de hebû xweş dixe ber çavan : di meha gulana wê salê de, piştî yekîtiya Sûriye û Misir li çend mehan, Serac çû bû Cezîrê û li wê gihabû Qamişlokê. Gelek xelk çûbûn pêşi û serdana wî. Welê dihate bawer kirin ku êdî hikim li Sûriyê bi rastî bûye demokrat û azadîparêz. Ji lewre wefdeke (delegasyoneke) Kurda jî çûbû cem Serac û xweşhatinî pê dabû. Ev wefde ji Cemîl Haco, Ekrem Cemîl Paşa û

Dr. Ehmed Nafiz pêk hatibû. Piştî gotinên xweşhatinî û pîrozî, bi navê wefdê Cemîl Haco ev tişt gotibûn Serac : «*Li Cezîrê Kurmanc, Siryan, Keldan, Ermen û Aşurî hene. Ev cemaetên han tevde, xwedî dibistan û nadî ne. Di dibistanên xwe de bi erebî re bi zimanê xwe jî dixwînin û dinivîsinin. Bi zimanên wan kitêb, rojname û kovar hene û bi serbestî digehin destê wan. Bangeh, (klûb) ên wan jî bi navê wan in. Tê de kom dibin, hev û du dibînin û ji bo pêşveçûna cemaeta xwe bi tiştên rengareng mijûl dibin.*

Tevî ku Kurmanc li Cezîrê, ji Siryan, Ermen, Keldan, Aşûrî û heta ji Ereban jî bêtir in, hikûmetên borî nedihişt ku ne dibistan ne jî nadiyên wan hebin, ne jî kitêb, kovar û rojnameyên wan derkevin. Piştî ku pareke ji armanca Ereban a mezin bi cî hat û yekîtiya Sûriyê û Misir dan za, em ji hikûmeta xwe ya nû dixwazin ku guh bide daxwazên me jî û bihêle ku em jî ji xwe re dibistan û nadiya vekin û kitêb, rojname û kovara ji xwe re derxin» .

Bi vî awayî... Serac ne hiştibû ku Cemîl Haco gotinên xwe timam bike. Ji nişkave, ewî bi xeyd peyvên wi birîbûn û bi hişkî gotibû wî û hevalên wî : «*Divê ku hun van tiştên ha ji serê xwe derêxin ! Nebi em tiştên welê nadine we, lê xweş bizanin ku, di nêzîkê de, emê dibistan û bangehên Ermen, Suryan, Kildan û Aşuriyan bi xe bidine girtin û kitêb rojname û kovarên wan jî bend bikin...*»

Li ser van gotinan, peyayên wefdê ber hev û du nêrîbûn û di cî de rabûbûn û ji cem Serac derketibûn.

Piştî demekê, Serac hin ji van gotinên xwe bi cî anîn : di dibistanên Ermeniyan de, meselen, saetên dersa bi ermenî hatin kêm kirin û hin nadiyên wan jî hatin girtin. Da nehêlin ku Ermen dengê xwe rakin, bi navê «*miamerek istimarî*», rabûn gelek Ermeniyên Taşnak girtin, ew avêtin zindanan, bi lêxistinê yek ji wan kuştin û hikmên giran dan hineka ji wan. Eger Serac hinekî din bimaya ewê bi Kurmanca re, Ermen, Suryan, Kildan û Aşuriyên Sûriyê gelek perîşan bikirina...

Lê şerê Kurdên sûrî bi rastî sala 1959 dest pê kir. Berî gişa Serac û Ba'asiya, hingê li ser hikim, eskerên kurd ên xwedî ritbe —ji Erif heya bi Siwra (general)— ji ser kar avêtin. Ji çend pîsik û bêbexta pêve tu kes di ordiya sûrî de nehiştin. Ev pîsên ha ku tê de man jê bi dûr kirin û xistin Mebahis û Mekteb-el-Xas de. Piştre, şevekê, ew danîn pêşiya xwe û piştî nîvê şevê, bi navê «şerê şiyûîtî» avêtin ser Kurdên Taxa Kurdan li Şamê. Di dirbaran re ketin mala hin ji wan, û hin jî deriyên wan şikênandin û xwe gihandin odeyên wan en raketinê, û di paşila jinê wan de,

bi ser wan de girtin. Ew bi pîjema, an bi kiras û derpî, an jî bê derpî ji malên wan derêxistin, xistin cîpên eskerî û ew birin hepsa Mezê ya eskerî. Li wê, bi mehan ve ew danîn ber çoga. Bi ser de jî, ew ji wezîfa avêtin û zar û zêçên wan perîşan û şerpeze kirin. Hin ji wan peyayên ha, bi rastî «şiyûî» (komunîst) bûn. An jî, di wexteke de ketibûn partiya soran de, lê paşê jê derketibûn. Lê piraniya wan ji bo Kurd û camêr bûna xwe dihatin girtin, êşandin û kambax kirin...

Bi vî awayî, ji alîkî «bihişt»bûna Iraqê û ji aliyê din jî «dojeh» bûna Sûriyê ji Kurdan re hişt ku Kurdên Şamê bi Kurdistana xwe bihesin. Piştî girtina bi hezaran Kurdên Cezîrê û ya Çiyayê Kurmanca di sala 1960 an de, Kurdên Şamê hên bêtir bûn kurd, xwe ji «kozmopolîtiyê» bi dûr xistin û li «Sewmiye-el-Erebî» hatin xezebê. Ji lewre beriya ku Ba'asî bêne ser hikim, xort û pîrên zan û nezan, zengîn û xizanên Kurdên Taxê dikeliyan û li riyeke welê digeriyan ku pê bigehin hev, xwe xurt bikin, hebûna xwe ya milî biparêzin û li Sûriyê serfiraz û serbilind bijîn.

Mihemed Xêyr û E.J. û çend xortên din ketibûn pêşiya wan : ew ji alîkî şiyartir û ji aliyê din jî saz dikirin.

Mihemed Xêyr ji şerê Taxê bû. Kete «şirteyê» (polis) û hatine şandin Cezîrê. Li wê, serekên wî bi kurdîtiya wî hesiyabûn û navê wî danîbûn ser deftera reş. Li mahnê digeriyan ku wî ji kar bavêjin. Di sala 1961 de, di hilbijartina şandiyara de —intixabata niwaba— ku piştî ji hev ketina yekîtiya Sûriye û Misrê çêbûn. Mihemed Xêyr ev mahne xiste destê wan. Hingê, min jî namzediya xwe danîbû. Kurda, bi dilgermî, xwe gihandibûn min û li dora min civiyabûn. Gava hikûmetê û neyarên me xurtiya gelêrbûna min dîn, li sebebekê geriyan ku min bigirin. Beriya hilbijartinê bi sê raya, bi hinceta ku piştî timam bûna mideta propaxandeya intixebatî, ez çûbûm Amûdê û Dirbesiyê, ku gelek xelk hatibûn pêşiya min û ku min bi kurdî gotar dabûn wan, hikûmetê ez girtim û avêtim hepsê. Piştî intixabatê (hilbijartinê) bi sê roja ez hatim berdan. Tevî ku ez di hepsê de bûm û ku hikûmetê bi her awayî şerê min kiribû, ez hatibûm hilbijartin. Lê hikûmetê li sindûqa lîst û li şûna min û hevalên min, peyayên xwe derêxistin. Hilbijartin di yekê kanûna pêşîna sala 1961 de bû. Ez 28 ê çiriya paşîn hatibûm girtin û çarê kanûna pêşin hatim berdan. Di vê midetê de, bi çûn û hatina xwe hepsê, bi dan û standinên xwe bi hevalên me re û bi meyildarî kirina min li ser sindoqa, Mihemed Xêyr xwe bi timamî eşkere kir û xezebên karbidestên «Qewmî Erebî», Ba'asî û Nasirî tevde li ser xwe anîn.

Piştî ku ez ji hepsê derketim bi çend rojan, min Cezîrê berda û vegeriyam Şamê. Jê mehekî bi şûn da, rojekê Mihemed Xêyr kete nivîsgeha min. Ji ber wextê bêtir ruyê wî dikenî û sî û du diranên wî xuyanî dibûn. Cilê medenî li xwe kiribû û bedla wî ya şîn a tarî lê bû. *«-Te xwe gelek xemilandiye û tu pir kêfxweş diyar î; texeyre, înşeleh ?!...»* min jê pirsî. *«-Bêbextîno ez ji kar avêtim»*. *«Qewmî Kurdî bûna min jî ji xwe re kirin mane...»* *«-Tu yê nihû çi bikî ?»*, bi dilekî şewitî min jê pirsî.

— Ezê li şixulekî bigerim. Eger peyda nebû, ezê bi benda «tezwîda» xwe bisekinim. Nêzîkî heşt sed bîre wê bikevin destê min. Ezê pê dikanekê vekim», ewî li min vegerand.

Piştî çend mehên din Mihemed Xêyr gote min ku di xaniyê xwe de odeyek xira kiriye û jê dikanek pêk aniye. Bi pereyê ku, piştî ava kirina dikanê, di destê wî de maye, mal kiriye û xistiye dikanê de. Bê sermiyana sê sed, çar sed lîre îdare kirina malekê ne hêsanî bû. Bi xwe Mihemed Xêyr di dikanê de kêm dima. Ew ji bavê xwe yê kal re dihişt û diçû xwe bi gihandin û tenzîm kirina Kurdên Taxê mijûl dikir. Di dilê wî de agirekî welê gur hatibû pêxistin. Ku dixwest pê Ereba bi timamî bike xulî. Hevalê wî E.I. yê hin dilşêwitîtir, tîjtir û xwîngermtir bû. Piştî ku Mihemed Xêyr çûbû Cezîrê kurmanciya wî pirik paktir bûbû. Lê, gava ku lez dibepivî kurmanciya wî ya Şamê bi ya Cezîrê re tevhev dibû û êdî tu kesî jê tiştek fehim nedikir. Heçî E.I. bi xwe, pirsek bi kurdî nezanî. Kalikê wî ji Sileymanî hatibû û li Taxê bi cî bûbû. Ewî zaroyên xwe hînî soranî nekiribû û ew jî xwe bi kurmanciya Taxê nekiribûn xudî. Lê, nihû E.I. ne bi tenê dil kiribû ku xwe hînî xwendin û nivîsandina kurmanciyê bike, lê, şiretên germ didan xelkê ku şopa wî bigrin û ji nû ve vegerin eslê xwe yê pak û hêja...

E.I. peyayekî kurd î zayifok bû. Lê, bi ser kêfa xwe yê mezin porê kin û gij lê bû, rûyê xwe jî esmer û tarî bû, simbêlên xwe yên stûr, reş û badayî û bi meşa xwe ya çiyayî, gelek bi heybet bû û tirs dixiste dilê xelkê. E.I. di axaftinê de jî pir jêhatî bû : dikarî bi saetan, bi erebiyeke paqij û bi dengekî blindî gurr xeber bide û gotinên xwe bigehîne mêjiyê guhdarên xwe. Gava ewî bi kurdekî dilpak lê xapiyayî re dipeyivî, guhdarê xwe zû ji rewşa dinê ageh dikir û ew tanî ser riya xwe. Bi vî awayî E.I. li Taxê bi nav û deng dibû û hikûmetê hêsab jê dikir.

Vê dawiyê, gelek ji Kurdên Şamê li dora Mihemed Xêyr, E.I. û hevalên wan kom dibûn. Ednan, kurekî Mihemed Elî Wanlî, peyayê ku ez li mala wî veşartî bûm, bi xwe jî ji wana bû.

Mayina min li mala Mihemed Elî Wanlî

Piştî ku ez giham mala Bavê Adil, sê şeva li oda jêrîn razam. Oda piçûk a jorîn, ango «Qesir», hatibû spî kirin. Lê oda wê hîn ziwa nebûbû. Roja çara, xelkê malê ez rakirim wê derê. Min hez nedikir ku nivîna min biguhêzin wê «pînka» ha odeyeke ewqas piçûçik bû, bi rastî qasî pûnkekê jî nedibû : dirêjahiya wê du metro û firehiya wê jî, bi zor, dibû metroyek û nîv. Textekî eskerî ew dagirtibû. Doşeka ku avêtibûn ser wî, ji her du alî jî dihate xwar û cî hên tegtir dikir.

Her sê aliyên odê bê pencere bûn. Pencereyên wê yên ji alîyê rojhelat, ji aliyê derve bûn û didan ser kolanekê. Gava xelk, li derve di bin wan re derbaz dibûn, pêjna wan wekê digihê me, te digo qey li nav odê bi xwe dimeşin.

Heçî pencereyên aliyê rojava, dida ser banê xaniyekî nizm ku tê de Diya Adil mirîşk, kevok û kevroşk bi xudî dirikrin. Heçî aliyê nîvro bi xwe pencereke bi tenê hebû. Lê mezin bû û dida ser bexçeyên Şamê. Gava diçûn jêr û dihatin jor, em di ber vê pencerê re derbaz dibûn. Ev «Qesir», havîngeha malê bû ; pirbûna pencereyên wê ji bo çûn û hatina wê bû. Lê, wê salê bayê taxê ji qiwet ketibû ; hebêwa jî gelek germ dihat û tiştên nexweş ji min re tanîn. Binêrin çawa :

Li oda min du licnên xenîq hebûn. Yek jê ji boyaxa odê bi xwe bû û tim hebû. Heçî ya din ji maleke cîranan dihat. Di vê malê de, bi sedan bizin û nêrî dihatin bi xudî kirin. Carna, gava bayê rojava xurt dibû û di her sê pencereyên min ên wê hêlê re dikete hundir, bi bêhna zibil, bêhna nêriya û ya şîr û mastên kefikî xwe davête odê û ew dadigirt. Hingê nefesa însan dihate girtin ; gêjî û serêşî pê re çêdibûn. Gava ev bêhna ha xwe digihand me, Diya Adil digo : «Bêhna mala H. xwe dîsa da çar aliyan !...» Ji mala Bavê Adil pêve, hemû cîrana, gelek caran, giliyê mala H. kiribûn û ji hikûmetê xwestibûn ku bizinên wan ji nav mala derêxe û wan bibe ciyekî durî Taxê. Lê hikûmetê guh nedida wan...

Ji vê bêhna genî pêve bizinên mala H. Kaniya belayekî din bûn. Ew jî bi şev pêşiyên bêdengên xwînmêjên dijwar bûn. Her wekî pêşîbendê min tunebû, bi şev razan pir dijwar bû. Ji ber van tiştan, min hez nedikir ku li «Qesrê» bi cî bibim. Lê, her wekî ciyê wan li jêr teng bû, keçikeke wan a gihaştî hebû û çûn û hatin jî li jêr pir bû, xelkê malê nedixwestin ku ez li wê bimînim.

Piştî derketina min «Qesrê» bi çend rojan, bêhna odê û ya mala H. ji berê bêtir dihatin hilgirtin. Lê ji xwîn mêtina pêşiyên (kelmêşên piçûk) pêşiyên bê deng re tu çare tune bû. Pencere bihatana girtin, bîna min diçikiya û vekirî bimana jî, pêşiyên fêris xwe davêtin hûndir û xwe li ciyên nependî vedişartin û ez ber bi nivistinê ve diçûm, van pêşiyên ha xwe davêt ser laşê min û derziyên xwe yên tûj diçikandin ranê min. Ez di cî de şiyar dibûm, çira pêdixist û li wan digeriyam. Livir jî ez xwedî mêşkujekê bûm. Min ew dikire destê xwe û li pêşiyên xwe yên veşartî digeriyam. Piştî ku min çendek ji wan dikuştin, ez vedigeriyam nivîna xwe. Bi vî awayî, heya sibê, ez sê, çar car şiyar dibûm, xwîna xwe ji zikê van pêşiyên bêbext tanê der û ji nû ve dîsa radizam. Heçî bi roj bivia jî şerê min û mêşa bû. Ên vir ji mala Ebû Ednan ne kêmtir bûn. Lê, her wekî oda min piçûktir bû, bi hêsanîtir min bi wan dikarî û zora wan dibir.

Bi rastî, eger ji bêhna û nemaze ji pêşiyan nebiwa minê li mala Ebu Adil rahet bikira. Xelkê malê tevda însanên ecêb, lê dilpak, xêrxwaz û paqij bûn. Neviya wan, Hêvî, hên deh mehî nebûbû, lê rojekê jî di derpiyê xwe de nedikir. Pîreka wê xwe pê serbilind didît û bi quretî digote min : «*Ev terbiya min e, gava keça min bi tiştekê dihese, di cî de xeberê dide min !*» Hêvî keçikeke ne xweşik, lê xwînşêrîn û pir zîrek bû. Gava min jê re bi kurmancî distrand, di cî de serê xwe radikir, rûdinişt, laşê xwe dihejand û li çepika dixist.

Diya Adil bi xwe însaneke xerîb bû, çil, çil û du salî dibû, nedibû. Lê pir ketibû û mestir xuya dikir. Ji serpêhatiyên kur û mêrê xwe gelek westiya bû. Nemaze hepsa kurê wê Adil, ew pir êşandibû. Mehiya mêrê wê û ya Ednan hemû nedigiha sêsed û pêncî lîreyên sûrî. Ji van peran bêtirî sed û pêncî lîre ji Adil re diçûn. Diviya bû ku di heftê de du caran herine hepsê û serdana wî bikin. Rojên sêşem û înê destûr hebû ku xelk herin girtiyên xwe bibînin. Roja sêşemê ji pîrekara û roja înê jî ji zilama re bûn. Her gava ku diçûn serdana Adil jê re goşt, fêkî, hêşinayî, şekir, çay, qehwe û gelek tiştên din dibirin. Dayika reben keserên kûr dikişandin û bi melûlî digote min : «*Ketina Adil hepsê pişta me dişkîne. Ji êş û ezaba pêve ku dide me, qasê malekê jî mesref dixwaze !...*» Lê, tevî nav gotin û gazinan jî, çiqa ji destê wê jinikê dihat, dikir ku kurê xwe li hepsê ji tu tiştî bê par nehêle. Bi xwe, ji rêha xwe de, Diya Adil ji bo qencî û xeyrê hatibû dinê. Dilê wê ne bitenê bi însan, lê bi heywanan bi xwe têşiyan. Eger jê bihata ewê hemî însan û heywanên reben, belengaz û bêkes bihewandana mala xwe. Her wekî ev tişt ji destê wê nedihat, ewê zora xwe dabû ji bo sivikkirina êş û derdên pisîkên bêkes û bê xudî. Di mala wê da

ji sihî bêtir pisîkên mezin û piçûk, mêr û nêr, xweşik û kisêt hebûn. Hemî bi nav kirî, bi qedir û bi qiymet bûn. Her ro Diya Adil ew yek bi yek digirtin, dikirin himbêza xwe, destê xwe bi ser pişta wan digerand, devê wan vedikir û ew maç dikirn.

Her wekî kurên wê ew xweş naskiribûn, gava li kolana kitikine piçûk û bê xwedî didîtin, ew di cî de hildigirtin û tanîn ji diya xwe re. Kingê ez li mala wan bûm, kurê wan ê piçûk, Mistefa, yekî din anî mal. Ev kitikê piçkole ji yên malî gişa xweşiktir û esiltir bû. Bi du, sê renga bû : Keskî tarî, kumet û spî. Muyê wî wek hevrîşmê nerm û dirêj bû. Bi awakî welê ku çawên wî diniximandin. Lê, hîn li ser şîr bû. Ji lewre çi didanê nedixwar û eger bixwara jî pê nexweş diket. Êvara roja înê hatibu mal, ji ber vê min navê wî kir «*în*» wek «*vendredi*» yê Robinson Kruzo. Gava nû hatibû, În bi şev di himbêza min de radiza û heya sibê li wê dima. Lê rojekê, êvarê, min kir nekir nehate «*Qesrê*». Min ew girt û bire jor û xist nivîna xwe de. Xwe tev neda û dengê xwe nekir. Lê gava min destê xwe ji ser hêlanî, di cî de xwe ji nivînê çeng kir erdê, bazda û çû jêr. Roja dîtir, gava min mesele gote Diya Adil, kenî û li min vegerand : «*Min jê re diyek peyda kiriya; nihû bi têra xwe jê şîr dimije. Ji lewre êdî demakeve jor.*» Diya Adil welê kiribû ku yekê ji kitikên nû yên bi çêlî şîr bide În jî...

Di mala Ebû Adil de, ji pisîka pêve heywanên din jî hebûn. Li ciyekî pînek çêkiribûn û tê de çend mirîşk û dîk dijîn û ji wan re, her ro, yek xwarin tanîn. Li jorê wan, ki ser xênî, di sindoqa de, xebxeba kevoka bû. Li aliyê jêrê, koxikek jî, ji bo kevroşka çêkiribûn. Dch, donzde kevroşkên spiyên kedî di dîwarên wê re qulên bê hejmar kolabûn û xwe tê de veşartin. Ji van pêve, di pênc, şeş qefesan de teyrên rengareng jî hebûn. Berî çend sala, hin teba jî, wek gur û rovî bi xwe, li mala wan dihatin xudî kirin. Lê, piştî ketina Adil hepsê, êdî xwe nêzikî tiştên welê nedikirin.

Heçî hewşa wan, li çar aliyên wê kulîlk, dar, mêw û gulên têrel hatibûn çandin û ew dixemilandin. Ji yasimîneke fêris re çardexek çêkiribun ku ezmana hewşê bi timamî dadigirt. Her wekî dinya havîn bû, sibê û êvarê, avdana wan pêwîst bû. Bi marpêça (xortim) stûr û dirêj ku me ji henefiya kolanê ya li ber deriyê me siwar dikir, avdana dar û kulîlk û şûştina xênî ne bi tenê tiştekî hêsanî, lê lîzeke xweş bû. Min hez dikir ku pêra bim, ji ber ku, bi vî karî min şixulê Diya Adil sivik, xwe pê hênik û wextê xwe jî derbaz dikir.

Gava ez li mala Mihemed Elî Wanlî dimam, Diya Adil welê kiribû ku gelek kes neyêne wêderê. Helîme, cîraneke wan, li hemberê mala wan rûdinişt. Berî ku ez bibême mêvanê mala Ebû Adil, ev xatûna ha tim li cem wan bû û bi hevre pir

xweş û bêş bûn. Helîme keçeke çil salî bû, hin mêr nekiribû û bi birayên xwe re dijî. Jineke serbest, rûhişk û bi iştexalî bû. Hîn bûbû ku hergav bi mêvanên mala Ebû Adil re hencka bike. Rojekê ez û Diya Adil li jor, li ber «Qesrê» rûniştibûn. Deriyê derve jî vekirî mabû. Ji nişka ve, min hema Helîme li ber xwe dî. Êdî nedibû ku ez rabim, ji ber wê xwe bidim alî û herim oda xwe. Ewê silav da me, li cem Diya Adil rûnişt û dest bi peyvê kir. Berê, bi Diya Adil re da û stand û jiştrê bela xwe frote min. Lê, çiqa bir û anî jî, min devê xwe veneckir û bi işaretan pê da fehim kirin ku ez ker û lal im. Lê, Helîme dil nedikir ku dev ji min ber de û digote Diya Adil: «Yu ! mêvanê we çima ûsa qure ye? ! *«ke ennû bi zimanê me nizane?». «Kurmanciya wî pir pak e, ya welêt e, ma wek kurmanciya me xwar û şikesti ye ! min hêk galgala te fehim nake...»* Diya Ednan lê vegerand. Helîmê dixwest dirêj bike û wextê xwe yê vala bi axaftinê derbaz bikê û ê bêtir ez çi kes im, min xweş nas bike. Gava min dît rûniştina min pê re ne rast e, ez rabûm û ketim «Qesrê» . Ew jî, hinekî dî li wê ma, û çû. Ez hindê dîsa vegeriyam cem Deya Adil û jê hêvî kir ku tiştekî bike da ku ev jinika ha cardî, wek berê, bê hefsar neyê mala wan.

Roja dîtir, Diya Adil hate cem min û bi kêfxweşî gote min : *«Bira dilê te rahet be, min welê kir ku heya ti li mala meyî, Helîme êdî, zû bi zû nayê vir. Eger hat jî xwe nêzîkî wê neke...».*

(dûmahîk heye).

EWLIYA ÇELEBÎ LI DIYARBEKRÊ

Reşo ZÎLAN

Herwekî eşkere ye, Gernameya Ewliya Çelebî ya gerokê tirk yê navdayî, di warê dîrokî, civakî, siyasî û hwd de çavkaniyeke gelekî pûtepêdayî û girîng e. Ev çavkanî, nêzîkî ji sê sedsalan û bi vir de ye, ku ji destên zanyar û lêkolînerên ku bi taybetî li ser pirsgirêkên têvel yên Asyaya nêzîk xebitîne, neketiye. Tevî hindek şaşî û nerastiyên gernameyê jî, wek belgenameyeke yekta, ew ê ji vir û ha de jî welê bi gengazî ji destên wan nekeve.

Di van salên dawîn de, zanyar û kurdnasê hêja Martin van Bruinessen, bi tevkariya hevalê xwe yê lêkolîner Hendrik Boesschoten, berhema xwe ya salpêçûyî û giranbiha da çap kirin. Bi ronahîdîtina vê xebata han ya pir hûrûkûr ve, bê guman ne bi tenê em Kurd, lê belê, berî her tiştî zanistên şaxa mirovperwerweriyê bûn xwedî gencîneyeke bêhempa.

Xebata Martin van Bruinessen û Hendrik Boesschoten yên berkeftî, li ser beşek ji gernameya Ewliya Çelebî yê gerokê tirk e, ku peywendiya wê bi Diyarbekrê ve heye. Ew di bin navê «*Evliya Çelebi in Diyarbekir, the Relevant Section of the Seyahatname, Edited with Translation, Commentary and Introduction by Martin van Bruinessen and Hendrik Boesschoten, Leiden - New York - Kobenhavn - Koln*» de, ji aliyê weşanxaneya navdar ya *E.J.Brill* ve hatiye weşandin.

Gernameya Ewliya Çelebî, tevî ku ji gelek Kurdan re nas e, Kurdan bi xwe bi qasî Ewropiyan ne hinde pûte pê danê û ne jî xwe hinde pê bilandine. Heye ku yek ji ho û sedemên vê yekê, bi nezanîna zimanê osmanî ve girêdayî be. Ji ber vê jî keysa ji orîjînalên wê xwandina gernameya wî nedîtibin. Heçî wergerên tirkiya nûjen in, di gel evçend guhartoyên wê, yeke ku nehatibe tehrîf kirin, tune ye. Di hemûyan de jî, da ku ew digel îdeolojiya resmî ya Enqerê bi rêk keve, destkarî û tehrîfine mezin hatine kirin. Ji lewre jî, heye ku ev jî bûbe ho û sedema ku wê li ba

Kurdan bihayê xwe winda kiribe, seza û layîqbûneke di deraxeke watov de nedîtibe.

Ewliya Çelebî, bi gerên xwe yên bo gelek hêlên Kurdistanê yên dûr û dirêj ve, Kurdistana sedsala hevdehan ji me re salox dide û tîne ber çavên me. Gava ku mirov gernameya wî dixwîne, dibîne ku bûyer û qewmandinên di van bi qasî sê sedsalên dawîn de gelek tişt anîne serê wê û ew gelekî guhertine. Li van guhartinan hûr nihêrîn û li wan hûrbûn, mercek e serekî ya xweşnasîna civata kurdî ya îroyîn e.

Ev karê han yê ku em pê rabûne, ne ku bi tenê ji bo nasîna Ewliya Çelebî ye, lê ji bo nasîn û nirxandina beşek ji gernameya wî ya li ser devereke Kurdistanê ye, ku ji sedsalan û bi vir de, di dîroka neteweyê kurd de roleke gelekî mezin lîstiye. Loma, me pêdivî dît, ku em wê beşê wergerînin zimanê kurdî.

Di wergerê de, tevî ku me orîjînala bi zimanê osmanî wek bingeh qebûl kiriye, me wergera Martin van Bruinessen û Hendrik Boesschoten ya bi zimanê îngilîzî jî ji ber çavan bi dûr nexist. Me her hevokeke vê beşê daye ber ya îngilîzî û piştre ew hevok li gor şiyan û stîla nivîsevaniya xwe ava kiriye. Di gel vê yekê, me pêwîst dît, ku em têbîniyên ji aliyê Martin van Bruinessen û Hendrik Boesschoten ve hatine nivîsîn jî wergerînin. Bi ser de, hin têbîniyên din yên xwe jî, yên gelekî pêwîst, lê zêde bikin. Me dil heye, ku em bi dû wergera teksta osmanî ya Ewliya Çelebî, beşên din yên vê afirandina Martin van Bruinessen û Hendrik Boesschoten jî ji îngilîzî wergerînin kurdî û wê di *Hêvî*-yê de pêşkêşî xwendevanan bikin.

Ji bo vê wergerê, herdu xwediyên pirtûka hêja jî, di rê û îzndanê de çû dirixî nekirine. Em ê vê kira wan timî bi teqdîr bidin bîra xwe, timî spasdar û hîvîdarên serkeftina wan bin.

GERA EWLIYA ÇELEBÎ YA PÊŞÎN YA DIYARBEKRÊ

1.1. Li ser cîhên ku em ji Başxanê heta Diyarbekrê tê re derbas bûne

Li vê deverê, me ji cenabê paşayê xwe yê ku berê xwe dabû rojhelatê, ber bi sancaqên[1] Tercîl[2] û Miyafarqînê[3], xatirê xwe xwast. Bi hatina rojên biharê ve, pêwîst bû, ku mirov şevên xwe di xeyme[4] û xergehên[5] di mêrgan de derbas bike. Paşa ferman da, ku em otaqên[6] li Diyarbekrê mayî bidin hev û bi pereyên ku li ba Fîrarî (Mustafa Paşa)[7] ne ve hin çergeh[8] û çadirên[9] têvel bikirin. Bi vî awayî, piştî

ku me jê re duayên xêrê kirin û destên wî maç kirin û bi şûn de, her yekî ji me da ser riya xwe: Cenabê paşayê me berê xwe da Tercîlê û min heqîrî jî berê xwe da ber bi Diyarbekrê.

Berî her tiştî, ez heqîr di gel deh xidamên xwe, me ji Başxanê[10] da rê. Di riya keleya Şankuşê[11] re, me kavilên Saqirdîkenxanê[12] li destê xwe yê rastê hîştin û berê xwe da ber bi başûr[13], heta ku em gihîştin qonaxa Ortaxanê[14], ku bi ..... ya erdê Diyarbekirê ve girêdayî ye. Me ji wir jî ..... saetan domî riya xwe ya ber bi başûr kir û paşe em gihîştin bajarokê kavilbûyî yê Şerbetînê[15] ku ser bi erdê Diyarbekirê ve ye. Welê xuya bû, ku ev bajarokê piçûk cîhekî gelekî ava û şên bûye, niha jî tê de du sed mal, mizgeftek, xaneke mezin û çend jî dikan hene. Herweha, wê tekyeke kevnare jî heye. Qaçar Beg, ku bavê begê niha yê Egîlê[16] ye, tê de veşartî ye. Di xêrxaneya wê de, xwarinê hem mişe û hem jî mift û bêpere didin rêwiyên ku tên û diçin. Aramgeha wê ya ji dewr û zemanan tam di cîhekî minasib de hatiye ava kirin. Ew bi temamî ji aliyê rehmetiyê mezin û şehîd Qaçar Beg ve hatiye çêkirin. Binecîhên vê derê hemû misilman in. Keleya ..... ji vir ne dûr e.

Ji vir me dîsan ber bi başûr domand û em gihîştin pireyeke bi destê hosteyan çêkirî û xemilandî, ku jê re Qara Köprü[17] digotin. Dûlhadî[18] di bin vê pireyê re dikişiya. Serê kaniya vê avê li ..... bû, ji wir dikişiya, dihat û dikete çemê Dîcleyê[19]. Em ji vê pireya navbirî derbas bûn û gava ku me pê li riya bi peyarê, ku navê wê Qara Taşliq[20] bû, kir, Xwedayê mezin *(el-'azemet-ul-lah)* barana rehmê wisan ji asman barand, ku wê ne di hespên me û ne jî di me bi xwe de can û mecal hîştin. Tevî kişandina heftê hezar renc û dijwariyê, tûşî bayê qirkirinê bûnê, bidestnexistina penah û cîhekî talde, di dawiyê de em piştî ..... saetan gihîştin (Diyarbekrê).

1.2. Saloxdana bajarê sezayê pesnê[21], ango keleya Qara Amîdê, bajarê Diyarbekrê yê bixeml û pesindar

Di derheqa bineçeya navê bajêr de çendîn hezar çîrok û gotin hatine nivîsînê. Lê belê, ho û sedemê avakirina bajêr ev e: Hezretê Yûnis pêxember[22] *"aleyhî"s-selam*[23] li bajarê Mûsilê[24] yê kevnare dima û hemû gelên van deveran dawetî ser ola heq dikir. Wî çendî kir, takecanek jî nehate ser ola heq. Evê yekê dilê wî yekcar gelekî êşand, rabû ji şêniyên Mûsilê re nifir kirin. Bajarê Mûsilê yê kevnare herifî û bû kavil. Lê gava ku ew ji wir hat Diyarbekrê, şêniyên wê, bêî ku jê doza mûcîzeyekê bikin, hemûyan xwe bi ola Îslamê rûmetdar kir. Yûnis

pêxember *"aleyhî"s-selam* pir şa bû, ji wan re duayên xêrê kirin û got: «Bila wîlayeta we şên û avadan be, bila gelê we timî dilgeş û dilşa be û bila zar û zêçên we hemûyan temendirêj û tovpak û rêrast bin». Ew di hundirê keleya bi navê Fis Qayasiyê[25] de heft salan bi tena serê xwe ma.[26] Hikmeta Xwedê, wê serdemê dotmîrek hebû, keçeke ji maleke biesl, ji keçên "Amlaq[27] bû. Wê bawerî bi Yûnis pêxember anî û bû musilman. Ew keçeke gelekî dewlemend bû, xwedî çendîn hezar gencîneyên Qarûn[28] û Efrasyab[29] yên veşartî bû. Bi fermana hezretê Yûnis, vê dotmîrê ev Diyarbekra ji kevirên reş yên xarayê yên ji Fis Qayasiyê ava kir. Ji ber vê yekê jî navê vê keçikê li vir kirin. Dîroknivîsên Eceman[30] ji vir re «Diyar-i Bikr»[31], ango «welatê keçika bakîre» dibêjin. Lê li milekî din, dîroknivîsên Rûm[32], ji ber ji kevirên xarayê ..... çêkirîbûna hemû dergeh û dîwarên wê, jê re «Qara Amîd»[33] dibêjin. Ev nav di defterxaneya padişahî de jî bi vî awayî hatiye qeyd kirin.

Tiştê ku mirov bikaribe bi ewlehî bibêje, ev e, ku kontrola vî bajarî çendîn hezar caran ji destên dewletekê derbasî destên dewleteke din bûye. Piştî hikûmdariya Enûşîrwan[34], ew ketiye destên Êrmeniyan û di destên wan de gelekî gul vedaye. Ji lewre jî dîroknivîs wê wek perçek ji *vilayet-i Ermen* (Êrmenistan) dihesibînin. Piştre, di sala 10-ê koça pêxemberî de[35], hezretê Xalid (ibn Welîd)[36] ji 70 000 eskerî re bû serdarê bilind û Diyarbekir ji destên qeyserên Êrmeniyan bi zora şûr derêxist[37]. Çendîn hezar kafir ji ber tirsa dijwariya eskerên muwehîdîn[38] xwe ji hundirê keleyê avêtin jêrê, ketin ser Fis Qayasiyê û hemû perçe perçe bûn. Hemd ji Xwedê re, bi vî rengî keleya Diyarbekrê hat girtin.

Bi dû re, kafirên Êrmeniyan ew dîsan vegirtin û bi dirêjahiya 70 salî bûn xwediyên Diyarbekrê. Di dawiyê de, Sultan ....., kurê Sultan Ewhedullahê[39] ji binemala Ebasiyan[40] li Kurdistanê, bi leşkerekî mişe wek derya, ajot ser Diyarbekrê û ew tam heft mehan dorlêgirtî hîşt. Kafirên gunehkar yên di hundirê bedenê de asê mayî, ji ber tunebûn û birçîbûnê, bexişandina xwe xwastin û bajar bi van heft [41] mercan spartin Sultan .....:

Mercê wan yê yekemîn: Ew ê li gor peymana "Emer[42] zêrekî cizye[43] bidin.

Mercê didwan: Divê dêra wan ya di hundirê bedena bajêr de nehête hilweşandin.

Mercê sisyan: Divê keşîş, patrîk, qeşe û rebenên wan xeracê nedin.

Mercê çaran : Divê bazirganên wan, wek bazirganên musilman, ji dehan yek gumrik bidin.

Mercê pêncan: Divê ew di xaniyên xwe yên di hundirê bedena bajêr de bimînin.

Mercê şeşan : Divê ew bikaribin termên mirdarên xwe di goristana xwe ya kevn de binerd bikin û herweha bikaribin goristanên xwe bi bax û baxçe bikin.

Mercê heftan: Divê kesek rê li ber danîna serê xwe ya serpoşiya wan ya belek[44] negire.

Çaxa ku ev her heft mercên jorîn hatin qebûl kirin, wan jî bajar[45] teslîm kir. Niha jî di hundirê bedena bajêr de kafir dijîn, ku di destên wan de peymannameyên ji aliyê sultanên berê °46 ve naskirî û tê de ev her heft mercên han bi zelalî nivîsandî, hene.

Ev Sultan ..... û dûndeyên wî Diyarbekir wek mîrat heta serdema Sultan Selîmê l-emîn[47], ku hingê Sultan ..... *el-melîk-ul-muzaffer*[48] hakimê Diyarbekrê bû, serbixwe hîştine. Gava ku Sultan Selîm Xan diçû şerê Çaldiranê[49], Kurdên Diyarbekrê di riya keleyên Kemah[50], Tercan[51], Baybûrd[52] û Çanxayê[53] de bi rêbiriyên xwe ve ziyaneke mezin digihînin leşkerên musilmanan[54]. Dema ku Selîm Xan bi vê rewşa han ya paxavdar dihese, hema bi *Qapucibaşiyê*[55] xwe yê *Dergah-i "Alî* [56] re nameyeke dostaniyê ji hikûmdarê Diyarbekrê re dişîne. Ew, di vê nameya padişahî de ji wî vê doz dike û dinivîse: «Birayê min, ji kerema xwe re van Kurdên xwe yên har, ku di bin îdareya hikûmeta te de ne, hilde bin disîplînê». Piştî ku hikûmdarê Amedê vê nameyê dixwîne û ji naveroka wê serwaxt dibe, radibe nameyekê di gel peyayekî dihinêre û tê de dinivîse: «Eger tu bikaribî toleya xwe ji Şah Îsmaîl[57] hildî, dê tu bikaribî heyfê ji 200 000 Kurdên min yên tifingdar yên Diyarbekra min jî bistênî». Çaxa ku name dikeve destên Selîm Xan, ew dibêje: *«El-lîsenet-ul-xelq eqlam-ul-heq*[58]. Hikûmdarê Diyarbekrê îzn daye me û gotiye ku em "ji Kurdên Diyarbekra wî jî toleya xwe vekin"; kîjan xêr e, bila ew be». Piştî vê gotinê, ew berê xwe dide şerê Çaldiranê û bi alîkariya Xwedê pişt li Şahê bedkar dişikêne û bi serkeftî vedigere Erziromê[59]. Bi dû re, ew Biyiqli Mehemed Paşa[60] ji 100 000 eskerên îslamê re dike serdarê bilind û wî dişîne ser Diyarbekrê. Paşa dor li keleya Diyarbekrê digire, bi dirêjahiya heftê rojî şerekî dijwar dike. Rûyê bedena keleyê, ji aliyê Deriyê Çiyê (Dağ Qapusi)[61] û Deriyê Mêrdînê (Mardin Qapusi)[62] ve, bi derbên guletopan ji gelek cîhan xesar dibînin. Gava ku şerevanên musliman di haziriya êrişekê de ne, dibînin ku ji aliyê Mêrdînê[63] ve eskerekî giran têt. Ji pêşajoyên eskeran çend kes pêşde tên, dikevin nav leşkerên îslamî û nameyek pêşkêşî serdarê navbirî, Biyiqli Mehemed Paşa, dikin. Piştî ku ew nameyê dixwîne,

ji şabûnê dest bi dîlkirinê dike û dibêje: «Gelî şerevanan, hikûmdarê Amêdiyê, cenabê Mela Îdris[64] ku di cenga Çaldiranê de hatibû hawara me, va ye bi 40 000 eskerên xwe ve dîsan tête hawara me. Ev eskerên ku dixuyên, ew in. Bila hema bên û konên xwe li rex yên leşkerên îslamî vegirin». Li ser vê fermanê, hema eskerên Mela Îdris, bêî ku bîskekê jî têkevin şik û gumanê, dikevin metrîzê. Dema ku Kurdên di hundirê bedena bajêr de vê rewşê dibînin, dest bi gaziyê dikin û dibêjin: «Bibexişîne ey bijarteyên *"Al-i Osman»*[65] û keleya Diyarbekrê bi aştî û bi alîkariya Mela Îdrisê Amêdî, teslîmî wezîrê dilpak Biyiqli Mehemed Paşa dikin. Piştre, Kurdên tazî û ji ber tavê şewitî, hemû ji hundirê bedena bajêr derdikevin û di gel hikûmdarê xwe diçin Mêrdînê, lê li wir jî nekarîn bihewin. Dema ku ev nûçeya dilgeşkir, di sala 921-ê (1515/16 z) de, li rasta Tercanê digihîje Selîm Xanê l-emîn, radibe peymanname dide nivîsandin û li gor wan ew Diyarbekirê ji bo heta hetê dide serdarê navbirî û Amêdiyê °66 jî dide Mela Îdris. Ji ber vê yekê jî, dîroknivîsên Rûm di fethnameya Diyarbekrê de dibêjin ku: «Fetha Selîm Xan ya bi destê Biyiqli Mehemmed Paşa û bi alîkariya Mela Îdris» û welê dinivîsin.

Paşê, gava ku Sultan Suleyman[67], *"aleyhî-er-rehmetun we-el-xufran,*[68] diçe fetha Bexdaya behiştîn, ji avûbaya vê Diyarbekrê hez dike, zivistangeha xwe li vir datîne û dibêje: «Bila ava be Qara Amîda min». Di navbera sê mehan de ji zîv 10 000 kîse[69] *aqçe*[70] dide kutan, li ser sikeya xwe «*Sultan Suleyman bin Selîm Xan "aze nesrûhû zurîbe fî Qara Amîd*»[71] dide nivîsandin. Niha jî ji vê *aqçeya* ji zîvê xalis, ku li ser sikeya «Qara Amîd»-ê heye, li ba kesên ser bi mezheba zemînî[72] yên ku ew di erdê de veşartine, gelek peyda dibe.

Suleyman Xan, bi dû re, nexşeya vê wîlayeta han ya Diyarbekrê derêxistiye û statûya eyaletê dayê û ew bi destê waliyekî bi payeya wezîr daye gerandin.

1.3. Li ser danzanîna qanûnnameya[73] Suleyman Xan ya eyaleta Diyarbekra Kurdistanê[74]

Berî her tiştî, li gor vê qanûnê payeya waliyê Diyarbekirê wezîr e û sê *tûxî*[75] ye. Di fermanên pîroz yên padişahî de, ku ji aliyê Sultan ve jê re tên şandin, dê ev peyv «*Destûr-i mukerrem ve muşîr-ul-mufehhem*»[76], wek payeke rûmetdar, li ber navê wî bête nivîsandin. Li gor qanûnê, *xasa*[77] wezîr liserhev 1 200 660 *aqçe* ye.

Eyaleta Diyarbekrê hemû ji şazdeh[78] sancaqan pêk hatiye û pênc sancaqên din jî hene ku hikûmet[79] in. Ji van nozdeh sancaqan diwazdeh, wek li eyaletên din

yên împaratoriyê, bi *tîmar* û *ze'amet*[80] in, begên wan ji aliyê dewletê ve tên tayîn kirin û herweha ew ji aliyê dewletê ve ji ser kar tên dûr kirin. Lê heşt sancaqên din yên begên Kurdan e. Ev navçeyên han, di dema vegirtinê de, li ser daxwaza Biyiqli Mehmmed Paşa, bi fermana împaratorî, ji bo heta hetê wek *yurtluq* û *ocaqlıq*[81] dane van began. Ew çu caran tayînkirin û jî jiserkardûrkirina bi destê dewletê qebûl nakin. Gava ku yek ji van began dimire, cîhê wî derbasî kurekî wî yan jî mermalekî wî dibe. Her çi be, çavkaniyên dahatên van sancaqan, wek sancaqên din, tevî tîmar û ze'ametan di lîsteyekê de dihatin nivîsîn. Heke şerek biqewime, tîmardar û ze'ametdarên van sancaqan tevî *alaybegi*[82] û *çeribaşı*-yên[83] xwe, bi leşkerên wezîrê Diyarbekrê re diçûn şerî. Çaxa ku ew nediçûn xizmeta ku hatiye ferman kirin, sancaqên wan didan kur yan jî mermalên wan.

Ji bilî van sancaqên li jorê navbirî, pênc sancaqên din jî hene, ku wek hikûmet ji qeyda bacê muaf hatine dîtin û riya tehsîldariya bacê li wan hatine girtin [84]. Di nav wan de *tîmar* û *ze'amet* tune ne. Hikûmdarên wan xwedî mafê mulkiyeteke wisan in, ku dewrkirin, kirîn û jêstandina wê mulkiyetê qedexekirî ye. Herwisan ji berhemên wan her çi dahat bi dest keve, ew ya hikûmdaran e. Di fermanên padişahî yên Sultanên Osmaniyan de, ji bo van hikûmdaran leqeba «cenab» tête bi kar anîn.

Sancaqên Osmanî yên Diyarbekrê ev in [85]:

Sancaqa Xarpêtê[86], Erxenî[87], Sêwerek[88], Nisêbîn[89], Hesenkeyf[90], Çemîşkêzak[91], Sêrt[92], Miyafarqîn, Aqçaqele[93] -nêzîkî Nisêbînê-, Xabûr[94], Şengal[95] û sancaqa Diyarbekrê, ya ku sancaqa textê paşa ye. Ev sancaq hemû ji aliyê begên Osmanî ve têne gerandin.

Lê belê, sancaqên ku em ê niha navên wan bînin zimên, ew sancaqên *yurtluq* û *ocaqlıq* in: Sancaqa Saxman[96], Pasûr[97], Mîhranî[98], Tercîl, Ataq[99], Pêrtag[100], Çepaxçûr[101] û Şankuşê. Dema ku ev li gor qanûnê *ocaqlıq* bûne, begên wan bê dûnde çûne û niha êdî ew bûne sancaqên Osmaniyan.

Di eyaleta Amedê de, hikûmetên ku em ê niha navên wan bînin zimên, hebûn: Hikûmeta Cizîrê[102], Egîl, Dara Hênê[103], Palî[104] û Hezoyê[105]. Hikûmdarên van pênc hikûmetan xwedî payeya *mîr-i mîran* yên otonom bûn. Lê ew jî hatibûn erkdar û wezîfedar kirin, ku di şerqewimînê de bi wezîrê xwe (yê Diyarbekrê) re herin şerî. Bi van pênc hikûmetan ve, hejmara hemû sancaqên Diyarbekrê digihêje bîst û pêncan. Di gel van sancaqan, sancaqa Aqçaqeleyê, mîrê Şehr-i ..... mîrê Pesyan û mîrê Pozan[106], mîrê Xançûk[107] û mîrê ..... hene. Sê sed (300) serekeşîrên

-boy begleri- din jî hene ku fena van mîrektiyan in. Ji bilî vê, Diyarbekrê *hakim-ekî*[108] ku *tîmar defterdarı* [109] ye, yekî ku *defter kethüdası* [110] ye û yekî ku *mal defterdarı* [111] ye jî hene [112]. Hatina salewextî *-xas-* ya van karmendan 40.399 *aqçe* ye. Di eyaleta Amedê de, ku textê paşa lê ye, hejmara *ze'ametan* 9 û ya *tîmaran* jî 168 e.

Li gor qanûnê divê sancaqa Diyarbekrê, *cebelü* [113] jî tê de, 2 000 serbazên têrçekdarbûyî tedarik bike. Hejmara serbazan, bêî *cebelü*-yan, 700 e. Lê di dema şerqewmînê de, diviya hejmara serbazên hemû sancaqên eyaleta Diyarbekrê bi hev re, *cebelü* jî tê de, bibûya 30 000 serbazên têrçekdarbûyî. Li gor *xasa* paşa, wî bi tenê 3 000 serbazên bijarte hene. *Sedeq-el-lahû "ilmen* [114].

1.4. Li gor qanûnê *xasên* hemû begên sancaq û *ocaq* û *hakimên* eyaleta Diyarbekrê dide zanîn [115]

Xasa begê sancaqa (*mir-i liva*) Hezoyê	219 999 *aqçe*, salê [116]
Xasa mîrê Erxeniyê	200 515
Xasa mîrê Sêwerekê	403 043 [117]
Xasa mîrê Ataqê	447 200
Xasa mîrê Tercîlê	445 200
Xasa mîrê Şankuşê	214 000 [118]
Xasa mîrê Hesenkêfê	203 995
Xasa Egîlê, ocaqliq	296 750 [119]
Xasa mîrê Çepexçûrê	370 000
Xasa mîrê Çemîşkêzakê	334 223
Xasa mîrê Saxmanê	369 057
Xasa mîrê Sêrtê	223 772
Xasa mîrê Aqçaqeleyê	200 000
Xasa mîrê Şehr-i .... [120]	191 517
Xasa mîrê Pesyan û Pozanê [121]	100 000
Xasa mîrê Pasûrê, ocaqliq	166 667
Xasa mîrê Xançûkê [122]	427 900
Xasa mîrê Pêrtagê	380 000
Xasa mîrê Dara Hênêyê	278 340
Xasa defterdarê xazîneya Qara Amîdê	140 395 [123]
Xasa kedxwedayê defterdarê Diyarbekrê	100 924 [124]
Xasa ze'ameta defterdarê tîmarên Amêdê	80 000

Li gor qanûnnameya Sultan Suleyman, xasa padişahî ya ji bo hemû begên sancaqên eyaleta Diyarbekrê û li gor payeya wan kifşkirî, bi vî rengî derbasî qeydê bûne [125].

TÊBÎNÎ

1 **Sancaq:** Di serdema Osmaniyan de, yekeyeke birêvebirinî (îdarî) bû û ji bo yekeyên îdarî yên ji eyaletan piçûktir lê ji qezayan mezintir digotin.

2 **Tercîl:** Yek ji sancaqa kurdî ya ser bi Diyarbekrê. Îro ji navenda bajarê wê re Hezro tête gotin.

3 **Miyafarqîn:** Di metna Ewliya Çelebî de navê wê Mîfariqîn (Meyyafariqîn, Müfariqîn) derbas dibe. Yek ji sancaqên Osmaniyan ya Diyarbekrê. Ew berê paytextê hikûmdariya Merwaniyan bû (*al-Fariqi, Ibn al-Azraq; Ibn "ül-Ezrak- Mervani Kürtleri Tarihi, Çeviren: M.E.Bozarslan, Istanbul 1975;* û *Amedroz, H.F.; The Marwanid dynasty at Mayyafariqin in the tenth and elevennth centuries A.D., Journal of Royal Asiatic Society 35 (1903), r.123-154*). Îro navê navenda bajarê wê Sîlwan e.

4 **Xeyme:** Peyveke erebî ye û bi maneya kon e.

5 **Xergeh:** Peyveke îranî ye û bi maneya konê mezin e.

6 **Otaq:** Peyveke tirkî ye û bi maneya kon e, ango konê fireh û pêşên wî bilind û xemilandî.

7 **Fîrarî Mustafa Paşa:** Di dema serdana Ewliya Çelebî ya Diyarbekrê de waliyê yekemîn yê Diyarbekrê. Ew bi navê Şatir Qara Mustafa Paşa jî tête nasîn. Ew berê waliyê Misrê bû, lê bi Köprülü Mehmed ve li hev nedikir. Köprülü wî ji kursiyê wî dadixe, badilhawa hewl dide ku wî bide girtin. Bi dû re, demekê ew li Stembolê timtêlguhartî dijî. Ji lewre jî naznavê wî dibe Fîrarî, ango revok. Ew di sala 1065-ê koçî (1655-56 zayînî) de, bi dirêjahiya bi tenê 6 mehan walîtiya Diyarbekrê dike.(*Hammar; Geschichte des Osmanischen Reiches, VI, 25, 187-8; Salname-i vilayet, def'a 19. - Diyarbekir 1323 (1905), r.54*)

8 **Çergeh:** Peyveke îranî ye û bi maneya konekî piçûk û bêpergal e.

9 **Çadir:** Welê xuya dike, ku Ewliya Çelebî navê konên curbicur bi awayekî pir bi mantiqî bi kar neaniye. Navekî misoger carina ji bo konên cihê cihê tête pêş. Ji ber vê yekê jî me hewl neda, ku em wan bi awayekî sedîsed durist wergerînin. Di vê metna me de, navên ev celeb konên han derbas dibin: *Çadir, çergeh, xayme, xergeh, otaq* û *engetir.*

Li milekî din, konên leşkerî yên Osmaniyan ji aliyê *Conte de Marsigli* ve (*Marsigli, L.F. de; L'état militaire de l'empire ottoman, Amsterdam 1732, berg II, r. 56-60*) hatine salox dan û wêneyên wan hatine çêkirin. Herçendî ewî navên wan yên tirkî nenivîsîbin jî, mirov dikare ji wan çend cureyan binase. Heçî *otaq* e, konekî pir mezin û biluks e û ji aliyê kesên wezîr û hwd ve dihat bi kar anîn (wêneya *Marsigli* ya 13-an, dibe ku 6 jî be). *Xergeh,* konekî cureyek konê mezin e, dibe ku ew mîna wêneya 10-an ya *Marsigli* be. *Tengetir* (yan jî *tengetür*) û *çadir,* konên piçûk in, ku hewce ba, di dema çûna şer de bi xwe re dibirin. Heye ku çadir piçekî ji tengetirê mezintir be (*Beldiceanu, N.; Le timar dans l'Etat ottoman -début XVIe-début XVIe siécle- Wiesbaden: Harrassowitz, 1980,*

r. 89-90). Heçî *xeyme* û *çergeh* e, ew navên cureyekê ne, heye ku ji bo guhartoyên konan yên gelekî têvel hatibin gotin.

10 Başxan: Navê devereke lêqonaxkirinê, ku dikeve bakura Diyarbekrê.

11 Şankuş (Çermîk): Yek ji sancaqa kurdî ya ser bi Diyarbekrê.

12 Saqirdîkenxan: (Saqir Diken Xani) Kerwanserayeke kavilbûyî ku dikeve bakura rojavayê Diyarbekrê. Cîhê wê nehat dîtin.

13 Ber bi başûr: (Qible), ango hindava Mekkeyê, hindava coxrafîk ya başur e, ku kêm yan jî zêde, dibe aliyê Diyarbekrê. Lê ev yeka han ne zelal e, ji ber ku Ewliya Çelebî peyva *qible* û *başûr* (cenûb) di şûna hevûdu de bi kar tîne. (Di 210r û rêza 12-an de wî herdu peyv jî bi kar anîne da ku qaşo hindavên têvel binimîne). Piştî bicîhanîna guhartinên hewce, mirov dikare eynî tiştî ji bo hindava *stêrka qutbê* (yildiz) û *bakur* (şîmal) jî bibêje. Welê dixuye, ku hindavên qiblenimayê yên ku Ewliya Çelebî bi kar tîne, li gor hindavên «rastîn» dizivirin.»Başûr»-a Ewliya Çelebî pirî caran hindava başûra rojhelatê, carina hema hema rojhelatê tîne zimên, «rojhelat»-a wî jî dikeve navbera bakur û rojhelatê, û hwd. Ev ne taybetmendiyeke Ewliya Çelebî ye. Em eynî kirdarê li ba erdnasekî kevn, Mehmed "Aşiq jî dibînin (divê Ewliya Çelebî ew xwandibe.

Binihêre: *Taeschner, F.;»Die geografische Literatur der Osmanen», Zeitschrift der Deutschen Morgenländischen Gesellschaft 77 (1923), r. 51-6, 66*) û herweha di çerxa navîn de li Ewropaya rojava jî dibînin. Niha jî gelek navên coxrafîk şahidiya vê yekê didin (deryaya ku ji aliyê Hollandiyan ve Deryaya Bakur tête bi nav kirin, dikeve hindava rojavayê; «aliyê bakur» yê gelek gundan dikeve rojava, û hwd.). Heçî bikaranîna peyva «başûr» û hwd ya Ewliya Çelebî ye, li gor nasîna me ya hindaman li ser kujên çerxa «qiblenimaya hişê» wî biryar dayîn, ne karekî hinde rast û di cîh de ye.

14 Ortaxan: Navê devereke lêqonaxkirinê, ku dikeve navbera Başxan û Diyarbekrê.

15 Şerbetîn: Bajarekî kavilbûyî, ku dikeve bakura rojavayê Diyarbekrê û jê bi qasî 45 km-yan dûr e. Navê wê, wek devereke lêqonaxkirinê, di Menzîlnameyê de gelekî derbas dibe. Kerwanseraya wê ji aliyê Ünal (*Ünal, R.H.; Diyarbakir ili'ndeki bazi Türk-Islam anıları* üzerine *bir inceleme, Erzurum, Atatürk üniversitesi, 1975, r. 136-141*) ve hatiye salox dan.

16 Egîl: Navçeyeke otonom (hukûmet) ya Diyarbekrê.

17 Qara Köprü: Pireyeke li ser Çemê Dûlhadî (*Devegeçîdî*) yê di navbera Şerbetîn û Diyarbekrê. Ev pireya han di serdema Malîk Salih Mahmûd yê hikûmdarê Artûqîd de, di sala 615-ê koçî (1218-ê zayînî) de, hatiye ava kirin (Binihêre: *Tekin, A.; Diyarbakir, Istanbul 1971, Diyarbakır'ı Tanıtma ve Turizm Derneği Yayınları, nr 22, r. 84-5).*

18 Dûlhadî: Çiqilçemekî Dîcleyê ye ku îro jê re *Devegeçîdî* tête gotin.

19 Çemê Dîcleyê: Navê vî çemî ji aliyê Ewliya Çelebî û herweha ji aliyê hevçerxên wî ve *Şet* yan jî *Şet-ul-'Ereb* têtе bi nav kirin.

20 Qara Taşliq: Devereke riya asê ye, ku dikeve bakura rojavayê Diyarbekrê.

21 Layîqî pesnê: Mirov ji rêzên bi dû re tên, têdigihê, ku mebest ji yê sezayê pesnê Yûnis

pêxember e (di metnê de peyva hamîd hatiye bi kar anîn da ku di gel Qara Amîd bi kêş û wezindar e).

22 **Yûnis pêxember:** Pêxemberek e, ku Ewliya Çelebî danîna hîmên Diyarbekrê bi wî ve girê dide û bawer dike ku bi saya duayên wî bajar hatiye parastin.

23 **"Aleyhî"s-selam:** Ango, bila aştî lê be.

24 **Mûsil:** Di metnê de wek Mûsul û Mosul derbas dibe.

25 **Fis Qayasi:** Zinarê ku keleya Diyarbekrê û herweha aliyê bakura rojhelata bajêr li ser hatiye ava kirin.

26 Hîmdanîna bajarê Diyarbekrê (û piştre eynî tişt ji bo Mêrdînê jî hatiye gotin) ya ku bi Yûnis pêxember ve tête girê dan, divê bingeha xwe ji adetên deverî standibe. Ji ber ku em, ne di edebiyata nivîskî û ne jî di ya zargotinî de, rastî wê yekê nehatin ku girêdana vî pêxemberî, ji bilî Nînovayê, bi bajarekî din re hebe (Bide ber hev: *Heller, B.; Yunus, Enzyklopaedie des Islam, çapa yekemîn, berg IV, r. 1273,* û *Heller, B.; Encyklopaedia Judaica, berg IX, r. 170-7, berg XII, r. 1170-1,* û *Ginzberg, L.; The legends of he Jews, Philadelphia 1954, berg IV, r. 246-53,* li beşa I.c-yê ya destpêkê û nemaze li têbîniya wê ya 6-an binihêre).

27 **"Amlaq:** Gernasê efsaneyî yê ku binemala "Amelikan navê xwe jê hildaye. Ev ew xelq e, ku Xwedê piştî alozbûna zimanê Babîlyonan zimanê erebî hînî wan kiriye (*Seligsohn, M.; "Amalik, Enzyklopaedie des Islam, çapa yekemîn*).

28 **Qarûn:** Korahê Încîlê, gernasê efsaneyî yê dijberê Mûsa pêxember. Dewlemendiya wî ya ku nehatiye dîtin, di zanista kevnare ya rojhelata navîn de, timî tête çêl kirin. Heqê wî yê ji bo serhostebûna di zanistên nependî de, ku alkîmîstekî navdar bû, hat xwarin (*MacDonald, D.B.; Karun, Enzyklopaedie des Islam, çapa duhemîn,* û *Sezgin, F.; Geschichte des arabischen Schrifttums, berg IV, r. 11*).

29 **Efrasyab:** Li gor adetên Îraniyan (*Avesta*, bi taybetî *Yasht XIX*), qiralê gernasê efsaneyî yê Tûraniyan. Nivîsevanên îslamî yên ereb û fars, yên wek Teberî û Firdewsî, ji navê wî gelekî kat dikin. Efrasyab di şerekî mezin yê di navbera Îran û Tûranê de bi Rostem re şer kiriye.

30 **Ecem:** Wek navekî coxrafîk ji bo binavkirina herêmeke, ku kêm yan jî zêde peywendiya wê bi Îranê re heye, û bi taybetî jî ji bo beşa ku Tirk lê dimînin, bi awayekî ne rêkûpêk hatiye bi kar anîn.

31 **Diyar-i Bikr:** Ewliya Çelebî, mîna gelek hevçerxên xwe, hez ji etîmolojiya gelêrî yan jî bi peyvan lîstinê dike. Maneya peyva *bikr* (li gor bilêvkirina farisî *bekr*) ya erebî, keçik e, ango keçika bakîre ye. Ewliya Çelebî paşê di cîhekî (beşa 1.34.-an) de bi kêfxweşî vê şilovekirina han ya li ser navê bajêr bi kar tîne, da ku pê paqijbûna jinên wê îzah bike.

32 **Rûm:** Maneyeke ferhengî ya vê peyvê, ku yekcar gelekî elastîkî ye, heye. Ew peyv dikare Bîzansê, welatê Selçûqiyên Rûmê, bi giştî (rojavayê) Anatoliyê, navçeya Sêwasê û yan jî Yûnanistanê raber bike. Carina jî, welê xuya dike, ku bi maneyeke pir giştî ji bo nimandina «welatên rojavaya dûrtir» e.

33 **Qara Amîd**: Ango Amîda Reş, Ameda Reş.

34 **Enûşîrwan**: Enûşîrwan-i "Adil, navê erebî yê yek ji hikûmdarên Sasaniyan. Jê mebest, Xosrowê Yekemîn e (binihêre: *Anushirwan, Enzyklopaedie des Islam, çapa duhemîn*). Lê, tevî ku çu peywendiyên gelek ji gernasên efsaneyî bi Xosrowê dîrokî re tune ne, dîsan jî navê wî bi navê Enûşîrwan ve tête girêdan.

35 **10-ê koça pêxemberî**: Beranberî 631-ê zayînî ye.

36 **Xalid ibn Welîd**: Hogirê pêxember yê ku ji bo girtina Diyarbekrê bawerî pê hatibû kirin. Kurê wî Silêman, ku di vî şerî de hat kuştin, li rex mizgefta pêşîn ya Diyarbekrê ya di hundirê bedena bajêr de hatiye veşartin (binihêre: *Crone, P.; Khalid b. Walid, Enzyklopaedie des Islam, çapa duhemîn*).

37 Ew ne di sala 10-ê koçî, lê di 19-ê koçî (639-ê zayînî) de bû, ku Diyarbekir bi destê leşkerên îslamî hat girtin (li gor dîroknas al-Waqîdî yê ku erdgirtinên destpêkiyê yên bi destê îslamiyan bi hûrgiliyeke pir berfireh salox daye). Hingê ne Xalid ibn Welîd, lê Îyaz ibn Xam serdarê bilind yê leşkerên îslamî bû. Xalid ibn Welîd ji baskê çepê yê sûpayê îslamî re serektî dikir. Heçî dorlêpêçana Diyarbekrê ye, ji aliyê Îyaz bi xwe ve hatiye li dar xistin. Lê belê li gor hedîsan ew Xalid e, ku di gel du hogirên navdar yên pêxember dergehê keleya bajêr şikandiye û ketiye bajêr (binihêre: *Yınanç, M.H.; Diyarbekir, Islam Ansiklopedisi, berg III, r. 601-626*). Li gor vegotinên deverî jî, Xalid ibn Welîd bi riya tunêlekê, ku ava zêde ya bajêr tê re diçû, dikeve bajêr.

38 **Muwehîdîn**: Ango monoteîst, yekxwedaparêz/yekxwadayî. Kesê ku baweriya xwe bi yek Xwedayî tîne. Ji vê baweriyê re jî monoteîzm, ango yekxwedatî, tête gotin.

39 **Sultan Ewhedullah**: Navê hikûmdarekî kevnare yê kurd, ku Ewliya Çelebî pirî caran ji navê wî kat dike, lê me nikarî em bi kesnameya wî nas bin. Ewliya Çelebî jê re Ebasî dibêje û wî kalikê xanê Bidlîsê (*Seyahatname, berg III, 225*) û herweha yê Erxenî Begê hikûmdarê yekemîn yê Erxeniyê dide zanîn (*Seyahatname, berg IV, 98/10*). Ew wî, hikûmdarê musliman yê yekemîn ku Bidlîs ji bin destê Êrmeniyan derêxistî, bi nav dike. Li milekî din jî, dîsan ew bi xwe dibêje, ku yê Diyarbekir ji Êrmeniyan bi şûn de standiye, kurê Ewhedullah e (*Seyahatname, berg IV, 222/36*, û di V, 222v û rêza 36-an, herweha 198v û rêza 31-ê vê metnê de). Em ne di *Şerefnameyê* û ne jî di dîrokên din yên herêmî de rastî navekî weha nehatin. Heye ku Ewhedullahê Ewliya Çelebî navekî ji hevedudanê yê çend kesên dîrokî be. Wek Ewhed ibn Melik "Adilê Melikê Eyûbiyan (ku di sala 604-ê koçî/1210-ê zayînî de Xelat girtiye û bi fermana bavê xwe, heya ku Melik Eşrefê birayê wî ew di sala 607-ê koçî/1210-ê zayînî de ji text daxistiye, lê hikûmdarî kiriye). Navê wî jî eynî bû û herweha yê Badê hikûmdarê yekemîn yê Merwaniyan jî, ku xwedî hema hema eynî kariyerê bû. Di derheqa Melik Ewhed de li *Bidlisi, Amir Sharaf ad-Din Khan; Sharafnama: Tarikh-i mufassal-i Kurdistan, çapa M."Abbasi, Tehran, r. 105-6*; *Bidlisi, Amir Sharaf ad-Din Khan; Chéréf-nâmeh, ou Fastes de la nation kourde par Chéréf-ou'ddine, wergêra F.B.Charmoy, St. Petersbourg 1868-1875, berg 1/2, r. 94*; *Saint Martin, M.J.; Mémoires historiques et géographiques sur l'Arménie, Paris 1818-1819, berg I, r. 432*-an binihêre. Di derheqa Bad de jî li *al-Fariqi, Ibn al-Azraq*; (têbîniya hej 3), *r. 65-75*) binihêre. Piştî nîvsedsalekê bi dû vî Ewhedê yekemîn re, hikûmdarekî kurd yê bi eynî navî pêşde têt, Melik el-Muwehhîd

yan jî el-Ewhed, hikûmdarê deverî yê bi dirêjahiya salên 657-79-ê koçî/1259-80-yê zayînî (heye ku bi dû vê salê re jî be) li Hesenkêfê hikûmdarî kiriye. (*Cahen,C.; Le Diyar Bakr au temps des premiers Urtukides, Journal Asiatique, 227 (1935), r. 124-5; 128, û (Cahen,C.; Contribution à l'histoire du Diyar Bakr au XIVe siècle, Journal Asiatique, 243 (1955), têbîniya wê ya r. 67-an*).

40 Li vir welê xuya dike ku Ewliya Çelebî bawerî bi vegêrandina bûyerên dîrokî yên herêmî ya Kurdan aniye, ku bi awayekî rast nehatine bîra wan. Ew di berga IV-an ya pirtûka xwe de, li gelek cîhan navê vî Ewhedullahê hikûmdarê Ebasî yan jî kurê wî tîne û wan wek kesên pêşîn yên ku li herêmê hikûmdariya Kurdan danîne bi nav dike. Heye ku Ewliya Çelebî li vir navê vî kalikê gernasê efsaneyî yê binemala hikûmdarê Kurdan û navê Badê danerê dîrokî yê mîrektiya Kurdên Merwanî, ku di sala 984-an de Diyarbekir xistibû bin kontrola xwe, (binihêre: *Amedroz, H.F.;* (têbîniya hej 3); *al-Fariqi, Ibn al-Azraq;* (têbîniya hej 3, *li gelek cîhan*); *Bidlisi, Amir Sharaf ad-Din Khan; wergera F.B.Charmoy, berg 1/2, r. 35-6, 247-56*)) tev li hev kiribe. Lê belê, Bad bajar ji Buweyhîdiyan standibû, ne ku ji «Êrmeniyan» (yan jî ji Bîzansiyan). Di rastiyê de, em çu çavkaniyeke îslamî, ya qebûl dike ku Diyarbekir careke din ketiye bin kontrola Xiristiyanan, nabînin. Lê, li gor dîroknivîsên Bîzansiyan (û herweha li gor hin dîroknasên Ewropiyan jî), Bîzansiyan Amed careke din girtiye û piştre ew di sedsala X-XI-ê zayînî de ji nû ve ketiye bin destê Musilmanan. Dîroknasên êrmenî û sûrî çêla biserketineke holê nakin, bi tenê ji çend dorlêgirtinan kat dikin (*Yınanç, M.H.; Diyarbekir, Islam Ansiklopedisi, berg III, r. 601-26*).

41 Ev eynî babeta han ya bingehîn, ku Ewliya Çelebî ji her heft mercên wê kat dike, di hin guhartoyên din de jî hatine formule kirin. Em di wan de bi kêmanî ji sisyan didoyê hêmanên sereke yên peymanê dibînin:

a. Mecbûriyeta dayîna *ciziye* yan jî *xeracê*, lê jê muafgirtina rêberên olî (mercê yekemîn û sêhemîn; ya çaremîn ji dereca didwan e û di gelek waran de, ji berbipêşderxistina bazirganên ne musilman bêtir, mercên hîn baştir dide wan).

b. Garantîkirina otonomiyeke olî û çandî (mercê didwan, pêncan û şeşan, heye ku yê heftan jî be?).

c. Venasîna pozîsyona serdestiya civata musliman (heye ku mercê heftemîn be, eger wek mecbûriyeta danîna serê xwe ya serpûşiya wan ya belek bête şilo vekirin, li têbîniya me ya hej 44-an jî binihêre).

42 **Peymana "Emer:** Yan jî mercên "Emer (*şûrût "Umer*) qanûnek bû, ku peywendiyên di navbera musilman û yên wan ên ne musilman (*fimmî*) de bi rêk dixist. Ji ber ku erdgirtinên herî mezin di serdema xelîfetiya hezretê "Emer de qewimîne, ev qanûna han jî bi navê vî xelîfeyî ve tête girêdan. Wek metneke civakî û siyasî, ew li her cîhî xwedî guhartoyekê bû û mercên berbiçav yên vê peymanê li gor deveran dihatin guhartin. Dîroknasekî ereb yê kevn, al-Beledhurî, behsa çend teşeyên vê peymanê dike (*Baladhuri, A.b.Y.; The origins of the islamic state; a translation of Futuh al-buldan, wergêr: P.K.Hitti û F.C.Murgotten, çapa 24-an, New York 1970, r. 191*). Ji bo gotûbêjên din li (*Fattal, A.; Le statut légal des non-musulmans en pays d"Islam, Beyrouth 1958, r. 60-9; Gibb H.A.R.; The fiscal escript of Umar II, Arabia 2, 1955, R. 1-16; Binswanger, K.;*

Untersuchungen zum Status der Nichtmuslime im osmanischen Reich des 16. Jahrhunderts, München 1977, bi taybetî r. 26-39; Juynboll, Th.W.; Handleiding tot de kennis van de Mohammedaansche wet volgens de leer der Sjāfi'itische school, Leiden 1930, r. 347-56) binihêre.

43 Cizye: Baca ku ji xelqên ne musilman dihat standin.

44 Mirov hêvî dike, ku danîna serê xwe ya serpûşiya belek ji mafekî bêtir mecbûriyet be, çêtir e. Kesên ne musilman gelek caran dihatine îcbar kirin, ku serpûşiyeke cihê bidin serê xwe, heta bi dû re rengên wê jî hatibûn xuya kirin. Regnault (ku *Binswanger, K.; Untersuchungen zum Status der Nichtmuslime im osmanischen Reich des 16. Jahrhunderts, München 1977, r. 165*, jê neqil dike), di sala 1549-an de dide xuya kirin, ku musilmanên Qudsê serpûşiya spî, lê belê xiristiyanan jî yeke belekî didane serê xwe. Ev ne tesadufî ye, ku serpûşiya belekî nîşana jihevveqetandina xiristiyanên Diyarbekrê be û herweha Ewliya Çelebî vê kira han ya di zemanê berê de, wek lutfeke ji wan re pêşkêşkirî, derdixîne pêş.

45 Me peyva *qal'e* (kele, kela, keleh), ya ku Ewliya Çelebî pê hem sûr û bedena bajêr û hem jî ketina hundirê bedena bajêr tîne zimên, li gor hevokan wek «kele», «bedena bajêr» yan jî «bajar» wergerand.

46 Heye ku mirov ji peyva «sultanên berê» (*selef selatîn*), sultanên berî Osmaniyan têbigihê. Terma *yarliğ* ya ku Ewliya Çelebî bi kar aniye, termeke kevnare ye û nema bi kar têt. Bi ser de jî, ew kilîleke misoger jî nade destê mirovî, ku mirov bizanibe ka lihevhatineke holê kînga û ji aliyê kê ve hatiye bestin. Bineçeya vê termê, ku ferman hevmaneya wê ye, monxolî ye û ew ji aliyê hinekên din ve, wek Selçûqiyên Rûmê, Qaraqoyûnlûyan, Aqqoyûnlûyan û Memlûkiyan, hatiye bi kar anîn. Herweha ew terma han car caran di metnên dîplomatîk yên kevn yên Osmaniyan de jî derbas dibe (*Uzunçarşılı, I.H.; Osmanlı devletinin saray teşkilatı, Ankara: Türk Tarih Kurumu, 1945, r. 283*). Wilo xuya ye, ku piştî Fatîh Mehmet nema hatiye bi kar anîn (*Matuz, J.; Das Kanzleiwesen Süleymans des Prächtigen, Wiesbaden 1974, r. 93; Doerfer, G.; Türkische und mongolische Elemente im Neupersischen, Wiesbaden 1963-1975, berg IV, hej. 1849*).

47 Sultan Selîmê l-emîn: Selîm Xan yan jî Yavuz Sultan Selim, ku di navbera salên 1512-1520-an de hikûmdariya Împaratoriya Osmaniyan kiriye. Di serdema wî de Diyarbekir bi împaratoriyê ve hat girêdan.

48 *El-melîk-ul-muzaffer.* Ango, padişahê biserketî.

49 Ewliya Çelebî Çildir dinivîse, ku eşkere ye şasiyek e. Ew navê Çildir û Çaldiranê, ku şerê mezin yê di gel Sefewiyan di sala 1514-e zayînî de li wir ciriya, têkilhev dike. Li milekî din, mîrektiya Çildirê, ya ku gelekî li bakura Çaldiranê bû, di eynî salê de bû dewletcke vasal ya Osmaniyan û di sala 1578-an de jî bû eyaleteke Împaratoriya Osmaniyan. Îro Çildir qezaya bajarê Qersê û Çaldiran jî nahiyeya Ebexeyê ya qezaya Wanê ye.

50 Kemah: Navê keleheke ye û dikeve jora çemê Firatê. Ew îro qezaya bajarê Erzinganê ye.

51 Tercan: Deşta Tercanê, di sala 1473-ê zayînî de bûye qada şerê mezin yê di navbera

Uzun Hasan û Sultan Mehmedê II-an yê Osmaniyan de. Di vî şerî de Uzun Hasan bi ser ket. Niha Tercan qezaya Erzinganê ye.

52 **Baybûrd:** Îro qezaya bajarê Gümüşhaneyê ye.

53 **Çanxa (Caniha ?):** **Navê keleyekê ye li bakura rojavayê Kurdistanê, ku ji me re navekî nenas e. Heye ku rasttir be, ku mirov wî navî wek** *Hanîce* **bixwîne. Lê me nedikarî em cîhê vî navî jî tesbît bikin.**

54 Çavkaniyên din bi awayekî vekirî nabêjin, ka Kurdan çi êş û azar bi leşkerên Sultan Selîm, yên ku di riya Çaldiranê de bûn, dane kişandin. Lê belê, tête zanîn, ku hingê Kemah û Baybûrd di bin destê Qizilbaşan de bûne û herweha nijdevanên Qizilbaşên van deran, heye ku Kurdan jî, bi dirêjahiya zivistana sala 1514-15-an, xwe dirêjî leşkergeha Osmaniyan ya li Erzinganê dikirin. Osmaniyan di bihara 1515-an de keleyên Kemah û Baybûrdê girtin (*Hammar;* (têbîniya hej 7; *VI, 25, 187-8; Sa'dü-din: Hoca Sadettin Efendi. Tacü-t-tevarih; Sadeleştiren ve yalınlaştıran: I.Parmaksızoğlu, Kültür Bakanlığı, Îstanbul 1979, berg V, r. 226-34).*

55 ***Qapucıbaşı:*** Termeke birêvebirinî ye û ji serekê dergehvanên (*Qapucı*) serayê re dihate gotin. Di nîvê sedsala 17-an de 12 *Qapucıbaşı* hebûn. Bi şev yekî ji wan panêriya *Dergah-ı "Alî* dikir ; gava ku dîwan diciviya, diviya du *Qapucıbaşı* li herdu kêlekên derî rawestin. Peyamên girîng yên ji bo waliyên eyaletan bi *qapucibaşi-* yekî re dihate şandin. (*Uzunçarşılı, I.H.;* (têbîniya hej 46), *r. 404-6*). Bi şandina *qapucıbaşı* ve, Sultan nîşan dida, ku ew pûteke gelekî mezin dide dabaşê.

56 ***Dergah-i "Alî:*** Ango, dergeha padişah, deriyê koşka key.

57 **Şah Îsmaîl:** Şah Îsmaîlê l-emîn, hikûmdarê pêşîn yê Sefewiyan, ku di navbera salên 892-932-yê koçî (1487-1524-ê zayînî) de jiyaye.

58 ***El-lîsenet-ul-xelq eqlam-ul-heq:*** Ango, zimanê gel qelema Xwedê ye.

59 **Erzirom:** Navê bajarekî Kurdistanê ye, ku dikeve bakura Kurdistanê.

60 **Biyiqli Mehemmed Paşa:** Biyiqli Mehemmed Paşa wek bilindtirîn fermanderê sûpayê hatibû tayîn kirin. Ew piştî biserketina Selîmêl-emîn ya di şerê 1514-an de, li Çaldiranê, li dijî Şah Îsmaîl, li rojhelatê ma. Di salên bi dû re, wî Diyarbekir kir bin destên Osmaniyan û di navbera salên 922-8-ê koçî (1516-22-yê zayînî) de bû waliyê Osmaniyan yê pêşîn li vê eyaletê. Wî koşka di keleyê de ji nû ve da çêkirin, herwisan mizgeftek û hemamek lê da ava kirin.

61 **Deriyê Çiyê** (Dağ Qapusı): Deriyê bakur yê bajarê Diyarbekrê, ku wek Deriyê Xarpêtê (Harput qapusı) û Deriyê Êrmeniyan (Ermeni qapusı) jî hatiye nasîn (*Nejat Göyünç; «On altıncı yüzyılın ilk yarısında Diyarbakır», Belgelerle Türk Tarihi Dergisi, hej 7, 1968, r. 78*). Ewliya Çelebî van navan bi kar nahîne.

62 **Deriyê Mêrdînê** (Mardin Qapusı): Deriyê başûr ya di bedena bajarê Diyarbekrê de. Wek alternatîv, jê re Deriyê Girikê (Bab-ut-Tel) (*Nejat Göyünç; «On altıncı yüzyılın ilk yarısında Diyarbakır», Belgelerle Türk Tarihi Dergisi, hej 7, 1968, r. 78*) jî digotin.

63 **Mêrdîn:** Herçendî di lîsteya navê sancaqan de navê wê nehatibe gotin jî, ew sancaqeke Osmanî ya Diyarbekrê ye.

64 **Mela Îdris** (Mela Îdrisê "Amadiyê): Ewliya Çelebî bi awayekî ne rast jê re dibêje Îdrisê hikûmdarê Amêdiyê. Îdrisê ku ew jê kat dike, Îdrisê Bitlîsî yê dîroknas û dîplomatê navdar e. Wî bi riya îqnakirina hikûmdarên Kurdan, ku ew li dijî Sefewiyan bi Osmaniyan re bibin yek, Kurdistan xist bin destên Osmaniyan.

65 **"Al-i Osman**: Ango, Osmanê payeberz û bilind. Jê mebest Osmanê ku hîmên împaratoriyê daniye.

66 **Amêdiye** ("Amadiye): Navçeyeke kurdî ya otonom, ku îro her eynî bajar e, ku ketiye herêma Behdînan ya li bakura Îraqê.

67 **Sultan** Suleyman: Süleyman-ı Qanuni yan jî Sultan Süleymanê 1-emîn yê Osmaniyan, ku di navbera salên 1520-66-an de sultanî kiriye.

68 *"Aleyhî-er-rehmetun we-el-xufran* nnn: Ango, bila dilovanî û bexişîna Xwedê lê be.

69 **Kîse**: Qîmeta misoger ya diravên kîseyekî li gor kursa zemên tête guhartin. Di sala 1537-an de, di serdema Sultan Suleyman de, qîmeta kîseyekî 20 000 *aqçe* bû. Di sala 1660/61-ê de, di zemanê Ewliya Çelebî de, 40 000 *aqçe* bû (*M.Zeki Pakalin; Osmanlı Tarih Deyimleri ve Terimleri Sözlüğü, Istanbul 1946-1972, 3 berg*).

70 Aqçe: Yekeyeke diravî bû. Ew pereyekî piçûk î madenî bû û qiymeta wê ji sisyan yekê pereyekî bû.

71 ***Sultan Suleyman bin Selîm Xan "aze nesrûhû zurîbe fî Qara Amîd***: Ev diravên madenî hê jî hene û saloxên wan di pirtûka *Halil Ethem; Meskukat-ı "Osmaniye, Qostantiniye, 1334(1916), berg 1,r.232- 44*-an de hatine dayîn. Ji wan ne bi tenê pereyên zîvînî û lê yên zêrînî, herweha xurdeyên ku sikkeyên mîna hev li ser heyî, hene. Pereyên hej. 798-803-yan yên di vê katalogê de, gelekî li yekî ku Ewliya Çelebî salox daye, diçe. Li ser rûyekî, *Şah Sultan Suleyman bin Sultan Selîm* (yan jî *bin Selîm Şah*) û li rûyekî din jî *"aze nesrûhû derbû Amîd senetu 926* (ango; bila alîkariya wî pir be, ji bo şerê biserketiyê Amedê yê sala 926-an) hatiye nivîsîn. Ewliya Çelebî li vir dikeve şaşiyekê, wê yekê bi zemanê serdana Sultan ya Diyarbekrê ve girê dide, ku ew di sala 942-yê koçî (1535-ê zayînî) de bûye. Sala ku li ser pereyan hatiye nivîsîn, 926-ê koçî (1520-ê zayînî) ye, ku ev jî sala derketina ser têxt ya Sultan Suleyman e. Ji bilî vê, Sultan Suleyman li Diyarbekrê ji bo derbasbûna zivistanê nemaye..Ew di 21-ê çiriya pêşîn de digihêje bajêr û piştî sê hefteyan berê xwe dide Helebê (*Nasuhü"s-Silahi Matrakçı; Beyan-ı menazil-i sefer-i "Irakeyn-i Sultan Süleyman Han, hazırlayan H.G.Yurdaydın, Ankara: Türk Tarih Kurumu, 1976, fol 102b-103a).*

72 **Zemînî**: Ev hevoka bi temamî ne zelal e. Peyva zemînî bi xwe bi maneya erdî ye. Heye ku bi maneya binerdî de, ji bo mezhebeke Şî'e ya ku heta niha nehatiye nasîn, hatibe bi kar anîn.

73 **Kurdistan**: Ev nava carina ji bo bi misogerî kifşkirina devereke coxrafîk hatiye bi kar anîn, ku ji Erziromê heta Besrayê û ji Helebê heta Erdelanê (di 218v - 219r yên vê destnivîsarê de) hildide nav xwe. Ango, deverên ku Kurd li wan deran hene lê belê ew kêmatiya rûniştevanên deverê pêk tînin jî dikevine nav. Carina jî Kurdistan navê herêmekê, herêmeke ku di gel gelên din gelek Kurd lê dijîn salox dide.

74 Ev metna jêrîn, ji nivîsareke din ya berê çapkirî, ku wek pirtûkeke saloxdêriya bilez di *Chancery* -dadgeha bilind- de dihat bi kar anîn, hatiye berhev kirin. Beşa yekemîn bi rastî jî di gel *Code* -qanûnnameyê-, ya ku ji aliyê Paul Rycaut (*Paul Rycaut; The history of the present state of the Ottoman empire, London 1682, r. 95-6*) Ewropiyê hevçerxê Ewliya Çelebî hatiye wergerandin, weke hev e. Ev metn di gel Risale-ya "Ayn-ı "Ali ya di sala 1018-ê koçî (1609-10-ê zayînî) de berhevkirî (*"Ayn-ı "Ali Efendi; Qavanin-i Al-i "Osman der hülasa-i mezamin-i defter-i divan, hazırlayan M.T.Gökbilgin İstanbul 979, r.29-31*) ne weke hev e, lê gelekî lê diçe. Di hindek cîhan de ya Ewliya Çelebî û di hindek cîhan de jî ya "Ayn-ı "Ali kamiltir e. Hem Ewliya Çelebî û hem jî Rycaut, herdukan jî guhartoyeke çakkirî û paşê çapkirî ya vê Risale-yê kopye kirine. Her çilo be, ev berhevoka ne ku rewşa di serdema Ewliya Çelebî de heyî, lê belê rewşa hinekî berî vê tarîxê yan jî kombînasyonek ji agehî û zanyariyên ji serdemên têvel bi me dinimîne.

75 Tûx: Peyv bi xwe bi maneya «dêlbijiyên hespan» e. Lê wek termeke birêvebirinî ji bo nîşandana payeya paşayan, wek sembol, hatiye bi kar anîn.

76 *Destûr-i mukerrem ve muşîr-ul-mufehhem*: Welê xuya ye, ku navnîşan û tîtla *Destûr-i mukerrem ve muşîr-ul-mufehhem* ji bo wezîran hatiye veqetandin. Ew wek navnîşan û tîtlekê di nîvê sedsala 17-an de, di fermaneke ji bo *beglerbegiyê* Erziromê hatiye şandin de hatiye bi kar anîn. Statûya vî *beglerbegî* jî wezîr bû (*A.S.Beygu; Köprülüler devrinde Kığı demir madenlerinde yapılan top güllelerinin Avrupa seferi için Erzurum'dan gönderilmesine ait üç vesikalar», Tarih Vesikaları II/II, 1943, r.335-7*). Mirov li vir dikare vê navnîşan û tîtlê wek *wezîrê rûmetdar û mareşalê fehman* wergêre kurdî.

77 Xas (xass): Li vir bi maneya çavkaniya hatinê ye. Lê wekî din; di zemanê Osmaniyan de, erdê ku dahata wî ya salewextî ji sed hezar (100 000) *aqçe*-yî bêtir yê ku bi pêşkêşî didan giregirên dewletê.

78 Eşkere ye, ku ev hejmar şaş e. Di rêza hema li dû vê de Ewliya Çelebî hejmara rast ya van sancaqan dide, ku 19 e.

79 Hikûmet: Di serdema Osmaniyan de, termeke siyasî û birêvebirinî ye û ji bo hikûmetên otonom, ango mîrektiyên otonom, dihat gotin.

80 *Tîmar* û *ze'amet*: Di dema Osmaniyan de, mafê standina aşara erdê ye. Ev mafê han dabûn begên ku di gel sîpahiyên xwe diçûn şerî. Heçî hejmara sîpahiyan e, yên ku diviya beg xwedî bikirana, hatibû sînor kirin.

81 *Yurtluq* û *ocaqlıq*: Termeke birêvebirinî ye û bi maneya herêmeke otonom ya kesê xwedî navnîşan û tîtel, ku ew navnîşan û tîtel ji dûndeyên wî re mîrat dimîne. Di vê metnê de, ev term bi tenê ji bo sancaqên otonom yên Kurdan hatiye bi kar anîn.

82 *Alaybegi*: Ango, fermanderê leşkerên *sipahi*.

83 *Çeribaşı*: Di zemanê Osmaniyan de ji serekê serbazan (esker) re digotin.

84 Ango, *mefrûz-ul-qelem ve meqtû'-'ul-qidem*.

85 Heçî navên van sancaqan e, me di wergerê de, yan navên wan yên bi kurdî bi kar anîn

yan jî ew li gor bilêvkirina kurdî nivîsîn. Lê heçî navên ku Ewliya Çelebî nivîsîbûn, me ew di têbîniyan de, di nav dukevaneyê de nivîsîn.

86 Xarpêt (Xarput): Yek ji sancaqên Osmanî ya bi Diyarbekrê ve girêdayî.

87 Erxenî (Arxenî): Yek ji sancaqên Osmanî ya bi Diyarbekrê ve girêdayî.

88 Sêwerek (Sîverek): Yek ji sancaqên Osmanî ya bi Diyarbekrê ve girêdayî.

89 Nisêbîn (Nisibîn): Yek ji sancaqên Osmanî ya bi Diyarbekrê ve girêdayî. Her Nisêbîna îro bi xwe ye.

90 Hesenkêf (Hisinkeyf, Hisnkeyfa): Keleke û bajareke kevn li ser çemê Dîcleyê. Hesenkêf paytextê mîrektiyeke kevn ya Kurdan û di sedsala 12 - 13-an de jî paytextê Artûqîdiyên Mezin bû. Di serdema Osmaniyan de ew navenda sancaqeke adetî bû.

91 Çemîşkêzak (Çemîşkezek): Sancaqeke Diyarbekrê bû, lê carina ew *ocaqlıq* bû. Piştre her yekser ji aliyê waliyê Osmaniyan ve hat bi rê ve birin.

92 Sêrt (Si'îrd): Yek ji sancaqên Osmanî ya bi Diyarbekrê ve girêdayî.

93 Aqçaqele (Aqçaqal'e): Di lîsteya sancaqan de navên du Aqçeqeleyan hatine nivîsîn û welê xuya ye, ku herduk ne navên eynî cîhî ne. Yek ji wan sancaqeke Osmaniyan ya bi Diyarbekrê ve girêdayî ye û dikeve devereke nêzîkî Nisêbînê (Li gor 197v û rêza 4-an). Ji ber ku ev nav li hîç deverekê nehatiye destnîşan kirin û nivîsîn, me cîhê wê bi awayekî misoger nenasî. Heçî Aqçeqeleya didwan e, heye ku ew eynî Aqçeqele be, ku navê wê di *Şerefname*-yê derbas dibe. Ew dikete nêzîkî Dara Hênêyê (Genc) û di bin hikûmdariya Sûweydiyan, begên Xançûkê, de bû (ne dûr e, ku ev Aqçeqele ew Aqçeqele be ku Birken (*Andreas Birken; Die Provinzen des Osmanischen Reiches, Wiesbaden 1976, -Beihefte zum Tübinger Atlas des Vorderen Orients, Reihe B; no. 13-, r.185*) wê wek sancaqa Osmaniyan bi nav dike. Di afirandina Katib Çelebi de jî navê Aqçeqeleyekê derbas dibe, ku dikeve nîvê riya di navbera Erzirom û Paliyê (*Katib Çelebi; Cihannüma, hazırlayan Ibrahim Muteferriqa, Istanbul 1145(1732), r. 427*) û heye ku ev her ew kele bi xwe be.

94 Xabûr: Navçeyên Xabûr û Şengalê, bi hev re, sancaqeke Osmanî ya ser bi Diyarbekrê pêk dianîn.

95 Şengal (Sincar): Sancaqa Osmanî ya ser bi Diyarbekrê bû (di gel navçeya Xabûrê). Eşîretên kurdî yên ku ol û dînê Êzîdîtiyê dihebandin, li Çiyayê Şengalê binecîh bûbûn. Ji ber timî li hember dewletê asêbûna wan, waliyê dewletê pirî caran êrişên serkutkirinê dibirin ser wan. Ewliya Çelebî saloxên du ji van êrişan dide.

Herwekî ku di rûpela 30-î ya *Risale*-ya "Ayn-ı "Ali de bi awayekî zelal hatiye diyar kirin, Xabûr û Şengalê tevde sancaqek pêk dianîn. Bi vî rengî, me yazdeh sancaqên Osmanî hene. Piştre, di rêzên bi dû vê re, Ewliya Çelebî Xabûr û Şengalê jî wek du sancaqên cihê hesab dike û bi vî tehrî hejmara wan li ser hev digihêje 12 + 8 + 5 = 25 -an. Tiştê seyr û ecêb ew e, ku herçendî Mêrdîn bi kêmanî ji dewra Sultan Suleymanê l-emîn û bi vir de sancaqeke Osmanî ya Diyarbekrê bûbe jî, navê wê di vê lîsteyê de tune ye.

96 Saxman (Sağman): Sancaqeke (*ocaqlıq*) kurdî ya Diyarbekrê ku xwedî mafê mîrasmayînê ye. Berê ew perçeyek ji Çemîşkêzaka mezin bû.

97 **Pasûr** (Qûlp): Sancaqeke (ocaqliq) kurdî ya Diyarbekrê ku xwedî mafê mîrasmayînê ye.

98 **Mîhranî** (Mihranî): Sancaqeke (*ocaqlıq*) kurdî ya Diyarbekrê ku xwedî mafê mîrasmayînê ye.

99 **Ataq**: Sancaqeke (ocaqliq) kurdî ya Diyarbekrê ku xwedî mafê mîrasmayînê ye. Ewliya Çelebî di vegera gera xwe de lê geriyaye (pirtûk V, r. 115). Dikeve nêzîkî bajarê Licêya niha. Ev keleya han îro nemaye (*Salname-i vilayet-i Diyarbekir, def'a 13, Diyarbekir 1308 (1890-91), r. 120*).

100 **Pêrtag** (Pertek): Sancaqeke (*ocaqlıq*) kurdî ya Diyarbekrê ku xwedî mafê mîrasmayînê ye. Berê ew perçeyek ji Çemîşkêzaka mezin bû.

101 **Çepexçûr** (Çapaqçûr): Sancaqeke (*ocaqlıq*) kurdî ya Diyarbekrê ku xwedî mafê mîrasmayînê ye. Keleya hikûmdaran nêzîkî bajarê Çewlika (Bingöl) niha ye.

102 **Cizîr** (Cezîre): Hikûmeteke mezin û otonom ya Kurdan. Paytextê Cizîrê (Cezire-i ibn "Ömer), di çemê Dîcleyê de giravek bû, bajarekî piçûk û bi kele ye.

103 **Dara Hênê** (Genc): Hikûmeteke otonom ya ser bi Diyarbekrê.

104 **Palî** (Palû): Hikûmeteke otonom ya ser bi Diyarbekrê. Ewliya Çelebî ev keleya han, ya ku li ser ava Mûradê ye, berî hatina xwe ya Diyarbekrê ziyaret kiriye.

105 **Hezo** (Hazo): Hikûmeteke otonom ya ser bi Diyarbekrê. Ev navçeya teqabulî Qabilcewza (Sason) îro dike. Niha navê bajarê Hezoyê kirine *Kozluk*.

106 **Pesyan** (Pesan, Pesyan) û **Pozan**: Eşîretên koçer yên kurd bûn ku bi mebesta bacê bi yekeyeke birêvebirinî ya xweser ve hatibûn girê dan. Ev rewşa han ya wan, bi rengekî zelal, di pirtûka ji aliyê Kunt ve hatiye weşandin de tête kat kirin (*Metin Kunt; Sancaktan eyalete: 1550 - 1650 arasında Osmanlı ümerası ve il idaresi, Istanbul Boğaziçi Yayınları, 1978, r. 143, 163, 192*).

107 **Xançûk**: Sancaqeke (*ocaqlıq*) kurdî ya Diyarbekrê ku xwedî mafê mîrasmayînê ye. Li gor *Şerefname*-yê (*Bidlisi, Amir Sharaf ad-Din Khan; çapa M.'Abbasi* (têbîniya hej 39), *r. 330*), ew dikeve çiyayê Şeftalûyê û hingê bi Dara Hênêyê (Genc) ve girêdayî bûye heta ku bûye paytextê hikûmdarên eşîreta Suweydiyan. Ji ber vê yekê jî, divê ew gelekî nêzîkî Aqçaqeleya didwan bûbe yan jî her ew bi xwe be, ku Ewliya Çelebî jî jê çêl dike.

108 ***hakim***: Yek ji karmendên desthelatdar ku meqamekî bilind yê dewletê digerîne.

109 ***timar defterdarı*** (Defterdar-ı tîmarha): Defterdarê tîmaran, ango karmendê tomarkirina *tîmar* û *ze'amet*-an.

110 ***defter kethüdası*** (Ketxûda-yı defterdar): Kedxwedayê defterdar, ango serkarê alîkar yê darayiyê.

111 ***mal defterdarı***: Defterdarê maliyê, ango serkarê darayiyê.

112 Naveroka hevokê rave dike, ku bi tenê ev hersê karmendên han yên xezîneyê, di gel *sancaqbegî*-yan, karmendên desthelatdar û bilind bûn ku *xasa* malûmulk dabûnê. Ev yeka han îdîayên Pakalın (*M.Zeki Pakalın; Osmanlı tarih deyimleri ve terimleri sözlüğü,*

İstanbul 1946-72) û Gibb û Bowen (*Gibb, A.R.Hamilton and Harold Bowen; Islamic society and the West, London: Oxford University Press 1950, r. 150*), yên dibêjin mafê *defter kedhüdası* û *timar defterdarı* tune bûn ku *xas* werbigirin lê wan *ze'amet* werdigirt, rast dernaxe.

Heçî *mal defterdarı* (yan jî *defterdar-ı hazine*) ye, serkarê gencîneya (xezîne) herêmê bû. Ew ji hemû hatin û çûnên darayî yên girîng berpirsiyar bû û di teoriyê de, beglerbegi nedikarî têkilî karê wî bibe. Nimûneya di vê biwarê de ev e, ku defterdarê Diyarbekrê bi xwe di warê çêkirina keleya Mûsilê de, di sala 1631-ê de, materyalên pêdivî yên ji bo avahiyê doz kirine (*R.Murphy; «The costruction of a fortress at Mosul in 1631». In: Social and economic history of Turkey 1071-1920); ed. by O.Okyar and H.Inalcık, Ankara 1980, r. 164*).

Heçî di navbera herdu karmendên din yên gencîneya herêmê de, *timar defterdarı* û *defter kethüdası* (yan jî *kethüda-yı defterdar*), parvebûna erk û wezîfeyan e, ne hinde zelal e. Li gor Panklın, çavdêriya giştî dabaşên darayî û dabaşên din yên ku bi *tîmara* li herêmê ve girêdayî, di destên *timar defterdarı* de bûn (*M.Zeki Pakalın, berg III, r. 507*). Lê *defter kethüdası*, di gel fonksiyoneke piçûk ya bi *ze'ametê* ve girêdayî, ew her yekser serkar bû (*M.Zeki Pakalın, berg I, r. 420; Gibb, A.R.Hamilton and Harold Bowen, r. 150*). Ewliya Çelebî di 199v û rêza 26-an de, wek karmendên gencîneyê, di bin navê *mal defterdarı* de navê *ze'amet defterdarı* û *defter emini* tîne zimên. Ev dide xuya kirin, ku *ze'amet defterdarı* û *timar defterdarı* her eynî kes bûne. Ew kes, hem ji çavdêriya nivîsîn û tomarkirina bacê û hem jî ji karûbarên *îmar* û *ze'ametê* berpirsiyar bûye, ku li gor mercan, karê *defter kethüdası* di gel *defter emini* yê gencîneya navendî parelel bi rê ve çûye.

Li milekî din, *xasa* ku Ewliya Çelebî li vir berpêş dike, eşkere ye, ku çewt e. Ew 40.399 *aqçeyên* han, ji *xasa* li serhev ku di rêza 21-ê de hatiye diyar kirin, ango 80.000 + 100.925 + 140.395 = 321. 320 *aqçe*, gelekî kêmtir e.

113 *cebelü*: Ev mêrên çekdar û zirîpoş in, ku xwedî *tîmar* û xwedî *ze'ametan* mecbûr bûn ku di gel xwe bibin şer û cengan. Hejmara *cebelüyên* ku diviya her xwedî *tîmarekî* tadarik bikira, bi *xasa* wî ya ji *tîmarê* ve girêdayî bû. Di vê biwarê de, yek ji kevntirê qanûnnameyên Osmaniyan mercên gelekî temam datîne: Ji bo *tîmarên* xwedî hatineke di navbera 1 000 - 5 000 *aqçeyî* de, 1 *cebelü*; ji bo *îmarên* xwedî *xaseke* di navbera 5 550 - 8 000 *aqçeyî* de, 2 *cebelü*; ji bo *tîmarên* hîn mezintir, serê her 5 000 *aqçeyên xasa* ji *tîmarê*, 1 *cebelü* (*Kitab-ı qavanin-i "ürfiye-i "Osmani, hazırlayan N.Beldiceanu, Wiesbaden 1967, fol 9a*).

114 *Sedeq-el-lahû "ilmen*: Ango, bila Xwedê zanebûna te zêde bike.

115 Di berga yekemîn ya *Seyahatnameyê* de (*berg 1, r. 193*; di çapa *Parmaksızoğlu* de ku tê de hin tişt hatine serrast kirin, *r. 157*) Ewliya Çelebî lîsteyeke weha ji bo giştî eyaletên Împaratoriyê dide. Lîsteya Diyarbekrê ya di wê de, ji vê lîsteya me piçekî cihêtir e: Navên Nisêbîn û Miyafarqînê, herwekî lîsteya "Ayn-ı "Ali, di wê de jî hene. *Xasa* herdukan jî 200 000 *aqçe* ye. Herweha, di wê lîsteyê de, navên hin cîhan cihê ne.

116 Heye ku navê Hezo li vir di şûna navê Xarpêtê de bi şaşî hatibe nivîsîn. Di berga I-ê

de, di vî cîhê lîsteyê de, navê Xarpêtê di gel eynî tibaba *xasê* derbas dibe. "Ayn-ı "Ali jî ji bo Xarpêtê vê tibaba han ya *xasê* dinivîse û tibaba *xasa* Hezoyê 427 900 *aqçe* dide.

117 Hem berga l-ê û hem jî "Ayn-ı "Ali vê tibabê 203 243 *aqçe* didin.

118 Di berga l-ê de ev tibab 221 300 *aqçe*, di pirtûka "Ayn-ı "Ali de jî 294 000 *aqçe* ye.

119 Di berga l-ê de ev tibab 896 750 *aqçe*, di pirtûka "Ayn-ı "Ali de jî 96 750 *aqçe* ye (eşkere ye ku şaşiyeke çapê ye).

120 Herdu amadekarên çapê yên berga l-ê ev wek Şengal (Sincar) xwandine, ku divê çewt be. Li gor "Ayn-ı "Ali, *xasa* sancaqên Şengal û Xabûrê, 127 999 *aqçe* ye. Li milekî din, di lîsteke me piştre dîtî de navê *yurdluq*-a Mîhranî jî derbas dibe. Tiştê ku gelekî bal û dêna mirovî dikêşe, eynîbûna tibaba *xasê* ye, ku 194 517 *aqçe* ye. Heye ku navê bajarê ku Ewliya Çelebî li vir nenivîsî ye, Mîhranî be. Ji ber ku wî, dibe ku, nikarîbe navê di orîjînalê de heyî bixwîne.

121 Di lîsteya "Ayn-ı "Ali de, me navê Paliyê dît, ku xwedî eynî xasê bû, ango 100 000 aqçe. Heye ku eşîretên Pesyan û Pozan yên koçer, ji ber pezçêrandina xwe ya di riya çûn û vegera ji zozanan de, bûbin bacdarên Paliyê (di pirtûka Ewliya Çelebî, *berg III, r. 226, 232*-an de, tevî navên din, navê eşîreta Pesyan jî derbas dibe).

122 Gelo şaşiyek e? "Ayn-ı "Ali vê tibaba han ya *xasê* "atfî mîrektiya Cizîrê ya girîng dike, ku bêtir cîhê baweriyê ye, ne ku Xançûka nisbeten negirîng, ya nêzîkî Dara Hênêyê, ku bikaribe hinde bi xêr û bêr be.

123 Ev tibab di pirtûka "Ayn-ı "Ali de 140 000 *aqçe* ye. Parmaksızoğlu, di çapa xwe ya berga l-ê de, vê 403 951 dixwîne. Lê di çapa pêşîn de, ew tibab wek ya di vê lîsteyê de ye.

124 Ev tibab di pirtûka "Ayn-ı "Ali de 100 900 *aqçe* ye.

125 Her çilo be, ev lîsteya han ne temam e. Li cîhên din, Ewliya Çelebî bi xwe weha lê zêde dike:

Amîd (*xasa beglerbegi*) 1 200 660 (199r, rêza 29-an; eynî hejmar ji aliyê Rycaut (*têbîniya hej 72*) ve jî hatiye dayîn. Hejmara 120 660 ya di çapa Gökbilgin (*têbîniya hej 72*) ya pirtûka "Ayn-ı "Ali de divê çewt be).

Mêrdîn 200 660 (210v, rêza 17-18)

Li gor lîsteya "Ayn-ı "Ali, divê em van jî lê zêde bikin:

Xarpût	219 990 (di lîsteya Ewliya Çelebî de derbasî şûna Hezoyê bûye)
Nisêbîn	200 000
Miyafarqîn	200 000
Şengal û Xabûr	127 999
Hezo	427 900

40 saliya bîranîna Mîr Celadet Bedirxan

Konê REŞ

Mîr Celadet Bedirxan mîrê dûmahiya welatê Botan bû, neviyê Bedirxan Paşayê navdar. Mîr ew Bedirxanê ji bo yekîtiya Kurdistanê xebitî bû û ji bo serxwebûna wê ketibû şer û pekên giran de, ter û hişkê xwe di riya wê de winda kiribû.

Gava Bedirxan ji Cizîra Botan hatine celî kirin (surgun kirin), bavê Celadet, Emîn Alî Bedirxan, li Stembolê bi cî û war bûbû, Senîhe Xanim, ji xelkê Çerkezan, bi ser jina ya berê, diya Sureya, de anîbû.

Mîr Celadet, di roja 26 ê nîsana sala 1893 an de li Stembolê ji vê jina duwem bû. Zarokiya xwe di malekê têr û zengîn de borand. Ji ber ku bavê wî Emîn Ali mirovekî zane û halxweş bû, hem jî kurdperwer û xwendevanekî jêhatî bû, nemaze di qanûn û hozaniyê de.

Hingê karbidestên osmaniya rê nedan Bedirxanan ku vegerin Cezîra Botan, warê bav û kalan. Emîn Alî rabû, mitrib, çîrokbêj û dengbêj ji Cizîrê anîn mala xwe da ku zarokên wî di warekî kurdî (Botanî) de bên xwedî kirin.

Ji bilî vê yekê jî, mamostên zimanên yunanî, farisî, fransizî û rûsî yên xwemalî (xisusî), ji zarokên xwe re digirtin ku serwextî zimanê cihanê bibin.

Hingê bavê Celadet hakimê ceza bû li Stembolê hem jî di nav tevgera kurdî de cihekî girîng digirt û doza kurd û Kurdistanê ji Tirkan dikir. Mala wî bûbû weke dibistaneke kurdî ji civîna xelkê komelên kurdî yên wê demê.

Îca dewleta osmanî bi tirs û saw bû ji karên Bedirxan Paşa, geh ew nêzîkî xwe dikirin, û geh jî ew durî xwe dikirin. Celadet bi bavê xwe re her heyamekê li bajarekî ji bajarên dewleta osmanî ya fireh û dirêj di Rojhilata Navîn de dijiya,

weke Ekka, Nablis, Selanîk û Edirne, ta ku xwendina xwe ya pêşin û navîn temam kir, û bi giyanekî niştimanperwerî hate xwedî kirin, di wê meşxetiyê de.

Piştî ku salên wî bûne 18, ew dikeve *Mekteba Herbiyê* li Stembolê û dibe ser baz lê bê dilê dê û bavê xwe. Di destpêka Şerê Cîhanê yê yekem di ordiya osmanî da beşdarî şer dibe, li Enya Qefqasê ta bajarê Baku û Tebrîzê.

Piştî Şerê Cîhanê yekem ku Osmanî winda dikin, Celadet bi welatparêzên kurd re bû hîmdarek ji «Komela vêkxistina civakî» ya Kurdistanî, bi bavê xwe û welatparêzên kurd re. Hem jî dostanî bi Mustafa Kemal Paşa û hevalên wî re danî, da ku Kurd, Tirk û Ereb bi hev re şerê xelasiyê bikin.

Di sala 1919 a de Celadet û birayê wî Kamûran û Ekrem Cemil Paşa di gel *Major Noel* yê îngilîzî ji Stembolê ber bi Kurdistanê ve çûn, ji bo xatirê dîtin û daxwazên miletê kurd, bê ku çi dixwazin, berî ku Peymana Sevrê û mafê Kurdan inkarkirin. Li vê yekê tenê jî nesekinîn, belê fermana serokê Kurdan yên ku ji bo mafê miletê kurd dixebitîn û şer dikirin deranîn, bi kuştin û surgûniyê.

Hingê navê Celadet û bav û herdû birayên wî Sureya û Kamûran di nav navên fermanliya de bûn, ji bilî gelekê din ji Kurdên welatparêz. Ji neçarî Emîn Alî û her sê kurên xwe Tirkiye li şûn xwe hiştin, Emîn Alî û Sureya çûne Misrê, Celadet û Kamûran çûne Elmanya da ku xwendina bilind a hiqûqê bikin.

Bi çûna Mîr Celadet a Elmanya, rojên xweş û şahî ji jiyana wî bi dûr ketin. Hiş, bîr û baweriya wî ma bi ser welatê wî de. Li Elmanya di ber xwendina xwe re têkilya tevgerên canfîda bû, û hem jî kar dikir ji bo pariyê nan û berdewama xwendina xwe û birya xwe û di nav van rejîserek dida bav û birayê xwe li Misrê.

Di sala 1925 an de gava şoreşa Şêx Saîd ji bo maf û daxwazên gelê kurd dest pê kir, Celadet ji Elmanya xwe bi şoreşê ve gihand, lê ji gelek sebeban ew şoreş bi ser neket û serokên wê hatin bi darvekirin.

Gava Celadet lîsansa xwe di avokatiyê de kuta kir, ew vegeriya Misrê. Kamûran ma li Elmanya da ku doktora di avokatiyê kuta bike. Celadet pir li Misrê nema, xwe li Beyrûtê girt. Hingê mala apê wî Xelîl Ramî li wê bû.

Di sala 1927 an de, gelek hêz û komelên welatparêzên kurd bi hev re komela «Xoybûn» xwe ji şoreşeke mezin re amade dikirin. Bi awayê «Xoybûn» danîn, Şoreşa Agirî bi serokatiya Îhsan Nûrî Paşa li dar bû, ji sala 1927 an û pê de. Hingê Celadet bi endamên Xoybûnê re xe amade dikirin ji alîkariya şoreşa Agirî

re, ku ji sînorê Suriyê de êrişî Tirkan bikin. Lê ji kêm haziriyê karên xwe nebirin serî, hem jî navbera Firansiz û Tirkan xweş bû, rê ji ber wan hate birrîn. Fransa piraniya wan welatparêzan dan hev û avêtin Şamê ; hingê şoreşa Agirî ji hatibû perçiqandin.

Di roja 25.8.1930 î de Celadet bi Haco Axa û zarokên wî re bûn mêvanê Elî Axayê Zilfo li Şamê. Li Şamê, ji nû ve Mîr Celadet di rewşa miletê kurd de ponijî, bi mitale dît ku Kurd di warê şer û konevaniyê de nema karîn tiştekî bi serxînin, tiştê li ber xwe dît, ku elfabêya ji sala 1919 an de dest pê kiribû bibe serî, û kovarekî pê derxîne, da ku xwendin û nivîsandin bi zimanê kurdî, tîpên latînî, di nav Kurdan de belav bibe, ku Kurd karibin bi zimanê xwe bi xwînin û binivîsîn û berî her tiştî xwe bi xwe nas bikin ku karibin xwe ji biyaniyan re bidin nasîn.

Mîr Celadet dizanî ku piraniya Kurdan nexwenda û nezan in... û tiştekî li ser xwe nas nakin... hêj nizanîn ew kî ne... ji kîjan milet û nijadî nê, zimane wan çi ziman e. Lê dizanî ku serê miletê kurd bi tore û çanda Ereb, Ecem û Tirkan ve hatiye girêdan. Vêca «Hawar», kovara ziman û çanda kurdî li Şamê derxist û belav kir. Û di serê jimara pêşin de got :

«'Hawar' dengê zanînê ye, zanîn xwenasîn e, xwenasîn ji me re riya felat û xweşiyê vedike, her kesê xwe nas dike, dikare xwe bide nas kirin. Hawar' a me berî her tiştî, heyîna zimanê me dê bide nas kirin, lêma ku ziman şertê heyînê a pêşîn e.»

Hejmara yekî ji kovara «Hawar»ê di roja 15 ê gulana 1932 an de derxist û belav kir, bi tena xwe tevdîra wê dikir. Li pey wê kovara «Ronahî» di 1 ê nîsana sala 1943 an de çap kir û belav kir.

Gelek ji rewşenbîr û nivîskarên kurd di her dû kovarên wî de nivîsandine weke : Goran, Tewfiq Wehbî, Şakir Fetah, ji Iraqê, Mistefa A. Botî, Osman Sebrî, Qedrî Can, Cegerxwîn, Hişyar, Dr. Nûreddîn Zana, Dr. Kamûran Bedirxan û Emîre Rewşen Bedirxan û hin din...

Di sala 1935 an de Mîr Celadet Bedirxan ji nû zewicî bi keçama pismamê bavê xwe Rewşen Bedirxan re. Di sala 1938 an de, niha li Bexdad e jina muhendisekî kurd e ji xelkê Zaxo.

Cemşîd di sala 1939 an de xwedê ew da, niha doktor e, li Elmanya jiyana xwe didomîne, jina wî xanimeke elmanî ye, kur û keçeke wan hene, navê kurê wî Kurdo ye, navê keça wî Evîn e.

Diya wan Rewşen Bedirxan, li Sûriyê, li bajarê Banyasê ji sala 1972 an de, jiyana xwe didomîne bi tena xwe, lê pîrejinek pêre ye alîkariya wê dike ta roja îro.

Di navbera salên 1936-1939 an de, Mîr Celadet gelekî destteng bûye, vêca di ber xebata çanda kurdî re, di Dibistana Sinetan de li Şamê bûye mamostê zimanê fransizî, hem jî di demekê de, avokatiya Mifetişiya Rêçê kiriye.

Piştî Şerê Cîhanê yê duwemîn, destengiya wî roj bi roj xurtir dibû, tevî ku hevalên wî yên zengîn û halxweş pir bûn, lê wî alîkariya kesekî qebûl nedikir.

Di sala 1951 an de, Mîr Celadet razî bû ku bi hevalê xwe yê nêçîrê Hisên Îbiş re zeviyên wî bi nîvî biçîne. Li gundê Hecanê, nêzîkî Şamê, wî dest bi kolana bîrekî kir. Tevî ku av li wê heremê zû dihate der, lê ew bîra ku Mir Celadet navê Bîra Qederê, lê kirî bû ava xwe zû demedixist.

Di roja 15 ê tîrmeha sala 1951 î de, weke vê rojê. Ji berî 40 salî de, Mîr Celadet Bedirxan li ser keviya bîrê rûniştîbû, ji nişkave bîr di bin de heripî, bi bûyera bîra heripî, Mîr celadet çû ber dîlovaniya Xwedê. Di eynî gora Bedirxan Paşa de hate veşartin, li goristana Şêx Xalidê Neqşebendî, li Taxa Kurdan, di bajarê Şamê de.

Ji bilî ku xwediyê kovara *Hawar* û *Ronahî* bû, afirandinên ku bi dû xwe de hiştine ev in :

1-Alfabeya Kurdî, 2- Rêzimana Kurdî, 3- Ferhenga Kurdî-Fransizî, 4- Rêzimana elfabeya kurdî, 5- Rûpelên elfabeyê, 6- Dibaca Mewlûda Pêxember, 7- Dibaca nimêjên Êzdiyan, 8- Name ji Mustafa Kemal Paşa re, 9- Ji mesela Kurdistanê, 10- Edîme Sukotunu, 11- Xwebinas (destnivîs), 12-Kitêba Sînem-Xanê (destnivîs).

Navên ku pê nivîsandine ji bilî navê xwe ev in :

Herekol Azîzan, Xwediyê Hawarê, Hawar, Ronahî, Stranvan, Çîrokvan, Xeberguhêz, Bavê Cemşîd, Bavê Cemşîd û Sînemxanê, Ferhengvan, Nêrevan,...

Ji bilî zimane kurdî, bi van zimanên din dizanî : fransizî, farisî, rûsî, tirkî, yûnanî, erebî, îngilîzî, elmanî.

Dawiya dawiyê, navê zimanzan, rojnamevan, helbestvan û rewşenbîrê kurd Mîr Celadet Emîn Alî Bedirxan û nivîsarên ku ji me re hiştine qet nayên ji bîr kirin. Mêrxasî û camêriya wî wê di dilê gelê kurd de bimîne...

Şam, 1991

Welatê Xerîbiyê...

Mehmed UZUN

Yek ji wan sembolên ku ketine pey min û mîna siyekê li pey min tên, dapîra min e. Bi bejna xwe ya dirêj û bedew, bi xetên kûr ên rûyê xwe ku bi portreke tarîxî dişibû, bi kincên xwe ku şahîdiya tarîxeke jibîrbûyî dikirin, bi çavên xwe ku kahniya coş û germahiyeke xweş bûn û bi dengê xwe ku mîna hewreşîmê tenik û nerm bû, ew yek ji wan kesên kêmhejmar bû ku mohra xwe li jiyana min xistine. Pîrika min şeş law anîbûn dinê û diya min yekkeca wê bû. Ew hez û germahiya ku li welatê min di navbera dê û zarokan de heye, bi her awayî di navbera diya min û dapîra min de jî hebû; hez û şefqateke germ, hîs û daxwaza parastin û lêxwedîderketineke bêpayan û kahniyeke bêdawîn û kûr a mesûdî û xweşiyê... Mala dapîra min wan jî, li eynî bajarê, çend kolan ji me bi dûr bû. Lê ew, di her fersendî de, dikete rê û dihate mala me ya hewşfireh ku tê de darên xox û henaran hebûn. Bi gelek yadîgaran ku di bin çengan de bûn. Wê ew ji bo keça xwe û torinê xwe, yanê ji bo min, dianîn... Dapîra min dihate û bi rojan, bi heftan li ba me dima. Ew rojên ku dapîra min li cem me bû, mîna kulîlkên darên henaran, rengîn bûn: şîvên herî xweş çêdibûn, celeb bi celeb kincên xweş û rengîn li xwe dibûn, çûyina serîdana cîran û merivanan pirtir dibûn, mîvan dihatin vexwendin, nûbûnek, nûjeniyek li wan rojên ku her mêna hev bûn, zêde dibû. Di wan rojan de, rûyê diya min, bi rengên zelal û jîndar ên xoxekî kemilî dibiriqî.

Herçî ez bûm, min pirtirîn ji şevên kurt ên wan rojên jibîrnebûyî hez dikirin. Ew şew, şevên çîrok û destanên rengîn bûn. Oda min a biçûk û bi pencere (ku lampên biçûk ên gazê nikarîbûn ronî bikirina), di wan şevan de, bi çîrok û destanan, dikete nav ronahiyeke ecêb. Hingê min dil dikir ku ew şev qet xelas nebin û her berdewam bin. Loma min ji dapîra xwe re, tim, digot, «xewa min nayê, ez

naxwazim şev xelas bibe...» Lê belê, ez radizam, şev diqediya, rojeke nû dest pê dikir û ez bêsebir li hêviya şeva nû dimam. Mêjî û heşê min ê zaroktiyê, hê hingê, dest bi fahmkirinê kiribû ku li dervayî daxwazin min, ji min û daxwazên min jî bi quwettir, hin qayide hene... Gava dapîra min li cem me bû, her şev, berî ku ez razêm, ew dihat, li ber serê min rûdinişt û bi destên xwe yên dirêj ku damarên wan lê baş dixuyan, porê min mist dida. Min hema bîr bi rewşê dibir; çîrokeke nû, rengîn û bicoş li rê bû. Min bahlîfa xwe ya bineqiş dida alî, bi hêdîka serê xwe datanî ser coga wê û bêdeng dikeniyam. Piştî vê haziriya sivik û bêdeng, ew qise û gotinên efsanewî yên çîrokan ku ji kûrahiya tarîxê dihatin, li pey hev rêz dibûn. Dapîra min gotinên kurdiya kevn, zaravayê dimilî ku nêzî zimanê Zerdeşt e û êdî mensûbê cîhaneke bihurî ye, mîna lûlûyek rêz dikir û ez dibirim cîhaneke ronî û rengîn. Li wê derê, ji gotinên rengîn û efsanewî lehî û çemekî xurt mîna Firatê, mîna Dîjlê dihate pê. Min, bi hêdîka, xwe berdida nav ava hûnik, rehet, ferreh a çemê efsanan. Bi hêlekaniya pêlên nerm û tenik, ez bi rehetî diketim nava bihurên xewê...

Walter Benjamin di nivîsareke xwe de weha digot; *«Kî îro rastî hinan tê ku dikarin bi xweşî û rehetî çîrokan bibêjin? Ma ji devê wan kesên ku dimirin, îro, qise û gotinên saxlem ku mîna gustîrekê ji nifşan vediguheze nifşên nû, derdikevin? Ma gotineke pêşiyan, îro, alîkarî li kê dikc?..»* Ev gotinên rast li mala me ya ku nikarîbû, bi her awayî, xwe bigîhanda lez û beza guherînên wext û civatê, nedihatin. Li wê derê, kesekê hebû ku bi gotinên xwe ruh û dilê min ê zaro bi quwet dihejand û bi xweşî û rihetî çîrok digotin...

Ew şevên rengîn wê çaxê yên kurt û rengîn, niha bûne nemir. Ew bûne xatirayekê, bûne siyeke xweşik ku her gav li pey min e. Bêguman, piraniya gotinên wan şevan ku hingê mîna lûlûyekê dibiriqîn, nikarîbûn xwe li hember pêlên xedar ên wextê rabigirin; ew winda bûn û çûn. Lê belê, ew şev mîna xatirayekê, hin gotinên wan şevan jî mîna perçeyekî qedera min, her, li ba min man. Ew bûn pardarê jiyana min. Yek ji wan gotinên nejibîrbûyî jî welatê xerîbiyê bû. Ji devê dapîra min a ku di gotina çîrok, destan û efsanan de, bi xwe jî dibû melayikekê ji wan çîrok, destan û efsanan, car bi car, ev herdu gotinên ji bo min ecêb derdiketin; welatê xerîbiyê...

Gotinên dapîra min, bi rastî jî, ecêb û bi sihêr bûn; wan behsa welat û diyarên nedîtî, nejiyayî dikirin. Çiyayên Qefqesê, çolên Yemenê, giravên Yewnanê, welatên Mixribê... Ev hemû welatê xerîbiyê bûn. War û diyarên ku Kurd çûbûnê û êdî jê venegeriyabûn. Welatên ku meraqeke bêdawîn û dûrahiyeke ne îşê aqilan

îfade dikirin û dianîn bîra merivan. Navên ku êdî bûbûn perçeyekî ji edebiyata devkî ya dewlemend a Kurdan...

Bêguman, hingê min nizanîbû ku ew nav, war, diyar û welatên dûr ku bi gotinên kevnare û tarîxî yên dapîra min dibûn efsaneyek, rastiya tahl a me Kurdan bû. Bi ya min, ew war û diyar, welatê efsanewî yê şerên mahşerî, cîhê qehreman, şerbaz, hût û dêwên çîrokan bû. Ma min ji kû dizanîbû ku ew gotinên germ û spehî yên dapîra min, di esasê xwe de, behsa janek, trajediyek û hesreteke bêeman dikin?.. Ji bo min wext diviya da ku min bikaribûya vê jan, trajedî û hesretê bizanibûya, nas û fahm bikira. Min diviya ku ez ji cîhana zelal a zaroktiya xwe bi dûr ketima, min tecrube û rastiyên xwe yên civakî û çandî zêde bikirana, min xwe bi bîr û zanîna huwiyet û şexsiyeta xwe ya neteweyî bigîhanda û ez hînî tarîxa xwe ya jibîrbûyî bûma. Min wext diviya... ders û tecrubên wextê diviya.

Paşê, di wan salan de ku min xortî û ciwaniya xwe li girtîgehan bihurand, ez hîn bûm ku çiyayên Qafqasê, çolên Yemenê, giravên Yewnanê û welatên Mexribê warê surgûniya Kurdan e. Kurd, şexs, malbat û pir caran jî mîna şênî û girse, sirgûnî wan deveran bûbûn. Ew, bi darê zorê, ji mal, war û welatê xwe hatibûn veqetandin û şandin. Dijminên Kurdan, bi zorê, rûyê Kurdan bi aliyên nenas û dûr zivirandibûn. Osmanî û piştî Osmaniyan, rejîma nû ya Komara Turkiyê (ji 1923-an û vir ve) Kurd, bêwest û rawest, 200 sal, şandin sirgûnê... da ku tekoşîna wan a serbestî û azadiyê bişikînin, wan her kole û dîl bihêlin û nehêlin ku Kurd yek bin û welatê xwe ji perçekiriyê rizgar bikin. Belê, ev 200 sal in ku koça Kurdan berdewam e... Pêl bi pêl. Her gav û daîmî. Bi ji hev veqetîna mal, malbat, eşîr, war û gundan. Bi erdê ve yekkirin û kavil û wêrankirina gund, bajar û waran. Sal donzdeh meh. Di zivistan û berfê de. Di havîn û germê de. Bêwest û bêrawest...

Bi dû re, di şevên bêdawîn ên girtîgehan de, ez hîn bûm ku riyên ku diçûn welatê xerîbiyê bi meyt û cendekên Kurdan tijî bûbûn. Kurdan miriyên xwe di gelî, bihur û şikeftan de, bi lez û bez û bêyî qedr û qîmetê, veşartibûn. Ji hêstirên dê û zarokên Kurdan lehî hatibûn pê. Dengê qîrîn û Hawara maciran xwe gîhandibû dengê teyrên elo... Di wan şevên girtî de, ji devê *dengbêjên* dengxweş û girtî, min li jan, trajedî, hesret û belengaziyên merivên ku ji welêt hatibûn veqetandin, guhdarî kirin. Min li serpêhatiyên ruh û dilên nemesûd û keserkûr guhdarî kirin. Mîna stranên xweş, baladên bedew...

Hingê ez hîn bûm û min fahm kir ka welatê xerîbiyê tê çi maneyî; sirgûn, ji rehê xwe û axa bav û kalan veqetîn, mehkumiyeta jiyaneke xerîb û nenas,

hesreteke bêdawîn û nostaljî... Aha, kedereke weha li pey gotinên ku dapîra min bi çavên xwe yên diçirûsî û dengê xwe yê nerm mîna qedîfê, bi hêdîka, digotin, veşartîbû. Di nav van du gotinan de, yanê di gotinên *«welatê xerîbiyê»* de, hemû trajedî û drama însanî ya Kurdan hebû.

Di havîna 1977-an de, xaçeriyên ku diçûn welatê xerîbiyê, mîna rastiyeke tahl, kete jiyana min jî. Min jî da pey karwana sirgûniyê ku ji 200 salan û vir ve li rê bû. Dor ya min bû... Ez mecbûr mam ku welatê xwe biterikînim. Di şeveke germ a havînê de, piştî ku heyva ronî çû ava û winda bû, min gava xwe, di tariya şevê de, ber bi welatê xerîb ê tarî avêt. Di serê min de bi sedan xewn û xeyal û bêyî ku min zanîbû ka pêşerojê dê çi nîşanî min bide. Bi gotina Rilke, êdî perde vebûbû: piyesa veqetînê bû ku dest pê kiribû...

Hema çi bigire hemû havîna 1977-an, ez li payitextê Suriyê Şamê, navenda medeniyetine Rojhelata Navîn û ereban, mam. Şam bi navendbûna xwe ya çand û medeniyetên cihê û kahnîbûna van çand û medeniyetan navdar e. Digel vê hindê, ew, ji bo me Kurdan, her gav, bi merkezbûna xwe ya warê sirgûnî û sirgûnbûyinê jî navdar e. Şam her tim bi rola navendiya sirgûniya Kurdan rabûye. Ew bûye navenda macirî û sirgûniya Kurdan. Hemû tarîxa welatê xerîbiyê li Şamê veşartî ye. Gora Seleheddînê Eyyubî, kurd û serokê îslamî, hem dost û hem jî dijminê Rîchardê Dilşêr û qumandarê ku li dijî ordiyên xaçperestan şer kir, li Şamê veşartiye. Hejmareke pir ji mîr, ronakbîr, nivîskar û serokên siyasî yên Kurdan li wê derê bi gor bûne. Stranên tenêtî û jibîrbûyinê, destanên keder û windabûyinê li wir, di nav kolanên xirbe yên dervayê Şamê de veşartî ne... Ev gotinên nivîskarê polonî Wštold Gombrowicz ku bi xwe jî birekî dirêj ji umrê xwe li welatê xerîbiyê û ji welatê xwe dûr bihurand, bi temamî li Kurdên sirgûnkirî û navenda sirgûniya wan Şamê tê; *sirgûn û sirgûnî goristanek e...*

Gava meriv dikeve Şamê, li kêleka Şamê, li ser gir û çiyayan, taxeke mezin heye. Kurdan ew tax ava kiriye. Navê taxê «Taxa Kurdan» e. Taxeke ku bi lez û bez lê bûye, xaniyên taxê, mîna konan, li ser hev vegirtî ne, tê de tu huner û estetîk nîn e û baş dixuye ku ew cîh, warê maciran e. Macirên ku ji riyeke dûr tên û li ser riyeke dûr in... Goristana vê taxê ku mîna pîneyekê bi çiyê ve zeliqiye, bi temamî, li gora gotina Gombrowizc e; ew goristana sirgûn, sirgûnî û kesên sirgûnkirî ye. Mîrê dawîn ê Kurdan Bedirxan Beg ku sala 1844-an, piştî serhildanekê, ji aliyê Osmaniyan sirgûnî Stembolê, ji wir sirgûnî girava Girîtê û ji wir jî sirgûnî Şamê bû, li wê goristanê, di nav gora xwe ya mezin û spehî de radizê. Neviyê Bedirxan

Beg, nivîskar û zimanzan Celadet Alî Bedirxan ku hemû jiyana xwe li sirgûnê derbaz kir û ji bo Kurdan kovarên çandî yên pir giranbiha ava û îdare kirin, li bin lingên bapîrê xwe radizê. Şaîr Qedrî Can ku ji bo bajarê xwe yê bav û kalan, zaroktiya xwe û zimanê xwe yê ku her jê bi dûr diket, şihêrên hêja nivisîne, li wir, di nav gora xwe ya mutewazî de radizê. Qehremanê romana min a siyemîn, pozitivîst, evîndarê ronahiyê, xwediyê prensîbên mîna pole yên ehleqî, romantîkê yekta, weşangêr û bîrewer Memduh Selîm ku sala 1923-an ji welêt derket û heta mirina xwe, 1976, li sirgûnê ma, mîna her carî, bêdeng, li wir radizê... Ma kî û kî ne li wê goristana xopan veşartî ye!..

Hemû ew havîna ku ez li Şamê bûm, di berbangên sibê de, gava kes hê nedixuyan, mîna xeyaletekî nexuyayî, ez hildikişiyam ser wan giran, diçûm wê goristana ku keder û bêdengiyê perda xwe lê rakişandibû û min bêdeng li kevirên goran dinihêrîn. Bi daxwaza ku ew kevir bihatina zimên û bipeyivana, min ji xwe re, bi hêdîka, ev rêzên Aragon dubare dikirin;

û şevên tebaxê hêldikin jêr
stêrikan, nizanim çawan
ûsil bi ûsil stêrk hêldibin
mîna çavên ku jihevketî ne...

Hema li kêleka wê goristanê, mizgefteke ku bi navê sirgûniyekî navdar î kurd ava bûye, heye; *mizgefta Mewlana Xalid.* Qedera zanayê îslamê, damezrevanê terîqeta Neqşîbendiyê li welêt û şaîr Mewlana Xalid jî, ji ya Mîr Bedirxan ne cuda ye. Herwekî cîhê ku gorên wan lê ye, herdu jî bûn pardarên jiyaneke keserkûr, mirineke xerîb û nchêja û hesreteke bêeman. Mewlana Xalid ku ji welatê xwe Kurdistanê û bajarê xwe yê bedew Silêmaniyê hatibû bi dûr xistin, bi dirêjiya salan, bi alîkariya rêzên xwe, welat û bajarê xwe, car bi car, vejand. U wî rêzên xwe bi wasita hîv, ro, ba û stêrikan ragîhand welatê xwe. Di vê dinya kambax û mirinê de, di vê dinya neheqiyan de ku *«meriv»»*, tê de, bi gotina sirgûniyê navdar Ovidius, *«gurên hev in»*, heval û dostên Mewlana Xalid ji merivan bêtir ro, heyv, ba û stêrk bûn. Ma mimkun e ku meriv keder û hesreta ku di nav van rêzan de ye, fahm neke, hîs neke?

Xwînî dilem, nesîmî saba gamgusar şû
Ber deştî Şehrezor men rehguzar şû
Gam ber dilem nuşest çû Gudrûn zi daxî hicr
Ey çeşmesarî çeşm, tu her Serçinar şû

Şehrezor, Çiyayê Gudrûnê, Serçinar, welatê ku Mewlana Xalid tê de zaroktî û xortaniya xwe bihurandibû, êdî di nav rêzan de xatirayeke xweş, hesreteke bêdawîn û semboleke bêdewr û bêwar in. Mewlana Xalid ku bi darê zorê ji welatê xwe veqetîbû û mecbûrî jiyaneke xerîb bûbû û vegera wî ne mimkun bû, li welatê xerîbiyê, ji bo jiyan û domandina jiyana xwe, tiştekî kir; wî bêrawest bîhn, tam, reng, hewa û jiyana welatê xwe di dil û mêjiyê xwe de her jîndar pê girt, serpêhatî û bîranînên zaroktiya xwe kirin nemir û pir bala xwe da ser têkûzkirina hêz û quweta afirîna edebî, entelektuelî û fikrî. Kesera xopan a sirgûniyê û jana bêeman a hesretê, Mewlana Xalid kir şaîr û şexsiyetekî kurd ê nemir. Mîna herkesî û her tiştî, wî jî heq û bihayê nemiriya xwe, bi zêdehî, da; wî jiyana xwe bi keder û hesreteke kûr rapêça û ew qulipand û kir warê fikir, xewn û xeyalên rengîn. Bihayê nemiriyê, di nav fikir û hîsên mirin û tenêtiyê de, her û her nivisîn, afirîn û fikirîn bû...

Ma bi tenê vî şaîrê nemir ê sedsala 19-an, ew heq û buhayê nemiriyê ku ez qal dikimê, daye?

Niha, gava ez van rêzên basîd û qels û ji salixdana hesret û sirgûniya Mewlana Xalid pir bi dûr dinivîsim, hişê min dere ser şaîrekî din ê sirgûnê; Ovidius. Gotina rastir, Ovidius, şaîrê nemir ê lmparatoriya Romayê, ronakbîrê serbilind ê bajarê bedew Romayê, bi mezinahiya xwe, oda min a biçûk a xebatê tijî dike... Berî niha bi çendekê, min romaneke xweş, *«Cîhana Dawîn»»* a nivîskarê awusturyayî Christoph Ransmayr xwend. C. Ransmary li ser şopa edet û ûsilê edebî yê Awrûpa Navîn e û bi edet û ûsilê bedew ê nivîskariya Broch û Musil girêdayî ye. Romana ku meriv dikare mîna «aliyê din ê cîhanê» jî bi nav bike, Ovidius, hosteyê eşq û hunerê, vî nivîskarê ziravbihîstiyar salix dide, hesret û kesera wî û hêz û quweta ku ji wê hesret û kesera kambax derdikeve taswîr dike. Hemû roman mîna destaneke bêdeng e ku li ser trajediya bixwîn a însaniyetê, sirgûniyê, hatiye gotin. Gava Ovidius ji aliyê hukimdarê Romayê Agust sirgûnî qiraxên Derya Reş, «wî aliyê din ê cîhanê» bû, ew di esasê xwe de, mehkûmî tenahiyeke kûr û mirineke dûr û giran bû. Bi vî awayî, hakimê mutlaq ê hukimdariya Romayê Agust xwest dengê şaîrê ku her henekên xwe bi hukim û hukimdariyên mutlaq dikir û bi hêza xwe ya edebî û afirînê li hember hukmên mutlaq radiwestî, bibire û wî bide jibîrkirin. Gelo hukimdar Agust bi ser ket?

Îro, bi temamî piştî 2000 salan, bersîva vê pirsa ku hê wê çaxê hatibû pirsîn, na ye. Bi misogerî na. Dengê Ovidius, hosteyê Mewlana Xalid û şaîr û nivîskarên

din ên sirgûnê, nehate birîn û navê wî, hunera wî, kitêbên wî nehatin jibîrkirin. Ji bervajiyê, sirgûnî, tenahî, keder û hesretê ew kir şaîrekî nemir. Herwekî ku wî bi xwe di nameyek ji namên xwe yên kêmhejmar de nivîsiye, ew li diyarê xurbetê çû rehmetê û serê xwe danî ser axa gorê. *«Ez hatim vê derê... û ez ê li vir bimirim... jixwe, ji bo gelek kesan, gava stêrika min çû ava, ez mirim...»* Lê belê, deng û hêza wî ya afirînê tevî pêlên har ên Derya Reş bû, pêl bi pêl fireh bû û xwe ragîhand roja me. Di welatê xerîbiyê de, wî, bi keder û hesreta xwe, cîhaneke ji xewnan hûnand û eserên nemir afirandin. Ew di nav tenahiyeke kûr, lê ji aliyê afirînê geş de, bi bîranînên xwe yên rengîn, metaforên xwe yên edebî, xewn û daxwazên xwe yên ebedî, di nav rastiyeke ecêb de ku ji rastiya civata wê rojê û wan deveran pir cihê bû, heta mirinê, jiya. U wî berhema xwe ya navdar *«Metamorphoses»»* bi van rêzan xelas kir; *«Min berhemek ku bikaribe li hember agir, hesin, xezeba Xwedê û tofana wextê raweste, afirand... Bi alîkariya wê berhemê, ez ê li ser stêrikan hêlbim û her bijîm... û heta ku împaratoriya Romayê hebe, ez ê li ser zimanê xelkê bim...»*

Sirgûnî veqetîneke bêeman e, keder û kulek e. Ew cezayeke giran û neînsanî ye; wext û demeke dirêj, dewr û dewraneke kevn, ya rastirîn, jiyaneke nas û jiyayî li pey xwe hiştine. *Bêyî daxwazî, bi mecbûrî...* Hem Ovidius hem jî Mewlana Xalid, her gav, bi siyên bîranîn û xatiran jiyan. Wan û kesên mîna wan, ne dewr û dewranên xwe, lê dewr û dewranên ku êdî li pey mabûn, jiyan. Herwekî semavê esera abadîn a Marcel Proust, ew jî ketin pey *wexteke windabûyî.* Bûyerên ne wexta wan, lê bûyer, mesele û jiyana bihurî bala wan kişand. Ez bawer dikim, ji ber vê yekê ye ku Ovidius bajarê Romayê, Dante Floransayê, Mewlana Xalid Şarezorê, James Joyce Dublînê û nivîskarên din ên sirgûnê bajar û warên ku ew lê bûne, tê de mezin bûne, li welatê xerîbiyê, ji welat û bajarên bav û kalan pir bi dûr, bi xurtiya jiyane û bi kûrahiyeke edebî, ji nû ve, vejandine. Wan rabirdûyeke windabûyî, ji nû ve, vejandine, afirandine û bi vî awayî, ew bûne navên nemir ên pêşerojê.

Ev haletê ruhiye, ez bawer im, qedereke muşterek e; pêşeroj û bala merivekî ku ji axa xwe, reng û tamên welatê xwe, gotin û henekên merivên xwe yên ezîz û daxwaz û mirazên xwe yên pîroz, *bi zorê,* hatiye veqetandin, her, ber bi paş e. Ruh û dil stranên dewrana rabirdû û wextên bihurî dibêjin. Çav li rûyên merivên ku êdî li pey mane, digerin. Şevên ku bi perda giran a hîsên tenahiyê hatine rapêçandin, bi xeyalên jiyana bihurî tijî dibin. Edî her tişt bi van gotinan îfade dibin; *xeyaleke wexta bihurî, bi cîhanêkê ye...*

Berî niha bi çendekê, gava min projeyeke edebî, bi navê *«edebiyat li ser*

tixûban/Edebiyata Navneteweyî», li Navenda Çandî ya Stockholmê, îdare dikir, hingê min ev pirsa hanê li beşdarên şev û civînan (bi qasî 40 nivîskar û ronakbîrên ku ji welat, çand û zimanên cihê hatibûn) kir; di pênc salên pêşîn ên jiyana we ya nû de, we li welatê xwe yê nû, qet xewnek li ser jiyan û welatê xwe yê nû dîtiye?.. Na, tu kesî xewneke weha di salên xwe yên destpêkê de nedîtibû. Xewnên wan, bi her awayî, li ser jiyana wan a bihurî û welatê wan ê lipeymayî bûn.

Tecrubên min ên şexsî jî li gora bersîvên wan nivîskaran bûn... Bi dû çend mehan re, min dest ji Sûriyê berda û ez hatim Ewrûpayê, qitaya ku bûye merkeza sirgûnî ya sedsala me. Li Swêdê, li oda polîs a balafirgeha Stokholmê, gava ez li benda karên serîlêdana penaberiyê bûm, dil û hişê min, mîna du kewên spî, bi fîrê ketin. Ew ber bi welatê min, merivên min ên ezîz ku min li pey xwe hiştibûn, ber bi gora kalikê min ku min hew dikarîbû ziyaret bikira û ber bi Apê Xelîl, kalemêrê ku min li girtîgehan nasîbû û şahidekî jîndar ê tarîxa nûjen a Kurdan bû, firiyan... Li welatê xwe yê nû, ez bi pihêtî û hişkî li bîranînên rengîn, bûyerên dilsoj û rûyên ku tesîr li min kiribûn, -yên jiyana min a ku min li pey xwe hîştibû-, xwedî derketim. Min ew, mîna roniya çavên xwe, parastin. Min jiyana xwe ya nû bi alîkariya siyên xatiran domand û her xwest ku ez wan siyan vejînim, ruh û can bidim wan. Û di pênc salên pêşîn de, li ser jiyana min a nû û welatê min ê nû, min tu xewn nedîtin. Ne bi rindî, ne bi xirabî. Xewnên ku min dîtin, li milekî, bîranînên zaroktiya min, xwediya çîrokên xweş, dapîra min û kalikê min ê ku her şekirên xweş û şêrîn didane min, dianîn bîra min. Li milê din jî, wan xewnan zor, polîs, girtîgeh, mirin, kuştin, şewat, mar û dûpişkên nas ên jiyana min a li welêt radigîhandin şevên min ên welatê xerîbiyê... Bi dû re, gava min romana xwe ya siyemîn *«Siya Evînê»* nivîsî, min hemû ew xewnên şêrîn û neşêrîn ragîhandin şevên sirgûnî yên qehremanê romanê Memduh Selîm Begê ku 53 salên jiyana xwe li welatê xerîbiyê bihurandibû û li welatê xerîbiyê çûbû rehmetê. Ez bawer im, wî jî, ji welatê xwe bi dûr, di şevên bêhejmar yên welatê wî yê xerîbiyê de, sal bi sal, xewnên weha xweş û nexweş dîtibûn...

Herwekî ku Joseph Brodsky, şaîrê rûs ku li Newyorkê, li sirgûnê dijî, dibêje, nivîskar yan jî ronakbîrê ku li sirgûnê dijî, ji herkesî bêtir, bi rabirdûyê ve girêdayî ye û li rabirdûyê nihêrîn, ji herkesî bêtir, roleke pir mezin di jiyana wî de dilîze. Gava min dil kir ku ez jiyana windabûyî û jibîrbûyî ya Memduh Selîm ji nû ve vejînim, bi tecrubên xwe yên şexsî, ez bi vî awayî fikirîm... Ma meriv dikare ji şevên dilekî şikestî û ji welatê xwe bi dûrbûyî, ji bilî kontrasteke ecêb ku bi rengên zelal ên cenetê û agirên sor ên cehenemê tijî ye, çi bipê?

Bi ya min, yek ji felaketên herî mezin ku dikare bi serê merivekî de were, ev tişt e; bi darê zorê ji welat û axa bav û kalan veqetandin. Nivîskarê swêdî Olof Lagercrantz ku lêgerîneke bêhempa li ser Dante nivîsiye, li derekî esera xwe *«Ji Cehenemê ta Cennetê»»* weha dibêje; *«Yek ji wan tiştên ku herî zêde Dante diêşand ev bû: Ew li sirgûnê, ji welatê xwe bi dûr dijiya, lê li welatê wî, tiştên ku wî afirandibûn, dihatin xirabkirin, bi awayekî xirab dihatin nîşan dan û gotin, li dijî wî her gav tiştên nexweş dihatin gotin û kirin... û tu kes nîn bû ku bikaribûya li dijî wan neheqî û nexweşiyan rawesta û ew biparasta.»*

Ez bawer dikim ku ev pejn û hîs e ku nahêle rabirdû bibe rabirdû, wext biherike û merivê sirgûnê bikaribe roja nû bijî. Ev hîs e ku ronakbîrê sirgûnê dike mahkûmê rabirdûyê. Ferq di navbera Scott Fitzgerald, Ernest Hemingway û Herman Broch, William Saroyan, Nazim Hikmet, Faiz Ahmed Faiz de, li vir e. Fitzgerald, Hemingway, nivîskarên mezin ên *La génération perdue*, bi xwe, welatê xerîbiyê, sirgûnî *helbijartin*. Lê yên din *mecbûr* man. Ji bo *La génération perdue*, sirgûnî macerayekî, kaniya îlham û afirandinê, merkeza jiyaneke bicoş û heyecan bû. Gava wan dixwestin, bêyî ku tiştekî xirab bê serê wan, ew vedigeriyan welatê xwe. Sirgûnî, ji bo wan, ne sebebê jibîrbûyin, qedexebûyin û windabûyinê bû, ji bervajiyê, hincetê bibîrhatin û navdarbûyinê bû. Sirgûnî, ji bo wan, kêf, henek û şênahiyek bû. Lê belê, ji bo hosteyê mezin ê zimanê almanî Broch ku ji ber zordariya naziyan reviyabû, nivîskarê ermen Saroyan ku bapîrên wî ji qetlîma Osmaniyan reviyabûn û wî bi xwe jî bi îngilizî dinivîsî, şaîrê mezin ê zimanê tirkî Hikmet ku ji ber bîr û baweriyên xwe, salên dirêj li zîndanan mabû û mecbûr mabû ku welatê xwe terk bike û şaîrê mezintirîn ê zimanê ûrdû Faiz ku ji ber terora dîktatorekî nezan Ziya Ulhak reviyabû, ji bo van şaîr û nivîskaran, sirgûn û sirgûnî, riya xelasî û ji mirinê rizgarbûyinê bû. Cezayekî jiyîn û jiyanê bû ku wan diviya bikişanda. Rêwîtiyeke bêveger û çûyineke bêdawîn bû. Cezayê însanbûyinê û jiyaneke însanî xwestinê bû. Ji ber vê yekê, ew sivikahî, şênahî, rehetî û ferrehiya yekta û bedew ku em di berhemên Fitzgerald û Hemingway'de dibînin, em nikarin di eserên Broch, Saroyan, Hikmet û Faiz de bibînin. Dewsa wê ferrehî û şênahiyê, tiştên ku em di berhemên Broch, Saroyan, Hikmet û Faiz de dibînin, ev in; tarîxeke keserkûr ku bi hostehî li dora qederên şexsî hatiye hûnandin, kedereke bêdeng, hesreteke bêeman ku peyv û gotin têrî taswîrê nakin, destaneke zîz ji bo qurbanên zor û zordariyê û hîsên şerm û poşmaniya ji merivên xwe, axa xwe, miriyên xwe veqetandinê...

Nivîskarê kurd Erebê Şemo, ku bi trilogiya xwe ya pir sade û naiv navdar e, yek ji wan nivîskaran e ku ez her tim û bi kêfxweşî dixwînim. Romanên vî nivîskarê bextreş ku di dema şerê cîhanê yê yekem de, tevî malbata xwe, ji kuştina osmaniyan reviya û çû li welatê Qafqasê bi cîh bû, lê ji wê derê jî, di dema Stalin de, sirgûnî Sibîryayê bû, her û her, bi awayekî pir şexsî û însanî, li dora van hîsên hanê tên raxistin; hîs û şerma ku ew mehkûmî jiyaneke nehêja bûye, hîs û kesera ku ew nikare xwe bigihîne merivên xwe û li hember wan xwe deyndar dibîne, hîs û daxwaza ku ew bikaribe tiştên ku wî di jiyana xwe ya nû û kevn de *winda* û *qezenc* kirine, bi welat û merivên xwe, bi dinê rabigihîne û nîşan bide ku ew heye, bikêr e, ew nemiriye, neketiye. (Jixwe bi xêr û alîkariya van hîsan, wî di kampên mirinê yên Stalîn de planên romanên xwe, di hişê xwe de, çêkirin.)

Ew di romanên xwe de, car bi car, behsa tiştên ku wî winda kirine û qezenc kirine, dike. *Tiştên windakirî û qezenckirî*... Ez bawer im, jiyana sirgûniyê ji van du peyvên zelal û basîd tê pê. Ez jî, her mîna Erebê Şemo, di welatê xwe yê nû de, berî her tiştî, ketim nav «tunela windabûnê». Jiyana min a nû bi windabûyinê dest pê kir. Berî her tiştî, min zimanê xwe yê bav û kalan, hebûna xwe ya herî muqedes, bi gotina Albert Camus, welatê xwe yê zikmakî winda kir. Bi carekê, zimanê min bû hebûneke bêmane, nepêwist û ew bû barekî giran. Wî hew dikarîbû hêz û quwet, bawerî û rehetî bida min û daxwazên dilê min, gotinên mêjiyê min îfade bikira. Min hew dikarîbû gotina xwe bigota û xwe îfade bikira. Tevî zimanê xwe, min huwiyet û şexsiyeta xwe winda kir. Ez ji «ez»bûnê derketim û bûm «penaberekî, macîrekî» nenas û bêwelat ku hewcedarê alîkariyê bû û kesî nizanîbû ka ew kî ye. Digel ku min nedixwest, ez bûm endamê «kategoriya xerîban» û mensûbê civata xerîban ku ne li navenda civatê, lê li kêlekê, li perîferiyê dijiyan. Jiyana min, tecrubên min, fikrên min, bi carekê bûn bêmane û wan qîmet û hêjahiya xwe winda kirin. Ew daxwaz û îdealên min ku ez ji bo wan li girtîgehan mabûm û min her tişt dikirin, bûn banal û wan hew tiştekî hêja û bimane îfade dikirin. Gava min dil kir ku ez sebebên girtina xwe bibêjim, ez pir li ber xwe ketim. Gava min dil kir ku ez sebebên hatina xwe bibêjim, min pir şerm kir. Min ew normên xwe yên jiyan û tevgerê ku ji bo min pir zelal û vekirî bûn, winda kirin. Min, bi heyret, dît ku piraniya wan norman li welatê min ê nû derbaz nabin. Min kar û meslegê xwe winda kir. Min mafê hemwelatiyê ku ji bo hemû merivan mafekî muqedes e, winda kir. Min mafê bi serbestî vegerê û li welatê xwe kitêbên xwe weşandinê winda kir. Min hez, şefqet û xweşî, nêrînên germ û maqûl ên doralî, meriv û dostên xwe winda kirin. Min ew qise, gotin û peyvên germ ên doraliya xwe ku hêz û quwet didane min, winda kirin.

Min ew darên biçûk ên xox û hinaran ku li hewşa mala ku biçûkahî û zaroktiya min tê de derbaz bûbû, winda kirin. Min tam û rengên wan xox û henaran û dengê hecreşikên ku her bihar dihatine wê malê, winda kirin.

«Herwekî ku hûn dizanin»», Gombrowizc digot, di destpêka 1960-an de, di nameyeke xwe de ku ji bo nivîskar û weşangêrê fransizî Maurice Nadeau, dost û alîgirê nivîskarên hêja yên sirgûnê, hatibû nivîsîn, *«jiyana min a edebî zehmet e. Ji welatê xwe koçkir, tenê, ji alîkariyê dûr, ez divê di nav têkoşîneke sert de bim...»* Ez jî, bi hemû hebûna xwe, ji welatê xwe koçkirî û tenê, ketim nav tunela jibîrbûyin û windabûyinê ku tê de têkoşîneke sert, lê ji têkoşîna welêt pir cuda, hebû...

Da ku ez jê, bi awayekî giştî, guherî û nûbûyî derkevim...

Eger ez tiştên ku min qezenc kirine jî, bi eynî zelalî û basîdiya romanên Erebê Şemo, rêz bikim, berî her tiştî, ez divê bibêjim ku min zimanekî qezenc kir. Zimanekî ku ji zimanê min pir cihê bû û ew êş, keder, jan, qedexe, dijîtî û birînên ku bûne barên zimanê min, tê de nîn bûn û ew nedianîn bîra min. Zimanekî ku min dikarîbû xwe pê, bi awa û şêweyên din jî, îfade bikira û îmkan û fersendên nû yên nivîsîn û xweîfadekirinê didane min. Bi alîkarî û wasita vî zimanî, min welatekî nû, çand û edebiyateke nû qezenc kir. Min meriv, edet, ûsil, norm, tecrube, ziman û çandên nû nasîn. Bi alîkariya welatê min ê nû, min hemû Skandinawya qezenc kir. Min nêzîkahî li cîhanê, meriv, çand û edetên cîhanê kir. Bi vî awayî, îmkan û fersendên min, ji gelekan zêdetir çêbûn ku ez bikaribim *helbijêrim*. Min dît ku ez *ne* navenda cîhanê me, mesele û problemên min û yên însanên min *ne* merkez in û li dervayî min jî cîhaneke pir mezin heye. Bi tecrubên xwe, ez hîn bûm ku merivên li dervayî min jî, kêmanî bi qasî min, hêja û balkêş in. Min, bi heyret, dît ku tiştên ku ez dijîm û hîs dikim, kêm-zêde, mîna yên Erebekî, Letonîkî, Çekekî, Urûguayîkî, Polonîkî, Çînîkî û Kongoyîkî ne. Ez hîn bûm ku ferq di navbera dîktatoran de, digel rengên wan ên cuda, zêde nîn e û meriv divê her tiştî bi qîmet û hêjahiyên însanî bipîve. Min nefsbiçûkî qezenc kir. Min bîr û hîsên însanbûnê (ne qehreman û boke, lê bi tenê însan, însanekî ku çewtî, şaşî, qusûr û kêmaniyên wî hene), qezenc kirin. Min meraqeke bicoş û bêdawîn û daxwaz û eşqeke zelal a hînbûn û nasînê qezenc kirin. Min huwiyeteke navneteweyî, bîr û hîsên hemwelatiya cîhanê qezenc kir. Min edebiyateteke pir dewlemend a cîhanê ku ez dikarim, her gav, bê qeyd û şert, bê hesab û guman, xwe berdim hembêzê û jê destkewtî bibim, qezenc kir. Edebiyateke ku ez dizanim, her gav, dilê min ê pê dewlemend bibe û ew ê min nêzîkî merivahiyê bike... Ez hînî wê hunera ku meriv bikaribe di nav ziman û

çandên cuda de bigere û tonên rengan, çêtir, ji hev veqetîne, bûm. Min, matmayî, dît ku li serê cîhanê, bingeh û esasê her tiştî rastiyeke basîd e; *însan*. Her tişt bi rastiyeke basîd ve girêdayî ye; *jiyaneke însanî û normên însanî...*

Gelo min ev hemû tişt û wesif qezenc kirin? Ma kî ji me, merivên ku ji tunela wextê dibihure, bi vê yekê dizane? Kî dizane ka çi qezenc dibin û çi winda dibin?.. Ez bi xwe, bi misogerî, nizanim, lê bi tenê texmîn dikim.

Bi alîkariya van tişt û wesfên ku min qezenc kirin, min ji nû ve zimanê xwe yê zikmakî peyda kir. Ji nû ve, ez hînî zimanê xwe yê ku xwendin û nivîsîna wî qedexekirî ye, bûm. Min ew, hîn çêtir, fahm kir, pê re dan û standineke hîn germ, hîn kûr û hîn bi coş ya evînê ava kir. Ez li çanda xwe ya qedexebûyî, tarîxa xwe ya jibîrbûyî, reh û kokên xwe yên qurmiçî û li huwiyeta xwe ya asîmilebûyî vegeriyam. Cara pêşîn, ji dûr ve, min welatê xwe yê perçekirî, bi temamî, bi hemû mozaîka wî ya rengîn, dît. Min pê re, li dervayî qise û gotinên sar û qor ên îdeolojî û siyasetan, peywendiyeke însanî danî. Min ew rûpelên ku li welatê xerîbiyê, di şevên sar ên Stokholmê de, hatin nivîsîn, bi siyên wî yên nexuyayî, neqişandin. Mîna Kurdekî û merivekî vê cîhanê, hemwelatekî însaniyetê, min hewl da ku ez sî û xatirên nexuyayî yên welatê xwe li ser wan kaxizan bireşînim û welatê xwe yê tenê û jibîrbûyî nêzî cîhanê bikim. Min romanên xwe yadîgarî bîranîna ewladên wî yên biqedr û hezkirî kirin. Min welatê xwe, ji nû ve, hez kir...

Ez tecrubên xwe yên biçûk û nehêja jî li tecrubên 2000 salan zêde dikim û herweha dixwazim vê yekê bibêjim; veqetîna ku di esasê xwe de jan û keder e, dikare alîkarî li dewlemendbûn û nûbûnê bike. Keder û hesret dikarin bibin kaniya avakirin û afirîneke bicoş, bêhempa û navneteweyî ku di xizmeta hemû însaniyetê de ye. Ew dikarin alîkarî li nêzbûn û yekbûna meriv, ziman, çand û tecruban bikin. Ew dikarin veguhezin «agorayekî însaniyetê» ku em hemû, bi adet û ûsilên xwe, bi tam û rengên xwe, tê de ne.

Her mîna ku Rilke dibêje, ji welatê xwe veqetîn û li welatê xerîbiyê jiyana sirgûniyê hem çelmisîn e û hem jî bişkuvînek e; hem mirin e û hem ji nû ve zayin e; jibîrbûyinek û nemiriyek e ku hew ji bîr dibe; welatê xerîbiyê trajediyeke însanî û *bihurekî rengîn yê însaniyetê* ye ku tê de wext û mekan, bi temamî, ji bîr bûne. Li wê derê, do, îro û sibê di nav hev de ne. Li wê derê, bi tenê meriv, merivê ku me hemûyan temsîl dike, destana me hemûyan dibêje, heye. Li wê derê, meriv, ziman, çand adet, ûsil û tecrube rastî hev tên û nêzî hev dibin. Di wî bihurê rengîn de,

destanek tê gotin. Destanek ku tarîx û pêşeroja me însanan, bi gotinên nerm û germ, salix dide...

Hevûdunasîna ziman û çandên cuda û dan û standina tecrubên însanî yên adet û ûsilên cuda dikare bibe sebebê guherînên bi heyecan û hêja û bibe kahniya avahî û afirînên dewlemend. Ma gelek ji wan nivîskarên ku em bi coş û heyecan dixwînin, ne endamên wî *bihurê rengîn ê însaniyetê* ne?.. Joseph Conrad ku bi eslê xwe polonî ye, lê bi îngilizî nivîsiye, Samuel Becket ku bi eslê xwe îrlandî ye û bi îngilizî û fransizî nivîsiye, hosteyê mezin ê zimanê yîdîş I.B. Singer, nivîskarê farisî Sadik Hîdayet ku di destpêka salên 50-an de li sirgûnê, Parîsê, xwe kuşt, nivîskarê trinidadî V.S. Naipaul ku bi eslê xwe ji Hîndistanê ye û bi îngilizî dinîvîse, şaîrê ereb Adonis û nivîskarê çekî Milan Kundera ku herdu jî li sirgûnê, li Parîsê, dijîn... Hîn kî û kî... lîste dikare her û her dirêj bibe...

Ez wisan bawer im ku dîtin, fikir, îdeal, şêwe û tevgerên nû, pir caran, ji koçên mezin, nasîna ziman û çandên nû, dijîtiyên çandî û civakî, tevliheviya ruhî û civakî û guherînên mezin tên pê. Berpirsiyarî, bîr û hîsên navneteweyîbûnê û merivê cîhanê bûyin, pir caran, li wan cîh û warên ku ziman û çandên cuda rastî hev tên, derdikevin holê û dibin fenomenek ku tesîr li me hemûyan dike. Czeslaw Milosz, şaîrê polonî ku li Amerika'yê dijî, dibêje; «*wezîfa edebiyat û şihîrê ew e ku însanbûna me bi bîra me bîne...*» Bêguman, ev gotin rast e. Lêbelê, ji bo ku meriv bizanibe wezîfa edebiyat û şiîrê weha ye, meriv divê xwediyê berpirsiyarî, bîr û hîsên navneteweyî be û ji bîr neke ku ew însanê cîhanê ye. Ev berpirsiyarî, bîr û hîsên ku ji guherîn, afirandin, nasîn û têkiliya çandî dizên, di eynî wextê de, bingehê şêweyên *jiyîn û fikirînên demokratîk, însanî û rengîn* e jî. Dîsan, her ev bîr û hîs in ku dikarin li hember «rastiyên mutlaq û totalîter» ku ji yekdengiyeke tarî û sert pê ve ne tu tişt e, raweste û rastiyên însanî û demokratîk derxe holê û bîne pêş.

Li vê derê, ez divê, dîsan, gotina Gombrowicz «*sirgûnî goristanek e*» bi bîr bînim. Gava meriv nikaribe li welatê xerîbiyê, di nav şert û mercên welatê nû de, xwe bi berpirsiyarî, bîr û hîsên navneteweyî û însanê cîhanê bûyinê bigihîne, hingê sirgûnî, bi rastî jî, dibe goristan. Heta ku meriv welatê nû mîna îmkanekê bi kar neyine û tênegihê ku welatê nû, veqetîn û dûrbûyin, digel her dijwarî û zehmetiyê, îmkan û fersendek e, hingê meriv nikare, li welatê xwe yê nû, biafirîne û rabirduyê ji nû ve vejîne. Gava meriv jiyana nû ya sirgûniyê ji jiyan û civata welatê nû veqetîne, îzole bike û di nav sînorên teng ên getoyekî de hepis bike, hingê welatê

xerîbiyê dibe goristanek. Ferqên mezin di navbera *ji nû ve avakirin û afirîna rabirdûyekê* û *rabirdûyekê her û her jiyînê* de hene. Nostaljiyek ku meriv pê kor dibe û cîhana xewn û xeyalan a avakirin û afirandinê ne eynî tişt in. Di navbera jiyana ku bi siyên bîranîn û xatiran rapêçayî ye (da ku meriv bikaribe pêşerojê bibîne û taswîr bike) û jiyana ku êdî ketiye dervayî wext û dewranê de ferq pir in. Di jiyana ku êdî ketiye dervayî wext û dewranê de îsrar û înadkirin, mirin e, goristan e. Bi alîkariya xewn, xeyal, bîranîn û xatiran, gavên nû avêtin û berhemên nû afirandin tiştekî ye û li taxên derveyî bajarên mezin, merkezên sirgûnê, di nav kirasekî teng û îzolekirî de, jiyîn û bêwest û bêrawest mezinahî û xweşiyên jiyana bihurî bibîranîn, tiştekî din e. Tu tekiliya ev herdu celeb jiyanan bi hev re nîn e... Danilo Kis, nivîskarê yugoslavî, ku ceribandineke pir balkêş li ser nivîskarî û jiyana nivîskarê rûs ê sirgûn Vladimir Nabokov nivîsiye, pir xweş, behsa jiyana penaber û macirên rûsan ku piştî şoreşa bolşevîk, 1917, pêl bi pêl, dev ji welatê xwe berdan û ketin ber pêla welatê xerîbiyê, dike. Jiyaneke bi keder, giran û keserkûr ku mehkûmî taxên dervayî bajarên Berlîn û Parîsê bûye; jiyanek ku nikaribûye xwe entegre bike û veguhezîne jiyana nû ya welatê nû; jiyanek ku bi wê kîn û nefreta ku ji welêt hatiye ve tijî û di bin nîrê giran ê dijîtî û navkokiya hindurî ya kom û grûbên rûs de fetisiye... Û di nav vê jiyana ku ji bo wan hilweşîn û têkçûnê îfade dikir de, arîstokrat, alim, nivîskar, ronakbîr, karker, xwendevan, hêzên çep ên muxalîf û siyasetvanên ku ji guherîn û nûbûnê dûr, hêdî hêdî, bi awayekî zîz û belengaz, ber bi windabûnê û axa gorê çûne... Ango goristanek ku tê de meriv dijiyan...

Mixabin, ez dibînim ku min ev babeta ku nivîsîna wê, ji bo min, pir zehmet e û ez bi tenê mîna kurte-ceribandinek fikirîbûm, direj kir. Ez dixwazim babetê, dîsan, bi dapîra xwe biqedînim. Ew welatê xerîbiyê ku dapîra min qal dikirê, mixabin, ji bo me kurdan bûye merkez û navenda xebat û tevgerên entelektuelî û çandî, bûye welatê me yê ronakbîrî. Sedsala me, sedsala şer, qetlîam, hilweşîn, guherîn û koçên mezin e. Kî dikare li hember vê rastiya ku gelek nivîskaran, car bi car, gotine, raweste? Ji bo me kurdan, ev rastî û ev wesfên sedsala me, heye ku ji hemû netewe û gelan bêtir, rast in. Û ji ber van rastiyan(wesfan), hema çi bigire, her avahî, eser û berhemên edebî, entelektuelî û çandî yên hêja yên Kurdan ku heta îro mane, li welatê xerîbiyê û sirgûnê hatine pê. Herwekî Cihû û Ermenan, Kurd jî welatê xerîbiyê, mîna îmkanekî, mîna merkezekê ku li wir meriv dikare ziman, edebiyat, huner û çanda xwe biparêze, pêş bixîne, dîtine û jiyane. Herweha ez dixwazim vê babetê, bi van gotinan, xelas bikim; ez, ewladê gelekî ku yekemîn

rojnama xwe, kovarên xwe yên pêşîn, kitêbên xwe yên nûjen, avahiyên xwe yên nûjen û çandî li welatê xerîbiyê anîne pê, welatê **xerîbiyê** hem mîna warê keser, hesret û kederê, hem jî mîna warê guherîn, nûbûn, afirîn û xwenasînê dibînim û dijîm.

Jina Şivên

*Henry LAWSON**
(wergrandin ji îngilîzî : Şahînê B. Soreklî)

Xaniyê ji du odeyan, ji stûn û dîlmeyên daran hatiye çêkirin, û ji qaqilê daran yê qalin, û erdê xênî ji dîlmeyên hatinî qelişandin. Mitbaxa mezin ya ku li hêleke xênî cîh digire ji tevahiya xênî, sekû jî tev, firehtir e.

Li dorhêla xênî qirş û çirpî, ta çavên merov dibirrin, ji ber ku erdê wî warî yekî dûz e. Tu çiya ji dûr ve xuya nakin. Qirş û çirpî yên darên sêvên kûvî ne, darên biçûk û gemirî. Tiştekî ku çavan geş bike tune, xeyn ji çend darên mazî, yên ku merov dibêje hema-hema keseran bi ser çaya teng, ya ku hindik maye av tê de bimiçiqe, dikişînine. Bîst û heft kîlometir ta nîşana şenahiyê ya herî nêziktir, koxeke li ser mezin.

Şivan, yê ku berê zevî ji daran paqij dikirin, nuha ji mal dûr li ber dewêr e. Jin û zarokên wî bi tenê hatine hiştin.

Çar zarokên di paçan de li dora xênî dilîzine. Ji nişkan ve yek ji wan diqîre : «Mar ! Dayê, marek va ye !»

Jina çolê ya ji çerm û hestî li bayê bezê ji mitbaxê tê der, dergûşa xwe ji erdê radike, bi destê çepê hembêz dike û radihêje çoyekî.

«Ka li ku ye ?»

Henry Lawson : Dê û bavê Henry Lawson ji Norvêjê wek muhacir hatibûn Australya. Ew bi xwe li wilayeta New South Wales ya Australî di sala 1867 an de hat dinê û li bajarê Sydney di sala 1922 an de wefat kir. Wî di jiyana xwe de gellek kar kiribûn, herweha mamostetî û rojnemevanî. Tevî ku stran û helbestên wî yên li ser jiyana çola Australya bi nav û deng in, pirraniya nivîsarên wî ji kurteçîrokan pêk tê. Ez li vir bêjeya «çolê» bi xwebêja bêjeya îngilîziya australî «bush» bikartînim. Bêjeya «bush» li Australya xwebêja jiyana li dervayê bajaran, ya di nav daran, qirş û çaliyan de, dide. Jiyana di nav «bush» de di dîroka Australya de, bi taybetî di sedsala 19 an û nîvê yekem yê bîstan de roleke mezin lîztiye, nemaze di folklora australî de.

«A va ye ! Çû binê koma daran !» lawikê mezin bang dike — zarokekî rûziravî yanzdeh salîn. «Li vir raweste, dayê ! Ez ê ji heqe wî derêm ! Paş ve biçe ! Ez ê ji heqê wî mîratî derêm !».

«Tommy, kuro wer vir, ew ê bi te vede. Ne ez bang te dikime, zû wer vir, hey virxûn !»

Zaro tê, lê bêdil, di destan de çoyekî jê mezintir. Dû re ew diqîre, wek kesekî ya xwe bi ser xistî :

«A wa ye diçe - di bin xênî de !» û zû we de direve, berê ço li jor. Di eynî demê de segê mezin î, reş î, çavzerî ji nijadine tevlihev, yê ku bi balkêşî li hewşê mêze dikir benê xwe diqetîne û dide şopa wî marî. Lê bi zor mar ji dest difilite ; dema ku pozê wî digihê qelişa nav dîlmeyan, doçika mar jî wenda dibe. Hema-hema di êynî katê de çoyê lêwik jî tê xwar û li wî pozî dikeve. Allîgator (navê kûçik e) pirr guh nade vê yekê, û hewl dide xwe têxe bin xênî, lê didine şopa wî û dû rakişandineke virde-wêde bi ya wî nabe, ew tê girêdan. Ew mala bêyî wî nabe.

Jina şîvên zarokan li nêzikî koxa kûçik dide sekinandin û bala xwe dide mar. Ew du sehenên biçûke tiji şîr li ber dîwer datîne, da wî bixapîne, ku were der ; lê seêtek derbas dibe, bêyî ku ew xwe xuya bike.

Ro li ava ye, û firtineyek nêzik dibe. Divêt zaro biçin hindir. Ew ê wan nebe hindir xênî, çikû ew dizane mar li wir e, û pêkane di her deqê de di qelşeke textê binê xênî re were hindir : loma ew çend hembêz êzing dibe mitbaxê, dûvre jî zarokan dibe wir. Erdê mitbaxê bêyî raxistin e, ji xweliyê pêk tê. Di navenda wê de maseyeke mezin e, ku bi şêweyeke xeşîm hatiye çêkirin, heye. Ew zarokan dihîne hindir û ji wan dixwaze, ku hilkişin ser wê masayê. Du lawik û du keçik in, hê zaroyên biçûk in. Ew şîveke sivik dide wan, dûvre, ber şev reş bibe, diçe hindir malê û tev xwe balgîh û rûşeltine tîne, û wisa difikire, ku pêkan e ew a nuha-a nuha, yan mar bibîne, yan destê xwe rastê wîne. Ew şûneke razanê li ser masê ji zarokan re çêdike, û li kêlekê rûdine bo bi drêjiya şevê bipê.

Çavekî wê li quncik e, û li şiveke kesk e, ku li kêleka wê di haziriyê de ye, li ser sandiqeke bi dixîle. Sepeta tiştên dirûnê û hejmareke Kovara Jinên Ciwan (*Young Ladies' Journal*) li wir in. Wê kûçik jî haniye hindir.

Tommy bi dijderketin xwe dike bin rûşeltê, lê dibêje ew ê bi tevahiya şevê payî bimîne û ew marê bêbav bipelixîne. Dayika wî jê dipirse, ma çend caran wê ji wî re gotiye, ku gotinên xirab neke.

Çoyê wî di bin rûşeltê de li kêleka wî ye, û brayê wî Jacky bi nefret diqîre :

«Dayê ! Tommy ez bi saxî guram bi çoyê xwe. Bila ji bin rûşeltê derîne.»

Tommy : «Huş, virxûnê ! Ma dixwazî mar bi te vede ?»

Jacky devê xwe digire.

«Heke tu werî pêdadan», dibêje Tommy dû kateke kurt, «tu ê biwerimî, û bêhna genî ê ji te wer, û tu ê sor û kesk û hêşîn bibî heta diteqî. Ne wa ye, dayê ?»

«De bes e, zarok metirsîne, rakeve êdî,» dayik dibêje.

Herdu zarokên biçûktir dikevin xewê, lê Jacky her çendekê carê hê gazincan dike, ku ew «hênciqî». Şûna wî tê fireh kirin.

Nuha Tommy dibêje :

«Dayê ! Guh bide wan «possum»ên biçûk (possum lawirekî Australiyî bi mezinahiya kevroşkan e ; di nav çemelên darên kavçukê de dijî). Çiqa dixwazin stûyên wan yên pîşe mirdal hilqetînin».

Û Jacky li dij derdikeve :

«Lê ew ti zirarê li me nakin, ewên pîse mirdal !»

Dayik : «Ha binhêr, min got tu ê Jacky fêrî gotina xeweran bikî !» Lê gotina we wê dikenîne. Jacky dikeve xew.

Niha Tommy dipirse :

«Dayê ! Gelo ew ê Kangurû qet serbest berdin ?» (lawirekî Ausralî ye).

«Xwedêyo ! De ez çi zanim, kurê min ? Razê, êdî.»

«Tu ê deng li min kî, heke mar derket ?»

«Erê. Razê».

Nêzikî nîvşev e. Zarok hemî razane û ew li wir bêdeng rûniştiye, geh didirû, geh dixwêne. Her bîstekê carê erdê û binaniya dîwaran di çav xwe re dike, û heke dengek tê wê, dest drêjê ço dike. Firtine digihê, û ba, yê ku xwe di navbera dîlmeyên dîwêr re digihîne hindir, hindik dimîne mûma wê vemirîne. Ew wê li ser sandiqa bi dexîle, li şûneke ku tê de ji bê were paraztin, datîne û peline rojnameyê bi kar tîne, bo wê biparêze. Her ku brûsk lêdixe, qelşên di navbera dîlmeyan de wek zîv dibirûşin. Tav dike xurre-xur û baran diçerpînê.

Alligator (navê kûçik xwebêja gumgumokê avî, tîmsah, dide) bi drêjî li ser erdê veketiye. Çavên wi li dîwarê mitbaxê û xanyê malê ji hev vediqetîne ne. Loma ew dizane, ku mar li wir e. Qulikên fireh di wî dîwarî de hene, ku bi ser binê xaniyê malê de vebûne. Ew ne keseke tirsonek e, lê bûyerên wan rojên dawîn esebên wê hejandine. Lawikekî brayê mêrê wê ber demeke nêzik, ji marekî hatibû pêdadan, û miribû. Li milê din, ev bû bûn şeş meh nûçeyên mêrê wê qut bûbûn, û hişên wê li ser wî mijûl bûn.

Ew şivan bû, lê dema ew zewicîn, wî beşek zevî ji dar û çaliyan paqij kir. Sala 18... ya bêbaran ew li erdê reş hişt. Divabû ew çend dewarên xwe yên mayî li şûn bihêle û biçe dîsa şivaniyê bike. Wî dil heye, dema vegere, malbatê bibe bajarê herî nêzik, û ta ew dema were, brayê wî, yê ku xaniyekî xwe li ser riya mezin heye, mehê kêm-zêde careke tev tiştên bo malê girîng tê. Jina şivên hê du çêlekên wê, hespek, û çend mîyên wê hene. Hin caran brayê mêrê wê yekê serjê dike, goştê bo wê divê didêkê, û yê mayî li şûna tiştên tev xwe hanîbûn dibe.

Ew fêrî hiştina bi tenê bûye. Ew carekê hejdeh mehan wisa jiyabû. Ew keçekê we li ser bê kela di xewn û xeyalan de lêkiribûn; lê hemî hêvî û daxwzên wan rojan ji mêj ve mirine. Ew hemî pêşabûna xwe di kovara Jinên Ciwan de dibîne, û-Xwedê alîkarê wê be ! ji rûpelan hemî, di yên modeyê de.

Mêrê wê Australî ye, herwcha ew bi xwe jî. Ew merovekî bêmiqayitî, lê şûyekî ne xirab e. Heke ji dest bihata der wî ê ew bibira bajêr û ew wek mîrekê li wir bihişta. Ew fêrî mayîna bi tenê bûne, bi kêmasî ew (jin) «girr û gazinc bêsûd in», ew dibêje. Pêkan e ew carine ji xwe bîr dike, ku ew zewiciye; lê heke şêkeke perene rind dema vegera li mal tev wî hebe, ew dide wê. Dema pere di destên wî de hebûn, wî ew çend caran biribû bajêr-di vagoneke trênê de cihê razanê stendibû, û li hotêlên herî çak cîh girtibû. Wî ji wê re erebeyeke sivik jî kirîbû, lê ji neçariye ew jî wek tiştên din hat frotin.

Herdû zaroken dawîn li çolê bûn yek di dema ku mêrê wê tixtorekî werxweş dihanî, bi zorê, bo alîkariya wê bike. Di vê katê de ew bi tena xwe bû, û weqa bêhêz. Ew bi hummê nexweş ket. Ew ber xwedê geriya, da alîkariyê ji wê re bişîne. Xwedê Marya Reş şand -aborijiniya (xelkê Australya yê eslî) welêt ya «herî spî». Ya rast, Xwedê berê King Jimmy şand, û wî Marya Reş şand. Wî rûyê xwe reş da ser stûna dêrî, zû rewş xist bin çavan, û bi ken got : «de baş e, xanim ez pîrejina xwe tînim, ew wê da li kêleka çayê ye.»

Yek ji zarokan mir, di dema ku ew bi tenê li vir bû de. Ew bi siwarî dora bîst û du kîlometr çû alîkariyê bibîne, zarokê mirî rakirî.

Seêt yan yek, yan dudu ye. Agir melûl dibêye. Allîgator mexel e, serî li ser lepan, dû dîwar xistiye bin çavan. Ew ne segekî pirrî xweşik e, û di bin ronahiyê de gellek brînên wî xuya dikine, li kuderan pirç demeketiye. Ew ji tiştekî natirse, ne li ser erdê, ne di binî de. Ji golikekê bigir ta sipiyekê, ew amade ye êrîş bike. Ew ji ti kûçikan hez nake -kûçikên kangurûyan ne tê de- û heznekirina wî bo dost û meriyên malbatê hatiye zanîn. Lê ew pirr kêm têyên. Yekcaran ew dostiyê bi kesên biyanî re datîne. Ew ji maran dimire û gelek ji wan kujtine, lê rojekê ew ê were pêdadan û bimire; ev dawiya pirraniya segên markuj e.

Di navbera kat û katê de jina çolê karê xwe eware dike û dinihêre, û guhdar dike, û difikire. Ew di bûyerên jiyana xwe de diponije, çikû tiştine din, ku bikaribe tê de bifikire hindik in.

Dû baranê giha dê dirêj bibe, û ev tîne bîra wê çawa ew carekê li dij agirê bi gîha ketî têkoşiya, dema mêrê wê ne li mal bû. Gîha dirêj û pirr hişk bû, û hindik mabû agir bi wê keve. Wê pantilonekî kevin yê mêrê xwe li xwe kir û bi çemelekî daranî hişk agir vedimirand, ta ku xuyeke gemarîn li ser eniya wê zîpik -zîpikîn bû û rêz ji çepelên wê yen gemarîn ber bi xwar hat. Dîtina diya xwe di pantilon de Tommy kenand, yê ku wek bokeyekî ciwan li kêleka wê şerê êgir dikir, lê dergûşê bizdoyîn bi dengekî bilind bo «dayê» diqîriya. Êgir ê li wê badabûya, heke çar peyayên çolê yên bi heyecan gihîştinî di kata munasib de negihîştibûna. Hertişt tevlihev bûbû ; dema çû dergûşê xwe rake, ew qîriya û ta dikaribû ber xwe da, bin texmîna ku peyakî reş dike wî rake ; û Alligator, yê ku ji hesta xwe bêtir ketibû bi bandora ya dêrgûş, xîj kir, û (wek segekî bi umir mezin û piçekî kerr) di heyecana xwe de berê dengê xwe nas nekir, û bi beşekî kincên wê girtibû, ta ku Tommy ew bi qayîşa kurtanekî, hindik mabû bifetisîne, paş ve kişand. Ji hejandina doça tiştek tê de nemayî û kenê deve ji hev vebûyî xuya bû ku seg şaştî kû poşmaniya xwe dixwazt bide zanîn. Demeke bi şan bû bo zarokan, yeke bîrhanîn û li seraxiftin û pêkenîna bi salan.

Ev tîne bîra xwe çawa ew di dema nelimalbûna merê xwe de li dij lehiyê têkoşiya. Ew bi saetan di bin barana wek ji derê kun were der de ma û herqek kola bo av zorê nede bendê li ser çayê. Lê wê nikaribû bend biparêze. Tiştine hene, ku jina çolê nikare bike. Di beyaniya roja din de bend hilweşiya bû, dilê wê jî hindik

mabû bişikê, ji ber ku ew mijûl bûbû, gelo mêrê wê ê çi bibêje, dema ew vegere mal û bibîne ku encama xebata bi salan bi ber avê ketiye. Ew giriyabû wê çaxê.

Wê herweha hewl da dewêr ji nexweşiyekê (nexweşiya pleuro-peunomonia) xilas bike, xwûn ji çendên mayî berda, û dîsa giriya dema herdu çêlekên wê yên herî çê mirin.

Ew herweha li dij golikekî kûvî yê dîn têkoşiya, ku êrîşe mala wan kir. Wê gulle çêkirin û bi tifingê di navbera qelşên dîlmeyan de avêtinê. Ew bi hatina sibehê re mir. Wê ew gurand û êyarê wî firot. Ew herweha şerê qirk û qertelan dike, yên çavên xwe beradane mirîşkên wê ye. Tevdêrên wê yên şer gelekî tabiî ne. Zarok bang dikin, «dayê girrik hatin !» û ew dibeze der û darê havlêkê (suburgê) ber bi wan dirêj dike, wekî ku ew tifing be, û dibêje, «bum !» Sirik zû diherin. Ew xusûk in, lê xusûkiya jinikê ji ya wan bêtir e.

Yekcaran çolpeyakî wek efrîtan, yan bêkarekî şer ji rû dibare, tê û ew hindik dimîne bizdoyîn bibe. Pirraniya caran ew ji biyaniyê bi guman re dibêje, ku mêrê wê tev du kuran li binaniya bendê çayê di kar de ye, yan li ew hêla din in, çikû biyanî herdem bi xasûkî li peyayê malê dipirsin.

Hema hefteya borîn paliyekî gerrok, yekî şer ji rû dibare, dû ku di çav xwe re kir, ku peya li vir tune, tûrê hûr-mûrê xwe çêkire ser sekûyê û xwarin xwazt. Wê tiştek bo xwarinê dayê ; dûvre wî da zanîn, ku ew dixwaze wê şevê li wir bimîne. Ro li ava bû. Wê dîlmeyekî textîn ji qaryolê kişand, benê kuçik vekir, û di destekî de dîlmeyê text, di yê din de benê kûçik, li hember kesê biyanî sekinî. «Bêderengî biçe !» wê got. Wî li wê û li kûçik niherî, bi dengekî tirsonek got : «baş e, xanim» û çû. Ew jineke ceddî xuya dikir, û çavên Alligator yên zer, şer jê dibariya-jê bêtir seg di ew şêweya xwe ya bi girr de, wek lawirê ew li gor wî hatibû binavkirin xuya dikir.

Di dema ku ew tê de li ber agir rûniştibû û mar dipa, pirr hindik bûn ramanên kêfxweşiyê, ku ew bi bîranîna wan mijûl bibûya. Roj hemî kêm-zêde wek hev in bo we; lê roja yekşemê dûnîvro, ew kincên xweşik li xwe dike, zarokan paqij dike, dêrgûş dixemilîne, û di riya nav çaliyan de derdikeve seyranekê, li pêş xwe erebeyeke zarokan gêr dike. Ew her yekşem vê yekê bi cîh tîne. Ew eynî katê di xweçêkirina xwe û zarokan de derbas dike, ku ê di seyraneke nav bajêr de derbas kiribûya. Lê tiştekî dîtinê tune, ne jî kesekî mirov lê rast were. Yek dikare sîh kîlometir li vir bimeşe, bêyî ku tiştek haya wî bikşîne, heke ew ne pisporekî jîna çolê û nav qirş û çaliyan be. Ew, ji ber wekhevbûneke ecêb ya darên lixwekemişî

ye, ta çavên yekî dibirin-ew wekhevbûna ku di dilê merov de dawaza çûyina ji vir tîne holê, heta ku trên dikare yekî rake, û ji wir heta ku keştî dikare yekî bibe-û hê wê de.

Lê ev jina çolê fêrî bitenêmayîna li vir bûye. Berê, pêş û dû zewacê, ew jê dimir, lê nuha, ji vir dûr ew ê xwe biyanî bibîne.

Ew kêfxweş e dema mêrê wê vedigere, lê ew tiştan ji usûlê dernaxe û mezin nake. Ew xwarineke xweş jê re çêdike, û zarokan paqijj dike, kincên wan diguhêre.

Ew wek jineke ji rewxşa xwe razî xuya dike. Ew ji zarokên xwe hez dike, lê wexta wê tune xuya bike. Ew li hember wan sert xuya dike. Derdora wê bo pêşvebirina hesteke «henûniya jinan» yan dilnazikiyê rê nade. Berbang pêwist e ne dûr be ; lê seet di hindir xaniyê malê de ye. Mûma wê hindik maye nemîne ; ji bîra wê çû ku mûmên wê nemane. Divêt bêtir êzing werin hanîn, da agir nemire, loma ew dêrî li ser kûçik digire û zû direve şûna koma êzingan. Baranê vekiriye. Ew bi çoyekî digire, dikişîne, û-xurr ! kom bi tevahiya xwe hildiweşe.

Duhu wê û rêwiyekî reşik li hev kirin, ku jê re êzingine bîne, û di dema mêrik di kar de bû ew çû li çêleka xwe ya wenda bigere. Ew dora seetekê ji mal dûr ma, û kesê aborijinî karê xwe bi şêweyeke çak kiribû. Dema vegerê ew bi dîtina komek êzing li ber êrgûn weqa mat ma, ku wê li ser heqê wî gurzek titûn daye û bo netenbelbûna wî pesna wî da. Wî ji wê re spas kir, û bi serbilindî, sîng ber bi pêş xatir xwazt. Ew ji êla xwe kesê dawîn û kiral bû ; lê koma êzingên wî hundurê xwe vala bû.

Nuha li zora wê hat, û di dema ew li ber masê rûniştiye de hêstir ji çavên wê dipijiqine. Ew destmalekê ji beriya xwe derdixe bo hêstiran damale, lê bi şaştî tiliyen xwe di çavên xwe re dike. Destmal tijî qulik e, û ew haydar dibe ku we tiliya girikê di qulikekê re kiriye, ya eşhedê di yeke din re.

Ev yeka wê dikenîne, û kûçik mat dihêle. Hesteke wê ya pirre nemaze bo buyerên ecêb heye, û yekcaran ew bi çîrokeke wisa kêfê rêwîvanekî di nav qirş û çaliyan de dijî tîne.

Ew berê jî bi bûyeren wisa ecêb keniyaye. Rojekê ew rûnişt «bo ji xwe re têr bigirî», wek got û pîrepisîka wê hat xwe di kincên wê da û «ew jî giriya». Wê li vir dest bi ken kir.

Pêwîst e ronahiya rojê êdî ne dûr be. Odeya mitbaxê girtiye û êgir ew germ kiriye. Alligator hê di navbera kat û katê de dîwer dixe bin çavan ; ew xwe hebkî

ber bi dîwarê navberê dixuşîne, û bedena wî bi heyecanê diheje. Pirça li ser stuyê wî gij dibe, û di çavên wî de xwe amadekirina bo şer dibirûse. Ew dizane xwebêja vê yekê çi ye, û destê xwe davêje ço. Dîlmeyekî dîwarê navberê di binî de ji herdu aliyan de şikestiye. Cotek çavên bêoxir, yên biçûk, wek hebên tizbiyan ji qulikeke vî dîlmeyî bibiriqin. Mar-yekî reş-hêdî-hêdî tê der, dora sîh sentîmetir, û serê xwe ber bi jor û jêr dilivîne. Seg nalive, û jinik wek kesekê çavên xwe bêawêr neke rûniştî dimîne. Mar sîh sentîmetreyên din tên der. Ew çoyê xwe radike jor, û mar, wek ku ji nişkan ve hay tehlûkê bibe, serê xwe dike qulika din ya binê dîlme, û zû dike ku doçika xwe li dû xwe derbas bike. Alligator xwe çêdike, û gezekê davejê. Ew nagire, çikû poze wî mezin e, û bedena mar xwe ber bi quncê di navbera dîlme û erdê mitbaxê de tîne. Bi derketina doçikê re ew gezeke din davêjê. A nuha wî mar girt, û ew wî nîvmetro dikişine. Xup, xup, tê dengê çoyê jinikê li ser erdê. Alligator dîsa dikişîne. Xup, xup. Alligator car din dikişîne û ji dest tê der mar bi tevahî derîne-hovekî reşî bi dirêjiya metro û nîvekî. Serî ber bi jor radibe bo virde-wê de xîj ke, lê kûçik neyêr di nêzikî stû de dike nav qîlan. Ew kûçikekî mezin giran e, lê bi levandina xwe wek yekî biçûk e. Ew mar dihejîne, wek ku haya wî jî ji naleya merovan lê haniye hebe. Kurikê herî mezin ji xew radibe, çoyê xwe bi dest dixe, û hewl dide ji şûna razanê rabe, lê diya wî bi awirekê wî radiwestîne. Xup, xup-pişta mar di gellek şûnan de şikestiye. Xup, xup-serî pelixî, û car din pozê Alligator bi ço şeqitî.

Ew marê helisî bi serê çoyê xwe radike, û dibe davêje nav êgir ; dûvre êzingine davêje ser û li şewitandina wî temaşe dike. Lawik û kûçik jî temaşe dikin. Ew destê xwe datîne ser serê kûçik, û ew şopên harbûn û girrê hemî di çavên wî yên zer de wenda dibin. Zarokên biçûk têyên hewandin û nuha raketîne. Lawikê çaqgemarîn demeke kurt bi tenê kurtik li ser lingan e û li êgir temaşe dike. A nuha ew li wê mêze dike, hêstiran di çavan de dibîne, û, piyên xwe li dor stuyê wê gerandî, jê re dibêje :

«Dayê, ez ê tu caran neçim şivaniyê ; min bikuj, heke ez çûm !»

Ew wî hembêze pêsîra xwe ya nemayî dike û wî radimûse; û wisa ew tev rûdinin di dema ku ronahiya rojê ya melûl xwe ji ser qirş û çaliyan re diyar dike.

Sydney, 3.1.1990.

Karbidest

Ferhadê ÇELEBÎ

Ji ya ku canê min givaşt û jê hate xwar
dilopên evînî bi xwînê re himbêzkirî...
•Rojîn•

Vê carê ez bi hêvî me ku wê çêbibe, mamosta Mehmûd xwe dayê û bi telefonê bi wan re axiviye, ez nizanim bê çi ji hev re gotine, lê ji min re got ; here wê baş be û wê te karbidest bikin.

(milê mirovekî li milê wî dikeve, berê wî pêre tê guhertin, lê ew guh lê nake,.. berdewam dike)

Baş e dema gundiyê mirov li bajarekî wilo mezin ku, tu kes kesî nas nake, bi kêrî mirov bê, law tê bêje me dunya hemû zeft kirye (ji xwe re bi şabûn digot); ez nema dihêlim bavê min karê giran bike, bes e ew jî mezin bûye û têra xwe westiyaye.

Bi Xwedê gelek caran gotinê (Bavê Misto) di ciyê xwe de bûn, digot : ma ev xwendin ji bo çiye ? ku mirov nikaribe hinekî bavê xwe rehet bike.

(emrê (temenê) bavê min li dor şêşt-şêst û pênc sala, ku ez ne şaş bim.)

Mafê wî jî li min heye, bavê min ne wek Bavê Rizo bû, bavê min bi kar û barê malê radibû û em kêmî tişkî nehiştin. Dayika min jî gelekî bi min re westiyaye, erê xweş tê bîra min wê çawa ew nanê hişk dida hev û difrot, da ku ez xwendina xwe kuta bikim, mafê wê jî li min heye, hema ez meha pêşî bistînim, ezê jê re çend miriîşkan bikirim.

«Tu... û ... ot....... xwe li nava kolanê dît û tirimbêl li dû hev rêz bûne û tûtûta wan e, bi lez kolanê qut dike .... û ....)

Min ji Fatê re gotibû ; hema kengî kar bi destê min keve ezê ji bo te kirasekî rengînî bînim, divê di cejna Newroza vê salê de li xwe bike, hinekî buha ye, lê ne xem e, xweha minî biçûk, ezê jê re bînim.

Gava bavê min bibîne, ku ez kar dikim wê gelekî şa bibe... ne tiştekî veşartî ye gava bavê min, Misto ji dibistanê derxist û karek da ber ji bo alîkariya wî bike.

Ezê Misto vegerînim dibistanê, bila bixwîne, da ku textorekî me jî çêbibe.

(Bi bazdan kolana *Alferdos* qut kir, li dora xwe nerî weke ku yek bi dûde ye ..... û......)

Ez û Gulê jî emê miradê xwe bikin, ev bû deh sal ku dilê me di hev heye, min nedikaribû ew bixwesta, helbet ji bilî vê xwendinê pêve tu tişt di destê min de tuneye. Bi Xwedê; ê di vî bajarî de, ku bê pişt be, hema çêtir e ku nexwîne. Min soz dabû Gulê, hema kengî ez kar bikim, ezê bavê xwe bişînim nik bavê wê ji bo xwestinê.

Avayike bilind weke çiyakî hate ber, li ser danîne (Wezaret Almaliye) rawestiya û li dor xwe nerî û dilê wî her weha dilerize, delo-dîn bû, here yan nere, gavek avêt yekê bi şûnde vegeriya, ket ramana de, tu çare nedî, divê derbas be bi taybetî piştî telefona mamoste Mehmûd hate bîra wî xwe li himber dergehê mezin dît, dergevanê nîv-razayî û bê guhdan rûniştiye û tivingek kevnar li ser çogên wî ye tu dibê ji sed salî û vir de gulak bi wê nehatiye berdan...

... Bêyî ku li dergevan binêre xwe dada hundir, derbasî eywanê bû li ser dîwarekî danîne : K*arbidest ji me re divên,* dibeşire û di ber xwe de dibêje : ev çar sal heye ku min zanîngeh kuta kiriye û min tiştekî wisa nedîtiye.

Nêzîk bû û xwend, bi şabûn digot : çi tiştê xwestine bi min re heye, tevlî kerta mamosta Mehmûd.

Ji yekî dipirse ; li ku mirov kaxetê xwe dide ?

— Jê re got : li qata sisya ye.

(li qata sisya hinekî rawestiya, ta ku ji bilî yekî keçel pêve tu kes li odê nema, hêdî hêdî li derî xist û derbas bû...) .. yê keçel li pişt masê rûniştiye, temenê wî li dor çil salî ye.

— Ka kaxezê xwe bide min, ê keçel bi dêmek tirş jê re got, tu dibê demana darê jê tên xwestin.

— Fermo mamosta, bi destekî lerizandî kaxetên xwe li ber destên wî danîn. Nerînek sivil li wan nerî, demê wî hineki xweş bû û got ; baş e, baş e kaxezên te hemû rast in, tu dibê ev karê han ji bo te çêbûye..., tu zanî ku mamosta Mehmûd pir hêja ye li ba me,... ma tu ji min re nabêjî ; penêr li cem we heye, yabo hema zarok dibêjin penêrê wan dera xweş e, ez dibêjim vê salê şinkayî hebû, ne wilo ?

Belê ezbenî ew tiştên tu dixwazî heye, bi cegerekî xurt lê vegerand ji ber ku ev xwestin dabû ber çavên xwe.

— Başe, de ka hewiya (nifûsa) xwe bide min û kengî tu çû... Qamişlê tê dest bi kar bikî, lê tu me ji bîr nekî.... ! Gava gotina hewiyê bihîst dêmê Ahmed nexweş bû û di ber xwe de got : careke din em vegeriyan wî meqamî..., bi matbûn go :

— Ezbenî ma çima hewî, va me ez, navê min Ahmed e, diya min Xatê ye, bavê min jî Qasim e, û ez li Amûdê hatime dinê, û anha ez li Qamişlê dijîm.

— Bavo de ka hewiya xwe bide min, ez ne vala me.

(bi dilekî şikestî destê xwe avêt bêrîka xwe qabek zer û kevin derxistin û pêşkêşî ê keçel kir...) lê temaşe kir û bi matmayî dixwend, careke di lê vegerya û bi deng got : xas bilacanib !!! Ev çi ye, ma ka hewiya te ?

— Bi Xwedê birako hewiya min ev e.

— Qey tu nej vir î, ta ku hewiya te bi vî rengî ye ?

Weke ku yekî avjenî ji sibê ta êvarî kiriye, wisa destê Ahmed hate xwar... Bi melûlî got : belê bi Xwedê, ez ji vir im û bave bavê min jî ji vir in, lê ji me re dibêjin hûn beyanî ne (acanib)... çire û çilo, çîroka vê yekê dirêj e, lê ku tu karibî anha tiştekî ji min re bikî, ezê gelekî spasdarê te bim û ez vê qenciya te ji bîr nakim.

— Bavô, bi Xwedê me tê vî barê giran ji ser milê min rakî.

— Ez zanim, ez zanim... (erê Ahmed zane, ji ber ku ev ne cara yekê ye û ne ew bi tena xwe ye....)

Kaxezên xwe bi destê xwe girtin û keserek ji hundirê kezeba wî hate xwar, pişta xwe da yê keçel û derket....!

Bi dilekî xurt û gavên ji xwe razî di ber dergevan derbas bû, dît ku ew bûye ta ku hew xuyaye.

Pêşgotin

Min çîroka "Emer di îlona 1967an de li Sersengê, li Kurdistana Iraqê, berhev kir.

Serseng navçeyeke bedew e, ketiye sî kîlometiriya rojhilata bajarê Amadiyê, paytexta mîrîtiya bi navûdeng ya Badînan. Serseng hezar û sed metre ji nîveka deryayê bilindtir e û navendeke havîngehî ye.

Çîrokbêjê min Muhemed Feqî Xidir bû. Wê demê bi qasî pêncî salî emrê wî hebû. Di eslê xwe de xelkê navçeya Zêbarê bû; lê wê gavê li gundê Bamernê dijiya û li we derê wekî çîrokbêjekî hêja hatibû nasîn û deng dabû. Dema ku min ew dît, wî li Sersengê wekî nobetdarê şevê kar dikir.

Min ev çîroka di paşî nîvrojeke xweşik de li mala bedew ya Ehmed Kittanî, mudirê îdara geroka (turîstan), girte ser teypê. Ehmed Kittanî neviyê zanayê kurd Sadiq Bahaeddînê rehmetî ye.

Di dirêjiya mayîna xwe a li Sersengê de, ez mîvanê malbata Ehmed Kittanî bûm û her ew binemala bû ku bi dilovaniyeke pirr mezin dagirtina vê çîrokê ji min re pêk anîn.

Çîroka Emer ku niha em dixwazin pêşkêşî xwendevanên xwe bikin, yek ji wan çîrokên navdar e ku Kurd pirr jê hez dikin. Di vê çîrokê de me çêtirên cur bi cur hene ku di libsê mirovî an heywanî de neqsên bi yûm an bedyûm dileyizin.

Kurdiya Muhemed Feqî Xidir kurdiya zêbarî ye, ku ew bi xwe jî li ser devoka badînî, yek ji zaravên kurmanciya jorîn tête hejmartin.

Ji bona hêsaniya xwendinê, min ji bo nivîsandina metnê çîrokê tîpên (alfabeya) «Hawarê» bi kar aniye. Bi tenê min ji bo nivîsandina dengên taybetî yên vî zaravî çend nîşanan lê zêde kiriye.

Joyce Blau

1992

'Emer

Dibêjin wext'ekî ĥakimek hebû li nav Bota. Kurek hebû digot'ê 'Emer, çu zuriyeta dî nebû. Dibêjin wusa çê bû, jina ĥakimî mir. Pişt'î hingê sal wext'ekî pê ve ço, ĥakim jî mir. Wezîrê wî, yê milê rast'ê, tişt'ê ĥakimî hemî bo xo hel girt' u 'Emer der ê xist'e bajêrî u delal gazî kirin.

Got'ê: Gazî ken, çi kesê ez pê biĥesiyem nanekî bidête 'Emerî, yan cilkêt wî bişot' an sexbêra wî biket, ez dê malê wî ĥeciz kem, keme mîrî u dê wî jî hebs kem.

E ma'lom e mirovêt 'Emerî gelek hebûn; çavê xo didayê. Ĥeçî kesê pê diĥesiya, daçît ketê hebsê u malê wî ĥeciz diket bo mîrî. 'Emer rojekê ma texmîna xo kir u got'î: «Babo, hûsa çê nabît, mirovêt min jî hemî di girara min da kelîn, lazim e ez bo xo der k'evim, çime 'erdekî, bo xo bibime rêncberê êkî, şivanê êkî, gavanê êkî, bo min çêt'ir e, ez li vî bajêrî nemînim.

'Emer ra bû çend p'arek bo xo ji mirovekî xo wer girt'in bi dizî ve, li sûkê dane bi nan, tûrbek bo xo peyda kir, kire tûrbê xo nanê xo bi milê xo ve kir bajêrê Bota der k'eft'.

Tengizî dinyayê bû, heçî li 'erdê li 'Emer bû êvarê, hek'o rêka wî bi gundekî k'eft' dê çît di gundî da rûnît. Hek'o rêka wî bi çu gunda nek'eft' dê çît serê xo bi berekî ve nîtin, gomtelekê axê li 'erdekî dinevît ĥeta sipêdê. Dê dest' havêt'ê nanekî bo xo ji çentka xo înîte derê u xot u dê çîte rêka xo.

Dibêjin, 'Emerê me ço, şevekê ma li çolê, sipêdê rabû, dinêrîte çentka xo sewkeka tê da may. Sewka xo xar u da rêkê. Havîn e u germ e. Ĥeta bangê nîvro 'Emer ço u bi ser çu gunda çu ava hel nebû. Birsî jî bû u gelek tehnî jî bû. Her ço ço, ĥeta sa'etek dimînit bo meẍreb. Li çolekê li deşt'ekê devê bîrekî, xo bi bîrê ra dinît gelek avê ve dixot, gelekê birsî bî, 'Emer ne hişyar dibît agah ji xo namînît.

Hindek k'arwanê t'icar da tinîne ji bîrê pê hel, t'icarêt Misriya. Serokê t'icara Ẍolamê xo virêdikete avê u dibêtê: «Bo min goskî bibe âvê, tu bara nedeyne, ev Ẍolamêt dî bila bara da nin, tu here bi min re goskê bibe avê bîne, ez gelekî tehnî me.»

Ẍolam jî diçîte ser devê bîrê, berê xo didete ew zelamê t'aze ma'lom e kurê ĥakimî ye. Zelam e, kamlana wî ye, yê li hevdê, zelamekê gelekê t'aze ye, u hindî gazî diketê, berê xo didetê, yê bi roh e, hêve qelb det, hêve qelb det, agah ji xo nîne 'Emerê me.

Dibêjin Ẍolam pê ve giro bû ḧeta çarekek ma bo meẍreb, sê çareka ma pê ve.

Got'î: - Babo, ez da biçim, aẍayê min dê xebera bêjîte min.

Rabû, goskê xo têjî av kir, ço nav barxanê, aẍayî gazî kirê: - Malik mîrat, eve ṟêka vêre u ser devê bîrê hemî pênc deqîqe ne, eve sê çarekêt sa'etê ye, tu k'î ve çobûy? Te çi ḍikir? Îna got'ê: - Ez benî ḧaloḧewalêt min u zelamekî eve ne, li ser devê bîrê. - Kuṟu hey nabe. - Belê, wella.

Dibêjin, t'icarî dest' havêt'e ava xo vexar u hevalêt xo hemî ṟakirin u zelam birin, betaniyek bir, 'Emerê me kire tê da u bi çar dest' zelama girt' u îna dana nav barxanê. Cihek bo çê kir u hindek nivînik havêt'ine ser.

Dibêjin wext'ekê şevê 'Emer hişyar bû guhê xo detê. - «Babo, eve ez yê li nav mirova, ez ê li ser devê bîrê bûm, çu mirov li def min nebûn. Dingo dinga mirova ya dihête min, u boşatiya dewar u girgirê dewara u hêrênê wan u...»

Ewî jî, betanya xo li ser çavêt xo ṟakir, berê xo detê dewra xo ya girt'î, yêd ṟûnîşt'ine xarê, yê çaya xo ve dixon. Îna 'Emer got': - Ez ê birsî me.

T'icarî got'î: - Tişt'e nake.

Rabûn, qazankêk îna hindeka da na ser piṟomîzekê, hek'o tabaxekê pîçeka biṟincî kirê, şorbêka rohin bo têjî kaskeka çayê kir dayê ḧeta eh! nêzîkî neh deh deqîkeka, careka dî hindeka dî daye ḧeta ko 'Emer têr kir. Her pîç pîç dayê .

Got'ê: Navê te bi xêr?

Got'î: Navê min 'Emer e.

- Tu xelkê k'î ṟe y?

Got'î: Wella, ez nizanim.

- Tu kuṟê kê y?

Got'î: - Ez nizanim.

Got'ê: - Pa, tu çi dikey li vêrê?

Got'î: - Wella, ma ejî hema...ṟîzqê min jî wê hat'iye vêrê u ez wê xo dibînim li vêrê.

- Dê k'î ve çî?

Got'î: - Wella, dê bo xo tiçime 'erdekî, bo xo bime ṟencberê êkî, min kesê xo nîne, ẍolamê êkî, an 'emelek, şolek tişt'ek bi dest' min bik'evît, dê bo xo kem.

Îna got'ê: - Pa, dê ligel me were Misrê. Li Misrê şol yê zehf e, tu ḧez dikey diçîye nik êkî bi heyv, u tu ḧez dikey jî dê li bajêrî şol key bi yewmiya, dê çavê xo jî deyne te ḧeta em diçîne bajêrê Misrê.

Got'î: - Eve gelek baş e.

Bêjin, mane li wêrê wê şevê. Sipêdê zû dest' havêt'ê karwaniya barêt xo bar kirin, u eve ko mezinê wan dibênê Xace Eḧmed, 'Emerê me digel

Xace Eḧmedî diçin ḧeta êvarê, êvarê datinin. 'Emer mirovekê zîrek e, yê zeberdest' e, ḧeta ẍolamêt dî yê dewarekî vedikin, ewa yê do bara vediket. Dibêjin, keyfa t'icarî gelek pê hat'. Ḧeta çon, çone ser Nîlê Misrê. Li wêrê Xace Eḧmed zivirî, îna got'ê:

- 'Emer.

Got'ê: - Çi bû, ya Xace Eḧmed?

Îna got'ê: - Heko ez qisekê bo te bêjim, ka dê çawa kevîte dilê te?

Got'ê: - Dê bêje, ez benî.

Got'ê: - Heçika ez im, tu malê va t'icara dibînî? Hemî yê min e. Ew şolî pê dikin. Feyda jî bo min u wa bi nîvî ye. Min çu 'eyal u zeydayî jî nîne. Ma çawan e? Ez bibime babê te u tu bibiye kurê min. Diçîne mal, sipêdê dê herine ser şola xo li ber dikana xo. Kesek hat' tişt'ek bo xo bir, tê li ser hêsêba wî binivîsî. Tu qelemî dizanî. Kesek jî hat' deynê xo da u bo xo tişt'ekî dî bir dîsanekê tê li ser nivîsî. Êvarê dê herine mala xo.

Îna got'ê: - Ez benî, Wella, eve xoş şol e.

Mîrê Misrê, keçeka wî hey dibênê Seracul Misrê. Jinkeka hinde beraz e ya zîrek e ya şajî' e. Qesreka bo xo ava kirî li rexê bajêrî. Heçî kesê bo xo biçîte t'icaretê, li 'erdekî, ew wext'ê dê çîteve dê bo xêlatekî bet u dê çîte nik Seracul Misrê dê p'irsiyara jê ket li filan bajêrî çi hebû çi nebû... Hewe çi dît', çi qewmî li wêrê? Yê çawa bo ew 'erd?

Dê hema bo xatira hindê ya hat'î rûnişt'iye xarê li wêrê. Xace Eḧmedê me gelek bi keyf k'eft' ji ber 'Emerî. Wê şevê ço venivist'in. Sipêdê, bîra wî nehat'ibû biçîte nik Seracul Misrê, ḧeta ko roja sê. Hevalêt wî hemî çon u zivirîneve. Seracul Misrê got': - Babo, eve Xace Eḧmed nehat'e nik min, eve ewî çu xêr e?

Dibêjin, rojê sê Xace Eḧmed dimînit zihna xo diket: - Babo, ez neçome nik Seracul Misrê, pa ji Xodê bawer bike ka dê çi li mi ket an dê çi înîte ser serê min.

Dê ra bit, diyarîyeka baş ya bo kiriye nav qedifekê u dest'ê xo girt'î, 'ebaya xo yê havêt'iyê ser milêt xo u ço dîwana Seracul Misrê.

- Selam 'alekom, 'alekom as-selam, bi xêr u selamat, ya Xace Eḧmed. Ez benî, eve sê roj e tu hat'iyeve u te negot' da biçime nik Seracul Misrê. Tu bo min nabêjî kanê ta'xira te ji ber çi bû? Kanê çi li te qewmiye?

Got'ê: - Wella, ya Seracul Misrê, tu lomeyî li min neke. Ez mrovekê pîr im. 'Umrê min yê çoye ḧeftê ẍaliyê. Xodê Ta'ala çu zeydeyî nedaye min. Ez vê neqlê jê hat'imeve ji vê seferê, Xodê Ta'ala, kurikekî daye min. Vêca, ji keyfa kurikî, min tu ji bîr kirî.

Îna got'ê: - Wellahî, ya Xace Eḧmed, vêca ez lazim e, ez xelatekê bideme kurê te u ez navekî danime ser.

Îna got': - Ne, ez benî, naxazîte hindê. Elhemdulillah dewlet serê te,

min mal jî zehf heye. Heko tu navekî jî daniye ser li nik xo bêje min navê wî kuṟî eve dê keme ew.
Got'ê: - Ne, xidam.
Got'ê: - Belê.
Got'ê: - Here, pêçulkê kuṟê Xace Eḧmed bi helgirê u bîne.
Xace Eḧmed got'î: - Babo, dê çi çît pêçulkê hel giṟîtin, ne ez benî ez bo xo dêçim, înim bila xidam naçîtin.
Xace Eḧmed mecbor bû, ço mal.
- 'Emer.
Got'ê: - Belê
Got'ê: - Babo, ṟabe. Da biçîne nik Seracul Misrê.
'Emerê me jî ṟabû, k'arê xo kir. 'Emer zelam e u kuṟê ḧakimî ye, lawekî taze ye, kamlanê wî ye, yê zeberdest'î ye, lawekî gelekî t'aze ye çirok dibêjit.
Dibêjin, wext'ê hat'in, bi jor k'eft'ine mezelka Seracul Misrê, Seracul Misrê ma tê fikirî.
Îna got': - Xace Eḧmed.
Got'ê: - Belê.
Got'ê: - Eve ye kuṟê te?
Got'ê: - Belê.
Got'ê: - Xodê kerema digel te kirî, kuṟek da te yê bi ṟih u simbêl, yê zelam, vêca te çi divêt, Wella tu ê heqq î, naheyê nik min Xace Eḧmed.
Got'ê: - Belê.
Got'ê: - Ev kuṟê he bo te baş nîne. Ev kuṟ bo min e, baş e.
Nawêrît dê çi bête Seracul Misrê.
Îna got'ê: - Bila.
Dibêjin 'Emer hêla bo Seracul Misrê, Xace Eḧmed xatira xo xast' u derk'eft'.
Dibêjin, Seracul Misrê ṟa bû, di qesrê da li ṟex mezela xo ve, ẍorfek bo xalî kir u ṟaêxist'. Textê wî danande wêrê, nîvinkêt wî bo danan, 'ebdek îna da na ber dest'ê wî.
Got'ê: - Eve 'ebdê te, çi gava çu xidmeta tu ḧewce biyê, bêje 'ebdê xo da bo te biqedînîtin.
Îna got'ê: - Belê.
Heṟo pişt'î t'êşt'a nîvṟo, Seracul Misrê dê sa'etekê çîte nik 'Emerî. Sohbeta wî u bi şevê jî pişt'î şîvê sa'etekê dê çîte def li sohbetê wî ṟûnît u dê hêlît, tiçîte mezelka xo.
Dibêjin, li qesra Seracul Misrê, li mezelka 'Emer, meydaneka dewar firot'inê dik'evîte ber pencerkê mazad e. Li wî 'erdî dewara mazad dikin.
Dibêjin, sipêdekê 'Emer yêt pencereka xo da berê xo dayê ḧesp'ek hat'e

mazadê. Berê xo da ḧesp'î, ḧesp' gelekê t'aze ye, gelekê pêşkêş e, dilê wî gelek ço ḧesp'ê, u pa ma'lom e, çu nîne pê bik'iṟîtin. Bîra wî li mala babê wî hat', hinde di zengîn, kuṟê ḧakimî u evṟoke ya'nî ko dilê wî biçîte ḧesp'ekî u neşêtin bo xo ḧesp'ekî bik'iṟîtin. 'Eciz bû, ma di 'eciziya xo da. Dibêjin, ṟengê wî bê ser u ber bû, u k'eft'.

Di wî wext'î da, Seracul Misrê bi jor k'eft'e mezelkê, ma dî 'Emer fikirî.

Îna got'ê: - 'Emer.

Îna got'ê: - Belê, ya Seracul Misrê.

Got'ê: - 'Emer, çi qusirî li te heye? Kê deyn kiriye te? Kê dilê te hêla ye?

Got'ê : - Ya Seracul Misrê, dewlet serê te ne qusirî li min hene, u na kesê deyn kiriye min.

- Pa, te çi ye? Tu nabêjiye min bo ṟengê te k'et'iye?

Îna got'ê: - Wella, ya Seracul Misrê, ejî nizanim.

Îna got'ê: - Bo min bêje ṟast'iyê.

Îna got'ê: - Wella, ya Seracul Misrê, min berê xo dikire meydanka dewara, ḧesp'ek hat'e meydanê, ḧesp'ekî gelek t'aze dilê min gelek çoyê. Ez mam, min texmîna xo kir u ez di texmîna xo da gelek 'eciz bûm, ṟengê min k'eft'.

Îna got'ê: - Ma, te divêt ez bo te ḧesp'ê bik'iṟim?

Got'ê: - Belê.

Gazî 'ebdê wî kir.

Got'ê: - Belê.

Got'ê : - Here mazadê, mazada ḧesp'î, çu çendê zeyde bike, wî ḧesp'î bik'iṟe bo 'Emerî.

Got'ê: - Belê.

Dibêjin, 'ebdê me ço mazadê. Ḧesp' havête mazadê ḧeta ko li ser 'ebdî ṟawest'iya bi sed zerêt zer, mazada ḧesp'î. Serê ḧesp'ê xo girt' u îna qesrê.

Xolamekî dî îna teslimî dest'ê wê kir.

Got'ê: - Eve li extexanê, ji vî ḧesp'î ṟe tu mes'ol î. Av dey bi xorînî cehî bideyê kayê bideyê. Ez pê biḧesiyem ṟojekî ze'îf bû, an tehnî bû ez dê ṟoha te helkêşim.

Got'ê: - Belê.

Ḧesp'ê xo kire extexanê. Ḧafîrê wî bo t'aze kir. Têjî k'a kir, 'ebdê wî virê kire sûkê bo zînekî da çê kirin u şîrek u mertalek, u ṟûmek zêrî u kunzîroyêt wî dirûst' dikin, tertîba siyarêt berê ne.

Îna got'ê: - 'Emer.

Got'ê: - Belê.

Got'ê: - Eve ḧesp'ê te, eve 'ebdê te, eve zîn u ṟûm u şîr u mertalê te. Her

roj sipêdê, ḧecî wext'ê tu ḧez key, bêje 'ebdê xo ḧesp'ê te bo te çê ket, siyar be, here bo xo bigeriye ḧeta êvarê. Êvarê, were qesda mala xo bike.

Got'ê: - Belê.

'Emerê me dest' havêt'ê, heroj sipêdê zu, 'ebdê wî da ḧesp'ê wî bo çê ket da siyar bît tiçîte beriyê. Geriyetin ḧeta êvarê. Çi eger xezalek kuşt'ibe eger kevrîşkek kuşt'ibe, an hek'o çu neînabe, êvarê da qesda mala xo ketin, u diçît li oda xo tinîte xarê.

Dibêjin, rojekê sed siyarêt Îranê hat'ine bajêrê Misrê, u qaẍezek îna ji nik şahê Îranê ko: Ez yê ḧewceyê hindek malî me bo min virê ke, yan bo min vî malî def'a ken u virêken, yan k'arê xo biken ez u hûng dê herbê keyn.

Roja paşt'ir, mîrê Misrê caba mezinêt Misrê hemiya virêkir, içtima'a xo kir: - Hon, çi dibêjin, em dê şerê Îraniya keyn, an dê evî malî deynê?

Xelqê Misrê got'ê: - Babo, em neşeyn şerê Îranê bikeyn. Me quweta Îranê tê da nîne. Em neşeyn hezar mrova bideyne kuşt'in, mal jî do cara hind biçît, u telefet çar cara hind bibît. Na Wella, em dê evî malî def'a keyn, bila bo xo biben u biçin.

Dibêjin, dest' havêt'ê ew malê ko şahê Îranê ji Misrê xast'î vêk êxist', bi çil dewar u hêstira kir u teslîmî siyara kirin, u dibêjin siyar çon.

'Emer êvarê hat'eve, zanî ko siyarêt Îranê ev mala bir u çon, got'î:

- Babo, ev mal mîratêt Misriya çi kir?

Berê xo dayê Misrê ya baş e, nêzîkî bîst' milionekan e, ev mala şahê Îranê jê stand, kesekê negot' : Hema em qebûl nakeyn, hema em nadeyn, kesekî xo 'eciz nekir? Nivist' ḧeta sipêdê. Roja paşt'ir ji ne ço. Ya sê, 'ebdê wî dewarê wî bo çê kir, li dewarê xo siyar bû u ço.

Ma'lom e 'eskere dê çît. Sa'etekê avekê dê bînît, dê deynît. Ḧeta roja paşt'ir bi rê dik'evit, ne wek'î k'arwanî ne hema dê hajon u dê çin. Dibêjin, 'Emerê me ço. Ji dûr ve siyarêt Îranê dît'in. Dibêjin çepek lê da ko ew nebînin, berî k'eft' u ço serê girkekî. Rû nişt'ê xarê, rima xo çikiland, ḧesp'ê xo lê girê da, sebîlka xo tê kir u zilkekê şexatê ber dayê, sebîlka xo kêşa, ma li ser enîşka xo lê fikirî. Ḧeta siyarêt Îranê nêzîk boyn. Zabitê wa yê li berî, dest' havêt'e dûrbîna xo u berê xo da deştê, temaşey deştê kir, zivirî, got'e hevalêt xo:

- Ez dibînim siyarek yê li serê girkê heye, siyarekî bi tenê. Bila êk biçît binêrîte eve çi tov siyar e.

Siyarek ji nav siyarêt Îraniya veqetiye, ço nik 'Emerî.

- Selam 'alêkom, 'alêkom esselam. Tu çi kesî li virê, babê min?

Got'ê: - Ez benî, wella, ez qati' tarîq im. Ez dihême serê riya, dinêrimê kerwaniyek bihêt ser gundekî, pazê wan, heywanêt wan bem, 'eyalê xo pê bi xodan kem, u rizqê 'eyalê min ye li ser vê çendê şolêt xirab. Hon, çi kes in?

Got'ê: - Wella, em 'eskerê Îranê ne.

- Ê, ez benî, hon ji dewlêt serê xo, tişt'ekî bidene min u werin herin bibûrin, ez dey nekeme hewe.

Îna got'î: - Babê min, ez dêçim bêjime zabitî ka dê zabit çi bêjît, 'esil zabit e kumandar e, hek'o kumandar bidet ḧez ket hemiyê bidete te, kes ji me neşêt çu bibêjîtê.

Îna got'ê: - Bila, ez benî.

Dibêjin, siyar zivirî ço berahika 'eskerî. Zabitê wa, kumandarê wa, pirisyar jê kir: - Kî ye?

Got'ê: - Wella, ez benî, qaṭi' ṭarîq e, yê dibêjit tişt'ekî bidene min, u werin bibûrin, ez dey nekeme hewe.

Got'î: - Kerê, kurê kerî, êk u em sed u êk siyar, em rabin tişt'ekê bideynê ḧeta rêkê bidete me u em biçin. Go: Here, bêjê wella em filsekî nadeynê, bila xo li ser rêka me vedetin u xo nedete teleftin u çi 'eciziyê nebû me u nebû xo çê ketin.

Dibêjin, siyar careka dî zivirî hat'ev nik 'Emerî.

- Ê, ez benî, çi got' kumandarê hewe?

Got': - Wella, yê got'î, em filsekî nadeynê u bila li ser rêkê jî ra bit u xo ji rêka me ve dit' bê 'eciz.

Îna got'ê: - Ez benî. Pêş min ve silama li kumandarî bike, u bêjê : Babo, du ḧesa bo hewe u êk bo min.

- Kuru, çu nadine te.

Got'ê: - Ez benî, tu qasid î, ez çi bibême te divêt tu biçî bibêjî kumandarî u ew çi dibête te divêt tu bikey bibêjiye min. Eger tu west'iyay, bila siyarekê dî bihêt.

Çû nik kumandarî.

- Çi got'?

Got'î: - Ez benî, wella yê dibêt ḧeseka vî malî bo min u du bo hewe. Dê keyne sê ḧesa, du pêşk bo hewe u êk bo min.

Got'î: - Kerê kurê kerî. Em filsekî jî nadeynê.

Siyarekê dî virê kir.

Got'ê: - Bêjê, bila xo li ser rêka me vedet, wella tu bibêjê yêk fils em nadeyn.

Siyarê dî ço nik.

- Selam 'alekom, 'alekom esselam.

Got'ê: - Babo, kumandarê me yê got'î, xo ji ser rêkê vedet, em çu nadeyn. Bo me 'eyb e, sed u êk siyar u ew êkê bi tenê, ḧeta ko ew tişt'ekî ji me bistînîtin? Yan kuşt'ina me ye, yan kuşt'ina wî ye.

Go: - Ez benî, qeydî nîne. Bila nîveka malî bo min bît u nîveka wî bo hewe.

- Kuṟu, 'ezîzê min, çu nadeyne te!
Got'ê: - Ez benî, tu qasid î. Ez çi dibêjime te, divêt tu wê bêjiye kumandarî.
Ço berahîka kumandarî.
- Ê, çi got'?
Got'ê: - Ez benî, yê dibêt nîveka vî malî bo min u nîveka wî bo hewe. Werin, herin, ez dey nakeme hewe!
Got'î: - Wa! Ev mirov yê dîn bî!
Got'î: - Neh, deh siyarek, herin, şîrekî di serî werînin u ḧesp'ê wî jî bînin, bikene nav dewara de.
Dibêjin, deh siyar ji nav 'eskerî ve qetiyan u çone 'Emerî. 'Emerî dît' wext'ê ko siyar hat'inê. Îna 'Emerê me jî ṟa bû, dest'hevsarê dewarê xo zebt kir, u lix̄avî bi ser da havêt', u pê xo havêt'e ṟikêbê u ji girkî bi xar k'eft' u hat'e berahîka wa deh siyara. Li dû her deh siyara ziviṟî. Pênc her li wêrê kuşt'in, u pênc çone berahîka siyarêt dî u bo şeṟ. Dibêjin, 'Emerî nîveka wa siyara kuşt'in, yêt dî revîn. Malê xo u tişt'ê xo hemî hêlan u çon.
'Emerî dest' havêt'ê ewêt hat'ine kuşt'in, ḧesp'êt wan jî lix̄avêt wan di ser da havêt'in digel çil hestirêt ko malê Misriyê lê kirê ko dê bo şahî ben, dane berî xo, u hat' qesda bajêrê Misrê kir. Wext'ê dihêt nêzîkî Nîlê Misrê, berê xo didete pîremêreke ji dûriyê diçîtin kerê wî yê li berahîkê. Tişt'ek yê li kerî dê bo xo bête sûke bifiroşit'in, bo xo bidete bi sê çar kurîşeka u bidete bi nan bo 'eyalê xo.
Îna got'ê: - Zelam!
Got'ê: - Belê, ez benî.
Got'ê: - Van dewara nabey teslîmî Mîrê Misrê bikey? U ez dê zêrekî zer deme te.
Got'ê: - Belê, wella, ez benî, bo çi ez nabim?
Her serê kerê xo girt', ewî zêrek kire dest'î. Dewarêt xo dane berê kerê xo, da dev ṟê, dane ber şiftana u li Nîlê Misrê derbaz bû u ço ṟexê dî. Berê xo bidete, dewrê bajêrî, kuṟê qazî, u kuṟê wezîrî, her dûke dihêyn, her êkê li ḧesp'ekî siyar e, şîrê wî yê di koşê da u di k'ar kirine keşxane.
Gazî kirê: - Ha, zelam !
Got'ê: - Belê.
Got'ê: - Çi ṭov dewar in?
Got'ê: - Wella, ez benî, ez nizanim, zelamekî yêt teslimî dest'ê min kirin, u got'î: Bibe teslimê dest'ê Mîrê Misrê bike.
Her du bazîne, ez benî serî, xodanê kerî da ber qamçiya.
Got'î: - Ez benî, bi xatirê Xodê, hun bo çi we dikin? Min çi li hewe kiriye?

- Kerê kuṟê kerî, ma tu nizanî em her du boyn, ez u kuṟê qazî.

Kuṟê wezîrî got'ê. - Ez benî, hon bo çî di min qotin?

Dibêjin, xodanê kerî, dewar hajot'in, kuṟê wezirî bi ṟexekî u kuṟê qazî bi ṟexekî u qesda sêra ḧûkmetê kir. Dibêjin, dewarêt xo birin u kirine ḧewşa serayê, u cab jî da Mîrê Misrê ko:

- Tu pê bizane, ev malê ko te daye şahê Îranê, mirovekî jê sṭandî, eve înandin.

- Kî ne?

- Kuṟê qazî u kuṟê wezîrî yê digel.

Ḍibêjin, gazî kirine u xodanê kerî jî gazî kir.

Îna got'ê: - Hewe, ev male sṭandiye ji siyarêt Îranê?

Got'ê: - Belê.

Got'ê: - Xodanê kerî.

Got'ê: - Ez benî, na wella, min eve nedît'îne. Belke ḧosa bît, belê min eve nedît'ine, siyarekî bi tenê bû. Yê hat'î teslimî min kirin, u zêrekî zer yê daye min u got'î: «Bibe serayê» u min yêt înayn. Ezî derbaz bem li Nîlî, min ev mrova yêt dît'in, ez gelek yê qotayem jî u got'î: - Em boyn.

Min got'ê: - Hema hon bin hek'o ew nebûn teslimî min kirin.

Îna got'ê: - Herin ḧeta sobehî.

Dibêjin, dewarêt xo barêt wan havêt'in u dewar kirine di extexane ve. Dîwan xelas bû, her kesek ço mala xo ḧeta ṟoja paşt'ir. Roja paşt'ir, delal viṟêkirine li ser minarê.

Got'î: - Heçi kesê dişêt xo li ser pişt'a dewarê xo bigirît, lazim e sipêdê bihête nik Mîrê Misrê, kanê kê ev kiriyare kiriye.

Meclîsê xo girt', kuṟê wezîrî dane ṟexekî u kuṟê qazî dane ṟexekî, u xodanê kerî jî dane dev kuṟê qazî.

Got'î: - Xelqê Misrê çon.

Heçi siyarê ço, got'ê: - Eve ye?

Got'ê: - Naxêr.

Ḧeta dibêjin xelqê Misrê hemî gazî kir u kes nema di bajêrî da. P'irsiyar kir: - Kî maye li bajêrê Misrê, kî nemayê?

U ew Xace Eḧmedî ko 'Emer înandî, îna got'î: - Ez benî, wella, ez pê neḧesiyam kesek maye di bajêrê Misrê da, belkê bes keça te ẍolamekî ḥey, dibênê 'Emer. Bes ewe may, hek'o kesê dî, em pê neḧesiyayn.

Dibêjin, du şorta virêkirine ber derê qesra Seracul Misrê u got'ê:

- Babê te yê emir kirî, ew u ẍolamê xo bihênê vêrê.

Got'ê: - Baş e. Herin, em dêheyn.

Dibêjin, Seracul Misrê ṟabû, gazî 'Emerî kir, her du dewarêt xo çê kirin, siyar bûn u qesda sera Mîrê Misrê kir, li nik Mîrê Misrê.

Ḧeta ko pîçek nêzîk boyn, xodanê kerî got'ê: - Ez benî, bi şikla ve

siyarê berî jî nîne, belê wella, yê dûv ṟa bi 'eqlê min ew siyar e dewar teslimî min kirin.

Hat'in, ji dewarêt xo peya bûn u hat'ine meclisê, cih danê, her kesek ṟûnişt'e xarê li ser kursîkekê.

Îna got'ê: - Ez benî, ev mrov e ko teslimî min kirin ev dewara.

Gazî kirê: - 'Emer!

Got'ê: - Belê.

Îna got'ê: - Te ev mala ji 'eskerê Îranê sṭandiye?

Got'ê: - Belê.

Îna got'ê: - 'Emer, seḧeta te xoş.

Ê nêzîkê neh deh deqîqeka bê deng bûn. Mîrê Misrê paşî got': - Ehlî meclisê kanê 'Emer ji ṟengî çi ye, da em 'Emerî xelat bikeyn. Ez çi bideme 'Emerî bû ev qenciya gel me kirî, u ḧosa yê zîrek bît u şeci' bît.

Xace Eḧmedî got'ê:

- Hek'o dê qencîkê hey, digel 'Emerî keça xo Seracul Misrê bidê.

- 'Emer

Got'ê: - Belê.

Got'ê: - Were dest'ê min, min Seracul Misrê da te.

Îna 'Emer ço dest'ê Mîrê Misrê u Seracul Misrê bo xo ṟe qebûl kir u, ez ẍolam, dest' havêt'e bo 'Emerî kire dawet.

Ḧeft şev u ḧeft ṟoja u dehol u zirne u 'Emer ṟûnişt'e xarê di mala xo ez benî, li ser malê.

Dibêjin, ṟojekê qiralê Romê, ḧeft êlçiyêt wî hat'in, hat'ine bajêrê Misrê.

Got'ê: - Mîrê Misrê, xerc u xeraca me ye ḧeft sala ye te nedaye. Yan xerc u xeraca me, ye ḧeft sala, yan şerî bikirin u em dê şerî keyn.

Dibêjin, careka dî içtima' xo kire ve. Gazî mezinêt Misrê kir.

Got'ê: - Babo, em neşeyne şerê Romê bikeyn u me hemî wext'a jî xerc u xeraca xo daye Romê. Ḧecî wext'ê em ḧewce bibînin jî, çi şolê em ḧez dikeyn bo me diken. Em dê dest' havêjîne, malê wane dê bo lêk deyn, bila nûka biben.

Dibêjin, dest' havêt'e xerc u xeracê ḧeft sala bo qiralê Romê lêk da. Dê k'î bet, dê k'î nebet? Wezîrî ḧez dikir Seracul Misrê bidete kuṟê wî ewî got'î: - Mîrî yê hu kiriyê he, ew bo nedaye, vêca gelek kerbêt wî ji 'Emerî ve dibin.

Îna got'î: - Eger, 'Emerê zavayê te, vî malî negehînte Romê dest'ê qiralî, kesê dî pê çê nabit.

Îna gazî 'Emerî kir. Îna got'ê:

- 'Emer.

Got'ê: - Belê.

Got'ê: - Babo , axir tu jî wek'î kuṟê min î. Zavayê mrovî u kuṟê mrovî

ferq nîne. Eve xerckeke Romê yê li ser me ya ĥeft sala ye. Divêtin tu vî malî bigehîne Romê.

Îna got'î: - Wella, ez nabem.

- Bo çî?

Got'ê: - Ma, ez dê çawa bem? Eve he, çil bar tê hene, çil hêstira bik'ire, bîst' zelama jî bidet digel. Her zelamekî du hêstira dewarêt xo bo xodan ken, barêt xo bar ken u ejî dê li dewarê xo siyar bim u dê bi rex k'evim u diçim.

Got'ê: - Tu ê heqq î. Dê here. K'arê xo bike, ĥeta îniyê. Şembiyê barêt xo bar ken u herin.

Dibêjin, xatirê xo ji xezûrê xo xast' u hat'eve geleke 'eciz. Seracul Misrê ji nû ya înandî u gelek divêt, u ma'lom e rêkeka geleke dûr e, bi dewarî, du sê heyva îĥtimal e digehinê u du sê heyva dê hêneve. Pênc şeş heyv gelek in, gelek 'eciz bû di dilê xo da, u neşêt xezûrê wî ye, dê çi bibêjîte? Ço ve gelekê 'eciz.

Seracul Misrê got'ê: - 'Emer, te çi ye?

Îna got'ê: - Wellahî, Seracul Misrê, ĥaloeĥewalêt babê te eve ne, got'î: - Ma vêca em çi bikeyn, bab e ?

- Wella, ez dişêm tu neçî! Em we bikeyn ko tu neçî! Bes, me navêt. Em bê xeberiyê babê xo bikeyn dê keyfa geleka pê hêt, dibêjin eve mrovekê wusa ye: evroke, tu ĥewce boye bi şolekê gûhê xo nadetê. Qeydî nîne. Ez dê rabim, k'arê te kem, nanê te pêjim, ĥeta rojê înî şembî paşî kes ji Xodê mestir nîne.

Dibêjin, Seracul Misrê dest' havêt'ê, k'arê 'Emer kir, nanê wî bo peht, cilk'o milk'o tişt'êt wî u heçi tişt'ê ko ye lazim bît bo rêkê ĥeta digehîte bajêrê Romê yê Qiralî. Dibêjin bo dirûst kir. U rojê şembî her çil barêt xo bar kirin u bîst' xulamêt wî digel dewara, ewî jî ĥesp'ê xo çê kir u li siyar bû, u yalla. Eger li rojekê u eger li heyvekê, dibêjin rojekê daxilî bajêrê Qiralî bûn. Tişt'êt xo birin, birine sera Qiralî. Teslîm pûstê wî kir u bir dayê u got'ê:

- K'î înay eve?

Got'ê: - Mirovekî hat'î, zavayê mîrê Misrê ye, dibênê 'Emer.

Gazî 'Emer kir. Wext'ê ço pêş Qiralî, dibêjin reĥma Qiralî wusa k'eft'e 'Emerî.

Got'ê: - Tu naçî ĥeta sê heyvêt dî, dê li nik min bî.

Got'ê: - Belê.

Dibêjin rû nişt'ine xarê deh roja li bajêrê Romê. Roja dehê, 'Emer ço nik Papay.

Got'ê: - Eger tu merhemetê bikey, îzna min bidey, ez dê çimeve. Eve sê çar heyv e ez ji mal hat'im, di dilê wan jî xûşxûş k'evîtin. Rêkeka dûr

e, nizanin, dibêjin ka hat'ine kuşt'in, şêlandin ka çi lê hat'in. Eger tu îzna me bidey merhemetê bikey em dê sobahî çîneve.

Hindî hat'e 'Emerî, 'Emer got': - Naxêr, ez ḧez kem biçim.

- Dê her çî 'Emer?

Got'ê: - Belê.

Got'ê: - Were dest'ê min. Min keça xo da te da tu bibiye zavayê min da car bo cara tu bihêye nik min.

Ço dest'ê Qiralî. Keça wî bo xo jê qebûl kir u hat' li binê malê, ṟa west'iyave, careka dî ço ve dest'ê Qiralî. Keça wî hibey wî kireve u ziviṟî hat'eve.

Got'ê: - Tu bo çi nabey?

Got'ê: - Ez neşêm bibem. Min jin hey, dê bo çî zehmeta bo xo çê kem, ez gelek memnûn im ji te.

Dibêjin îzna xo ji Qiralî xast', u ṟoja paşt'ir dewarêt xo çê kirin, siyar bûn k'eft'ine ṟêkê qesda bajêrê Misrê kir.

(Min xeberek yê ji bîr kirî).

Roja ji bajêrê Misrê der k'et'in, Seracul Misrê nivişt'iyê da bû u got'î:

- 'Emer vê nivişt'iyê bike di bêrîka xo da. Çu qonaẍa tu çoyê, vê nivişt'iyê bîne derê, berê xo bike, tu dizanî kanê çu li bajêrê Misrê heye, u çu nîne.

Îna got'ê: - Belê.

Ji bîra wî nehat' çu ṟojekê berê xo bidete nivişt'iya xo. Ḧeta ṟojekê dihênê bi ṟê ve, da na 'erdekê bi mêrg, yê bi sîber aveke taze.

'Emer got' hevalêt xo: - Em dê dehrekê li verê keyn. Virê geleka xoş e. Çerwaneka zehf e, aveka xoş e. Sîberêt lawîn, em dê li vê derkê bin. Dehra xo keyn, ḧeta dehra dişkêt, paşî em diçîne ser ṟêka xo.

Got'ê: - Baş e.

- Hon dewara veken bişêlînin u min ji mêje leşê xo neşuşt'î, leşê min gelek yê dixoriyet u bihna xûhê ya ji min dihêt. Ez dêçime ser kaniyê u dê xo havême avê ḧeta hon têşt'ê ḧazir dikin.

Got'ê: - Belê

Dibêjin 'Emerê me ço ser avê, şûtka xo vekir u dest'ê xo havêt'e bişkuşkêt cilkêt xo ko dê veket, dest'ê wî diçîte ser bêrîka wî ko dê veket, bîra wî li nivişt'iye dihêteve. Nivişt'iya xo ji berîka xo dê înîte derê, tê difikirîtin.

- Ya 'Emer ! Tu pê bizanê, eve ṟojê hon çoyn, deh ṟoja pişt'î hewe, 'eskerê Îranê yêt hat'î, yê di ser bajêrê Misrê de girt'î, bajêrê Misrê yê talan kirî. Seracul Misrê jî ya birî u yêt çoyn.

Dibêjin, 'Emerê me hind 'ecîz bû, zêde, zêde. Îna careka dî şûtka xo girê da ve u xo naê xist'e avê u hat' ṟûnişt'e xarê dev hevalêt xo. Ji 'eciziyê abeden neşêt baxivît. Ḧeta têşt'a xo xar.

Got'ê hevalêt xo: - Babo! Eve ħesp'ê jê teslimî hewe, bes bo min şîrê min u mertalê min, min çu dî navêt

- Dê çi key 'Emer?

Got'ê: - Wellahî, dê çim bo xo bi dinyayê k'evim.

- Kuṟu, dê were da biçineve

Got'ê: - Naxêr, ez nahêm.

U negot'e hevalêt xo ji ko tişt'eke ħosa yê qewimî.

- Belê, hindek nanî bidene min.

Dibêjin, hindek bo kire turbekî. 'Emerê me xatira xo ji hevalêt xo xast', ħesp'ê xo jî teslimî wan kir u k'eft'e çol u beyare. ṟêka girt'. Eger ṟojekê, eger dua, eger siya. Dibêjin, ṟojekê ço binê çiyayekî, sa'eteka ma bo meẍreb. ṟêkek diçîte çiyay.

Got'î: - Ya Rebbî! Sa'etekî ya may bo meẍreb, ez nizanim biçîme vî çiyay kanê sa'etekê dua siya gundek dê bi ṟêka min k'evît, an nak'evît, çu nan jî digel min nemaye u çu av jî u çu av nîne, ez dê çi kem? Ez bimînime li virê, ne nan u av dê mirim ji tihna u birsa. Ez biçim, tirsim gelek, çiyayê dirêj bît u çu gund li wê derkê nebin, dîsanekê li min bibîte şev u ez ne gelekê şehrêza dê bê ser u ber bim. Bo xo ve ma'til bû. Babo, ya qenc ewe ez biçim, Xodê ya înaye serê min.

Dibêjin, 'Emerê me da çiyay u ço ħeta çarekek may bo meẍreb. Gehişt'e ber derê şkeft'ekê, berê xo didetê têjî tê da nivîn in, aman in ferdêt brincî ne yêt arî ne, ya'nî kolî tişt'ek têjî şkeft'êyê u çu mirovek li wêrê nîne. Lê digeṟiyêt, li şkeft'ê hindek nanî dibînîtin, dêînit, nanê xo dixot. Şkeft'ê jî kûnek ya li 'erdekî hey, ço wê kûnê ṟa.

Got'î: - Dê çime di vê kûnê ṟa kanê ki dihête vê şkeft'ê. Ev şkeft'e ya k'ê ye?

Dibêjin, 'Emerê me ço di kûnê ve.

Got'î: - Ma beyneke deh deqîqa man bo meẍreb, sahirek hat', yê her du çava kûr. Şitî teyarê firî, u hat' dane ber derê şkeft'ê. Ber derê şkeft'ê zebt kir, ma li ser pêt xo.

Îna got'î: - Malka te mîrato. Eve çi ava dî çavêt te rejiya bû? Ev şevê tu bihiya vê derkê, biye mehvan, ħeta ko ez te bixom.

- Vêca me, ya kafir, ez ê hat'im. Diyare, ez ṟizqê te me, Xodê Ta'ala, ṟizqê min ya înaye vêrê.

Dibêjin, kafir hat', ço ber diwarekê şkeft'ê nêzîkî sa'etekê ma li ber dîwarî, yê ṟawest'iyay li ser pêt xo. 'Emer jî yê li wê kûnê ṟaberê xo dikete, u ma beynakê berê xo dayê, kafir veresiya u jor da bi nîveka şkeft'ê k'eft' u ne hişyar bû. 'Emerê me jî ṟa bû, hat', der k'eft' ji wê derkê, eger tehtîkek eger gûnikek bo xo havêt'e 'erdî, ez ẍolamê serî, hindek nanê dî jî xar, serê xo dana u nivist' ħeta banga sipêdê.

'Emer sipêdê ra bû ji xew, kafir rabû.
Got'ê: - 'Emer.
Îna got'ê: - Belê
Got'ê: - 'Emer, da bo te bêjim.
Got'ê: - Bibêjê, ya kafir!
Got': - Eger, 'ehdekê dikey bo min, ez te nakujim, u ez dey nekeme te u eger tu bo min nekey, wellahî tu ji dest'ê min xelas nabî.
Îna got'ê: - Ya kafir, bêje wellahî, çu ya min pê çê bibît, ez dê bo te kem.
Îna got'ê: - Jinkekê dêbênê Sultandêrê, tu bo min dêînî, wella 'Emer çu nabême te. Tu bo min naînî, wellahî 'Emer dê te kujim, dê te pirtpirt kem.
Got'ê: - Li k'û rê ye?
Got'ê: - Ez nizanim qesra wê, mrovêt wê, gundê wê, bajêrê wê. Got'ê: Ez qet nizanim li k'û rê ye. Got'ê: Ḧeft sala, em ḧeft bray ne, ez brayê biçûk im yê ji her du çava kûrê me. Em her ḧeft bra şerî digel keyn, şerê me her ḧefta diketin, u em her ḧeft sahir in, ew jî sahir e, em neşeyn carekê pê bibeyn u ez nizanim bajêrê wê u ez nizanim mala wê.
Got'ê: - Baş e. Ejî dê çim p'irsiyar kem. Hekê vek'eft'im, dê bo te înim.
Dibêjin, dêwê me sipêdê, bi sihrê firî u ço. 'Emer rabû, lê geriya, eger hindek nan, eger tişt'ek xar, ji şkêft'ê derk'eft', dengek hat' 'Emerî.
Got'ê: - 'Emer.
Îna got'ê: - Belê.
Got'ê: - Dê çîye Sultandêrê?
Îna got'ê: - Belê.
Ina got'ê: - 'Emer, tu neşey Sultandêrê bînî. Eger ez rêka nîşa te nedem, tu neşey Sultandêrê bînî.
Got'ê: - Dê, tu çi rêkê nîşa min dey? Ez, ne kesê dibînim, u ne kes li şkeft'ê ye.
Îna got'ê: - Wê rê ber wî 'erdê ko kafir duhî êvarê lê rawest'iyay dê min bînî.
Got' 'Emer jî ço qesda wê derkê kir, dê bînît kûnkeka hindka ya li dîwarî, dîwarê yê dayê ber u yê ava kirî u nîveka mezelkê ya rûhne pencerkêt lê heyn, jinkeka tê ve, mirov bixot u vexot, ḧisn u cemala vê jinkê dê fikirît, hingiya can e.
Ê got'ê: - Tu di vêrê ve çi dikey?
Îna got'ê: - Wellahî, ez jinkeka bisilman im, evî kafirî ez li 'ilmê sihrê ya înayme vê derkê. Dil nadet min bikujît. Hero êvarê dêhêteve, ez ẍolam serî u dê ew tibla min mêjît ḧeta xûn ji min di xelas bît. Ew di li wî rexî k'evît, ez di li vî rexî k'evim. Ewiya ez ê xist'îme vê 'ezabê u ev dîwarê he da naye ber min. Ez neşêm çu bikem.

- Navê te?

Got'î: - Navê min Gulbihar e. Dê, 'Emer eger dê 'ehdekê key bo min, min ji vêre der ve êxî u min li xo mehr bikey, ez dê rêkê nîşa te dem ko tu bigehiye Sultandêrê. Eger tu bo min 'ehdî nekey, min ji virê bîniye der ve, wellahî, tu kûre bibî, sed salê dî bigeriyey, tu nizanî ko Sultandêrê li kî re ye.

'Ehde kir bo Gulbiharê ko: ez te mehrî kem u ez te ji virê bînime der. Hema bi min ve bihêt ez bişêm.

Got'ê: - 'Emer

Got'ê: - Belê

Got'ê: - Dê çî li vî çiyay bi ser k'evî.

Got'ê: - Li serê çiyay?

Got'ê: - Belê. Li nîveka çiyay 'erdekê rast' e yê berfireh e gelek, kanîkeka avê ya li nîveka rast'ê. Kurê mîrê ecina u dêwê sipî, brayê kafirî, her duka şere di xo lêk dan. Her du bi quwetekê ne. Bi zelaminiyê her dûk wek'î êk in, şiklê wan her duwa wek'î êka, libasê wan jî wek'î êka. Vêca, 'Emer tu here, heko tu ser k'eft'iye serê çiyay, rûnê xarê, cigara xo bikêşe, ȟeta bangê nivro dibît. Heko bangê nivro bû, her du girin, her du dihêne ser derê kaniyê, rûdine xarê, wek'î brayêt êk. Her kesek dê zadê xo danîte ber xo digel êk naxon. Di zadê xo xot. Pişt'î hingî, her kesek dê berekî kêşîte bin serê xo u dê nivît. Xo bîsteke bigire, 'Emer, heko te zanî ko eve yêt xew çoyn vê ma beynê here, berê xo bidê, 'Emer, çi şikla tu ji her duka tu naniyasî. Eniya wa ya xûh dayê, tibla xo bide eniya wa, tibla xo bihûsî. Hek'o ya nîsek bît, yê pîs bît ew sahir e, kafir e.

Xûha wî ya nîsek e, ya pîs e. Eger kurê mîrê ecina bît ew bisilman e, xûha wî bihûsî ya hûlî ye, tiblêt te namîne pêk ve. Tu dê bi vê êkê pê ȟesiyay. Heko tu pê ȟesiyay, şîrê xo hel gire, serê kafirî bibire u li bin pêt kurê mîrê ecina rûne xarê, pêt wî biperxîne ȟeta hişyar dibît. Heko hişyar bû, dê berê xo bidêtê kafir yê kuşt'î, dê pirsiyar jî te ket: navê te, tu bêjê navê min 'Emer e. Te çi divêtin, te çi mirad heye, ez bo te ȟasil kem. Tu bibêjê, min divêt: şivik, kumik, berik.

Îna got'ê: - Belê.

Dibêjin, 'Emerê xatira xo ji Gulbiharê xast' u ji şkeft'ê derk'eft'. Ser kete serê çiyayî, berê xo bidetê nav serê çiyay, deşt'êka rast' kanîyeka avê ya li nîveka rast'ê. Berê xo bidetê stûneka toze ji 'erdekî bilind boye ber 'esmanî. Kurê mîrê ecina u dêwê sipî yê xo lêk dan şerê wan e.

Dibêjin, ȟeta bangê nîvro manê pêk ve. Kesekê çare bi kesekê nebir. Dibêjin, her duka êk u du berda dest'êt xo têk girt'in, hat'ine ser kanîka avê, rûnişt'ine xarê, nanê xo xar, u her êke berek danan da bin serê xo u k'eft'ine 'erdî, nivist'in. 'Emerê me bîstekê xo girt' u rabû çu herwek'î

Gulbiharê got'iyê, tibla şehdê da eniya wa husû, bi xoha kafirî ĥesiya, dest' havêt'e şîrê xo u serê kafirî birî u ço rû nişt'e xarê li bin pêt kurê mîrê ecina. Pêt wî perxandin, mabeynakê cirfek bi kurê mîrê ecina k'eft', rabû ew zelamê li bin pêt wî.

Îna got'î: - Tu çi kes î?

Îna got'ê: - Ez insan im.

Got'ê: - Navê te?

- Filan kes.

- 'Emer, te ev kafir kuşt'iye?

Got'ê: - Belê.

Rabû, rûnişt'e xarê, bo xo soĥbet kir.

Îna got'ê: - Dibêjê, 'Emer, kanê te çi mirat heye? Vêca, ez bo te ĥasil kem, madem te ev qenciye ligel min kirî.

Îna got'ê: - Ez benî, min divêt şivik, kumik, berik.

Got'ê: - Wellahi! 'Emer, eve min pê çê nabin. Rabe, biçîne nik babê min kanê dê babê min çi bêjît.

Dibêjin, 'Emer u kurê mîrê ecina her du pêk ve rabûn u çoyne bajêrê ecina. Çone mala wan, maleka xoş u ya baş, yêt rûnişt'ine xarê. Çone mala wan, maleka xoş u ya baş, yêt rû nişt'ine xarê. Çone cihê dîwanxanê, babê wî yê rûnişt'iyê, selam kire ser, selam ji wer girt', cih daye 'Emer, yê rûnişt'î, p'irsiyare kurê xo kir ĥalê hewe.

Îna got'ê: - Wellahi, evî mrovî ew kafir kuşt'. Hek'o ez bi çu çara nedişiyamê. Eve ĥeft' roj e em pêk ve u ez neşiyamê.

- E, 'Emer.

Îna got'ê: - Belê, ya mîr.

Got': - Bêje, kanê bêje, mirada te çi ye, miqseda te çi ye da bo te ĥasil keyn.

Îna got'ê: - Ez benî, min divêt şivik, kumik, berik.

Îna got'ê: - Willahî, 'Emer, min ĥeft' kur hebûn, şeş wî kafirî yêt kuşt'in, u eve jî kuşt'iba u te ev daxaza ji min nekirba, min gelek ĥez dikir. Belê, vêca te qenciya kirî u li şûna qenciya te ez neşêm xerabiyê digel te bikem.

U rabû ji diwana xo, ço mal u hat' pirteka berkê ya digel ya hinde u şifkek u kulavek. Xelqê Bota dibênê kolave : kumik.

Got'î daneve 'Emerî.

Got'ê: - 'Emer.

Got'ê: - Belê

Got'ê: - Tu kulavî bike serê xo kes te nabînît. Vê berkê jî, heke tu daniye 'erdekî u vê şifkê tê werînî, te k'î rê divêt kî rêye miqseda te dê te bête wêrê.

'Emerê me ma li vê derkê eger rojekê, eger dua xatira xo ji mîrê ecina xast' u derk'eft' ji bajêrî. Ço serê girkek'î, batankekê berka xo ra ê xist' u bi dest'ê çepê her sê çar lifkêt berkê girt'in u kulavkê xo kire serê xo u şifka xo di berkê werand.

Got'ê: - Berka min, divêtin tu min daniye serbanê qesra Sultandêrê.

Got'î berkê bilind kir u ço dane ser banê qesra Sultandêrê. Kanîka avê ya di nav da, dergêhê wê ya qifil kiriye. Xelekeka asînî ya ê xist'iye dergehî, ya hinda. Zincîreka ê xist'iyê, ya hinda, ya ê xist'iye xelekêt rexê dî ya qesrê singekê mezînê asînî yê tê qotay, li ser banî ra dêînitin, dê êxîte wê xelekê. Kafira Xodê, axirî kes neşêt daxîlî qesra wê bibît.

Ma'lom e, li nîveka banî neqeb e. Kulavkê wî yê di serî. Li derecê da ço xarê, ço mezelka Sultandêrê. Berê xo dikete Sultandêrê ya li ser text'ê xo nivist'iye. Jinkeka zelam ya geleka t'aze. Berê xo dayê xidam bi ser k'eft', eger kursîkek, eger mêzek, eger ferxêsêne dane zadê wê da nan da tê da.

Dibêjin, mabeynekê çavê 'Emerî yê li Sultandêrê, îna cirfek bi Sultandêrê k'eft'. Êk u êk rabû, rûnişt'e xarê ser cihê xo, îna gûrmijî ma texmîna xo kir.

Îna got'ê: - Dê were 'Emer mi 'ehda kirî ko çu kulli kesek yê daxilî qesra min bû, na ez çu bibêjimê u çoya ew bibêjîte, min jî ez bêxeberiya wî nakem. Min vê carê di xewa xo didît mirovekî daxilî qesra min bîtin, navê wî 'Emer e, u dê te bêtin bo dêwê kûre.

'Emer lê neço, cara sê 'Emerî xo eşkere kir, kulavkê xo li ser serê xo hêland, u ço rûnişt'e xarê li nik Sultandêrê u dest' havêt'e têşt'a xo xar.

Îna Sûltandêrê got'ê: - 'Emer.

Got'ê: - Çi bo bêje ya Sultandêrê ?

Got'ê: - Ez heyf u mûxabin dikem. Ez ve jina hinde t'aze u hinde şeci', tu min bibey bo dêwê kûre, çi Xodê ji nik te beriye, tu bo çi min mehr nakey?

Got'ê: - Ez benî, mane, min 'ehd bo kirî! Ez neşêm, paşî dê min bi 'ilmî sehrê min bête wêrê u dê min kujît.

Got'ê: - Kuşt'ina wî xema min, te şûlê pê nabit.

Îna got'ê: - Belê, u em dê çîne şkeft'ê. Ez dê bi minime li ber derê şkeft'ê, tu here, yê nivist'iye kafir. Pehnekê li bin pêt kafirî bide. Bêjê: Kafirî kûre min Sultandêrê ya bo te înay. Ew dê xo digel te 'aciz k'eft' u dê bêjite: te pêşûkê pîs. Heko pîsêt şibhetî te jî Sultandêrê bînin dinya xirab bîtin. Ez dê bêjime: Belê kafirê kûre, ezê bo te înayim, tu çawa dil dey wa bêjiye 'Emerî. Ew dengê min dinasît u dê rabit. Wusa bi keyf dê rabit dê şûrê xo hêlîte li cihê xo. Eger bi şûrê wî nebit, bi çu tişta ew nahête kuşt'in. Tu şûrê wî dest'kê bigehîne lepêt min u tu kavlanî bigire u ji wêrê pê ve xema min. Te şolê jê nîne.

Got'ê : - Baş e.

Îna Sultandêrê u 'Emer ser k'eft'ine banê qesrê. Pirta xo ya berkê ya ra ê xist'e her du ket rûnişt'e xarê li ser, şifka xo ya tê werandî.

Yê got'iye: - Berkê! Me divêt tu me daniye ber derê şkefta dêwê kûr e.

Dibêjin, berkê yê dihilandin u yê dinayne ber derê şkeft'ê ; çirok e eger direw eger rast', hosaye hat'iye got'in.

Dibêjin Sultandêrê ma li ber derî u 'Emer ço berê xo bidetê kafir yê nivist'iye. Pehnek li bin pêt ewî da u got'ê: Rabe kafirê kûre, min Sultandêrê ya bo te înay.

Got'ê: - Dê here, pîsê heramî. Heko pêşûkêt şibhet te jî Sultandêrê bînin. Eve heft sal in em heft bray ne, yê ji hemûya bêçaret'ir ez im. Bi 'ilmî sehrê em her heft yêt pê ve u em neşeyn 'amelekî li Sultandêrê bikeyn u tu eve çar roj e çoy dê Sultandêrê îniye virê?

Îna Sultandêrê got'ê: - Hey kafirê kûre, ezê bo te înayim, tu çawa dil didey wa bêjiye 'Emerî ?

Wext'ê dengê wê gulê bihîst, dengê wê dinyasit. Dibêjin kafirê me wusa ji keyf rabû, şîrê xo hêla li cihê xo. 'Emer bazî, şûr hel girt' li ber tenişta kafirê ra dest'kê şûrî da bi Sultandêrê. Wext'ê Sultandêrê kêşay bi sirêna şûrî kafir pê hesiya.

Îna got'ê: - Sultandêrê, ez k'eft'ime ser bextê te u yê 'Emerî her duka. Hon min nakujin. Ji ev roja pê ve, ez xolamê hewe, ez bo hewe 'ehdê dikem çu cara xiyanetî digel hewe nakem.

Sultandêrê got'ê: - Kafirê kûre, tirtire nake, wellahî dê te kujim, eger tu bo min dinyaye dê ser êk da binî.

Dibêjin, Sultandêrê şûrek dane kafirî. Kafir jor da li 'erdî da, u kafirê me kuşt'. Dibêjin, Sultandêrê u 'Emer ra bûn, lêhazek înandin, u bi çu kull u halî neh deh roja mane pê ve heta ew dîwar xirab kir. Gulbihar jî ji wêrê îna derê. Gulbihar înandin derê, mane li wêrê nêzîkî bîst' rojeka heta Gulbihar bi ser xo ve hat'eve u bi çare bû. Pîçek roh hat'e dest' u pêt wê.

Dibêjin, li şkeft'ê geriyan, ço malê tê ve yê hişk bû xo kire di çendka da têrka da. 'Emer ma texmîna xo kir u got'ê:

- Ez zelamek im. Ez ê piyan im u siyar jî nîn im. Ya qenc ew e em bi şevê biçîne rêkê u bi rojê xo li 'erdekî veşêrîn. Hema neh deh siyarek bi ser me hel bibin ezê bi dest'a me, ne min deware u ne min çi ye! Hewe her duka ji min bist'înin, ma ez dê çi lê kem? Na wella, em dê bi şevê şêyn bo xo çine rêkê u li 'erdekî hisar deyn u xo veşêrîn.

Dibêjin, tekbîra xo kir, bû mexreb, her sê bi rê k'eft'in, li şkeft'ê derk'eft'in rêk girt'in u k'eft'ine di rê da. Ger sipêdê dibo dinya zelal dibo dê çîne 'erdekî, rûnin dehlekî ra, şkeft'ekê ra da xo veşêrin heta dibo mexreb dêcîne. Eger heyvekê eger duwa eger siya hosa çon. Dibêjin rojekî

yê diçin sipêdê ê çone bajêrekî, li bajêrêkî derk'eft'in bajêrekê xoş.

P'irsiyar kir: - Eve k'î rê ye?

Got'ê: - Babo, evê Îran e, evê Urumiye ye .

Dibêjin, ewî ji p'irsiyar kir u çone xanekê mezelkek bo xo girt', her sê rûniştine xarê. 'Emerê me ço sûkê, du dest'êt dî yêt bedlê k'irîn, yêt mêrka, êk bo Sultandêrê, êk bo Gulbiharê. Her du k'arê wan kir bi mêrkanî, u sê ĥesp' jî bo xo k'irîn li sûkê, ĥesp'êt baş. Mane li Urumiyê nêzîkî heyvekê. Derk'eft'in, qesda bajêrê Tehranê kir, u çone bajêrê şahî.

Dibêjin eger rojekê, eger heyvekê daxilî bajêrê Tehranê bûn pişt'î meẍreb. Ya Rebbî, em dê k'î ve çîn? Em ne şahrezay ne! Bajêrê Tehranê yê baş e ne em kesê dinyasîn, u ne em dizanim çu xana an çu otela. Ya Rebbî, vêca tu tekbîrekî li me bikey.

Dibêjin, diçin şare'ekê bajêrî. Got'î, ĥesp'ê 'Emerî li ber dergehekî zexm rawest'iya. Hindî rikêba li bin zîkê didat, ĥesp' nalivît.

Got'î: - Ya Rebbî, rizqê me yê li vê malê, xîzêma dergehî qota.

Got'î: - Wella, jinkek hat' dergeh vekir, berê xo diketê, hewşeka mezin, pîrejinekê dergeh bo vekir.

- Hun, çi kes in?

Got'ê: - Wella, em mehvan in.

Got'ê: - Li ser serê min u her du çavêt min hat'in.

Wella, îna her sêk daxilî hewşê bûn, dewarêt xo şêlandin, dewarêt xo birine extexanê li ser hafira. 'Emer dimînitin di extexanê u difikiritin. Cihê heşt' hafira ye li extexana wê malê. Bes, hafirekê dewarek yê li ser. Dewarêt xo girê dan, ka jî kire ber wan, 'Emerê me hat'e silal. Mezelkek bo xalî kir, her sê çon lê rûnişt'in. Berê xo didete mezelkê heşt' sing tê qotayine. Bes, singekî şûre mertalik yêt pê ve u yêt dî her ĥeft de xalî ne. 'Ecebiyê 'Emer girt'. Dibêjin, pîrejinê jî şîva wan çê kir u hindî berê xo diketê ne mêrka u ne jinka li wê qesrê nabinîtin ji wê pîrejinê pê ve t'ir!

Got'î: - Dibêjin, şîva xo xar, u pişt'î hingî semawer danaye bo xo çayê çê dikin, u yêt çaya ve dixon.

'Emerî got'e pîrejinê: - Erê, ez pirsiyarekê kem tu 'aciz nabî?

Got'ê: - Roha deyka xo, ma êk heye ji her du çavêt xo kûre bibit, ji mehvana 'aciz bibit? Mehvan mehvanêt Xodê ne! Heçiya dibêjin, çu nîne!

Îna got'ê: - Pa, daykê, ez çome extexanê, min dît' heşt' hafirêt yê li extexanê mala te, bes hafirekî ĥesp'ek yê li ser. Ez dihême vê mezelkê, ez dibînim, heşt' sing lê diqotayne cihê çeka, bes singekî çek yêt pê ve. Pa, mirovêt evê malê k'î ve çoyne?

Got'î, axinkek bi pîrejinê k'eft' u got'ê:

- Roha pîra xo, te careka dî birînêt deyka xo îna nav bîra min.

Got'ê: - Bo çî pîrê, çi li te qewmiye?

Got'ê: - Roha pîra xo, salekê şahê me ħewcey hindek malî bû nik Mîrê Misrê. Got'î sed mirov bi rêkirin digel kumanderekî. Virêkirine bajêrê Misrê. Mîrê Misrê ew mal dave bi mirovaynî, çu şer nebûn! Min ħeft kur hebûn, her ħeft ligel ewan siyara bûn. Got'î: Xodê kullekê tê xe te mala wî dêbênê 'Emer. Got'î: Hat'e berahîke siyarêt me. Her ħeft kurêt min kuşt'in. Got'î: Heçiyê kuşt'î kuşt'î, heçiyê nekuşt'î revî hat'eve u kurêt min kes nehat'eve. Got'ê: Min keçeke hey navê wê Gulê. Li şûna brayêt xo ew diçîte dîwana şahî ħeta ko sa'et danzde u paşî dê hêteve.

'Emer bi xem k'eft' : - Pa, heko ez qatilê vê bim, ħeft kurêt wê min kuşt'ibin, ez dê çawa vêca pirsyara Seracul Misrê kem?

Ma texmîna xo kir 'Emer paşî îna got'ê:

- Pîrê!

Îna got'ê: - Tu çi dibêjî, roha pîra xo?

Îna got'ê: - Hek'o noke qatilê te bik'evîte nav dest'êt te, şûna kurêt xo dê çi lê key?

Îna got'ê: - Ya roha deyka xo, ne heyf u mûxabin, qatilê mrovî eger daxilî mala mirovî bû, ne ħeft kura bikujit, sed kura bikujit, mirov nabêtê pêlava pê te ya xar e.

- Hey ne!

Got'ê: - Belê, roha pîra xo, ew 'adetê me Îraniyan ne. Heko noke, min deh kur hebin u êk bikujitin u daxilî malê bibît ez çi lê nakem.

Ina got'ê: - Wella, pîrê, pa ez 'Emer im!

- Tu 'Emer î?

Got'ê: - E!

- Tu li dû Seracul Misrê ra hat'î?

Got'ê: - Erê, wella !

Got'ê: - Were, tu li ser çava hat'î, 'Emer. Gul dihêtin. Tu xo bi min naîne derê. Ez dê vê qisê ħoxa dê bo Gulê kem. Eger min dît' Gul ji ya qenciyê ye, u ya selaħetê ye, em dê xo pêk înîne derê. Eger min dît' Gul ya xezebê ye, ne ez te dinyasim u ne tu di min niyasî.

Got'ê: - Belê.

Ew roje, Seracul Misrê înandî ya kiriye di mezelkekê ve, derê mezelkê yê ji pişt' ve girt'î, ya xo harkirî, venaket, ne jin o ne keç o ne kuru ne kes biçîte di mezelka wê ve! Pencerkeka biçûk ya li mezelka wê tê ra zadî didenevê u ava wê, we naket abeden kes biçîte nik.

Dibêjin, sa'et danzdey şevê berê xo dikenê taqêna cezma. Gulê hat'. Hat'eve ji sera şahî. Hat', berê xo didetê, zîna dibînîtin li nav ħewşê, silav diketin, keyfa xo gelek deînîtin.

- Dayê, eve k'î ne?

Got'ê: - Willahî, mehvanêt me ne.

Got'ê: - Bi ser u selamêt u ser çava. Keyfa me gelek hat' u di sebrê me jî gelek bêt. Min nizanî ev mehvanêt 'eziz yêt bo deyka min hat'in, eger ez da zû hêmeve! Belê, hon li min nagirin, ez pê neḧesiyay me ko hon yêt hat'in.

Keyfa xo Gulê jî gelek pê îna. U careka dî ṟabûn, semawera xo îna, çayeka dî çê ken. Dê bo xo sohbatê ken. Mabeynakê pîr vê sohbatê bo keça xo Gulê diket. Gul jî dibêjit li dev cima'etê: Eger xûndarê mirovî daxilî mala mirovî bo, mirov çu li ser namînîtin. Ma dê çawa tişt'ekî bêjîtê?

Îna got'ê: - Dayê, pa eve 'Emer e, ewê ko ḧeft brayêt te kuşt'in.

- 'Emer e?

Got'ê: - Belê, 'Emer e.

Got'ê: - Li ser çava hat'î, bi xêr u selamêt hat'î.

U serê xo sernişîv kir ṟeş bû, wek'î qêrê lê hat' u xûhekê ber da. U hizra xo kir u paşî serê xo ṟakir u got'ê: - 'Emer.

Got'ê: - Te çi bû ya Gulê ?

Got'ê: - 'Emer. Eger dê 'ehdekê key dê min mehr key ez dê bo te li ber geṟiyêm da te bigehînime Seracul Misrê. Eger tu min mehr nakey, 'Emer min şolê ji te nîne u tu bo xo k'î ve diçî here. Tu ev şevê mehvanî li vê derkê u sobehî woẍira te xêr. Tu bo xo k'î ve diçî here. 'Emer, ne ji ber hindê ye jî, ya'anî ko ez 'aşîqa te, me dê her hebît êk ko ez şû pê bikem. Belê ez dimînim texmîna xo dikem eger sobehî me harîkarî bo te kir, me Seracul Misrê gehande lepê te. Hingî şahî zanî ko eve me kir, em dê her dê çîn u dê me kujît. Vêca heko dê me kujît me gel xo bibe da em ji belkî xilas bibîn. Belkî eger xilas bibîn pêk ve xilas bibin, hek'o bihêne kuşt'in jî bila pê ve bihêne kuşt'in.

'Emer 'ehde kir bo Gulê ko dê wê jî mehr ketin. Dibêjin ṟoja paşt'ir 'Emer ṟabû, zêrek da bi pîrê bi ṟê kirê sûkê hindek sêv kiṟîn. Sêveka gir, qewrand. Roja çoye bajêrê papayê Fireng, kefîka Seracul Misrê bo xo hel girt' ya xo da bo Seracul Misrê, gustirka xo jî da bo vê u ya Seracul Misrê kir bo tibla xo. Dibêjin ew sêv nêr u mê kir, gustirka Seracul Misrê kire nav da digel çar pênc sêvekêt dî kirine nav kefîka wê da u got'ê:

- Pîrê, tu lazim e van sêva bideye vê.

Got'ê: - Wella ṟoha pîra xo, ez naşêm biçim.

Got'ê: - Wellahî qerebalixeka hinde ez neşêm xo bigehînime ber pencerkê u ḧeta ez xo bigehinime ber pencerkê bîst' cara dik'evim ê ez bo xo jî ya bêçare me dê li bin dest' u pêt xelqê dimirim.

Îna got'ê: - Na çê nabît, tu dibey.

Mecbor bû, îna ṟabû kefîka xo hel girt'. Qesda mezelka Seracul Misrê kir. Her sipêdê ḧeta ko bangê meẍreb hindî pîr hat'e neşiya bigehîte ber pencerkê.

Êvarê, ziviŗî hat'eve.
- Tu negehişt'iyê?
Got'ê: - Na wella.
Got'ê: - Baş e, ḧeta sobehê Xodê kerîm e. Sobeha sipêdê zû, heko tu ŗadibî ji xew ko dê nêvêja xo key nanekî bo xo bi tirsî u xo li çayê negire u here hêjda neboye qerebaliẍ, belkey xo bigehiniye ber pencerkê.
Dibêjin, sipêdê zû pîra me, ya Rebbî, nanekî xarî u kefîka xo ya hel girt'î u xo gihandiye ber pencerkê hêjda neboye qerebaliẍ. Li ber pencerkê ŗawest'iya kefîka xo havêt'ê jor u ŗûnişt'e xarê li ber pencerkê. Seracul Misrê dibêjit: - Ma ez biçûk im dê min bi sêva axivin ?
Sêv jî ji kefîkê der k'eft'in u her êk ço 'erdekî dimînit. Texmîna xo kir.
- Wa hanê şibhet wê kefîkê ye ewa min dayeve 'Emerî ŗoja çoye bajêrê Qiralî. Ez dibînim ew sêva he jî ya lêk nêr u mê kiriye. U hat', sêva xo helgirt' ji êk ve diket berê xo dikete 'eynen gûstirka wê ya li nav da. Kefîka xo jî helgirt' u got'î: - Kanê ewa ko ev sêva havêt'in.
Pîrê ŗabû u got'ê: - Ez xodam ez im.
Got'ê: - Here bibêje u pêş min ve selama lê bike u tekbîr xema wî ye. Rêkekê bibînit.
Îna got'ê: - Belê.
U xelqê jî dibînit pîrejin ya digel axavit. Bo deng u dûr u cab ço şahî ko: Tu pê bizanî filan pîrê Seracul Misrê qane' kir u ya sobhet'ê ligel diket u ya ligel taxavît.
Dergeh jî bo vekir u ço jor ve. Qedr bo qedrê pîrê ê gava pîr ji derî der k'eft' mirov dê xo kene kolan hindek dê xo dane ŗexî u hindek dî xo dane ŗexê dî u dê ŗêka pîrê ken u pîr dê şekala xo dixiŗûnît u diçîte mal.
- Tu geheşt'iyê, pîrê ?
Got'ê: - Erê u ya got'î vêca tekbîr xema wî.
Got': - Pîrê here bêjê: 'Emerî yê got'î: Bila cabê bidete şahî. 'Emer ço eve sê sal e, 'Emerê çoye ez nizanim ka hama ka çu lê hat'. Vêca sedêt şibhet 'Emerî ez qorbanî pêlava kuŗê şahî dikem. Bila ev şevê bikene xena u şeveka dî bila ji nokê zava bihête jor.
Îna ji nû ve pîrejina me ço nik Seracul Misrê u got'ê u Seracul Misrê cab da şahê Îranê vêca dest' havêt'e wê şevê kire xena. Ḧeft dest'êt duhol u zirna înan u Îraniya dane ber derê qesra şahî u dewat girê da u bo xena wê şevê ḧeta ŗoja paşt'ir.
Dibêjin kuŗê şahî bire mezelkê, ma'lom e serspî jî pîr e. Hemî dizanin ko keça wê hey. 'Emer jî yê digel xo birî.
Îna got'ê: - 'Emer.
Îna got'ê: - Belê.
Got'ê: - Rabe da biçîn, k'arê keça min bike u digel min were. Em diçîne

wê rê heta ko zavay dê îna jor heta ko delîva me dik'evîte bikujit u paşî em dê der k'evîn, Seracul Misrê jî dê beyn.

Dibêjin 'Emer u pîr her du pişt'î bangê mexreb yêt rabûn çone mezelka Seracul Misrê heta sa'et sêy şevê. Berê xo bidene mezinêt Tehranê hat'in. Kurê şahî înan da jor nik Seracul Misrê rûnişte xarê.

Got' berê bidete zelmakê zexm yê sor e, çav şîn yê zer yê kirêt. Rûnişt'ine xarê fêqî îna fêqiyê xo xar. Çayek çê kir her êkî şîşek vexar xelq hemî derk'eft'in, man pîr u Seracul Misrê. Îna pîr der k'eft' rex xurfa wan u 'Emerê me kulavkê xo kire serê xo u rabû. Ço, ço mezelka Seracul Misrê rûnişt'e xarê binê malê.

Îna berê xo dayê kurê şahê Îranê kîskê xo îna der qelûna xo tê kir.

Got'ê: - Seracul Misrê ka pelekê bîne.

Seracul Misrê bazî gaska xo helgirt' u pelek îna da nan de ser qelûnka yê kurê şahî. Kurê şahî her qelûnik li ser bazkî hel girt' u got'ê:

- Keça sey, tu ji xo nagirî bo min pelê bi dest'ê bînî tu bi gaskê dêînî.

U li Seracul Misrê ra west'iya heta Seracul Misrê êxist' 'erdî wusa lê da. Seracul Misrê bihna xo ve kir u got'ê :

- 'Emer, kerê kurê kerî, heta noke min xo dîn kir bû u harkirî bû ez rihet bûm. Evroke te hû li min kirihe, heta ko ev leşê hosa yê rihet te hosa da zehmet dan.

Dibêjin, kêşa nêzîkî nîv sa'etekê Seracul Misrê ji 'erdî ra bû geleka bêhal geleka bêçare bû, yê diêşit u ço rû nişt'e xare li ser text'ê xo u kurê şahî jî yê rûnişt'iye yê qelûnka xo dikêşit heta qelûnka wî xelas bû daqota u careka dî tê k'î re ve u got'ê:

- Bo min pelekê bîne

Seracul Misrê bazî maqlê pelek helgirt', dest'êt jinkane bo xo di nazik in, ji vî dest'î kire vî dest'î u ji vî dest'î kire vî dest'î danîte ser qelûnkê neşiya danîte ser. Careka dî pela wê k'eft'iye.

Hey got'ê: - Keça sey, hindî tu ji dilekê sax deînî, hingî 'înad di dilê te da nîne bo xatira 'Emerî, wellahî we billahî, dê kera li babê te şêdînim heta tu dimirî dê halê te eve bît. Her şev bîst' cara dê te qotim heta ko dê qotana xo da dimîrî, we diyara çi jinik li Tehranê nînin ko ez bînim bes cenabê te nebit?

Careka dî qelûnka xo li ser bazkî vekir ko dê derasiyetê Seracul Misrê. 'Emerî şîrê xo hel kêşa u bazî kurê şahî. Şîrek li serê wî werand, serê wî kir ding u bi nîveka mezelkê k'eft' u dest'ê Seracul Misrê girt'.

Rakir u da digel pîrê u got'ê: - Keça te ye, tu bibe u here. Tu u keça xo dişên çin, u ez dê hêm kes min nebînît.

Got'ê: - Baş e.

Dest' havêt'e pişt'î Seracul Misrê înay her du, wê şevê de bo xo hindik

hevîr kir, hindek nan peht hindek birînc tişt' u mişt' lêk da u xîvetek u bo xo bar kirin u xîveta xo jî bo xo li dewarekî kir u dergeh kurê şahî ji kafil kir u kililk kire de bêrîka xo da u 'Emer jî der k'eft' u geheşt'e mal. Wê şevê da barêt xo bar kirin her çar pênc şeşek siyar bûn li dewarêt xo, derk'eft'in.

Her şeş siyar bûn u derk'eft'in ji bajarê Tehranê u qesda 'Iraqê kir, diçîne rexê Turkî. Dibêjin hat'in sê şev u sê roja li çu 'erda nerawest'an. Îna 'Emer ma u texmîna xo kir u got'î:

- Babo, dewarêt me êdî neşên ji birsa da rê ve biçin, em bo xo jî eger li me hel k'evîtin em hindêt birsî bûn em neşeyn çu. Hat'ine 'erdekê berê xo dikenê girk'eke li nîveka 'erdeke rast' çerwanekê gelekê xoş u aveka geleka zehf u ya tazî u k'eviyêt befrê.

Got'î: - Em dê li vê derkê bihna xo deyn.

Hindî deyka Gulê u Gulê got'ê:

- 'Emer da biçin, 'esker dê li dif me dahêt da nedanîn.

Got'ê: - Wellahî, li dif me da bihêt an nehêt. Êdî dewarêt me neşeyn. Eve sê şev u sê roj e bi taqaqê em yê diheyn u dewarêt me tişt'ek nexariye. Eger li me helk'evît em her naşeyn tişt'ekê bikeyn. Dewarêt birsî dê bo me çi ken? Dibêjin, xîvetê xo li serê girkê veda u cihê 'Emerî u yê Seracul Misrê li bin xîvetê çê kirin. Evêt dî: Gulbihar, Sultandêre u Gul u pîrejin k'eft'ine ber derê xîvetê. Razan li wê derkê.

Dibêjin, wext'ê sipêdê, duhol u zerna diçine ber derê qesrê hingû hingû heta bangê nîvro. Zava ji xew ranebû.

- Babo, dê êk herin zavay ji xew raken, mal miratî. Me hemiye jin yê tînayn kesê hû nekiriye hê.

Bangê nîvro çone selal, dergeh yê darêxist'î. Bi lehazey derê kenin, berê xo dikenê mezelk ya tejî xînê, ser yê li wê re he u qalib yê li wêra he.

Got'î: - Eve çiye çi nîne? Eve hebît nebît, ya pîrejinê çê bî. Herine mala pîrejinê.

Diçîne mala pîrejinê, derî ve dikir kes tê ve nîne. Dibêjin deng li 'eskerî kir her nêzîkê du hêzar 'eskerî u bi rêkekê vi rê kir. 'Emer u ew jî nivist'îne. Dibêjin, sipêdê ji xew radibin wext'ê nivêjê, got' berê xo dikenê, dewra xîvêta wan 'eskerî xivêtêt xo yêt dirûst kirin.

Sultandêrî got': - Kes 'Emerî ji xew ne ra ken. Ez dê çime şerî.

Got' dibêjin, dest' havêt'e têşt' bo hazir kir, têşt'a xo xar Sultandêrî dewarê xo çê kir, şîr u metalêt xo û rûma xohel girt'in. Siyar bû da biçîte meydana siyarêt Îranê. Dibêjin heta êvarê Sultandêrê şer ligel wî 'eskerî hemiyê kir, telaftineka geleka mezin ji Îraniya kir. Êvarê berê dewarê xo zivirandî ve tûmbilbask ket, infîsalê lê dan. Sultandêrê hat'eve xîveta xo u 'esker zivirî çove xivetêt xo heta roja dûê.

Roja dûê, dîsanekê wê wa nekir 'Emerî kes hişyar ketin. 'Emer yê hişyar dibit berê xo dikete şerê Sultandêrê yê digel dihêt rûnîte xarê naçîte şerê. Got'î mabeynake ħeta nîvro Sultandêrê şer kireve digel wî 'eskerê Îranê. Mabeynake got'î êkî siyarek hat' got'î rûmek li pişt'a çiçkê Sultandêrê da, xo li pişt'a wê der îna. Got', Sultandêrê dest' havêt'ê, rûm singê xo kêşa u çemiya 'erdê hindek ziblê dewara evê t'ir êdi vî rexê u wî rexê birîna xo ra kir. U got'î berê dewarê xo zivirand u qesda xîvetê kir. Hat' rûnişt'e xarê, brînêt xo qewandin u 'esker jî zivirî, çûn xîvetêt xo ħeta roja paşt'ir sipêdê.

Sultandêrî got'î: - Ez dê rabim çime şerî.

Hindî jinka got'ê: - Da, 'Emerî rakeyn bila biçît.

Got'î: - Ne, kes nebêjne 'Emerî dê ez çime şerî.

Ma'lom e ya brîndar e u neşeytin xo ji zerba vegirît u zerba danit.

Got', dibêjin, du qat k'eft'e şerî ħeta bangê nîvro. Got', dibêjin 'eskerê Îranê nêzîkî Sultandêrê bûn ha bikujin. Got'î, çavê Seracul Misrê yê lê got'î 'Emer yê dixewe. Got'î, Seracul Misrê bo Sultandêrê kire girî. Ronkeka girîyê ya Seracul Misrê k'eft'e ser rûyê 'Emerî cirfek vek'eft' u rabû.

Îna got'ê: - Seracul Misrê!

Got'ê: - Bêje 'Emer.

Got'ê: - Seracul Misrê, hek'o te wusa kurê şahî Îranê diviya, bila te got'iba min wellahî min nedikuşt'.

Got'ê: - Eve du roj sê roj Sultandêrî ya diçîte şerî, duhî ya brîndar bû u di wê brînê da ya çoye şerî, siyarêt Îranê îhat'e pê kir, ha dê Sultandêrî kujin.

Got'ê: - Hey, na na.

Got'ê: - Belê, wella.

Dibêjin 'Emer rabû, zû k'arê xo kir ħeta wî k'arê xo kir, jinka ħesp'ê wî çê kir, dest' havêt'e li ħesp'ê xo siyar bû, u li girkî bi xar k'eft' u ço şerê Îraniya. Dibêjin, 'Emer bi nav k'eft' yê ji cinûbê dibête şerqê u ji şerqê dibête şimalê, kes nizanît k'î ve dibet. Yêt tera u bera kirin. Bêxe belê bêxe, Sultandêrê jî pîçek keyfa wê xoşt'ir lê hat'. Tirsa wê kêm bû. Got', ya brîndar e jî, belê pa ya şerî diket ħeta bangê êvarê. Şolekê mezin li 'eskerê şahê Îranê hat'î kuşt'in. Telefet jî bû. Êvarê dibêjin berê dewarêt xo zivirand. Sultandêrê u 'Emerî qesda xîvetê kir u 'eskerî qesda xîvetêt xo kir.

Rûnist'ine xarê li bin xîveta zad xarînê. Got'î, yê şîva xo dixon.

Zebita got': - Em dê tekbîrekê keyn.

Îna got'î: - Dibêjin.

Got': - Eve 'Emer e. Em yê diçoyne bajêrê Misrê.

Got'î: - sed mêr bûn. Her sed nedişiyanê u 'Emer evroke yê li di namûsa xo hat'î u dû jina xo ra hat'î. Wellahî we billahî, ȟeta qetek ji me nemaye ew dê me kujît, me şolê ji 'Emerî ye? Yê hat'iye jina xo u çu qûsiriya me nekiriye. Hindê kurêt feqîr u jara dê hêne kuşt'in bi xatirê kurê şahî, kurê şahî ço cehenem. Eve du sed sê sed merêt dî me dane kuşt'in. Ya qenc ewe em rabin şîva xo bixoyn, xîvetêt xo bar keyn u qesda bajêrê Tehranê bikeyn u heko şahî pirsiyara me kir dibeynê: - Babo, em geheşt'inê, me şerekê mezin kir, bi şevê em nivist'in. Sipêdê em raboyn, yê revî hindî em lê geriyayn me nizanî k'î ve ço. Ma em çu mecbor in bo zelamekî em hinde kurêt xelqê bideyne kuşt'in ?

Hemû li ser vê tekbîrê qana' bûn dest' havêt'ê her wê gavê da, şîva xo xar, xîvetêt xo tapandin u li pişt'a dewarêt xo kir u qesda bajêrê Tehranê kir. Evêt dî sipêdê rabûn, berê xo dikenê ço xîvet li wê rê nîn in. We diyar e revîn. Dey roja mane li wê re ȟeta birîna Sultandêrê saẍ bûyeve. Rojê yanzdê dewarêt xo çê kirin, siyar bûn u qesda 'Iraqê kir. Dibêjin 'Emer digel her pênc jinka ve hat'e Zêniye Şêxa li hûdûdê Îranê u 'Iraqê.

'Emerî got'î: - Wellahî, em dê li vî rexî ra çîn. Rexê Amêdiyê me nedît'iye diçîne Zêbarê u çîne nav Barzaniya u çine Barzan, Amêdiyê, çîne Zaxo u çîne Cezirê paşî diçîne Bota da em evî rexî jî bibînîn.

Dibêjin dest'havêt'ê, hat'ine Barzan şevekê mane li Barzan şevekê mane li Bamernê, ya dî çûne Zaxo ya dî çûne bajêrê wî yê ko wezîrî tişt'êt wî jê standin. Yê şehrezayê 'Emer çone otelekê bo xo odek girt', çone sûkê hindek birînc u goşt' u tişt' u mişt' bo xo k'irîn u birine ẍurfa xo, şîva xo bi xo lê na.

Êvarê 'Emerî got'ê: - Sultandêrê.

Îna got'ê: - Belê.

Got'ê: - Eve hon hemû rûnişt'ine u Seracul Misrê min 'ehda bo kirî, eve jî hemû jinik in, çende ko min k'arê mêrk'a yê kiriye ber. Gulê tu dizanî ko jinik e. Belê ev her dûkêt dî tu nizanî. Eve jî Gulbihar e u eve Sultandêrê. Her duka kulavkêt wa ji serî rakirin, keziyêt wa ji bin k'eft'in u got'î :

- Min 'ehda bo kirî dê eve jî mehr kem.

Îna got'ê: - Mehr ke. Sahêta te xoş. Ma dê çu ji min k'evîte avê. Ew xişkêt min yêt mezin u ez ya biçûk, ez xidema wan her sêka.

Îna got'ê: - Sultandêrê.

Got'î: - Tu çi dibêjî 'Emer?

Got'ê: - Heçike ez im, u ez kurê ȟakimê vî bajêrî bûm. Wusa çe bû, Xodê Ta'ala deyka min u babê min her du mirin. Evî wezîrî malê min ji min stand, ço di qesra min da rûnişt', şûna babê min bo ȟakim u ez derêxist'îme kolana. Delal vi rê kirine ser minara u kire gazî: Ȟecî kesê

ḧakim pê bizanît nanekê daye 'Emerî yan cilk'êt wî dişon yan li mala xo dinivînin ḧukmet dê malê wî musadere ket u diket ḧebsê. Ya filan kes got'î nêzîkî deh mrovêt min evî wezîrî malê wan ḧeciz kir, kire mîrî u ev jî kirine ḧebsê bi sebebê ko çavê xo dida min. Rojekê min got'î: Hosa çê nabît, ez ṟabûm hindek pare ji mrovekê xo wer girt'in da bi nan u ez ji bajêrî der k'etin. Xodê Ta'ala ew bo ṟizqê min înaye Misrê u min Seracul Misrê mehr kirî. Vêca, ez nuka yê hat'im ew wezîrê ko ez derêxist'im, ḧakim e li şûna babê min, tu k'arê xo bike em dê çîne diwanê. Dê keyfa xo bi me înît u dê pirsyara ji me ket. Hek'o pirsyar ji me kirin ez dê bêjime ez benî ez ehlê vî bajêrî me. Ezê hat'im eger tu qesra min bideyeve min, ḧakimetî her bila bo te bîtîn u malê me jî her bila bo te bîtin. Bes, qesra min bide min dê bo xo şol kem u dê qesra xo da ṟûnime xarê. Eger di ber ṟa ço eger di ber ṟa neço, çi gava min îşaret da te dest' pavêjê şîrê xo dê ṟabîne diwanê çu Xodê da me çu da wan.

Îna got'ê: - Gelek baş e.

Dibêjin, her du yêt ṟabîn diçîne diwana wezîrî yêt ṟû nişt'ine xarê selam kirî cihê dayê cigarek her êkî ya dayê yêt bo xo ber daynê.

Wezîrê got'ê: - Ya zelam.

Got'ê: - Belê, ez benî.

- Ji k'î ve dihên dê k'î ve çî? Çi dik'iṟî çi difiroşî?

Got'ê: - Wella ez benî. Heçike ez im, ez xelqê vî bajêrî me.

Îna got'ê: - Tu direwa dikey. Çu cara min guh lê nebûye kes ji bajêrê me çoyê çu 'erdêt dî.

Îna got'ê: - Belê, ez benî. Ez xelqê vî bajêrî me u ez kuṟê filan ḧakimî me. Babê min mir bû, te qesra min ji min sṭand u te ez derêxist'im, u mrovêt min gelek ḧebis kirin, malê wan ḧeciz kir, ez evṟokê yê bûme zelam u ezê hat'im. Min xo yê havêt'iye nik te eger tu qesra min bideye min bila ḧakimetî her bo te bît. Min mal jî navêtin.

Îna got'ê: - Nexêr, tu direw dikey, çu cara me çu ḧakim nabîne. Ḧakim her ez im u çu 'Emer u çu ḧakim li vêre na ṟa bîne ko kuṟek hebît navê wî 'Emer bît, tu direw dikey.

Hindê got'e wezîrî. Wezîrî înkar kir u got'ê:

- Tu direw dikey, wella.

Îşaret da Sultandêrê. Dibêjin her duka dest' havêt'e şîrêt xo hel k'êşan bi nav diwanê k'eft'in. Got'î 'Emer ewellî bazî wezîrî, wezîrî kuşt' u ḧeçî kesê mirovêt wezîrî jî di wêrê da kuşt'in u yêt mrovêt wî nabin, hema hat'ibine wê ṟê dey na kire kesê, u delal viṟêkirine serbana u kire gazî:

- Hon hemî pê bizanin, 'Emerê kuṟê ḧakimî hat'eve. Wezîr kuşt' u li şîna babê xo careka dî yê ṟûnişt'iye xarê pê bûye ḧakim u ḧukm ḧukmê wî ye.

'Emerê me sipêdê ra bû, her çar jinkêt xo înane qesrê dest' havêt'e mela gazî kir, her şev êk lê mehr kir, her sêk jî li xo mehr kirin. K'axezek nivîsî virêkire Misrê bo xazûrê xo Mîrê Misrê.

Got'ê: - Tu pê bizanî ez yê hat'im çoyme bajêrê Îranê, min Seracul Misrê ya înandiyeve. Ejî kurê ĥakimê vî bajêrî bûm, wezîrî ez derêxist'ibûm u malê min jî standibû. Ez yê zivirîm hat'ime bajêrê xo, min wezîr jî yê kuşt'î u ez intizarê emrê te me. Çi gava ko te gelek hebît tu cabekê bo min virêke, ez yê ĥazir im li emrê te de.

Ew jî rûnişt'e xare li mala xo u ez jî hat'imeve çu neda min.

Mihemmed Faq Xidr, Sersang 1967

کابرایەک بە خۆی و بە ڕۆبێکی سپی وەستا بوو، سێبەرەکەی تا بڵێی درێژ بو، گەیشتبووە لای تەکسیەکە. لێم نزیک کەوتەوە:

ـ جەنابت ئەو کەسەی کە چەند خولەکێک بەر لە ئێستا بە تەلەفۆن قسەم لەگەڵ کردی؟

ـ بەڵێ.

هیچی دیکەی نەووت.

داڵانێکی دوور و درێژمان بڕی، دوای ئەوە بە دەستە ڕاست دەرگایەکی چلکنی گەورەی کردەوە؛ بەر پێمان زۆر پیس دیار بوو، سەرم هەڵبڕی، لە ژوورەوە، کۆمەڵێک تەرم بە پەڕۆی سپی داپۆشراو لەسەر چوارپای گەورە گەورە ریز کرابوون. تا ئەو کاتەش هیچ باوەڕم نەدەکرد، بەڵکو خەیاڵیشم بۆ شتی وا نەدەچوو، کەچی کابرا ووتی:

ـ ئەمە تەرمی خاتوو «ڤ» ـە...!!

❑ ❑ ❑

کردم، جارێکی دیکەش سوپاست دەکەم، بە تایبەتی لە بەرامبەر ئەو گیانە فراژوو بووەت، رووانینت. ئەمرۆ دکتۆر داوای لێکردم ئێوارە بچم بۆلای دوا پشکنین بکەم، هەڵبەتە، وا هەست دەکەم هەر بۆ ئەم وەرزەیە؛ دەبێ جارێکی دیکەش لە ئایندەیەکی نزیک تێهەڵچمەوە.

هەروەکوو پێشتر ووتم لە خۆم رادەبینم بێم بۆ لات، ئێمرۆکە رۆژی یەکی مانگی گەلاوێژە، رۆژی پانزەی هەر ئەم مانگە کاژێر حەوتی ئێوارە چاوەرێم بکە...بەلاَم گوڵەکانت لە بیر نەچێت..هەر شاد بیت...

دلّ لەلات
۷. ۱

* * *

ئێمرۆ هەر لە نیوەرۆوە کەمێ ماڵەکەم هەڵبژارد، کتێبەکانم هەمووی لە شوێنی خۆیان داناوە، کەمێ دیمەنی ماڵەکەم قەشەنگ کرد. نازانم چۆن وا بە ئاسانی ئێوارە داهات، کاژێر لە حەوت نزیک دەبۆوە؛ بە دڵێکی پڕ لە شادمانی چاوەرێم دەکرد. (لەبەر ئەوەی ماڵەکەشمان زۆر لە گەراج نزیکە لە سەر قسەی خۆی هەر لە ماڵەوە مامەوە). کاژێر لە حەوت تێپەری، هیچ شتێک رووی نەدا، گەیشتە نۆ و دە، دونیاکە هەروەکو خۆی کپ و هێمن، ماڵەکە ئەت ووت، خەمیان بسەردا کردووە. لە ناکاو زەنگی تەلەفۆنەکە رایچڵەکاندم، دلّم خێرا لێی دا.

- جەنابت . م . یت؟
- بەلێ.
- ئەبێ هەر ئێستا بگەیتە ئێرە، نەخۆشخانەی گەورە.
- لە کوێوە قسە دەکەیت؟
- هەر لە شارەکەی خۆت، لە نەخۆشخانەی گەورە...

بە پەلە تەکسیەکم گرت و خۆم گەیاندە نەخۆشخانە. لە بەر دەرگای نەخۆشخانە دابەزیم؛ هەراکەی تا بلێی فێنک بوو، شارەکە دەتووت زەلامێکە، پاش رۆژێکی گەرم، لەم شەوە فێنکەدا پالی لێداوەتەوە. رووناکییەکی هەتا بلێی بەهێز لە بەردەرگا زلەکەی نەخۆشخانە پەرش ببوو؛

بگەڕێییتەوە ناو ئەو ئەبەدییەی کە یەکسان دەبێت بە خۆ لێ.. نا..نا.. وەرە.. چاوەڕێتم، چەپکە گوڵێکی بنەوشەیت پێشکەش دەکەم. بە بیرت دێت جارێکیان ووتت « گوڵ هیچ قیمەتێکی نیە، تەنیا لەنێوان دوو دەست، دوو چاو و دوو رووخسار و دوو ڕووانیندا نەبێت». ناوە ناوە ئازاری تەنهاییەکی ترسناک دەمکرۆژێ!

چەند ڕووانینێکی نامۆت هەیە و چەندیش بە ئاسانی لە لایەن ئەو مێشکەوە قووت دەدرێت، بەڵگە نەویست دەکەوێتەوە، بەلام بەهادار، چ جوانیەک لە دیمەنی گوڵ دەدۆزیەوە؟ جاری ڕابردوو زۆر بە حیدەت و نامۆیی ڕووخسارت لێیان نزیک کردەوە و بە هەرا و هوروژمێکی پڕ لە خۆشەویستی قیژاندت: « گوڵەکانم، خۆشم دەوێن..خۆشم دەوێن..خۆشم »

ئێستاش سەرم لەو ئاستە سوڕماوە، هەستیش بە دڵێکی پڕ لە خۆشەویستی و گەرم دەکەم. تۆ دڵت خۆشەویستی تیایە یان سەرت؟ هەڵبەتە سەرت، مێشکت، ئەگینا بۆ مێشکت ئازارت دەدات. ئەو کاتەت لە بیرە کە لە ڕۆخ دیجلە لە بن دار ئەسپیندارەکە دانیشتبووین، سەیری قایەغەکانمان دەکرد؟ تۆ چەند لێیان وورد بوویتەوە، چەندیش بە بێدەنگی مایتەوە، باسی چیت دەکرد؟ ئەتگووت: « قایەغ رەمزی چیە...؟ هی پەڕینەوە، هی بەیەکگەشتن، نا.. قایەغ لە پردێکی گەڕۆک زیاتر نیە...!» دواییش زۆر پێکەنیت. ئەو ڕۆحە ئیبلیسیەت کە نهێنی شتێکت دەدۆزییەوە، چەند بە حیدەت شەتاو پێدەکەنیت، چەند دڵت خۆش بوو، کەمێک دەرەنگتر نیمچە پەژارەیەکی بێ مانا دایگرتی، دەهاتیتەوە ناو پێست و گۆشتی خۆت، ووتت: «ئەمەش مەرگی پێکەنین و قایەغ». ئایە هیچ شتێک گۆڕا، هیچمان گۆڕی.؟ لە خودا دەپاڕێمەوە، هەردەم لەش ساغ بیت، هەنووکەش بەوپەڕی دڵنیایی و ئاسوودەیی چاوەڕێت دەکەم. وەرە.

هاوڕێت

٦.٢.

هاوڕێ گیان...

دوا نامەتم بە دەست گەیشت، زۆر سوپاست دەکەم.

لە ئاست هەڵچوونی ئەو خوێنەی کە بۆ یەکمان ڕادەکێشی، نازانم چۆن بڕوانم..! ئایە ئێستاش ڕوخسارت هەروەکو خۆیەتی، هەردەم پرسیاری لێ دەبارێ..؟ نامەکەت شاگەشکەی

کش و مات لەوناوە بوو، تەنیا دەنگی پێی خۆمم دەبیست، گەیشتمە راست شووشەبەندێک هەر کە ئاوڕم داوە زریکە و قیژەی یەک دوو ژن کە بەسەر چوارپایەک خۆیان خوار کردبۆوە بەرز بووەوە، زۆر ترساندمی، لەولاشەوە پەژارەیەکی ناچیزە دایگرتم، سامناک، خەریک بوو لە هۆش خۆم بچم.. باش بوو هیچ ڕووی نەدا، دەمووت: مرۆڤ لەشی لە گیانی بەلاّیە و بە ئەبەدی پێوەی نووساوە.. ئیتر نازانم..! ئایە کە دەگەمە لات بە هەمان چەشنی جاران چەپکە گوڵێکی بنەوشەییم پێشکەش دەکەیت..! کەمێک دڵم بەر هاتنە و چاوەڕوانییە خۆشە، خەیاڵی ئاسوودەییم لا دروست دەکات. ئەگەر چی، ئێستاش، ناوە ناوە سووکە سەرئێشەکە دەمگرێتەوە، بەلاّم ماوەی نێوانیان زۆرترە. هەر کە لە خۆم رابیینم دێم، کەمێکیش لە سەفەر گومان لە خۆم دەکەم. کەواتە دەبێ چاوەڕێم بیت، دوایی ڕۆژی هاتنەوەمت پێ دەڵێم. ئاخۆ دەبێ جارێکی دیکە بێمەوە، بکەومەوە ناو هەمان باوەش...

گوڵەکانت لەبیر نەچێت...

دڵ لە لات، ١ ـ ٦

بۆ «ڤ» ی هەمیشە دڵ...

نامەی یەکی ئەم مانگەتم بەدەست گەیشت، بەڕاستی هەنووکە کەمێک دڵم ئاو دەخواتەوە لەوەی خۆت هەست بە چاکی خۆت دەکەی. ووشەکانت، ووشە جوانەکانت دەبینم دەبریقێنەوە، هەروەکوو دەشڵێی، بەڵێ لە تەلەفۆن هەستم بە گۆڕانی تۆ کرد، ئەمە ئەوپەڕی بەختەوەری و چوون بەرەو ژیانێکی دیکەیە. تۆ خۆشت باوەڕت وایە کە جارێ زووە، بەڵێ جارێ زووە، هەروا بە ئاسانی مرۆڤ ماڵئاوایی بکات! ماوەیەکە، چ من چ تۆ لەگەڵ شتە ترسناکەکان ڕام بووینە... ئەگەر ئێستا تۆ لێرە بایت و گوێت لەم قسانە بایە دەتگووت « بەڵێ، بەڵێ، شتە ترسناکەکانیش مەودای جوانی خۆیان هەیە...!!» لە چیرۆکەکەی بەم دواییەت، زۆر بە جوانی وەسفی ئەو گۆمە قەوزاوی و بۆگەنە دەکەی. من سەرم لەوە سوڕماوە چۆن توانیوتە ئەو ڕوانگەیەی لێ هەڵبگری، لە کاتێکدا هەر سەیرکردنی بێز دەهێنێتەوە..؟

ئێستاش ئەو گیانە ئیبلیسیە نامۆیەت هەر تیا ماوە..! چەند بە وردی نهێنی و پەیوەندی شتەکانی دەوروبەرت دەپشکنی و دەدۆزیەوە..! ئەی خودایە چ گیانێکی لەبن نەهاتووت هەیە..! لە کاتێکدا ئەو بایە ناگەهانییە خەریکە چڵی جستەت بشکێنێتەوە، هەتا هەتایێ

سەرم قاڵە، بەڵام خۆزگە دەخوازم لە لات بم.. ئیستە نازانم چی دەکەیت، خەریکی چیت، هیوای ئەوە دەخوازم جارێکی دیکە ژووری نەخۆشخانە نەبینیەوە. لەم ڕۆژانە، ئەگەر هەلم دەستکەوێ، لە نزیکترین دەرفەت دێم بۆ لات...

همیشە ئاسوودە بیت

هاوڕێت، ۱۰.۱ - ۵

هاوڕێ گیان...

نامەی ڕۆژی ۱۰ ی ۵. ت گەیشت، زۆر سوپاست دەکەم. تۆ، دەڵێی بۆ ئەوە دانراوی هەتاو بهێنیە ناو لەشی من؛ .ووشەکانت لە خۆشیان وەک کۆتر هەڵدەفڕێن، بەسەر پەنجەرەیەک دەمگیرسێننەوە، بەقەد ناولەپ، ئای کە دڵم خۆش بوو بە نامەکەت..! ئەو ماوە درێژەی کە هیچ دەنگ و باست نەبوو، ڕاستییەکەی خەریک بوو تەواو بێهوودە بم، دەترسام لەوەی دڵم شکاندبی، یانیش خوانەخواستە شتێکت بەسەرهاتبێ. دواجار کە بە تەلەفۆن قسەت لەگەڵ کردم گەلێک دڵخۆش بووم، گەیشتنی نامەکەت ئەوەندەی دیکە تەزووی بە لەشما دەهێنا. هەرچۆنێک بێت ئیستا کەمێک ئاسوودەم، کە تەلەفۆنت کرد، تازە لە خستەخانە دەرچووبووم، واتە لەوەتەی تۆ کە لە نامەی یەکەم دەڵێی لەگەڵ دکتۆرەکە قسەم کردووە، دووجارە دەچمەوە خستەخانە، پێشتریش، پێش نامەی یەکەمت سێ مانگی ڕەبەق تێیدا مامەوە. ئەو کاتەی کە خۆت لە لام بوویت، جارێکیان، بە تایبەتی دوای ئەوەی کەمێک بەهۆش هاتمەوە، دکتۆرەکە لەسەر سەرم وەستا بوو، پێی ووتم: «ئەزانی بۆ ماوەی سێ ڕۆژە تەنیا دڵت لێدەدات؛ هیچ جووڵەت نەبوو، هەناسەت هەتا بڵێی کز بوو، بە تەواوی دەستمان لێ شووشتبووی، گەلێک ڕێگامان بەکار هێنا، بەڵام هەروەکوو خۆت بووی...» هەر چۆنێک بێت با سەرت بەم قسانە نەئێشێنم، حەزیش ناکەم ئازار بخۆی.. ئیتر.. نازانم باسی چیت بۆ بکەم، ئەوەندە دەزانم هەنووکە کەمێک زیتترم. خۆ ڕەنگە خۆشت لە تەلەفۆنەکە هستت بە گۆڕانی باری من کردبێت «دوێنێ دایکم لە لام بوو، باسی تۆشی بۆ کردم». داوام لە دکتۆرەکە کردوە هەر کەمێکی دیکە باشتر بم ئیزنم بدا، ئەو کاتە ئەگەر تۆش نەیەیت، هەروەکو لە نامەکانت باسی سەرقاڵی و تەنهاییم بۆ دەکەی، ئەوە من دێم بۆ لات. بە هەر چەشنێک بێت دەبێ لەو شارە دوور کەومەوە، بێمەوە لاتان، هەڵبەتە، هەوا و جێگا گۆڕین بۆ من لە جێ یە. دواجار کە بە دالانی نەخۆشخانەکە ڕادەبووریم، لە شووشەبەندی تەک دەرگای هۆڵەکان سەیری ناوەوەی هۆڵەکانم دەکرد، هێمنی و بێدەنگییەکی

بێ..!» ئێوارەکەی دایکتم بینی. ناوە ناوە، بە جادە و کۆلانەکان پیاسەم دەکرد، ئەو ڕێگا قیرتاوەی بەسەر ڕەزەکانی ناودۆڵەکەدا دەڕوانێ و لاکەی تریشی بەرزاییەکی درێژە، هەمووی بە خانوو و کۆشک هەڵێنرا بوو، باڵکونەکانیان تا بڵێی خنجیلانە بوون، لە پێی خانووەکان، لە لارێ، بەدرێژایی ڕێگاکە گابەردی زل زل کەوتبوو، کەمێکیش پەرت و بڵاو بوون. بەردەکان ڕەش دەچوونەوە، لەملاو لەولایان نەرمە گیای سەوز سەریان دەرهێنا بوو و دەشنانەوە، ئەت ووت لە بەر قورسایی ئەو گابەردانە دەناڵێنن. وەک پێشانگایەکی هەتا بڵێی جوان دەهاتە بەرچاو. ئاخۆ بە منداڵی چەند بەسەر ئەو گابەردانەدا هەڵبەزیو و دابەزیویت! سەیری زەوییەکەم دەکرد بەکۆلانەکان گوزەرم دەکرد، وەک منداڵێک بیری سەیر سەیر بە مێشکمدا دەهات. هەوڵم دەدا شوێنەواری پێیە بچکۆلەکانت بدۆزمەوە. «ڕەنگە ئەمە هەو بێت، نا، ڕەنگە ئەوە هەو بێت». هەندێ شوێن پێم لەناو کۆلانێکی قوڕاوی ووشک بۆوە بینی، شوێن پێی پێلاوێکی بچکۆلانە، لە دڵی خۆمدا ئەمووت، هەو لەو ڕۆژەوەی تۆ بێرە دا تێپەڕیوی ئەم جێ پێیە بۆتە شوێنەوارێکی مێژوویی، من بە دوای ئەم شتە دا دەگەڕام، کەچی لە ورێنە زیاتر نەبوو، وەلێ خۆش.

ئای هاوڕێ گیان کە ئێمە بەستەزمانین! بۆ دەبێ خۆمان بخەینە ناو ئەو شێتییە خۆشەوە. دەزانی شتە ڕیاڵ و لەبەرچاوەکان لە ئاست شەتاو و هەڵچوونی هەستێکی ئەفسووناوی هیچ نرخێکیان نیە. ئایا ئێمە بەسەر شتەکاندا تێدەپەڕین یان ئەوان، دوای ئەوەی خۆیان دەخەنە ناومان ئاوا دەبن...کە لە جادە بەرینەکە سەردەکەوتم، هەر بە لێوار گابەردەکان، لە پانتاییەکی بچکۆلە، ئەسپێکی ڕەشتاڵە بەسترابۆوە، لە پەنای گابەردێک سەری، بەڵکو نیوەی لەشی دیار بوو، دەستەکانی لە زەوی دەکوتا و هەڵدەستاوە، دەیکوتی و هەڵدەستاوە. نازانم بڵێم خەیاڵی چی لەلا دروست دەکردم، تەنیا ئەوەندە نەبێت، هەستم بە هێز و هوورژم و لێشاوێکی پێ پایان کرد. گەڵێک لەو ناوە ڕامام، بەرەو ڕەزەکان شۆڕ بوومەوە، چوومە بن دار قەزوانەکە. ئەو ووشانەی تۆم دەهاتنەوە یاد، کاتێ کە باسی ڕۆژانی ناو ڕەزانت بۆ دەکردم. باسی منداڵی خۆت بۆ دەکردم. چ هێز و قەدەرێک من و تۆی لە ژێر ئەو دارە قەزوانە کۆکردەوە. جوانی منداڵێتی و بەختی ئەو بوو، ئەو هەموو ڕۆژانەی گەیاندە تەقینەوەیەکی نەمری ئەو ئێوارە لە ڕادەبەدەر ناسک و ئەندێشاوییە؟ ئایا دەزانیت، ئەو ساتە وەختانە لە مێشکی هەردووکمان بوتە تابلۆیەکی زیندوو! موتەکی مەرگ بۆ ناهێڵێ، ئەو تاوانە، ئەو گاڤانە، چڕۆ بکەن، بگەشێنەوە، لە حەشارگەیەکی ڕوحت، گەرایەکی بەختەوەری دابنێن..! بەڵام هەروەک تۆ دەڵێیت، ئەو پەیوەندییە لە ناو ڕوحمانە، لە تەک پێستمانە، هەتا لەگەڵ کردنەوەی پەنجەرەیەکیش، هەنگاو هاویشتنێک، فڕینی شتێک، بەیەک کەوتنێک، خۆی ڕەپێش دەکات، بە تەریبی لەگەڵمان دەڕوات. لەم ڕۆژانە

هەردەم مایلی مەرگە، چونکە لە ساتێکی دیاریکراو لە لووتکەیەکی وادا بووە، یانیش هەر بۆ خۆی چارەنووسی خۆی بە مەرگ دیاری دەکات... ئیتر... هاوڕێ گیان باسی چیت بۆ بکەم، چاوەڕێی تۆم بێیتە لام، پێش ئەوەی جارێکی دیکە بکەومەوە نەخۆشخانە. ڕاستییەکەی ئەو سەرنێشەیە بۆتە ڕۆتین، هەندێ جار لە ناو ناخۆشترین ساتدا خەون بە بینینی تۆوە دەبینم، حەز دەکەم لە سەر سەرم بیت، دوو مەتریش لێم دوور بیت گرینگ نیە. دواجار کە لە نەخۆشخانە بووم، وڕێنەم دەکرد، هەستم دەکرد یەکێک دەستی گرتووم، وام زانی تۆی، کچی درەنگتر زانیم دەستی یەکێ لە سستەرەکان بوو. ئای هاوڕێ گیان چ دەردێکی کوشندە بوو! خۆزگە ئەو کاتە لە لام دەبوویت. ڕۆژی دوایی، نامەیەکی تۆم بۆ هات، خستمە ژێر سەرینەکەم، لچکێکیم دەرهێنا بوو، جارجار دەستم بۆ درێژ دەکرد، دەستم لێ دەدا، بەڵام حەزم نەدەکرد بیکەمەوە. بەمە خەیاڵ دەیبردمەوە. بڕوا بکە هاوڕێ گیان، ئەو پەیوەندییە لە هەموو شتێکدا دەدۆزمەوە. کردنەوەی نامەیەک، واتە بە هەوا هەڵفڕینی ووشەکان و نەمانیان، ئەمە وەک کردنەوەی پەنجەرەیەکە، وەک هەنگاو هاویشتنێکە کە کۆتایی بە هەنگاوی دوای خۆی دێنێ. ئەمانە هەموو مەرگن... هەیهات... ئەو شەوەی ناو شەمەندەفەرەکەت لەیادە؟ بەیانییە زووەکەی کە لەو شارە ڕەزا گرانە دابەزین، باو و بارانێکی توند و شێتانە بوو، بە بیرت دێت سەیوانەکە بابردی، تۆ چەند بە دوایا ڕات کرد، من چەند باران لێیدام، تا گرتتەوە... ئیدی، هەمیشە هەر شاد بیت، چاوەڕێی نامەی ئایندەتم.

دڵ لە لات

٣.١٣

بۆ «ف» ی هەمیشە دڵ...

خۆزگە نامەکەت زووتر دەگەیشتە دەستم، ئەو کاتە هەوڵم دەدا هەموو شتێک بەلاوە بنێم، هەرچۆنێک بێت، بەهەر چەشنێک بێت بێمە لات. ئەگەر دوور بە دووریش بەدیبای گرینگ نەبوو، خۆ ئەوەشم لە نامەکەت هەست پێکرد: هەر تەنیا بینینیش بێت، ئەوە بۆخۆی هەڵنانی قەڵایەکی مەزنە. ئەو کاتەی نامەکەت لە ماڵەوە کەوتبوو، من لە شارە خنجیلانەکەی ئێوە بووم. ڕاستییەکەی بە کاری تایبەتی چوو بووم، بەڵام هەر وەکو ئەوە وابوو تۆم لەگەڵ بێت. خۆزگە کە نامەکەت دەگەیشت من لە ماڵەوە دەبووم. ماوەیەکی زۆر بەسەر گەیشتنی نامەکەتدا تێپەڕیبوو من بێ خەبەربووم. لە خوام ئاواتە، تا ئێستا زۆر چاک بوویتەوە و ئاسوودە بیت. بەیانی تەلەفۆنت بۆ دەکەم... لە شارە بچکۆلانەکەتان خەیاڵم هەر لە لای تۆ بوو، بیرم لە منداڵی تۆ دەکردەوە، « داخوا پەنجەکانت چەندە وردیلە و قژت چەندە خاو و نەرم و دیمەنێکی چۆنی هەبوو

هاوڕێ گیان...

سوپاست دەکەم، کە لە دوا نامەدا لە تەندروستیم دەپرسی، ئەمە بۆ من گەلێک شتە. نامەکەت دڵخۆشی کردم. ئێستا لە خەستەخانە هاتوومەتە دەرەوە، وا هەست دەکەم کەمێک لە جاران چاکترم. بەڵام لە گەڵ ئەمەش ناوە ناوە ئەو سەرئێشەیە دەمگرێتەوە، بەرچاوم تەواو لێڵ دەکات. ئەو دەمانە هەست بە ئازارێکی تا بڵێی کوشندە دەکەم، وەک ئەوەی گرمە گرم و هەورە تریشقە لە ناوسەرم بێت...کە ماندووشم دەکات، تەواو بێزار دەبم و بیری لێ ناکەمەوە. لە یەکێ لە نامەکانت، شتێک زۆر سەرنجی ڕاکێشام، ئەویش باسی پەردەکە بوو، کە دەڵێی پرد هەردەم دوو خوڵ، دوو جێگا، دوو لا بەیەک دەگەیەنێ و بەسەر ئاو پاز دەدات. ئەم ڕووانینەت بۆ من گەلێک شت بوو، بە تایبەتیش ئەو دەمە لە خەستەخانە بووم، شتێک بەلای رووناکییەکەی خۆی رادەکێشام، یا بۆ چرکەیەکیش بیت چیە! ئەو بارە نالەبارە لەبیرکەم. ئەگەر چی ئەو ڕۆژانە لە ڕوخساری ئەو کسانەی کە لەدەوروبەرم بوون، کە ڕاستەوخۆ سەیریان دەکردم، نیگایەکم دەخوێندەوە زۆر ترسناک بوو. من حەز ناکەم کەس بەزەیی بە مندا بێتەوە، کەچی وام هەست دەکرد دەڵێن: «ئای .«ڤ» ی خۆشەویست، تۆ زۆر ناسک و جاحێلی، ئەو تۆزی مەرگە چیە لە ڕووخسارت نیشتووە، ئەفسووس، ئەفسووس!!».

گەلێک جار منیش هەوڵ دەدەم ئەو پەیوەندییەی نێوان مەرگ و خۆشەویستی بدۆزمەوە، زۆر بیری واشم بۆ هاتووە، دەبینی بۆخۆشم لە نێوان ئەو دوو هەستەدا دەژیم. بەڵام ئەو نموونەیەی تۆ هێناوتەوە لەیەک کاتدا، زۆر زۆر شڵەژاندمی و زۆریش بێزم بۆوە. ئایا بۆ دەبێ ئەو پەیوەندییە بەهێزە لە نێوان ئەم دوو جیهانەدا هەبێت..! تۆ چیرۆکەکەی «مزپاسان» ت خوێندۆتەوە، کە کوڕەکە دەچێت خۆشەویستەکەی لە گۆڕ دەردێنێت، تا بەیانی لەگەڵی دەبێت، ماچ و کێم و خۆشەویستی و بۆنی بۆگەن تێکەڵی یەکتر دەبن؟ بۆ هەمیشە چرکەیەکی پڕ لە هێمنی و خۆشەویستی و چرکەی مەرگسات بۆ مرۆڤ دێنە ئاست یەکتر..؟ لە کاتێکدا تنۆکە هیوایەک لە ئارادا نەماوە، ئەو هێزە چیە پاڵ بە مرۆڤەوە دەنێ لەززەت تەنانەت لە مەرگیش وەرگرێت، لە کاتێکدا کە دەزانێت ئەو هەستەی پێشوو تازە کوژاوەتەوە، کەوتۆتە ناو بێپایانییەک گەڕانەوەی بۆ نیە..؟

ئەی هاوڕێ گیان... هەستەکان، هەست بە لەززەت و هەتا شتە کوشندەکانیش، ئەمڕۆ و سبەیان هەیە. هەموویان تەنیا لە چرکەیەک لووتکە دەگرن؛ دواییش ڕەش دەبنەوە. ئەو لەشەش

چیرۆک

رامان

موحسین ئەحمەد عومەر

بۆ «ڤ» ی خۆشەویست...

لەوەتەی دواجار تەلەفۆنم بۆ کردی، داخەکەم ئەوکاتە لە نەخۆشخانە بوویت، هیچ نامەیەکم بۆ نەناردووی، لە دڵەوە داوای بەخشین دەکەم کە بوارم نەبووە. ئەگەرچی دەزانم نامەنووسینم بۆ تۆ هەمیشە جێگایەکی گەورە لەو دڵە «لاواز بووە» ناسکە پڕ دەکاتەوە، کە خوانەخواستە هەر شتێکی لێ بێت بۆ من لە گێژەلووکە زیندەتر نابێت. بۆیە لە دڵەوە دەڵێم ناتوانم دەستبەرداری ئەو دڵە ببم کە دەرگای گەردوونی پەنهانی و ریاڵی بۆ کردمەوە. دیسان، لە دڵەوە داوات لێدەکەم لێم زویر نەبیت. لە لایەکی دیکەش وا هەست دەکەم، کە مروڤ لە بارێکی ئاوادا پێویستە تەنها بێت، چونکە تەنهایی وای لێدەکات لە خۆی ، لە ناوەوەی، لە لەشی ورد بێتەوە، نهێنیەکانی خۆی بزانێ تا پنتە لاوازەکانی بۆ ئاشکرا بێت و دوایش ببێتە خاوەن ئیرادەیەکی مەزن و بەسەر ئەو بارە نالەبارە دا زاڵ بێت. هەڵبەتە ئەمەیان ڕاستە، بەڵام دەربارەی کەمتەرخەمیم لە نووسین بۆت، داوای بەخشینێکی بێ پایان دەکەم. لە لایەکی دیکەشەوە، من دوو جار بە تەلەفۆن لە گەڵ پزیشکەکەت قسەم کردووە، جاری دووەمیان پێی ووتم: «ئەگەر کار وا بڕوات ئەوە لە ئایەندەیەکی زوو قیت دەبیتەوە». ئێستاش لە خودای گەورە داواکارم بە زووترین کات بەپێوەت ببینمەوە، جارێکی کە لە نزیکەوە چاوە سپی واژییەکانت ببینم زیت زیت بکەونەوە ناو هەمان گوڕ و گەرمی جاران. هەروەکو خۆت دەتووت: «هەرجارێ کە لە نەخۆشخانە دێمە دەرەوە، هەست دەکەم ئەو باوەشە تا بڵێی گەرم و نەرمە...». منیش لەبەر دەمتا دەستەوەستان دەبم. هەنووکەش، ئەگەر تاقەتت هەیە بۆم بنووسە، چی دەکەیت و خەریکی چیت؟ هەر ئەوەندە لە بیهۆدەیی دوور بیت بەسە. ساتەکان، ئەگەر بە بێ تاقەتیش بێت، بە پڕی بەسەریان بەری دەسکەوتێکی گیانی بەهێزە.

چاوەڕێی نامەتم...
هەمیشە شاد بیت
هاوڕێت. ٣/١

لە کەنار دەریا پیاسە دەکەم
گوێم لە دەنگی پەرییەکانی دەریا بوو
گۆرانییان بۆ یەکتری دەووت
باوەڕناکەم بۆ منی بڵێن.

بینیمن بەرەو پانتایی سواری شەپۆلەکان دەبوون
قژی سپی شەپۆلە بەرەودوا پەرشبووەکان دادەهێنا
لە کاتێکدا کە با یاری بە ئاوی رەش و سپی دەکرد.

لەگەڵ پەرییە ڕازاوەکان
بەگیای دەریایی سوور و قاوەیی
خۆمان دەخزێنینە ژوورەکانی دەریا
تا دەنگەکانی ئادەمیزاد بێدارمان دەکەنەوە و
دەخنکێین.

* * *

(١) ئەم چەند دێرە لە «کۆمیدیای خودایی» دانتی . یەوە وەرگیراوە، ئێلیەت هەر بە زمانی ئیتالی لە سەرەتای شعرەکەی نووسیویەتیەوە، منیش لە کۆپیە ئینگلیزییەکەی، کە لەلایەن (ژۆن سیاردی) یەوە کراوە بە ئینگلیزی، وەرم گرتوە.
(٢) ناوی «لازارۆز» دوو جار لە ئینجیلدا هاتووە، جارێکیان لە (یۆحەننا) ناوی هاتووە،برای ماری و مارتایە کە دوای مردنی مەسیح زیندووی دەکاتەوە و دەڵێت:«هەموو شتێکیان فێردەکات، هەموو ئەوانەی من ووتومن بەبیرتانی دەهێنێتەوە». جاری دوەم لە «لۆقا » ناوی هاتووە، سواڵکەرێکە.

سەرچاوەکان:

The Complet Poems and Plays of T.S.ELIOT.London, Faber and Faber, 1969.
2-The Invisible Poet, T.S.ELIOT. Hugh KENNER. London,1959
3- A Student's Guide to the Selected Poems of T.S.ELIOT,3ed ed. London, Faber and Faber.

ئایا پاش گشت ئەمانە، ئەوە دێنێ،
ئایا شایستەی ئەوەیە،
پاش خۆرئاوابوونەکان و بەردەرگا و شەقامە ڕشێنراوەکان،
پاش چیرۆک و ئیستیکان و تەنوورەکان
کە لەسەر زەوی دەخشێن .
ئەمە و زۆری لەمە زیاتر؟ .
مەحاڵە بتوانم مەبەستم دەربڕم:
بەڵام وەک بڵێی فانوسێکی ئەفسووناوی
دەمارەکانی بۆ نموونە فڕێدابێتە سەرشاشە
ئایا ئەوە دێنێ
ئەگەر یەکێک سەرینێک دابنێت یا شاڵێک تووڕ هەڵبدات
ڕووە و پەنجەرە وەرسوڕێ، بڵێت:
«بەهیچ شێوەیەک ئەوە نەبوو،
مەبەستی من ئەوە نەبوو، بەهیچ شێوەیەک».

نە! من میر هاملێت نیم و نەمویستووە ببم بە ئەو
من نۆکەری میرم، یەکێکم ژمارەی دەست و پێوەند زیاد دەکات
یەک یا دوو پەوەدە دەنوێنێ
ئامۆژگاری میر دەکات، بێگومان، ئامرازێکی گوێڕایەڵ
بەڕێز، حەزدەکات سوود ببەخشێ
بلیمەت، هوشیار، دوودڵ
قسەپڕ، بەڵام کەمێک گێل
هەندێ جار، لە ڕاستیدا زۆر جار، پێکەنیناوی .
زۆر جار، هەندێ جار، گەوجەن.

من پیر دەبم...من پیر دەبم...
شەرواڵەکەم سەرەوژێر لەپێدەکەم.

قژم جیا بکەمەوە و هەڵیدەمە دواوە؟
ئایا جورئەت دەکەم خۆخێک بخۆم؟
شەرواڵێک لە فانیلەی سپی لە پێدەکەم

دەبوایە جووتێ چرنووکی ناهەموار بم
بنی دەریا بێدەنگەکان هەڵدڕم.

پاشنیوەڕۆ یا ئێوارە بەئاسوودەیی دەخەوێ!
بە پەنجەی درێژ دڵنەوایی دەکرێ
بۆرژاو...هیلاک...یا خۆی نەخۆش دەکات،
لێرە، لە تەنیشت تۆ، لە تەنیشت من
لەسەر زەوی لێی ڕادەکشێ
ئایا دەتوانم دوای چا و کێک و بەستەنییەکان،
خولەکێک بەرەو گرفتەکانی ببەم؟
بەڵام هەرچەندە من گریام و بەرۆژوو بووم، گریام و پاڕامەوە،
هەرچەندە سەری خۆم (کە کەمێک ڕووتاوەتەوە) بینی
لەسەر سینییەک پێشکەش دەکرا،
من پێغەمبەر نیم و مەسەلەیەکی گەورەش لە ئارا دا نیە
ساتی گەورەیی خۆمم بینی بەلادا دەچوو،
خزمەتکاری هەمیشەییم بینی ساقۆی دەگرتم و بە مۆنیەوە دەگرژیەوە،
بەکورتی، ترسام.

ئایا پاش گشت ئەمانە، ئەوە دێنێ؟
پاش مرەببا و چا و کووپەکان،
لە نێوان شەربە و لە نێوان هەندێ قسەکردن لەسەر تۆ و لەسەر من،
ئایا ئەو کاتە ئەوە دێنێ
مەسەلەکە بە بزەیەک ببڕێنیەوە،
گەدوون بگووشی و بیکەیتە تۆپێک
غلۆری کەیتەوە بەرەو چەند پرسیارێکی سەخت و
بڵێی: «من لازارۆز. م (٢)، لە لای مردووەکانەوە هاتووم،
هاتووم هەموو شتێکتان بۆ بگێڕمەوە، هەموو شتێکتان بۆ دەگێڕمەوە»،
ئەگەر یەکێک سەرینێک بخاتە ژێرسەری،
دەڵێت: «مەبەستی من ئەوە نەبوو، بەهیچ شێوەیەک
ئەوە نەبوو، بە هیچ شێوەیەک».

له خولەکێکدا کات هەیە
بۆ بڕیار و پاشگەزبوونەوە کە خولەکێکی دی لەناویان دەبات.

چونکە من هەموویانم ناسیون، دەمێکە هەموویانم ناسیون،
ئێوارەکان، بەیانییەکان پاشنیوەڕۆکانم ناسیون،
ژیانم بە کەوچکی قاوە پێواوە،
من ئەو دەنگانە دەناسم
کە بە کەوتنێکی گیانەلاٌئامێز
لەژێر مۆسیقای ژوورە دوورەکاندا دەمرن،
جا چۆن جورئەت بکەم؟

من دەمێکە چاوەکانم ناسیون، هەموویانم ناسیون
ئەو چاوانەی دەتخەنە ناو واژەیەکی داڕێژراو
کە داڕێژرام، لەسەر دەرزیلەیەک پان دەکرێمەوە
کە بە دەرزیلەوە دەکرێم و لەسەر دیوار لوول دەدرێم
چۆن دەست بکەم بە هێنانەوەی پاشەرۆکی رۆژ و ڕێگاکانم؟
جا چۆن جورئەت بکەم؟

من دەمێکە قۆڵەکانم ناسیون، هەموویانم ناسیون
قۆڵە پڕ بازن و سپی و ڕووتەکان
(بەلاٌم لەبەر رووناکی چرا بە گەنمەمووی قاوەیی داپۆشراون!)
ئەمە عەتری کراسە وا گێژی کردووم
ئەو قۆلاٌنەی لەسەر مێز درێژ کراون یا لە شاڵ وەرپێچراون.
ئایا ئەو کاتە جورئەت دەکەم؟
چۆن دەست پێ بکەم؟

ئایا، دەتونم بڵێم پاش خۆرئاوابوون بە شەقامە تەسکەکاندا تێپەڕیم
ڕوانیمە دووکەڵی بەرزبوەوەی پایپی ئەو پیاوە تەنهایانەی
کە بە کراسە قۆڵدارەکانیانەوە
خۆیان بەسەر پەنجەرە شۆڕ دەکردنەوە؟

دووکەڵە زەردەکە کە لچی خۆی لە میناى پەنجەرەکان هەڵدەسوێ
گۆشەکانی ئێوارەی بە زمان لێستەوە،
لەسەر گۆمیلکە گیرساوەکانی جۆگەکان خۆی دواخست
تا ئەو تەنیەی لە دووکەڵکیشەکان بەردەبێتەوە بکەوێتە سەرپشتی،
لەسەر سەکۆکە خزی و لەپڕ بازی دا،
کە بینی شەوێکی خۆشی ئۆکتۆبەرە،
جارێک بەدەوری ماڵەکەدا سووڕایەوە و خەوی لێکەوت.

لە ڕاستیدا کات دەبێ
بۆ ئەو دووکەڵە زەردەی بە درێژایی شەقامەکان دەخلیسکێ و
پشتی لە میناى پەنجەرەکان هەڵدەسوێ،
کات دەبێ، کات دەبێ
بۆ ئامادە کردنی ڕووخسارێک بۆ بینینی ئەو ڕووخسارانەی چاوت پێیان دەکەوێ،
کات دەبێ بۆ کوشتن و دروست کردن،
کات بۆ گشت ڕۆژ و کاری دەستی
کە پرسیارێک بەرز دەکەنەوە و هەڵیدەدەنە ناو قاپەکەت،
کات بۆ سەدەها گومان و
سەدەها شەبەنگ و هاتنەوە سەرخۆ،
پێش خواردنی ئەستوک و چایەک.

لە ڕاستیدا کات دەبێ
بۆ لەخۆپرسین، «ئایا جورئەت دەکەم؟» و «ئایا جورئەت دەکەم؟»
کات بۆ گەڕانەوە دواوە و دابەزین لە پلیکانەکان،
بە خۆم و پەڵەیەکی ڕووتاوەی ناوەڕاستی سەرم
(جا دەڵێن: «قژی چۆن ڕووتاوەتەوە!»)
بە ساقۆی بەیانیانم و یاخە ڕێک بەرز بووەکەم تا چەناگە،
کراڤێتەکەم پۆشتە و گرانبەها، بەڵام بە دەرزیلەیەکی سادە ڕاگیراوە
(جا دەڵێن: «دەست و قاچەکانی چەند باریکن!»)
ئایا جورئەت دەکەم
گەردوون بشێوێنم؟

گۆرانی خۆشەویستیی

ج. ئەلفرید پروفرۆک T. S. Eliot

وەرگێرانی لە ئینگلیزییەوە:
نەزەند بەگی خانی

ئەگەر باوەڕم بکردایە وەڵامەکەم بۆ یەکێکە
بە یەکجاری دەگەڕێتەوە بۆ دونیا،
ئەم گڕە چیتر زمانەی نەدەدا.
بەڵام چونکە قەت کەس لەم جیهانە قووڵە نەگەڕاوەتەوە
ئەگەر ئەوەی دەیبیستم راست بێ،
بێ ترس لە ڕوودانی هیچ ناگەهانیەک وەڵامت دەدەمەوە. (١)

دەبا بڕۆین. من و تۆ،
لە کاتێکدا کە ئێوارە وەک نەخۆشێکی بێهۆشکەوتووی سەرمێز
ڕووە و ئاسمان رادەکشێ؛
دەبا بڕۆین، بەناو شەقامە دیاریکراوە نیمچە چۆڵەکان،
بە ناو سڵەمینەوە ووڕێناوییەکانی
شەوە ناڕەحەتەکانی هۆتێلە یەکشەوییە هەرزانەکان و
خواردنگەی ئاردەداراوی و پڕ لەسەدەف:
ئەو شەقامانەی وەک گفتوگۆیەکی بێزارکەری نیازپیس
بەدوای یەک کەوتوون
تا بەرەو پرسیارێکی سەختت ببەن...
ئوە ، مەپرسە، «چییە؟»
لێگەڕێ بابڕۆین زیارەتەکەمان بکەین.

لە ژوورەوە ئافرەتەکان دێن و دەچن
لەبارەی مایکل ئەنگیلۆوە دەدوێن.
تەمە زەردەکە کە پشتی خۆی لە مینای پەنجەرەکان هەڵدەسوێ،

هەر لە کاتی بڵاوبوونەوەی ئەو شعرە، کە یەکەم شعری بڵاوکراوەی ئیلیەت بووە، تا ئێستاش ئیلیەت و شعرەکانی بوونەتە شوێنی دووان و گفتوگۆی زۆر. بابەتی سەرەکی باسەکان، کە ئیلیەت خۆشی لێی دوواوە، بریتییە لە: ئایە ڕاستییە فەلسەفییەکان و ڕاستییە شعرییەکان دەتوانن بەیەکەوە لە شعردا کۆببنەوە؟ بە مانایەکی تر، ئایە دەتوانین لە شعردا بیر و مانا لە هێزی خەیاڵ جیابکەینەوە؟ بە ڕای ئیلیەت «خەیاڵ باوی نەماوە و بەد بووە، پێویستە پشت بە هۆش و ژیری و هەستیاری ببەستین» بە پێچەوانەی شاعیرە ڕۆمانسیەکان کە دەڵێن: «خەیاڵ و سروشت و شوێنی هێزە شاراوەکانی ناوەوەی مرۆڤ کانگای چاکەخوازی و پاکیزەین». ئیلیەت لەگەڵ ڕای (کانت) یەکدەگرێتەوە کە دەڵێ: «سروشتی ڕووت چاکەخوازی ناگرێتە خۆی، هەموو بەها مۆڕالیەکان ناسروشتین». بە ڕای ئیلیۆت یاسای ئەمڕۆی جیهان پێویستی بە لەناوبردنی ڕۆمانسیەت هەیە کە هەروەکو ڕەخنەگر (هیوم) دەڵێ «لە شێوەی ئایین خۆی سەپاندووە».

دەبێ ئەوە بهێنینەوە یاد کە هەر لە یەکەم سەفەریەوە بۆ فەرەنسا، ئیلیەت کەوتوەتە ژێر کاریگەری شاعیرە سامبولیەکانی فەرەنسی، بە تایبەتی بۆدلێر کە بۆ بەرەنگاربوونەوەی ڕۆمانسیەت دەڵێ: «پێویستە خۆمان لە دڵ ڕزگار بکەین».

سەرەڕای هەموو ئەمانە، ئەو ئەپستراکت و چەمک و ڕوانینانەی ئیلیەت لەو کات و شوێنەوە سەری هەڵداوە کە ئەوی تیا ژیاوە. ئیلیەت سۆز و نۆستالژیایەکی زۆری هەیە بۆ ڕابردوو، بۆ دین، بۆ سەردەمی مندالی کۆمەڵگا و بەرپەرچدانەوەی کۆمەڵگای پیشەسازی کە بە ڕای ئەو بۆتە هۆی ڕووخانی مرۆڤایەتی، بەلام ئەو بە چاوی ئەقڵ و هۆش شتەکان دەبینێ و بیر دەخاتە قالبی زمانی شعرییەوە. زمانی ئیلیەت زمانێکی پیر و زیندووە، پیرە بە قەد پیری کۆمەڵگا.

لە کۆتاییدا دەڵێین «گۆرانی خۆشەویستی ج- ئەلفرێد پروفرۆک» نالانەوەیەکی میلانکۆلیانەی مرۆڤی سەدەی بیستەمە.

لە ئیلیەت ـ یان پرسی: «لە شعرەکانتدا دەتەوێ چی بڵێی..؟»

لە وەڵامدا دەڵێ: «تەنها ئەوەی کە شعرەکان خۆیان دەیڵێن».

لەگەڵ چەند ئافرەتێکی بێباک، هەموو جیهانی ڕابواردنن. جیهانێکی هەڵخەڵتێنەر و شێوەپەرست و بێناوەڕۆک کە مرۆڤ بەرەو نامۆیی و وونبوون دەبات، بەرەو باوەڕ بەخۆتەمان و هەستکردن بە کەمی و نەبوونی هیچ توانا و جۆرئەتێک لە شەقکردنی دیواری نێوان تاک و کۆمەڵ. ئافرەتەکانیش لە ناو باڕ و قاوەخانەکان، بە قوڵی سپی و ڕووت و موواویانەوە دێن و دەچن و باسی (مایکل ئەنگیلۆ) دەکەن. (مایکل ئەنگیلۆ) دوو واتا دەگەیەنێت: لەوانەیە دۆست و خۆشەویست و شاسواری خەونی ئەو ئافرەتانە بێت کە بەتاڵن و لەباسکردنی پیاوەکانیان زیاتر هیچ باسی دیکەیان لانیە. لەوانەشە مەبەست (مایکل ئەنگیلۆ) ی هونەرمەند بێت کە بۆ مەبەستی خۆبەزل زانی و خۆ دەرخستن دەیلێنەوە. لە ناو کۆمەڵگایەکی پڕ لە چەپاندن و درۆ، ئافرەت وێنەی ڕاستەقینەی وونبوە و بۆتە شوێنی ڕشانەوە و بێزهێنانەوەی پروفرۆک.

دڵی پروفرۆک خۆشەویستی و سۆز دەخوازێت، کەچی مرۆڤەکان ، ئاو و هەواو بارەکە تووشی سڕبوون و دڕان و ڕەشبینی دەکەن. هەندێ جاریش گیانێکی کۆمیدی لە ناودا قیت دەبێتەوە و دەکەوێتە وورێنە کردن و گاڵتەبەخۆکردن. ناتوانێ هیچ کام لەو بڕیار و بەڵێنانەی کە بە خۆی - یان دەدا بیانگەیەنێتە سەر، دڵی خۆشی بەوە دەداتەوە کە «کات دەبێ، کات دەبێ».

کات دەبێ لە داهاتوویەکی تێکشکاو و تواوە لە ناو ئێستای لەهۆشخۆچوویدا. مرۆڤ لەم بار و ئاووهەوایەدا ناوەوەی دەبێتە سەر شانۆی پارچە دژبەیەکەکانی خود و بوون- ی، لە وورێنەکردن زیاتر هیچی بۆ نامێنێتەوە. ئەو پارچە پارچە بوون و وورێنەکردنە هەر لەیەکەم دێری شعرەکەدا هەستی پێدەکرێ: «دەبا بڕۆین، من و تۆ». ڕەخنەگران زۆر لەسەر ئەم دێرە دوواون، «تۆ» کێیە؟ بەڕای من وە بەپێی ناوەڕۆکی شعرەکە (من و تۆ) لە دوو پارچە کەسایەتی دژ بەیەکی خودی پروفرۆک، خودی هەموو تاکە کەسێکی سەر بەم کۆمەڵ و سەردەمە زیاتر نیە.

پروفرۆک بەئاگایە، هەست بە هەموو شتەکان دەکات، بەلام سڕ بووە و ناتوانێ بجوولێتەوە و بە هیچ کارێک هەلسێت کە دژی شەپۆلی ناهەمواری و دژواری ئەم بارە بێت. هەندێ جار خۆی لە ناو هەمان باری گومان و خۆخواردنەوە و دڕانی (هاملێت) دا دەدۆزێتەوە، کەچی هەر خۆی جیاوازیەکە دەبینێ : «نە، من میر هاملێت نیم و نەمویستوە ببم بە ئەو». هاملێت دەگاتە ئەنجام و بڕیارێک دەدات، بەلام پروفرۆک دوودلە و جورئەت ناکات و شتەکان هەلدەگرێ بۆ ئەو کاتەی کە (کات دەبێ)، هەر دوای ئەوەش هاوار دەکات:

من پیر دەبم... من پیر دەبم...

شەرواڵەکەم سەرەو ژێر لە پێ دەکەم.

لەوانەیە ئەم دێرە بە شێوەیەکی کۆمیدی بێتە گوێی خوێنەر، کەچی پروفرۆک لەو پەڕی ئاگایي دایە و ڕاستییەکی وجودی دڵتەزێن دەدرکێنێ و تۆش لەگەڵ خۆی بێدار دەکاتەوە.

لە چواری کانوونی دووەمی ساڵی ١٩٦٠ لە لەندەن دەمرێ و لەسەر ڕاسپێری خۆی لاشەکەی دەسووتێنن و خۆڵەمێشەکەی لە کەنیسەی (کۆکەری ڕۆژهەڵاتی) دادەنێن.

هەڵوەستەیەک لەبەردەم «گۆرانی خۆشەویستی ج. ئەلفرێد پرۆفرۆک»

پرۆفرۆک لاوێکی پیری هەستیار و ڕاڕا و نائومێد و دۆڕاوە لەناو کۆمەڵگای سەدەی بیستەمی ئەورووپی، سەردەمی پیشەسازی و بە ماشێنکردنی مرۆڤ و سەردەمی دوو جەنگی جیهانی. پرۆفرۆک تەنها سامبولێکە، تەنها کەسێکە لەناو میلیۆنەها کەس کە لە هەمان باری سڕبوون و ڕەشبینی و تەنهاییدا «ژیانیان بە کەوچکی قاوە دەپێون...».

ئایا دەتوانین بڵێین پروفرۆک ئێلیەت خۆیەتی؟ نەخێر. لە ووتارێکدا دەربارەی دەنگ لە شعردا، ئێلیەت باسی سێ دەنگ دەکات لە شعردا: یەک ـ دەنگێکە لە ناوەوەی شاعیر لەگەڵ سەرهەڵدانی چەمکی شعرەکە دێتە گۆ. دوو ـ دەنگی شاعیر خۆی. سێیەمیان دەنگی کسایەتیەکی دروست کراوە لە لایەن شاعیرەوە. لێرەدا، بە پێی ووتارەکەی ئێلیەت، پرۆفرۆک دەنگی سێیەمە، کسایەتیەکی دروستکراوە لە دەرەوەی ئێلیەتە و ناوەوەی ئێلیەت نەخش ناکات، سەرچاوەی ئازارو خەمی ئێلیەت لە دەرەوە، لە ناو ڕیالیتێکی ئۆبژێکتیڤەوە هاتوە. بە پێچەوانەی شاعیرە ڕۆمانسی و سامبولیەکان کە گرفتەکەیان ڕۆحییە و لە ناوەوە سەرهەڵدەدات. گرفتی پروفرۆک گرفتی لاوێکی پیرە لە ناو کۆمەڵگایەکی پیر، لە ناو کۆمەڵگایەک کە بەرەو ڕووخان و وێرانبوون دەچێت، مرۆڤ لە ناویا بووە بە دوو پارچە: لە نێوان حەز و خواست و ئارەزووەکانی لە لایەک و ئیفلیج بوون و باوەڕبەخۆنەبوون و ڕاڕایی و سڕبوون لە لایەکی تردا دڕاوە. شعری پروفرۆک سەرەتای بابەتێکی سەرەکی و سەرەتای فەلسەفەی ئێلیەتە کە لە شعر و نووسینەکانی دوایدا ڕەنگی داوەتەوە. لە لای ئێلیەت هەڵسەنگاندنی شعری لە باوەڕ و چەمکە فەلسەفیەکان جیانابێتەوە.

ئێلیەت ئەم شعرە بە چەند دێرێکی «کۆمیدیای خودایی» دانتی دەست پێدەکات کە لە سەر زمانی یەک لە کسایەتیەکان لە دۆزەخەوە دەدوێ. سەرەتای ڕاگەیاندنی چەمکە فەلسەفیەکە لێرەوە دەست پێدەکات. ئەو پروفرۆک بەو کەسە دەچوێنێ کە لە دۆزەخەوە دەدوێ، دەیەوێ بڵێ ئەو جیهانەی کە پروفرۆک ـ ی تیا دەژی دۆزەخێکی دونیاییە. کات ئێوارەیەکی نەخۆشە لە سەر مێزی ئۆپێراسیۆن بێهۆش کەوتووە و ساتەکان پڕن لە چپەچپ و نیگەرانی. تەم و مژ و دووکەڵێکی زەرد بە سەر شەقامەکاندا دەخلیسکێن و خۆیان لە پەنجەرەکان هەڵدەسوون. شەقامەکان چۆڵن و پیاوە تەنها و بێ هیواکان خۆیان بە سەر شیشەی بالکۆنەکاندا شۆڕکردۆتەوە. لەو لاشەوە پیالەی چا و قاوە و تەنورەی درێژ و کێک و بەستەنی و کۆبوونەوە

لە ساڵی ١٩١٥ لە نووسینی یەکەم شعری «گۆرانی خۆشەویستی - ج - ئەلفرێد پرۆفرۆک» دەبێتەوە و دەینێرێ بۆ (ئێزرا پاوند)، ئەویش بەلایەوە پەسەند دەبێ و دەینێرێ بۆ سەرنووسەری گۆڤاری «شعر» کە لە شیکاگۆ دەردەچوو، هەر لە هەمان ساڵدا بڵاو دەبێتەوە و گفتوگۆ لە ناو رەخنەگران دروست دەکات.

ماوەیەک لە لەندەن دەبێ بە مامۆستای سەرەتایی و لەهەمان کاتیش لەرێگای نامەگەری لەگەڵ دانیشگای (هارڤارد) خەریکی نووسینی نامەی دکتۆراکەی دەبێ بە ناونیشانی: «تاقیکردنەوە و بابەتی زانستی لە فەلسەفەی ف - هـ - برادلی». برادلی فەیلەسوفێکی ئینگلیزییە و تایبەتمەندی فەلسەفەی (هیگل)ـە؛ هەر ئەمە وای لە ئێلیەت کردووە بەگەرمی بکەوێتە ناو فەلسەفەی (هیگل)ـەوە کە لە زۆر لە شیعرە سەرکەوتوەکانیدا رەنگی داوەتەوە.

لە مەیدانی شعر دا، لە سەرەتای ژیانیدا، ئێلیەت کەوتۆتە ژێر کاریگەری شاعیرە رۆمانسیەکان، بە تایبەتی (بایرۆن)، بەڵام هەر زوو شاعیرە سامبۆلییەکانی فەرەنسی، بە تایبەتی «بۆدلێر» و شاعیرە میتافیزیکییەکان و شاعیری ئیتالی (دانتی) لەم رێبازەی لادەدەن.

لە سەرەتای ساڵی ١٩١٦، ئێلیەت دەست بە کارکردن دەکات لە مەیدانی رۆژنامەگەری، سەرپەرشتی دەرهێنانی گۆڤاری (لایگۆست) دەکا و لە ساڵی ١٩١٩ دەبێ بە سەرنووسەری پاشکۆی ئەدەبی (تایمز)؛ هەر لەم ماوەیەشدا دەبێ بە فەرمانبەر لە بانکێک و ماوەی دە ساڵ تیایدا بەردەوام دەبێ.

لە ساڵی١٩٢٢ ئێلیەت بۆ جاری دووەم دەچێتەوە فەرەنسا، لەوێ شعرە بەناوبانگەکەی «وێرانەخاک» دەنووسێ و کە دەگەرێتەوە دوای دەستکارییەکی زۆر لە لایەن (ئێزرا پاوند) ـەوە بڵاوی دەکاتەوە و سەرکەوتنێکی یەکجار مەزن بەدەست دەهێنێ. دوای ئەوە واز لە کارکردن لە بانک دەهێنێ و لە دەزگای بڵاوکردنەوەی Faber and faber دادەمەزرێ. ئەم دەزگایە تا ئێستاش بەردەوام کارەکانی ئێلیەت چاپ دەکاتەوە.

ئێلیەت لە رەسەندا پرۆتستانتە، بەڵام دوای ئەوەی رەگەزنامەی بەریتانی وەردەگرێ دەبێ بە کاتۆلیک. لە ساڵی ١٩٣٢ دوای بڵاو کردنەوەی «مرۆڤە پووکاوەکان» و «چوارشەممەی خۆڵەمێش» قۆناغێکی نوێ لە ژیانی ئێلیەت دەست پێدەکات؛ ئەویش قۆناغی رەخنە و شانۆگەری نووسینە. هەر لە هەمان ساڵدا لەسەر خواستی دانیشگای (هارڤارد) دەچێتەوە ئەمریکا و چەند کۆرسێک لەبارەی رەخنە و شعر دەڵێتەوە کە لە پاشاندا لە شێوەی کتێبێک بە ناوی «سوودی رەخنە و شعر» چاپیان دەکات.

لە ساڵی ١٩٤٤ شعری «Qatre Quators» بڵاو دەکاتەوە، کە کاریگەریەکی زۆری سۆفیەت و میتافیزیکی بەسەرەوە دیارە. لەساڵی ١٩٤٨ خەڵاتی (نۆبل) ی پێ دەبەخشرێ.

کورتەیەک لە ژیانی تۆماس ستیبێرنز ئیلیەت

و

شعرێکی وەرگێڕدراو

نەزەند بەگیخانی

ت. س. ئیلیەت لە ٢٦ ی کانوونی دووەمی ساڵی ١٨٨٨ لە «سانت لویس (ئەمریکا) لە دایک بووە، بچووکترین منالی خێزانێکی خاوەن حەوت منالْ بووە. دایکی (شارلۆت) کچی خێزانێکی چینی ناوەڕاست بووە و زۆر حەزی لە ڕۆشنبیری و ئەدەب، بە تایبەتی شعر کردووە. یەکەم کاریگەر و هاندەری کوڕەکەی بووە لە گرتنی ئەو ڕێبازە. لە ساڵی ١٩٠٥، باوکی دەینێرێتە ئەکادیمیای (هارڤارد) بۆ ماوەی ساڵێک و دواییش لە دانیشگا بۆ ماوەی سێ ساڵ فەلسەفە دەخوێنێ. لەم ماوەیەدا، لەوێ، دوو فەیلەسووفی بەناوبانگی ئەو کات «جۆرج سانتیانا» و «ویلیەم جێمس» دەناسێ. هەر لەو کاتەوە فەلسەفە کارێکی زۆری تێکردووەو بە درێژایی ژیانی لە شعر و نووسینەکانیدا ڕەنگی داوەتەوە.

لە ساڵی ١٩٠٩ (ئێزرا پاوند) و کۆمەڵێ شاعیری دی کە لە دەوری ڕەخنەگری ئینگلیزی (ت . ا . هیوم) دا کۆببونەوە، قوتابخانەی (ئیماژی) دادەمەزرێنن. گرینگی سەرەکی بە فۆرم و ڕیتمی ناوەکی لە شیعر دا دەدەن. ئیلیەتیش دەچێتە ناو ئەو قوتابخانەوە، کەچی هەر زوو، بە تایبەتی دوای کوشتنی «هیوم» لە شەڕی جیهانی یەکەم دا، ئەم قوتابخانەیە بەجێ دەهێڵێ؛ بەلاّم کاریگەری ئەو کۆمەڵەی، بە تایبەتی (ئێزرا پاوند) ی هەر لەسەر دەمێنێ.

لە ساڵی ١٩١٠، ئیلیەت دەچێتە فەرەنسا، لەوێ بۆ ماوەی ساڵێک فەلسەفە و ئەدەب لە سۆربۆن دەخوێنێ و ئامادەی چەند کۆرسێکی فەیلەسوفی فەرەنسی (بێرگسۆن» دەبێ) بەلاّم بە دڵی نابێ و دەگەڕێتەوە (هارڤارد) و بۆ ماوەی سێ ساڵ خەریکی خوێندنی دەروونناسی و زمانی سانسکریتی و سۆفیگەری هیندی دەبێت. لەوێ پەیوەندی لەگەڵ (بەرتراند روسێل) دروست دەکات و بۆماوەیەکی کەم لە دانیشگای (هارڤارد) دەبێ بە مامۆستای فەلسەفە، بەلاّم هەر زوو واز دەهێنێ و بەرەو ئینگلتەرە کۆچ دەکات و لەوێ، لە دانیشگای (ئۆکسفۆرد) دەست دەکات بە خوێندنی فەلسەفەی یۆنانی.

نەدیوە. لە روانگەیەکی دیکەوە نرخی ئەو نووسراوەیە لەوەدایە کە نووسەر باسی هەر شتێک دەکا، بە ژمارە و پێوان هەڵیان دەسەنگێنێ. رێگاکان دەپێوێ، نرخ و بەهای زۆر شتان باس دەکا، دانیشتوانی جێگایان دەژمێرێ و هتد... . ئەو ژمارانە دەتوانن ببنە سەرچاوەی ساغ کردنەوەی زۆر ئاماری بە نرخ.

* * *

پەراوێزەکان

١. بە وتەی دوکتور محەممەدی دەبیر سیاقی، رێگای ناسر خوسرەو دەبێ لە (خۆی) را دەستی پێکردبێ بەرەو (وان) و (وەستان) و پاشان بۆ (بەرکەری) و (اخلاط) و (بەتلیس).

٢. خاوەنی ئەم کتێبە: ئەو وشەیە رێگای دوو لێکدانەوە بە خوێنەر دەدا. یەکەم ئەوە کە ناسر خوسرەو نوسراوەکانی رۆژانەی سەفەری، خستوتە بەردەست کەسێکی ترەوە کە ئەو کتێبەکەی نووسیوە. دووهەم ئەوە کە مەبەستی «خاوەنی ئەو کتێبە» دەگەرێتەوە بۆ نووسەر واتا خودی ناسر خوسرەو. ئەو شێوە نووسینە بە تایبەت لەو کاتەدا لە نێو ئێرانییەکان باو بووە. مەبەستی نووسەر لەم لێکدانەوەیە ئەوەیە کە سەرەرای نەقلێکی زۆر کە لەم بابەتانەوە هەیەتی، بە هێنانەوەی ئەو چەند بابەتە قەناعەتی کردووە.

٣. سەرنجی خوێنەر بۆئەوە رادەکێشین، کە ناسر خوسرەو پاش گەرانەوە لە سەفەری حەوت ساڵەی، ئەو بیرەوەریانەی، لەرووی کورتە نوسراوەکانی، دەهێنێتە سەر کاغەز. کاتێک دەڵێ شاری وەک ئامێدم لە هیچ کوێ نەدیوە، مەبەستی ئەو شارانەشە کە لە پاش «ئامێد» و «دیاربەکر» دەیان بینێ.

سەرچاوەکان

بە فارسی: «سفرنامه ناصر بن خسرو قبادیانی مروزی». دکتر محمد دبیر سیاقی.

بە ئینگلیزی:

History of Iranian Literature
D. Reidel Publishty Company, Dordrecht - Holland 1968. Jan Rypka.

مزگەوتی جەماعەتی ئەو شارەش هەر لەو بەردە رەشەیە. مزگەوتی وا قایم و بە حوکم هەر نابێتەوە. تەنانەت ژووری نوێژکردنی، زیاتر لە دوو سەد کۆڵەکەی هەڵگرتووە، یەک تەخت لە بەرد داتاشراوە. لە سەر ئەو کلەکانە بە بەرد تاق داهێندراون کە ئەوانیش کۆڵەکەی چکۆڵەتریان هەڵگرتووە و ئەو کۆڵەکانە دەبنە بناغەی تاقێکی گەورە. تەواوی بانەکانی مزگەوت بە خەرپشتە داپۆشراون و بە جوانی نەجاری و نیگارکێشی کراون. لە ناو حەساری مزگەوت دا حەوزێکی خڕ دروست کراوە، بنی لە بەردێکی یەک تەخت دارێژراوە. دەوری ئەو حەوزە بە ۱۰ گەز دەگا. گەروویەکی برینجی لە نێوەڕاستی ئەو حەوزە ئاوێکی روون بە هێز دەردەداتە دەرەوە. شوێنی دەست نوێژهەڵگرتنی گەورەیە و هێندە جوان دروست کراوە کە لەوە باشتر نابێتەوە! جگەلەوەی کە بەردی عیمارەتی «ئامێد» هەمووی رەشە و ئەوەی «مەیا فارقین» سپی یە. لە تەنیشت ئەو مزگەوتە کلیسایەکی زۆر گەورە هەیە. تەواوی حەساری ئەو کلێسایە بە دەستی نیگارکێشان نەخشێندراوە. لە شوێنی نیایشی ئەو کلێسایە دەرگایەکی خانوویەکم دی کە لە هیچ جێگایەک لەم چەشنەم نەدیبوو.

لە شاری «ئامێد» ڕا بۆ «حوڕان» دوو رێگا هەیە. یەکێکیان چل فرسەخە و هیچ ئاوەدانییەکی لە سەر رێ نیە. ئەوی تریان پڕە لە ئاوەدانی و دێهات. زۆربەی خەڵکی ئەو جێگایە گاورن و درێژایی ئەو رێگایە دەگاتە شێست فرسەخ....

ئێستا کە لە ناوەڕۆکی نوسراوەی ناسر خوسرەو ئاگادار بووین، دەتوانین بێ ئەوەی دوور بڕۆین، ئەو راستییە دەربڕین کە رابردووی شارستانیەتی گەلی کورد چەندە دەوڵەمەند بووە. ئەوە راستە کە ناسر خوسرەو تەنانەت جارێکیش وشەی کوردی بە زار دا نایە و کەسیش ئەوە بە رەخنە نازانێ. چونکو لە سەدەکانی ناوەڕاستدا، ئەو وڵاتانەی ناسر خوسرەو پێیاندا دەڕوا لە ژێر دەستەڵاتی تازەی ئیسلامدا، هەموو چەشنە فەرق و جیاوازییەک شاردراوەتەوە. لە لایەکی دیکە، بوونی کۆمەڵان وەک «گەل» زۆر پاشتر لە سەدەکانی ناوەڕاستەوە دەست پێدەکات. وا وێدەچێ نووسەر خەڵکی ئەو وڵاتەی دەگەڵ تورک و هەرمەنی لێ تێک چووبێ. چونکو باسی هەرمەنییان لە یەک دوو جێگا دێنێ. بەڵام نەهێنانی وشەی کورد، تەنانەت وەک زمانێک کە ئەو کاتە خەڵکی ئەو شارانە قسەیان پێکردووە، لە لایەن ناسر خسرەوەوە جێگای سەرسوڕمانە. با ئەوەش لەبیر نەکەین کە ناسر خوسرەو بەچاوێکی زۆر موسوڵمانانە سەیری دنیای کردووە.

ئەو چەند لاپەڕەیەی ناسر خوسرەو لە سەر کوردستانی نووسیوە، میراتێکی گەورەی مێژووییە. ناسر خوسرەو کە لە ئێران ژیاوە و ئێرانی ئەو کاتیش کانگای شارستانییەت و ئارشیتێکتوری سەرسوڕهێنەر و ئەدەب و هونەر بووە، ناتوانێ بەرامبەر بە گەورەیی شارستانییەتی کوردان ئەوە بشارێتەوە، ئەوەش بە چەندین جار، کە شتی وای قەت لە هیچ کوێ

خوتبەی ئەم شارە، لە ژێر ناوی سوڵتان، بەم چەشنە دەخوێنرایەوە: «الامیر الاعظم، عزالاسلام، سعدالدین نصرالدولە و شرف الملە ابو نصر احمد». واتا « ئەمیری هەرە گەورە، مایەی سەربڵندی ئیسلام، سعدالدین نصرالدولە و مایەی شەرەفی گەلەکەی، ابو نصر احمد».

تەمەنی سوڵتان سەد ساڵە و واحیدی تەرازووی چوار سەد و هەشتا درهەمە. ئەو ئەمیرە شارێکی دروست کردووە کە تەنیا چوار فرسەخ لە «مەیا فارقین» دوورە و ناوی نراوە «نصریە». لە نێوان «ئامێد» و «مەیا فارقین» نۆ فرسەخ رێگایە.

شەشی رێبەندان گەیشتینە شاری «ئامێد». بناخەی ئەو شارە لە سەر بەردێکی یەک تەخت دانراوە. درێژایی و پانایی شار دەگاتە دوو هەزار هەنگاو. لە دەورەی شار، بە بەردی رەش کە بە خشت بڕدراون، وارشێک کێشراوە. قورسایی هەر خشتێک لە نێوان سەد مەن تا هەزار مەن دایە. ئەو خشتانە وا بەیەکەوە نووسراون کە نێوپڕەیان نە قوڕی ویستوە نە گێچ. بەرزایی وارشەکە بیست ئەرەش (ئەرەش ئەندازەی قامکی نێوەڕاستی دەست تا سەر ئانیشکە - و پانایی بە ۱۰ ئەرەش دەگات. لە سەر هەر سەد گەزی بڵیندی ئەم وارشە، بورجێک بە شوعاعی هەشتا گەز دامەزراوە. کزنگرە (تاق) کانیشیان هەر بەو گاشە بەردە رەشانە داناوە. لە لای ژووری شار ڕا بۆ ئەم شوورە، لە زۆر جێگا نێردیواری قایم دابەستراون. لە سەر هەر بورجێک شەرگەیەک هەیە. ئەم شارە چوار دەروازەی لە چوار رووی دنیا هەیە، هەمووی لە ئاسن و بە بێ دار دروست کراون و دەروانێتە روانگەیەک. ئەوەی رۆژهەڵاتیان «باب الدجلە»، رۆژئاوا «باب الروم»، باکوور «باب الارمن» و ئەوەی خواروویان «باب التل» نێو نراوە. لە دەرەوەی ئەم وارشە، شوورێکی دیکە هەیە، لە هەمان بەردەڕەش دروست کراوە و بەرزایی دە گەزە. لە سەر ئەم شوورە تاقێک لێدراوە لە ناوەوەی دا پیاو بە چەکەوە دەتوانێ راوەستێ و شەڕ بکا. دەروازەی ئەم وارشەش لە ئاسن دروست کراوە. دەروازەکانی شووری دەرەوە دژ بە دەروازەکانی وارشی ژوورەوە سازکراون تا کو لە رۆژی مەبادا، ئەگەر دوژمن لە شووری هەوەڵ تێپەڕ بوو، ماوەیەکی پێ بچێ تا دەگاتە دەروازەی وارشی دووهەم. ئەم دوو شوورە پانزدە گەز لەیەک دوورن.

لە ناو شار سەرچاوەیەک هەیە لە سەختە بەردی خارا (بە فەرەنسی :Granit) هەڵدەقوڵێ. قووڵایی ئەم سەرچاوەیە پێنج ئاشی پێ دەگەڕێ. ئاوێکی زۆر خۆش کە کەس نازانێ لە کوێوە دێ. لەو شارە دار و مەیدانێکی زۆر هەیە لە سەر ئاو ساز کراون. ئەمیر و حاکمی ئەم شارە کوڕی «نصر الدولە» یە کە لە پێشدا باسمان کردووە. من لە سەرانسەری دونیادا گەلێک شار و قەلاّم دیتوە، لە نێو عەرەب و عەجەم و هیند و تورک، بەلاّم شاری وەک «ئامێد» م لە هیچ کوێ نەدیوە (٤)، لە کەسیشم نەبیست کە بڵێ «جێگایەکی ئاوام دیوە».

ڕۆژی بیستی جەمادی هەوەڵ بەرەو شاری «ڕەبات» وەڕێ کەوتین. بەفر و سەرمایەکی سەخت بوو. بەر لە گەیشتن بەم شارە، لە مەودایەکدا، کۆڵەوەژ لە سەر ڕێگا چەقێنرابوون بۆ ئەوەی لە تەپوەژ و بەفردا ڕێگا ون نەبێ. پاشان گەیشتینە شاری «بتلیس». ئەم شارە لە نێو دۆڵێک دامەزراوە. سەد مەن (٢) هەنگوینمان بە دینارێک کڕی. دەیان گێڕاوە لەو شارە یەکێک هەیە ساڵێ ..٣٠ تا ..٤٠ شانە هەنگوین دەبڕێتەوە. لە دەرەوەی شار قەڵایەکمان دیت، «قف و انظر» واتا ڕاوەستە و بڕوانە». کە لە وێ تێپەڕ بووین، مزگەوتێکمان بەرچاوکەوت کە بەدەستی «ئەویسی قەرەنی» ـ خوا گیانی پیرۆز کا ـ دروست کرابوو. لەم دەوروبەرە ، لە چیا، خەڵک دارێکیان دەبڕی. پرسیمان چ لەو دارە دەکەن؟ وەڵامیان داینەوە کە: سەرێکی لە ئاور دەخەین، لە سەرەکەی دیکەی کەتیرە دەردەکەوێ. ئەو کەتیرانە لە چاڵاوێک کۆ دەکەینەوە و بە باری وڵاغان دەیبەینە شار.

ئەو وڵایەتانەی پاش «ئەخلات» نێو بران و بە کورتی باسمان کردن، سەر بە «مەیا فارقین» حیساب دەکرێن. پاشان چووینە شاری «ئەرزەن». شارێکی ژیکەڵە و ئاوەدان بوو. ئاوێکی ڕوون و باغ و باغات و بازاری جوانی زۆری هەبوو. فارسان لە مانگی «ئازەر» دوو سەد مەن ترێیان بە دینارێک دەفرۆشت. بەو ترێیەیان دەگوت «ڕەزی ئەرمانوش». ڕۆژی هەینی ٢٦ی جەمادی هەوەڵی ساڵی چوار سەد و سی و هەشت گەیشتینە «مەیا فارقین». مەودای «ئەخلات» و « مەیا فارقین» بیست و هەشت فرسەخە. ئەگەر لە «بەلخ» ڕا، بەو ڕێگایەی ئێمەی پێدا هاتووین تا «میا فارقین» بپێوین، پێنج سەد و پەنجا و دوو فرسەخ دەکا. کە گەیشتینە «مەیا فارقین» گەڵای داران هەروا شین بوو. قەڵایەکی مەزنی سپی لێ بوو کە لە بەرد ساز کرابوو. قورسایی هەر گاشە بەردێک پێنج سەد مەن و لە سەر هەر پەنجا گەزێک، بورجێکی گەورە دروست کرابوو. لێواری سەرووی دیوارەکان هەر بەو بەردە سپییە، بە شێوەی ددان دانرا بوو و دەتگوت هەر وێستا وەستا دەستی لێکێشاوەتەوە. یەکێک لە دەروازەکانی ئەو شارە لەلای ڕۆژئاوایە. دەرگایەکی ئاسنی بێ ئەوەی داری تێدا بەکار هێندرابێ، بە تاقێکی قورس بەو دەروازەیە کێشرا بوو. ئەگەر باسی مزگەرتی جەماعەتی ئەو شارە بکەین تەواو نابێ، هەر چەندە خاوەنی ئەم کتێبە (٣) نەقڵێکی تەواوتری هێناوەتەوە. بۆ وێنە شوێنی دەستنوێژ هەڵگرتنی لە چل حوجرە زیاترە. دوو جۆگەلە ئاو بە هەموو خانووەکاندا دەگەڕان. یەکێکیان بۆ بەکارهێنان و ئەوی تریان بە داپۆشراوی ، بۆ پاک کردنەوەی چاڵاوەکان. لە دەورەی ئەو شارە، لە شارۆچکەی «ڕەبز» کاروانسەرا و بازاڕێکی زۆر هەیە و مزگەوتی جەماعەتێکی دیکەی لێیە کە ڕۆژانی هەینی لەوێش نوێژ دەکرێ. لە لای سەروو شارۆچکەیەکی دیکە هەیە کە «محدثە»ی ناوە. ئەو شارەش بازاڕ و مزگەوتی جەماعەت و حەمامی زۆری هەیە کە بە قەوارەیەکی خۆش دروست کراون.

له تەمەنی چل ساڵیدا، بۆ کاروباری دەربار دەچێتە شاری «مەرو». لە بەر چەند هۆیەکی نادیار لەم شارە وەدەردەنرێ و پاش ئەو رووداوە سەفەرێکی حەوت ساڵانە دەست پێدەکا کە لێرە دا ئامیانی باسەکمانە.

ئەم سەفەرە کە بۆ زیاتر لە نۆسەد ساڵ لەمەوبەر دەگەڕێتەوە، هەنگاو بە هەنگاو دێتە سەرکاغەز و ئیمڕۆ بە چەندین زمان لە چاپ دراوە. ناسر خوسرەو لە ڕێگای ڕۆژئاوای سەرووی ئێرانی ئەمڕۆ، «تەوریز» و «خۆی» بە ڕێگای کوردستانی تورکیە دا تێپەر دەبێ و ئەوەی وەبەر چاو دەکەوێ بە زمانێکی روون و پاراو لە چوارچێوەی ستیلی کۆنی فارسیدا دەیگێڕێتەوە. نوسراوەی ناسر خوسرەو لە دوای زیاتر لە ٩٠٠ ساڵ، ئاوێنەیەکی ژیانی ڕۆژانەی چەند شارۆچکەیەکی کوردە. پێویستە بگوترێ کە مەبەستی ناسر خوسرەو بە هیچ چەشنێک وەسف کردنی کوردستان نەبووە، بەڵکو گەیشتن بە «مەکە» و «بیت المقدس» و «میسر» بووە.

پوختەی مێژووی سەفەری ناسر خوسرەو بەم شێوەیەیە:

دەست پێکردنی سەفەر، ڕۆژی ٢٣ی شەعبانی ٤٣٧ی (هـ.ق) (١٠٥٨ی ز)، گەیشتن بە «بیت المقدس»، ڕۆژی پێنج شەمۆ، پێنجی ڕەمەزانی ساڵی ٤٣٨ (هـ.ق)، ڕێکەوتی یەکی خاکەلێوە، ٢١ی مارسی ١٠٥٩ی زایینی.گەڕانەوە لە سەفەر و گەیشتن بە «بەڵخ»، ڕۆژی ٢٢ی ئابان، ڕێکەوتی ٢٦ی جەمادی ئاخری ٤٤٤ (هـ.ق)، (١٠٦٥ زایینی).

پێش لێکۆڵینەوە و دەربڕینی بیروڕا سەبارەت بە نوسراوەی ناسر خوسرەو، با سەرنج بدەینە سەر وەرگێڕاوی کوردی چەند لاپەڕەیەک کە ناسر خوسرەو نووسیونی :

«.. ڕۆژی ١٤ی ڕەبیعول ئەوەل لە «تەوریز» ڕا بەرەو «مەرەند» وەڕێ کەوتین. لە ڕێگا دەگەڵ لەشکری ئەمیر وەهسودان کەوتین کە تا «خۆی»یە هاوڕێمان بوون. لە «خۆی» ڕا دەگەڵ قاسدێک چووینە «بەرکەرێ» کە ڕێگای سێ فەرسەخە ڕێ بوو. ڕۆژی ١٢ی جەمادی هەوەڵ گەیشتینە «بەرکەری».، لە وێڕا چووینە شاری «وان» و «وستان». (١) لە بازاڕی ئەو شارانە، گۆشتی بەراز هەروەک گۆشتی بزن دەفرۆشرا. ژنان بێ پارێز لە تەنیشت پیاوان لە بەر دوکانان شەڕابیان دەخواردەوە. ڕۆژی ١٨ی جەمادی هەوەڵ گەیشتینە «ئەخلات» کە سەرحەدی موسوڵمان و هەرمەنیانە. لە «بەرکەرێ» تا «ئەخلات» نۆزدە فرسەخ ڕێگایە. ئەمیری ئەو شارە، «نصرالدولە»، تەمەنی سەد ساڵ زیاتر بوو و کوڕەکانی لە هەژمار نەدەهاتن. هەر یەک لە کوڕەکانی لە سەر ولایەتێک دانابوو. خەڵکی ئەو شارە بە سێ زمانی عەرەبی و فارسی و هەرمەنی قسەیان دەکرد. پێم وایە هەر لەبەر ئەوەشە کە ناوی ئەم شارەیان ناوە «ئەخلات». داد و ستەد و موعامەلە بە پووڵە و واحیدی پێوان سێسەد درهەمە.

جێگای کوردستان لە سەفەرنامەی «ناسر خوسرەو» دا

مەنسووری تۆکمەچی

«ناسر خوسرەو قبادیانی مروزی » یەکێکە لە زانیارانی بەنرخی سەدەی پێنجەمی هیجری لە ئێران. کتێبەکانی لە باری فەلسەفییەوە بایەخێکی گرینگیان هەیە و لە ریزی کتێبە دانشگاییەکانی ئێران دان. لە منداڵییەوە تا تەمەنی چل و دوو ساڵی، هاموشۆی بارەگای سوڵتانی کردوە. «ناسر خوسرەو» دەبیرێکی زانیار و ئاگادار بە کاری حکومەتی، بەبنەچە خەڵکی «بەڵخ» بوو.

«ناسر خوسرەو» لە ساڵی ٣٩٤ ی هجری ـ قەمەری (١٠١٥ ی زایینی) لە «قبادیان» ی «مەرو» لە دایک دەبێ و پاش ٨٧ ساڵ تەمەنی پڕ لە هەوراز و نشێو، سەرئەنجام، ساڵی ٤٨١ ه.ق (١٠٢ ١ ی زایینی)، لە «یمگان» ی «بەدخشان» چاو لە سەریەک دادەنێ.

گرێ و تاریکی لەبارەی ژیانی «ناسر خوسرەو» زۆرن. تا ئیمڕۆ، سەرەڕای لێکۆڵینەوەی پربایەخی ئێرانییەکان، شتێکی زۆر لە سەر ژیانی نازانین. بەڵام ئەو نووسراوانەی کە «ناسر خوسرەو» بەجێی هێشتوون لە بارەی ئەدەب، فەرهەنگ و کۆمەڵناسی، نرخێکی بێ پایانیان هەیە.

«ناسر خوسرەو» پیاوێکی ئەدیب و خاوەن قەڵەم بووە. تینووی فێربوون بووە و بە وردی لە شتان دەکۆڵیەوە. قورئانی لەبەر دەزانی و زەوقی شێعر گوتنی هەبوو. هەرچەندە کە بۆچوونی فەیلەسوفانەی سەبارەت بە ئیسلام هەبوو، بەڵام بە هەڵوێستێکی نەرم لەبارەی مەزهەبەکانی دیکەی وەک یەهرد، زەردوشتی، مانەوی و دینە هیندییەکان قسەی دەکرد. لە ژیانیدا، جارجارە زاهید و گۆشەگیری مزگەوت بوە و جارجاریش پیری مەیکەدە بووە، بەڵام قەت بەرهەڵستی تونە و تاوێژی تێکشکێنی هەڵنەبژاردوە.

پەراوێزەکان

(١) بڕوانە سەرچاوەی ژمارە (٩)

(٢) ئەم باسەم لەگەڵ Hijarno کردەوە ، بەلاّم ئەویش بیری بۆ هیچ سەرچاوەیەکی ناسراو نەدەچوو.

(٣) بڕوانە: Lademannsleksikon, n. 8 (202) 1972 , Danmark:

(٤) لە سێ کتێب ، دووانی لەلایەن عەزیز گەردی و ناجی عەبباسەوە کراون بە کوردی .

(٥) بڕوانە سەرچاوەی (٥)

(٦) ئەگەرچی (یان یانوی) کوردناسێکی پڕکارە، بەلاّم لەوەدەچێت سیاسەتی دەوڵەتی تورکیا کاریان تێکردبێت.

(٧) لێرەدا دەبێ ناوی دکتۆر مهدی مضفری ، مامۆستا لە زانکی شاری ئاغووس، نەخەینە ڕیزەوە، کە لە ڕۆژنامە و کاناڵی تەلەفزیۆندا جەختیی لەسەر ڕەوابوونی مەسەلەی کورد دەکرد.

سەرچاوەکان

1- Hjarno, jan og Necip onder: Kusca. National museet, Etnografisk samling, 1970.

2- Jacob. Heinzog Bolette Moldenhawer: Undertrykkelse, integration - Kurdistan.Institut for kultursociologi, 1988.

3- Brigitte Beckert: Kurdisk flygninge.Roskilde.U.C. (R.U.c.),1988.

4- Wolff Marianne og Annette Jensen: Kurdiske pigers opvokst i Dan mark. Skovetofte sosial - pedagogiske siminarum, 1983.

5- Hjarno, Jan: Kurderne - et splittet folk, Munksgaard, 1972.

6- Kurds, Anne - Mette: Kurderne. Dansk flygtninghjep, 1986.

7- Hidir Atay: De Blinde og Elefant problemet: 1989, Esbjerg.

(٨) ئیبەکلوڤدال رایش و هێنینگ بخز: تاریخ، ساست و فرهنگ دانمارک (یک معرفی برای خارجیان) از انتشارات انجمن ایرانیان، ١٩٨٧ دانمارک.

(٩) ایرج افشار: راهنمای تحقیقات ایرانی، ١٩٤٦.

یاداشتەکانی کچە کورد (مریەم سیرت) کە لە تەمەنی هەشت ساڵییەوە هاتۆتە ئەم وڵاتە و لەشێوەی داستانێکدا چاپ کراوە، بایەخی ئەدەبیی خۆی هەیە. خوێنەر ڕوخساری خێزانێکی کورد بە هەموو ڕەهەندەکانییەوە لەم یاداشتانەدا بەدی دەکات. هەروەها لێکۆڵینەوەیەکی (حەیدەر عەتای) بەناونیشانی (کوێرەکان و کێشەی فیلەکە) کە تەرخان کراوە بۆ باسی کوردە عەلەویەکان و کێشەکانیان، نرخی زانستانەی خۆی هەیە و بەرهەمی کۆششێکی زۆرە. هەرچی نووسەرە عەرەب و فارس وتورکەکانیشن، نەیانتوانیوە لە باسکردنی کورد دا خۆیان لە تێڕوانینی باو، کە دەوڵەتانی فەرمانڕەوا بەسەر کوردستاندا ڕەواجی پێ دەدەن، ڕزگار بکەن. بۆ ژمارەی دانیشتوانی کورد پەنا دەبەنە بەر ئەو سەرژمێریانەی کە دەوڵەتەکانی ناوچەکە بڵاویان کردۆتەوە، جگەلەوەش کێشەی کورد بەزەقی و دوور لە کاریگەرێتیی ناسیونالیزمی عەرەبی و تورکی و فارسی باس ناکەن.(۷) لە دەرەوەی ئەم دابەش کردنەشدا، چەند بەرهەمێکی دیکە لەبارەی کورد هەن. بۆ نموونە ئەو کۆمەڵە پەندی پێشینانەی لە ساڵی ۱۹۷. دا لە کتێبی (پەندی پێشینانی جیهانی) دا بڵاوکراونەتەوە. لە ساڵی ۱۹۸۵ بەولاوە، کتێبخانەی بێگانان بەشێکی بۆدجەی خۆی بۆ کڕینی کتێبی کوردی تەرخان کردووە، بەڵام لەبەر کەمیی خوێندەواری کورد و کێشەی (سۆرانی) و (کرمانجی) ژمارەی کتێبەکان لە چەند سەد دانەیەک تێناپەڕێ. ئەمە لەکاتێکدا ساڵانە بایی ....٦٠ کرۆن کتێبی فارسی دەکردرێ. ئەم چالاکیانە لە ئاستی دانمارکدا چەسپیو نین، پەیوەندییان بە ڕووداوەکانی ناوەوەی کوردستانەوە هەیە. واتە هەر کات ڕووداوێک دەقەومێ، ئەوا ژمارەی چالاکییەکانیش، هەم لەڕووی چەندایەتی و هەم لەڕووی چۆنایەتییەوە، دەگۆڕێن . بۆئەوەی چاالکیەکان بچەسپێن و لە شوێنە جیاوازەکانی دانمارکدا بواری لێکۆڵینەوە پەرەی پێ بدرێ پێویستە لایەنە فەرهەنگی و ئەکادیمیەکانی کورد لە دەرەوەی وڵاتدا پەیوەندی لەگەڵ ئەو لایەنانەی دانمارک دروست بکەن. پێویستە مەڵبەندە کوردییەکانی وەک ئەنستیتووی کورد، فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکان، مەڵبەندی ڕشنبیریی لەندەن ... هتد، سەرچاوەی گرنگ و بەرهەم و بڵاوکراوەکانی خۆیان بۆ لایەنە جیاوازەکانی دانمارک ڕەوانە بکەن و سوود لە زەمینەی دانمارک وەربگرن. دووا قسە، بەرهەمی هەر یەک لە قۆناغەکانی کوردناسی لە دانمارکدا پێویستی بە قسە لەسەرکردنی زیاتر هەیە؛ هیوادارم لەداهاتوودا بواری لێکۆڵینەوەم لەسەریان بۆ بڕەخسێت.

ئەم لێکۆڵەرەوانە بریتییە لەو کتێب و باسانەی بە زمانی ئینگلیزی، فەرەنسی، ئەڵمانی و سوێدی لەسەر کورد دەست دەکەون. بەڵام لایەنی پراتیکی ئەو باسانە، بریتیە لە مرۆڤی ئاوارە، پەنابەر و کرێکار، ئافرەت و منداڵی کورد. هەندێ لەم نووسەرانە دەیانەوێ بەهۆی گفتوگۆکردنەوە لەگەڵ ئەو دەستەیەی مەبەستیانە، پاشخانی کۆمەڵگای کوردەواری شی بکەنەوە و لەم ڕێگەیەشەوە بە کرۆکی تەنگوچەڵەمە جۆراوجۆرەکانی مرۆڤی کورد بگەن. مێتۆدی ئەکادیمیانە و خاڵی دەسپێکردنی ئەم نووسەرانە، تابلێی شوێنی بایەخ و لێوە فێربوونە. بەڵام بەداخەوە فاکت گرتنی زۆر لەو گفتوگۆیانە لەگەڵ گرووپی جیاوازدا ئەنجام دراون، یان پشت بەستنیان بە پرۆگرامی لایەنە کولتووری - سیاسیە کوردییەکانی ئەم وڵاتە، خاڵێکی لاوازی لە هەڵهێنجاندنەکانیاندا جێ هێشتووە. ئەمەش لەبەرئەوەی ئەو گرووپە جیاوازانە، نە دەتوانن شوێنی کۆمەڵایەتیی خۆیان لەناو ئەو چینەی لێوە هاتوون دیاری بکەن، نە دەشتوانن ڕاستگۆیانە نوێنەرایەتیی چینەکەی خۆیان بکەن. لە بەرامبەر ئەم خاڵە لاوازەدا، خاڵێکی گرنگ خۆی دەنوێنێ، ئەویش تایبەتمەندبوونی باسەکانن. تایبەتمەندبوون بەو واتایەی کە هەر نووسەرێک لایەنێکی تایبەتی کێشەکانی کۆمەڵگای کورد دەگرێت و لێی دەکۆڵێتەوە: منداڵانی کورد لە باخچەی منداڵان و لەماڵەوە، منداڵی کورد و زمانی کوردی، کچانی کورد لە نێوان خێزان و کۆمەڵگای تازەدا، پەنابەرانی کورد و مافەکانیان وەک گرووپێکی ئەتنیکی، ..هتد.

دەستەی سێیەم : ئەو دەستەیە لە کورد، عەرەب، فارس و تورکەکان پێک دێت. ئەو کوردانەی کە بە زمانی دانمارکی لەسەر کوردیان نووسیوە بە ژمارە کەمن، ناوەڕۆکی باسەکانیشیان زیاتر باسکردنی بۆنە نەتەوەییەکان و هەندێ بابەتی وەک مۆسیقای کوردی و هەڵپەرکێ دەگرێتەوە. ئاستی زانستیی ئەم بەرهەمانە (وتاری رۆژنامە)پاشخانێکی پتەوی نووسەرەکانیان لەسەر مێژووی سیاسی- فەرهەنگیی کورد نادات بەدەستەوە. لەناو ئەم بابەتانەدا، کۆمەڵگەی کوردەواری کۆمەڵگەیەکی سەرەتاییە. بۆ دانمارکییەک کە پێشتر زانیارییەکی ئەوتۆی لەبارەی مێژووی هاوچاخی کورد نەبێ، ئاسان بڕوابکات کە کورد لە رۆژگاری ئێستادا زانکۆ و یەکیەتی نووسەران و هونەرمەندان و تیپی مۆسیقا و شانۆ و مۆزەخانە و ئەکادیمیای زانستییان هەیە.

راستە ئەم بابەتانە ڕادەی هوشیاریی خاوەنەکانیان بەپێی ئەو ناوچانەی لێوە هاتوون و بەپێی ڕادەی چەوساندنەوەی مرۆڤی کورد لەو ناوچانەدا ڕەنگ پێ دەداتەوە و پەردە لەسەر ترادشیۆنی بەژێر پێوەبوونی مافەکانی مرۆڤی کورد هەڵدەدەنەوە، بەڵام سەرنجی خوێنەر بۆ ژیانی هاوچاخی کۆمەڵگای کورد و تایبەتمەندیەکانی ئەم قۆناغەی ئەمڕۆ ڕاناکێشن. هەر لەسەر ئاستی کوردیدا، چەند کارێکی دیکە ئەنجام دراون کە نرخی زانستی و دەستپێشخەرانەی خۆیان هەیە.

لێکۆڵینەوە لە کورد خۆی لە چوارچێوە تەقلیدیەکە رزگار دەکات و ئاقارێکی کۆمەڵناسانەی فراوان بەخۆیەوە دەگرێت.

کارەساتی هەڵەبجە، ئەگەرچی کەم و زۆر لە رۆژنامەگەریی دانمارکی دا رەنگی دایەوە، بەڵام نەبووە هۆی خولقاندنی بەرهەمی سەربەخۆ. ئەو راپۆرت و وتارانەی لەو سەردەمەدا بلاوبوونەتەوە، ئەگەرچی لە چوارچێوەی وتاری رۆژنامەیی دەرباز نەبوون، بەڵام رۆڵێکی باشیان لەبواری سەرنج راکێشانی رای گشتیی دانمارکیدا بینیوە. هەر لەبەر ئەم خاڵەش، بەتایبەتی ئەگەر مەسەلەی (ئۆلف پالمە)یش بینینەوە یاد، ئەوا ئەو وتارانە شایانی سەرنجدان و ئاوڕلێدانەوەن .

داگیرکردنی کوێت و پاشانیش پەلاماردانی بزووتنەوە جەماوەرییەکانی خوارووی عیراق و کوردستان لەلایەن بەعسییەکانەوە، جارێکی دیکە مەسەلەی کوردیان لەناو رۆژنامە و دامەزراوە ئەکادیمییەکانی دانمارکدا زەق کردەوە. ئەم قۆناغە، ئەگەرچی ئێستا بەهۆی گفتوگۆی سەرکردە سیاسیەکانی کوردەوە لەگەڵ رژێم، ساردییەکی تێ کەوتووە، بەڵام هێشتا بەردەوامە و لە دانیشگاکانی وەک دانیشگای کۆپنهاگن، غۆسکیلە، سویوسک و شوێنەکانی دیکەی وەک بەرێوەبەرایەتیی پەناهەندان و هەروەها لە گۆڤاری (Samspil) دا خەلکانێک هەن لێکۆڵینەوەی جۆراوجۆر لەسەر کورد ئامادە دەکەن.

ئەوانەی لەسەر کوردیان نووسیوە ، بەسەر سێ دەستەدا دابەش دەکرێن:

دەستەی یەکەم: ئەو نووسەرە دانمارکییانەی کە خۆیان کوردستانیان دیوە، لە ناوچە جۆربەجۆرەکانیدا ژیاون، وەکوو هێنی هاراڵد هەنسن، یانوی.

تایبەتمەندیی ئەم دەستەیە ئەوەیە کە خۆیان لەنزیکەوە ئاشنایەتییان لەگەڵ مرۆڤی کورد هەبووە، توانیویانە ئەرشیفێکی دەوڵەمەند لەسەر لایەنە جۆراوجۆرەکانی فەرهەنگی کورد بۆ مۆزەخانە و دەزگا کولتوورییەکان ئامادەبکەن. ئەمرۆ ئەم ئەرشیفە، کە لەلایەن مۆزەخانەی نەتەوەییەوە کۆکراوەتەوە، بڕیارە لە ساڵی ١٩٩٢دا بەشێکی تایبەت بەناوی کورد بکرێتەوە. ئەرشیفەکە لە وێنەی فۆتۆگراف، جلوبەرگ، کەرەسەی بەرهەمهێنانی کشتوکاڵ و گەلێک کەلوپەلی دیکەی ژیانی رۆژانەی کورد پێک هاتووە. دەسپێشخەری کردن لەم بوارەدا دەگەڕێتەوە بۆ داپیرەی کوردان هێنی هاراڵد هەنسن.

دەستەی دووەم : ئەو نووسەرانەن کە لەناو دانمارکدا ئاشنایەتیان لەگەڵ کورد پەیدا کردووە، لە ئاستی جۆراوجۆردا هەندێ کاریان لەبارەی کورد ئەنجام داوە وەک: م. بۆلێت، هانس ژاکۆب، ماریان وولف، ئانێت یانسن و گەلێکی دی.

بوونی کورد و چالاکییەکان لەم وڵاتەدا، هەروەها کێشە کۆمەڵایەتی و سیاسی و ئاینییەکانی خێزانە کوردەکان شوێنێکی زۆریان لە کارەکانی ئەم نووسەرانەدا داگیرکردووە. سەرچاوەی تیۆریی

لە دووای کوشتاری ئەرمەنییەکانیش (١٩١٥)، لەناو رۆژنامەکانی ئەو سەردەمەی دانمارک دا ناوی کورد هاتووە. بەتایبەتی لە رۆژنامە چەپییەکاندا، کە چەند گفتوگۆیەکیان لەگەڵ پەنابەرە سیاسیە ئەرمەنیەکاندا بڵاوکردوتەوە. بەڵام ئەو ناوهێنانانە لەوە تێپەڕناکات کە کورد و ئەرمەن لەژێر دەسەڵاتی عوسمانیەکاندا دەچەوسێنەوە. وا پێدەچێت کە لە سەرەتای ساڵانی بیستیشدا (ئەو دەمەی کە کوردستانی ژێر دەسەڵاتی عوسمانی سەرلەنوێ بەسەر دەوڵەتە تازەکانی تورکیا، عیراق، سوریا... دابەش کرایەوە) لە دانمارک باسی کورد کرابێت. بەڵام لەم بارەیەوە سەرچاوەیەکی باوەڕپێکراو بەردەست نەکەوتووە. (٢)

ساڵی١٩٣١ بۆ ١٩٣٨ کارلسبێرگ فوند (Carlberg Fundts) بە سەرۆکایەتیی پرۆفیسۆر هارالد ئینگهولتون، لەدایکبووی ١٨٩٦، پرۆژەیەکی ئەرکیۆلۆژیی لە ناوچەی (حەما) دامەزراند.(٣) لێرەوە سەرنجی نێوبراو بەرەو کوردستان راکێشرا. تا ئەوە بوو لە ساڵی ١٩٥٧ دا سەرۆکایەتیی ئەو لیژنە دانمارکییەی کرد، کە هاتنە خوارووی کوردستان و هەڵکۆڵینی پاشماوەکانی ناوچەی دەشتی بێتوینیان لەئەستۆ گرت. یەکێک لە ئەندامە چالاکەکانی ئەم لیژنەیە خاتوو (هینی هارالد هەنسن) بوو، کە ئەمڕۆ ئەنجامی لێکۆڵینەوەکانی بە چەندین زمانان لەبەردەست دا هەیەیم (٤)

ئەم قۆناغە بە قۆناغێکی گرنگ دەژمێردری لە مێژووی کوردۆلۆژی لە دانمارک دا؛ بناغەیەکی پتەوی دارشت بۆ هەموو ئەو کەسانەی کە لەوەوبەدووا لە ئاستی ئەکادیمی و خوێندندا لە کوردیان کۆڵیوەتەوە .

قۆناغێکی دیکە لە ساڵی ١٩٦٧ بەولاوە دەست پێدەکات. لەم ساڵەدا دوو کوردی خەڵکی (قونیا) دووای ئەوەی لە ئەڵمانیا کاریان گیرناکەوێت، خۆیان دەگەیەننە دانمارک و نیشتەجێ دەبن.(٥) بە گەڕانەوەی ئەم دوو کەسە بۆ کوردستان و زۆربوونی بەرەبەرەی کورد لەم وڵاتەدا، لایەنە بەرپرسیارەکانی دەوڵەتی دانمارک ناچاردەبن چەند شارەزایەک بنێرنە ناوچەکە بۆئەوەی لەرووی کۆمەڵایەتی و ئابوورییەوە لێکۆڵینەوە لەسەر کورد بنووسن. لەم بوارەدا یان یانۆی دەستپێشخەری دەکات و چەند لێکۆڵینەوەیەکی مەیدانی لەبارەی ناوچە جۆراوجۆرەکانی کوردستانی سەروو بەرهەم دەهێنێ. نێوبراو، ئێستا لە (Sonderjysk Universiitet) کار دەکات و بەردەوامە لەسەر توێژینەوە کوردناسییەکان. (٦) بە دەسپێکردنی جەنگی عیراق و ئێران و هاتنی کورد وەک پەنابەری سیاسی بۆ دانمارک، قۆناغێکی شێلگیرانەتر لە مێژووی کوردناسی لە دانمارک سەرهەڵدەدات. ئەو بەرهەمانەی لەو سەردەمەدا ئەنجام دراون، چ لە رووی چەندایەتی و چ لەرووی زانستی ـ ئەکادیمیەوە، بایەخێکی تایبەتییان هەیە. لەم کارانەدا، میتۆدی

مێژووی کوردناسی له دانمارک

«سەرنجدانێکی خێرا»*

رێبوار سیوەیلی

سەرەتای مێژووی کوردناسی له دانمارک، یان لەسەر کورد نووسین به زمانی دانمارکی، دەگەڕێتەوە بۆ سالأنی پاش جەنگی جیهانیی دووەم. لەپێش سالی ۱۹٥۷ دا، واته پێش هاتنی ئەو لیژنه دانمارکیيه له پەیوەندی لەگەڵ بەستی (دوکان) دا بۆ کوردستان، بەرهەمی دیار و تایبەت به کورد به زمانی دانمارکی بلأونەبوٚتەوە.

بەر لەو مێژووە، چەند گەڕیدەیەکی دانمارکی به فەرمانی شاکانی ئەو ولأته هاتوونەته خۆرهەلأتی ناوەراست و یاداشتییان لەسەر (Delige Arabien) و عەرەبستانی دلگیرەوە نووسیوە و لەگەڵ خۆیاندا هێناویانەتەوە. ئەم گەڕیدانه له ناوچەکانی خۆرهەلأتی ناوەراستدا تەنیا یەک نەتەوە و یەک شێوە سروشتیان دەبینی: نەتەوەی عەرەب ، ئاینی ئیسلام و سروشتی نەبراوەی‌سارا (صحراء‌ لحا)

بۆیە دەبینین هەرچی سەرچاوەیەک که لەبارەی خۆرهەلأت - تاکو سەرەتای سالأنی ۱٦۰۰ - لەبەردەستدا هەبێت ، ئەوا له روانگەی ئەو سێ کوچکەیەوە تەماشای ناوچەکه دەکات .

پەیوەندیی دانمارک و ئێرانیش له سەردەمی شاعەبباسی سەفەوی دا دەستی پێکرد.(۱) له سالی ۱٦۳٥دا دەستەیەک دانمارکی بەمەبەستی پەیوەندی بەستنی بازرگانی بەرەو ئێران کەوتنه رێ. ئەنجامەکانی ئەم پەیوەندییه و پەیوەندیی شێوەلێکچووی لەم بابەته، سەرنجی گەڕیدەی بەناوبانگ (کارستن نیبوه (Carsten Niebuhr) رادەکێشن ؛ ئەمەش دەبێته هاندەرێک بۆ ئەو ، تا له سالی ۱۷٦٥ دا ـ له سەردەمی شا فریدریکی پێنجەم دا - بەرەو ناوچەکه رێدەکەوێت و خۆی دەگەیەنێته (تەختی جەمشید).

نیبوە، ئەگەرچی لەو کتێبەیدا که له سالی ۱۷۷۸ دا له کۆپنهاگن بلأوی کردۆتەوە راستەوخۆ باسی کورد ناکات، بەلأم ئەم کاری نێوبراو دەکرێ وەک سەرەتایەک تەماشا بکرێت بۆ رەتکردنەوەی رووانگه سێ گوشەییەکەی باسمان کرد.

---

* ئەم بابەته سەرەتایەکی کورته بۆ نووسینێکی بەرفراوانتر. بێگومان هەمو سەرەتایەک له کەموکووڕی بەدەر نیه.

فەرهەنگۆک

پیەس: شانۆنامە
نوشی ددەت: نیشان دەدات
ئەشخاص: کەسایەتییەکان، ئەکتەرەکان
مەجلیسا ئەوەل : دیمەنی یەکەم
ئەسەر: بەرهەم، نووسراو
هلاویستین: هەڵواسین
غەزا: شەڕی دینی، شەڕێک لەپێناو دین دا بکرێ
سەرحەدان: سەرسنووران
کیم [کێم): کەم
خۆ ناگرم: لە پاش نامێنم
فەلان (فەلە): مەسیحییەکان، دیانەکان
جوهاب: هەواڵ، خەبەر
بەرهەڤ بوون: ئامادە بوون، خۆ کۆکردنەوە،
خۆ تەیارکردن.
پرغلیان: هەڵچوون
ئیعلا کرن: بەرز کردنەوە
دقووتن: دەکوتن
دبەزوت : دەبزوێ، ڕەپێ دەبێتەوە
روونی خوارێ: لە خووارەوە دانیشە
نوها: نهۆ، ئێستا
کەنگێ: کەی
زەواد: بژیو، توێشەبەرە
دایەک: دایکێکی
شوۆلان (شوۆل): کار وبار، ئیش
بهێلمە جێ دا: جێی بهێلم
غازی بیم: ببمە جەنگاوەر
حەرەم: حورمە، خێزان
پیچەک: قیچەک، نەختێک

ملاحەزە دکەت: رادەمێنێ، دادەمێنێ، بیردەکاتەوە
هوون: ئێوە
تونێ: تەنیا ،بەتەنیا
چاوا (چاڤان، چاوان): چۆن
روهنک: رووندک، فرمێسک
ژێ: لەوە
دکەڤت: دەکەوێت
تێت: دێت
مەلەکێ مەوتێ: عیزرایل
راتبەتە پێیان: رادەبێتە پێیان، ڕەپێ دەبێتەوە
پۆشمان: پەشیمان
خەسی (خوەسی): خەسوو
خودان عیسمەت: ناموس، پاقژیا ئەخلاقی،
شەرەف (ب)
دەو: دز
وەستامە: ماندوم
هەمان: یەکسەر، یەکسەڵەف
کۆرە: کۆر، کوێر
ئاهەنگ: ستران، گۆرانی
چوو : چونکە.
دایەک: دایکێکی
شوۆلان (شوۆل): کار وبار، ئیش
بهێلمە جێ دا: جێی بهێلم
غازی بیم: ببمە جەنگاوەر
حەرەم: حورمە، خێزان
پیچەک: قیچەک، نەختێک
ملاحەزە دکەت: رادەمێنێ، دادەمێنێ، بیردەکاتەوە

غەزال ـ ئەمر کە!

مێهڤان ـ هوون (کچا) مالێنە، یان (بووکا) مالێنە؟

غەزال ـ هوون مێهڤان نەبان، مقابلێ ڤێ سوئالا تە لازم تات ئەز بە چەکان جواب بدەم. هەندە قەدر هەیە توو مێهڤانی. قەدرێ مێهڤانییێ سەر مە واجبە، چوو کوردان د مالا خوٚ دا دەنگ بە مێهڤانان نەکریە و دائیمە کرمانجان دە رێیا مێهڤانێ خوٚ دا جان دایە. دوژمنێ کرمانجان بیێتە مێهڤان، دیسا قبوول دکەن و قەدری دەگرن، خزمەتی بوٚ دەکەن.

مێهڤان ـ غەزالا من! سەد ئافەرین بوٚ عیسمەتا تە، ئەز فەخرێ بە تە دکەم! تە ئەز نەنیاسیم، ئەز مەموٚمە! شیرێ تە خاری، ل تە حەلال بت. «هەمان ڕادبت دەستێ غەزالێ دگرت».

غەزال ـ «یەکجار حەرەکەتا خوٚ تەبدیل کر، بێ ئیختیار» ئاهـ...

«هەر دوو خوٚ ل ستوویێ یەک ددەن، سەر دوٚشەگێ دکەڤن نەهشیار دبن»

«چاڤرەش دەری دەقوتت. کەس دەری ناڤەکەت. دەری دەشکێنت، ژ دەر دا تێت. بووکا خوٚ د ڤێ حال دا دبینت، تەماشا دکەت، نانیاست»

چاڤرەش ـ عەجیب، قەت مومکینە! ئەڤ ژی دێ ببە! ناموسا کورێ من ما مومکینە وها د دەستێ نەیاران پامالْ ببت! ئەڤ چ خاینی یە! ...نەخێر!...نەخێر!...«جارەک دی دچت تەماشا دکەت» لازمە ئەز ببرم یان بکوژم. قەت چوو کورد ناموسا خوٚ وەها ببینت، ناوەستت. بەلێ، ئەو ناموسا من و ئەمانەتێ منە!...

«جارەک دی دچت تەماشا دکەت. تێتە غلیانێ»

چاڤرەش ـ بەلێ...بەلێ...کوشتن! ژ غەیری وی چوو دیتر نینە. خودێ ژی ژ من ناپرست، چونکە لسەر ناموسێیە.

«هەمان دبەزت، ڕما ئانی. دێنت دانیتە سەر سنگێ کورێ خوە.»

چاڤرەش ـ هانێ بوٚ تە! زەربا ناموسێ، ئەی جانەوەری بێ ناموس!

مەموٚ ـ ئاهـ...دادێ!

غەزال ـ (هەمان هشیار دبت. ڕمێ د سینگا مەموٚ دبینت. دبێژتە خسیا خوٚ) وای، تە چاڤێ خوٚ کوٚرە کر!

«د ناڤ سەرێ خوٚ ددەت»

«غەزال و چاڤرەش هەر دوو دگەل یەک بە ئاهەنگ» :

هەرێ مەموٚ، مەمێ عەباسی، عەباسی!

بریندارو مەموٚ، دایێ کوٚر بیت، نەنیاسی!

چاڤرەش . غەزال، خودێ وەکی مەمێ دا من، توو ژی ژ بۆ مەمێ هاتی دنیایێ. شەرم نەکە. ئەز ئیفتیخاری ب تە دکەم کوو توو بووکا منی. مەمێ چەند لاوە، توو ژی هند دەلالی، مەمێ چەند جامیر و خودان مێرینی یە، توو ژی هند خودان عیسمەتی. ئەز لە پێش تە نابێژم، خودێ شاهێدە، هەمی جیهان. ئەز دبێژم، چونکە مروڤ راستی ئینکار بکەت: بێ ئینسانی یە...خودێ وە هەردووکان بۆ من بهێلیت.

«دەنگێ دەری تێت»«

«غەزال دچت»

غەزال . ئەو کیە؟

«دەنگ» . ئەزم.

«خولامەک ژ دەر دا تێت».

خولام . خالەتا چاڤرەش! خانما من گۆت بلا حەتا ل ئێر کەرەم بکەت.

چاڤرەش . (دبێژتە غەزالێ) غەزال، ئەز وێ دچم. ئەمانەتێ تە ئەڤ دەر. «چاڤرەش دچت. غەزال تونێ دمێنت»

غەزال . ئاه...ئاه...خوەسیا من مزگینی دا من، عەجەبا راستە جارەک دی ئەم دێ بگەهینە یەک؟!

«دەنگێ دەری تێت. غەزال دبەزت»

غەزال . ئەو کیە؟

دەنگ . مێهڤانە.

«پۆشیا خۆ ب دەڤێ خۆ دگریت، دەرێ دڤەکەت».

غەزال . کەرەم کە!

مێهڤان . «تەماشا دکەت، ناس ناکەت» سەلامو عەلێکوم.

غەزال . عەلێکومەسسەلام. کەرەم کە! سەر سەرێ من هاتی.

مێهڤان . «روو دنت» خودێ ژ تە رازی بت.

غەزال . «تاسەک دەو تینت. دستێ خۆ ددەتە سنگا خۆ» کەرەم کە!

مێهڤان . «دەو دگرت. دەوێ ڤەدخۆت» من گەلەک ژ تە مننەتە.

«غەزال دچت کارێ نانێ بکەت»

مێهڤان . زەحمەتێ نەکێشە. ڤێ گاڤێ ئەز وەستامە، ئەز نشێم چ بخۆم.

غەزال . مێهڤان مێهڤانێت خودێنە، چاوان ئەمر بکەن ئەم مەجبوورین ئەمرێ وان بەجێ بینین.

مێهڤان . خودێ کێماسی نەکەت. پرسیار بێ عەیبن، ئەز دێ تشتەکی ژ تە پرس بکەم.

چووی، روحی من ژێ دچت، من دگەل خۆ ببە!...

مەمۆ ـ د شەرێت وەهەدا، شەرمە ژن دگەل مە بێن. هەم ژی دایکا من تونی یە. تو دێ چاوا بهێلی؟!

غەزال ـ ئەز شەر و رۆژ خەددامی ژ دایکا تە را بکەم، ئەز ژێ عاجز نابم، ئەز ژێ تێر نابم (روهنکان ئیزهار دکەت) ئەز دێ چاوا تە بدەمە دەستێ فەلەکێ، دێ چاوا ژ تە دوور ببم؟!

مەمۆ ـ «بە ئاهەنگ» ئیرۆ هەفتە داوەت کری غەزالێ ئەز ژ تە کری

ئەز دێ بچمە بەر کافری غەزالا من، دەلالا من، بەس بگری.

غەزال ـ مەمۆ ئیرۆ بوو عەسکەرە

ئەڤینا مە بوو کەسەرە

توو من ببە دگەل خۆ، هەرە

یان بکوژە یان بکوژ پاشێ هەرە

مەمۆ ـ توو بەس روهنکان ببارینە

ئیرۆ دوژمن ل مە کینە

وستانا مە لائیق نینە

غەزالا من، دەلالا من، بەس بگری.

«غەزال، نە هوشیار، دکەڤت»

«پەردە دکەڤت»

پەردا دوویێ

«پەردە ڤەدبت. دیسا راخستنا بەرێ. غەزال ب تونێ سەردوێشەگێ روونیشتیە، ملاحەزان دکەت و یەکجار»

غەزال ـ ئاهـ...یارەب، ئەوە بوو سالەک چ جواب ژ مەمێ نەهات! جارەک دیتر من مەمێ دیتبا، بلا مەلەکێ مەوتێ هاتبا ئەمانەتێ خووە ژ من وەرگرتبا. «رادەبتە پێیان» ئاهـ...ئاهـ...ئەڤە چ ژینە، ما مروڤ ژ بۆ دەرد و ئەلەمان هاتیە دونیا...؟!

چاڤرەش ـ «ژ دەر دا تێت» غەزال، خودێ خێرکەت، تە چی یە؟ دیسا توو وێ دگریان؟ ژ بەر لاوێ من نەگری! نەگری! مزگینا من لە تە: ئیروکە مروڤەک ژ ئوردوگاهێ هاتیە، لەشکرێ مە بەردایە دوژمنان، دوژمن تەسلیم بوونە. مەمێ سەلامەتە، ڤان رۆژان دێ بێت...

غەزال ـ «بێ خۆ» خودێ گوهـ دەنگێ تە بی! «خۆ بەرهەڤ دکەت. گۆتنا خۆ پۆشمان بوو، پێش خسیا خۆ شەرم کر»

«لەوەند ژ دەر دا تێت.»

لەوەند ـ ئەلسەلامو عەلێکوم! «دەچتە ملێ چاڤرەشێ»

چاڤرەش ـ عەلەیکومسسلام، کەرەم کە، روونێ خوارێ «لەوەند روودنت»، سەرسەرێ من هاتی، سەرچاڤان. توو گەنجەکی خوەشی. ماڵ، بچووک، چاڤانن؟!

لەوەند ـ خودێ ژ تە رازی بت، ماڵ، بچووک دەستی تە رادەموسن.

مەموٚ ـ سەرسەرێ برایێ خوٚ هاتی.

لەوەند ـ سەرێ تە هەزار سالی بت. تە خووە بەرهەڤ کر، دادێ دەستوورا تە دا؟

مەموٚ ـ مە ژی حەتتا نوها ئەو خەبەر ددا. دایکا من شیرێ خوٚ ل من حەلال کر. دێ کارێ من بکەت. خودێ حەز کەت ئەم ژی کەنگی بچین؟

لەوەند ـ ئیروٚکە مروڤەک ژ (باشکالان) هاتیە، گو (میر) حەتتا (چولە مەرگێ) چوویە. لازمە د ڤێ هەفتەیێ دا ئەم ل چولەمەرگێ بەرهەڤ ببین.

مەموٚ ـ ئیروٚکە خوٚ بەرهەڤ بکەن، سبەی زوو جا ئەم رێ بچین.

لەوەند ـ دەستوورا من بدە ئەز ژی بچم خوٚ بەرهەڤ کەم.

مەموٚ ـ دسەر سەرێ من هاتی.

«لەوەند دچەت»

چاڤرەش ـ (خوٚ بە خوٚ) یا رەببی! ئەولادی من ئەمانەتێ تەیە! توو فرسەتی سەلامەتیێ بدەیێ! «تەماشای مەموٚ دکەت» کورێ من! خودی دگەل تەبی! ئەز بچم کارێ زەوادا تە بکەم.

«چاڤرەش دچت»

مەموٚ ـ (خوٚ بە خوٚ) ئەی خالقێ من، تە چ لوتفەک مەزن ب من را کریە، دایەک خودان حەمیەت تە دایە من. چی یا ویژدانا من ئەمر کەت، ئەو پێ رازی یە. چ جاران نابت مانعێ شولان. ئەز وی دچم با غەزالێ...بووکا هەفتەیەکە، ئەز بهێلمە جێ دا، ما ئینسافە؟!...بەلێ، ئینسافە، لەورا ئەڤینیـــا وەلاتێ ژ هەمی ئەڤینیان مەزن ترە. ئەو ژی پێ رازی یە. ئەز بچم غازی ببم، جا ئەو ژی ببتە حەرما غازیەکی!...لازمە ئەو ژی فەخرێ بکەت...

«پیچەک ملاحەزە دکەت. وێ وەختێ غەزال ژ دەر دا دێت. د دەستەکی دا دەسماڵ، چاڤێ خوٚ پاقژ دکەت. مەموٚ دەستی دەگریت، روو دنتە خوارێ».

مەموٚ ـ غەزال، تە خێرە؟ توو بوٚچی دەگری؟

غەزال ـ ما هوون ناچن؟!

مەموٚ ـ بەلێ، ژبەر چوونا من ما لازمە توو بگری؟

غەزال ـ وەکی توو چووی، پاشی تە ئەز دێ چ بکەم، ما مومکینە ژینا من...؟! وەکی توو

پەردەڤەبوو

« ئۆدەکی کرمانجی خەملاندی، بە بەڕ و مافووران رایێ خستی. دیوارێ وێ چەکێت مەمۆ پێڤە هلاویستینە. چار تەرەفێ دیوار: دۆشەگ، بالگینە».

مەجلیساتەووەل

مەمۆ ـ «تەنێ» بەلێ...ئیرۆکە میر ئەمر کریە، غەزایە. نەیاران سەرحەدان گرتنە. زارێ کوردان، مەعازەللاً دێ لبەر دەست و پێێ دوژمنان بچت. ئەز ژ کی کێم ترم، ما ئەز کرمانج نینم؟ ما ناموسا هەر کوردەکی ناموسا من نینە؟... ئەلبەت...ئەلبەت ئەزێ بچم. قیامەت رابت دیسا ئەز دچم، خوون سەران ببەت دیسان ئەز خۆ ناگرم، حەتتا خەزال ژی من مەنع بکەت ئەز ناوەستم، ئەز مەمێ ئالانم، میرێ هەکاریان ئەمرکریە، هەم سوڵتان سەلاحەددین شیرێ خووە کێشایە، ل پێش تەمامێ دنیایێ وەستایە، «قودسا شەریف» محافەزە دکەت. عمومی فەلان بەرهەڤ بوونە کوو ئەوێ ژ ئیسلامێ بستینن. جوهاب ژ میرێ هەکاریان هاتیە، ئەم دێ بچینەهاریکاریا وی. ئیسلام هەمی ل وێ بەرهەڤ بوونە، ژ بۆ چی؟ ئەلبەت ژ بۆ غەزایێ. مالا هەکاریان هەمی چەکێت خووە بەستنە، ژ بۆ چی؟ ئەلبەت ژ بۆ غەزایێ. ما ئەز ژ وان نازدارترم؟ ما خێرا غەزایێ دێ هەر ژ بۆ وان بت؟!...

«دایکا مەمۆ ژ دەر دا تێت. وەکی کوڕێ خووە وها پڕ غلیان دبیت.»

چاڤرەش ـ کوڕێ من! خودێ خێرکەت، تە چی بیهستیە توو وها پڕ حیددەتی، چاوێت تە وها سور بوونە؟!

مەمۆ ـ دایێ! شیرێ خۆ ل من حەلال بکە! دوژمنان سەر ل مە ڕاکریە، هاتینە قودسێ ژ ئیسلامێ بستینن. وە میر ئەمرکریە غەزایە، دێ بچینە غەزایێ. مادام ئەز ژی کوردم، وە ئەز ئالانم، باب و باپیرێت من لە ڤێ رێ دا چوونە، دڤێت ئەز ژی ڤێ رێ دا بچم. تە شیرێ سپی دایە من، شیرێ خۆ لەمن حەلال بکە!...

چاڤرەش ـ کوڕێ من! دە رێیا دینێ خۆ و دە رێیا ولاتێ خۆ دا ئەگەر ئەز تە حەلال نەکەم، خودێ ژی من حەلال ناکەت. ئەگەر توو ئێرو نەچی، سبەی دوژمن دێ بێتن. من توو ژ بۆ رۆژەکی وەها خوەدان کری، کوو توو وی جیێ ژ بۆ دین و وەلاتێ خۆ بگری، ناڤێ کوردایەتیێ، کرمانجەتیێ ئیعلا بکەی. من شیرێ خۆ حەلال کر. خودێ دگەل تە بە .

مەجلیسادوویێ

«دەنگی دەری تێت».

مەمۆ ـ دایێ، وێ دەری دقووتن (هەمان دبەزت) ئەو کیە، ئووو...برایێ لەوەوند...کەرەم کە...کەرەم کە...

پیەسی کوردی

مەمێ ئالان

تیاترۆیا کوردان فەزیلەتا کوردان نۆشی ددەت

دوو پەردە پیەس

ئەسەرا: ع. رەحمی

ئەشخاص:

مەمێ ئالان

لەوەند ـ هەڤالێ مەمۆ، خولامێ میر

چاڤرەش ـ دایکا مەمۆ

غەزال ـ ژنا مەمۆ *

** ئەم سەردێڕە «پیەسی کوردی»، لە تێکستە بنچاخەکەدا بە تورکی نووسراوە «کوردجە پیەس». ئێمە لێرەدا، لەبەرئەوەی تێکستەکە بە زمانی کوردی نووسراوە، سەردێڕەکەشمان بە زمانی کوردی نووسیوە. (ب)*

١٨. گۆڤاری ژین M.Emin BOZARSLAN: JÎN (1918-1919), Wesanxana DENG, Uppsala, Swêd,1985,r.70-71

١٩. Albert CAMUS: Le malentendu, 3 actes, Galimard. Paris, 1944

٢٠. بە بیرم دێ لە کۆتایی ساڵانی حەفتا، نواندنێکی تەلەفزیۆنی، کە لە شاری بەغدا تۆمار کرابوو، لە تەلەفزیۆنی قەناتی کەرکوک پیشانی خەڵک دەدرا: هەمان ناوەڕۆک و چیرۆکی دەگێڕایەوە. ئەو نواندنە تەلەفزیۆنییە، بە زاراوەی کرمانجی بوو، بە هەمان ئەو گۆرانیە فولکلۆرییە کوردییە کۆتایی پێدەهات کە لەم شانۆنامەیەی (ع. رەحمی هەکاری) دا هەیە.

٢١. جێی سەرنجە، لە چەند شوێنێکی شانۆنامەکە و لە کۆتاییدا، چەند کۆپلە شیعرێک دەبینین. ئەم دیاردەیە لە شـــانۆی سەرەتای ساڵانی ئەم سەدەیەدا، لە ئەدەبیاتی تورکیدا دیاردەیەکی فراوان بووە. سوود وەرگرتن لە رەگەزی گۆرانی و مۆسیقا دیاردەیەکی هاوچاخی دیکەی ئەم شانۆنامەیەیە.

٢٢. کێشەی زمانی ئەدەبی یەکگرتووی کوردی، هەر لەو سەردەمەوە، بە تایبەتی لەسەر لاپەڕەکانی گۆڤاری (ژین) دا یەکێک بووە لەو گیروگرفتانەی کە نووسەرانی ئەوکات زۆر مشتومڕیان لەسەر کردووە.

٢٣. ئەم دیاردەیە لەلای (عەبدولرەحیم رەحمی هەکاری) دا نەک تەنیا لەم شـــانۆنامەیە و لە پەخشانەکانیدا، بەڵکو لە سەرتاپای شیعرەکانیشیدا بەئاشکرا هەستی پێدەکرێ.

٢٤ ـ گۆڤاری (ژین)، ساڵی ١٩١٩، ژمارە (١٥)، لاپەڕە (٢١ ـ ١٤)، هەروەها ژمارە (١٦)، لاپەڕە (١٤ ـ ١٧). جڵدی سێیەم و چوارەم لە نوسخە کۆکراوەکانی مامۆستا (م. ئەمین بوزئارسەلان).

٨ . لە بارەی شانۆگەریە ئەوروپییە تەرجەمەکراوەکانی عەبدوڵلا جەودەت بۆ سەر زمانی تورکی، بڕوانە ئەم سەرچاوەیە :
T. POYRAZ et N. TUGRUL: Tiyatro bibliografyası 1895-1925, Ankara. 1967.
٩ . هەمان سەرچاوەکەی (Metin AND)، لاپەڕە ٨٦ . ٨٧.
١٠ . سەرچاوە ئینگلیزیەکەی (Metin AND)، لاپەڕە ٨٢ . ٩٢.
١١ . Ahmed HACHIM: Les tendances actuelles de la littérature turque, Mercur de France , N. 627, Paris. 1924, PP. 641-655.

هەروەها بڕوانە
BAZIN et P. DUMONT: Histoire de la littérature turque.
١٢. گۆڤاری (ثروت فنون) بۆ یەکەمین جار لە ساڵی (١٨٩٦) بلاوکرایەوە تا ساڵی (١٩٠١) درێژەی کێشا. بەرپوەبەری ئەو گۆڤارە، نووسەر و شانۆنامەنووسی گەورەی تورک (ئەکرەم رەجایی زادە) بوو، کە بە پێی یاداشتەکانی پیرەمێردی شاعیر، ماوەیەکی زۆر هاوڕێی نزیک و تەنانەت دراوسێی (پیرەمێرد) بووە، لە شاری ئەستەمبوڵ، لە هەمان گەڕەک و لەهەمان ئاپارتمان دا ژیاون. گۆڤاری (ثروت فنون) لە نێوان ساڵانی (١٨٩٦ . ١٩٠١) دا (توفیق فیکرەت) و (خالید زیا) و (جەناب شەهابەددین) و (ئەحمەد ئیحسان) بەرهەمیان تێدا بلاودەکردەوە. بۆ ماوەی هەشت ساڵان وەستا، پاشان لە ساڵی (١٩٠٩) سەرلەنوێ سەری هەڵدایەوە، شێوە و رەوتی قوتابخانەیەکی نوێخوازی ئەدەبیی سەربەخۆی وەرگرت.
١٣. بۆ پەیداکردنی ئەم زانیاریانە، پشتمان بە گۆڤارەکان . خۆیان بەستووە. سەرتاپای ئەو گۆڤارانە، لە کتێبخانەی (لانگزۆ) لە پاریس پارێزراون.
١٤. بڕوانە رۆژنامەی (ژین)، ژمارە (٨٩٣)، سلێمانی: ١٩٤٧. « وتارەکە بە قەڵەمی پیرەمێرد نووسراوە».
١٥. پیرە مێردی شاعیر لەم نووسراوەیدا، بە پێی عادەتی ئەوروپییانەی تورکەکان: لە سەرەتادا ناوی فامیلی ئەو نووسەرانەی نووسیوە، کە دەکا (ئەکرەم رەجائی زادە)، (خالید زیا عوششاقی زادە)، (حسێن رەحمی)، سێ شاعیر و شانۆنامەنووسی هەرە گەورەی تورکن لەو سەردەمەدا، کە لە گۆڤاری (ثروت فنون) و گۆڤارەکانی دیکەدا بەرهەمیان بلاودەکردەوە. پیرەمێرد لەم یاداشتەیدا ناوی نووسەرێکی تورکی دیکەشی هێناوە (رەزا توفیق) کە دەرەنگتر لە رێگای ئەوانی ترەوە ناسیویەتی و پەیوەندیە هاوڕێ. ئەم رەزا توفیقە لەوانەیە ئەبو زیا توفیق (١٨٤٩ . ١٩١٣) بێت.
١٦. رۆژنامەی (ژین)، ژمارە ٩٦٧، سلێمانی: حوزەیرانی ١٩٤٩.
١٧. پیرەمێرد :ـ پیەسی تەمسیلێکی راستی لە وڵاتی خۆماندا رووی داوە ، سلێمانی: ١٩٤٢، هەروەها مەحموود ئاغای شێوەکەڵ، تەمسیلی ، چاپخانەی ژین، سلێمانی: ١٩٤٢، لە (٣٨) لاپەڕەدا. شایانی باسە، پێش پیرەمێرد، شاعیر و شانۆنامەنووسی کوردی سوڤیەتی (وەزیری نادری) شانۆنامەیەکی بە ناونیشانی (رەڤا ژنێ) لە چوار پەردە دا، لە ساڵی ١٩٣٥ دا، بە شێوەی کتێب لە یەکیەتی سوڤیەتدا بلاوکردۆتەوە ، لە شاری یەریڤان.

سەرچاوە و پەراوێز

١ ـ «میرمیرێن» جۆرە شانۆگەریەکی میللی و کوردەواری بووە، بەهاران کراوە. ئەم نەریتە هونەرییە، پەیوەندییەکی هێندە راستەوخۆ و پتەوی بە ژیانی شانۆیی کوردەوارییەوە هەبووە، بە شێوەیەک کە مامۆستا گیوی موکریانی لە فەرهەنگی (کوڵکە زێڕینە) دا، ئەم وشەیەی دەقاودەق بۆ واتای (تئاتر) ی فارسی و (مسرح) ی عەرەبی و (Théâtre) ی فەرەنسی بەکار هێناوە. بۆ زیاتر شارەزایی لەبارەی ئەو قۆناغە سەرەتاییەی شانۆگەری و هونەری نواندن لە لای گەلی کورد، بڕوانە

A - Jaques DE MORGAN: Mission scientifique en Perse (1889 - 1891), vol.4-5, Paris.

B- Majid REZWANI: Le theatre et la danse en Iran, Edition d'Aujourd'hui, Paris, 1960.

C - عبید الله ایوبیان: میر نوروزی (تاریخچه هنر تئاتر در کردستان ایران ـ قرن نوزدهم)، مجله نشریه دانشکده ادبیات تبریز، شماره (١٤)، ص: ٩٥ ـ ١٢٢.

D - Nicolas N. MARTINOTCH: The Turkish Theatre, New York - London, 1968, pp. 19-20 .

٢ - Alessio BOMBACI: Histoire de la littérature turque. Paris, 1968, p. 3.

٣ ـ لە ساڵی ١٨٦٠ دا گرووپێکی شانۆگەری بەناوی «تیاترۆی گەدیک پاشا» لەلایەن کۆمپانیای سیرکی فەرەنسییەوە دامەزرا، لە ساڵی (١٨٦٢) کۆمپانیایەکی شانۆگەری بەناوی «کۆمپانیای شانۆی میناکیان» لە لایەن هونەرمەندێکی ئەرمەنییەوە بەناوی (ماریدۆس میناکیان) دامەزرا و زیاتر لە (٢٠٠) شانۆگەری تەرجەمە کراو و ئامادەکراوی بە زمانی ئەرمەنی پێشکەش کرد. لە ساڵی ١٨٧٨ گرووپی «تیاترۆی تولووعەت» دامەزرا، لە هەمان ساڵدا گرووپی تیاترۆی شاری بوورسە لەلایەن ئەحمەد وەفیق پاشاوە دامەزرا، کە بەڕێوەبەرەکەی پیاوێکی ئەرمەنی بوو (تۆماس فەسوولەفجیان)؛ جگە لە چەندین گرووپ و کۆمپانیای دیکەی شانۆگەری، وەکو: شرق تیاترۆسی ١٨٣٤ ، گوولوگۆپ تیاترۆسی ١٨٨٥، عوسمانلی تیاترۆسی ١٨٦٢...هتد. بڕوانە ئەم کتێبە:

Metin AND: A history of theatre and poputa, Paris , 1968, p. 349.

٤ ـ هەمان سەرچاوەکەی (Metin AND)، لاپەڕە ٨٢ ـ ٨٩.

٥ ـ هەمان سەرچاوەی پێشوو، هەمان لاپەڕە.

٦ ـ ئەم شانۆنامەیە چاپ نەکراوە، بەڵام شانۆساز چیرۆکەکەی بە دیکۆر و دیمەنی کوردەوارییەوە خستوتە سەر شانۆ. بڕوانە هەمان سەرچاوە، هەمان لاپەڕە.

٧ ـ هەمان سەرچاوە، هەمان لاپەڕە.

بەکارهێناوە: (بۆ) لەجیاتی (ژبۆ)، (لە) لەجیاتی (ل)،(بگەهینە یەک) لەجیاتی (بگەهینە هەڤ)؛ بەکارێنانی (د) لەجیاتی (ت) لە فۆرمی کرداری ئێستادا، وەکو (دێنیت) لەجیاتی (تینت)... هتد.(٢٣)

زمانەکەی، چ لەرووی رێنووسەوە چ لە رووی شێوەی دەربرینەوە (لە ساڵی ١٩١٩دا) جارێ هێشتا بەتەواوەتی پاک نەبۆتەوە، لەژێر کاریگەرێتیی رێنووس و زمانی فارسیدایە، بۆ نموونە:(تەماشای مەمۆ دەکات) نووسراوە (تماشە مو دکت)،(ئەم دێ) نووسراوە (امدی)، (چاوێت تە)نووسراوە (چاویتتە)، (شەو) نووسراوە (شو). جگە لە پەیڤ و شێوە گۆتنە فارسی و عەرەبیەکان، وەکو: پرغلیان، اضهارکردن، جواب، سوال، هند قدر هیە (این قدر هست)، اشخاص، مجلس، تبدیل کردن، ملکا موتی، الم .. هتد.

ئێمە بۆ خستنەسەر رێنووسی تازەی کوردیی ئەم تێکستە، هەردوو تێکستەکەمان لەبەرچاو گرتووە: تێکستی ژین ـ خۆی، لەگەڵ تێکستەکەی مامۆستا محەممەد ئەمین بۆزئارسلان کە لە رێنووسی کۆنەوە خستوویەیە سەر ئەلفابێی لاتینی. هەرچۆنێک بێ، تۆژەر ئەگەر بیەوێ لە باری رێنووسی ئەوسات بکۆڵێتەوە، پێویست وایە بگەرێتەوە سەر تێکستە ئۆرێژیناڵەکەی گۆڤاری ژین ـ خۆی.(٢٤)

لە کۆتاییدا، پێویستە هەموو وەچەیەکی کورد هەمیشە یادی ئافەرینباری مامۆستا بۆزئارسلان بکاتەوە، کە جوامێردانە سەرتاپای ژمارەکانی گۆڤاری (ژین) ی لەدەست فاشییەکانی رژێمی تورکیا قوتارکردووە و سەرلەنوێ، وێڕای خستنەسەر ئەلفابێی لاتینی، چاپ و بلاویانی کردۆتەوە. چونکە ئێمە ئەگەر ئەمڕۆ ژمارەکانی گۆڤاری ژینمان لەبەردەست نەبوونایە، گەوێکی گرنگ و درەوشاوەی نێوان ئەدەبیاتی دوێنێ و ئەمڕۆمان بزر دەمایەوە؛ بەرامبەر تەواوی قۆناغێکی ئەدەبەکەمان ناشارەزا دەماینەوە .

پاریس

هاوینی ١٩٩٠

ڕزگارکردنی قودسی شەریف، خەباتی ڕزگاریخوازانەی نەتەوەی کورد بەیان بکات بۆ ڕزگارکردنی کوردستان.

هۆیەکی دیکەش، لەوانەیە ئەوە بێت کە لەبەر سانسۆری تورکە لاوەکان، کە تازە هاتبوونە سەر حوکم و جارێ هەر پابەندی دین و ئیسلام بوون، نووسەر نەیوێرابێ بەشێوەیەکی ڕاستەوخۆ و بەتەواوەتی لە دینی ئیسلام دابڕ ببێت و خەباتە نەتەوەییەکەی کورد بەشێوەیەکی ئاشکرا بەیان بکات. خۆ لەوانەشە نووسەر، تەبای هەموو ڕووناکبیرە کوردەکانی ئەو سەردەمە، کە جارێ هێشتا هەر پابەندی بیری پان - ئیسلامی بوون، نەیتوانیبێ چارەسەر و ئایدیۆلۆژیایەکی جیاواز بۆ خەباتی ڕزگاریخوازانەی نەتەوەیی کورد بدۆزێتەوە. لەم بوارەشدا، **ئەم شانۆنامەیە بە ئەڵقەیەکی زۆر گرنگ دەژمێردرێت لەنێوان بیری پان ئیسلامی و بیری نەتەوە - دەوڵەتی کوردیدا.**

بەم شێوەیە، ئەم شانۆنامەیە، ئەگەرچی هەندێ ڕەگەزی سەمبولی و مێژوویی تێکەڵ کراوە، بەڵام لەگەڵێک ڕووەوە بە **شانۆنامەیەکی دەروەست** لەقەڵەم دەدرێ. بە هەندێ باری دیکەشەوە دەچێتە خانەی شانۆنامەی تراژیدییەوە.

بەشی هەرە زۆری دیالۆگ و مەنەلۆگ و دیمەنە جۆراوجۆرەکان، تەنانەت تا دەگاتە وەسف و دیکۆریش، بە شێوەیەکی تابلێی ئەرکدارانە بەکارهاتوون؛ دەستاوەردێکن بۆ پیشاندانی ژیانی گەلی کورد و داب و نەریتە کوردەوارییەکانی وەکو: میواندۆستی، بەخشندەیی، خۆشەویستی، ئازایەتی، لەخۆبوردوویی، مێرخاسی، ئازادیخوازی، پابەندێتیی گەلی کورد بە پێودانگە ئەخلاقییە بەرزەکانەوە. ئەم دیاردەیەش، بەتەواوەتی لەگەڵ دیدی نووسەر بۆ مەسەلەی داهێنانی شانۆیی یەک دەگرێتەوە. چونکە نووسەر بینینێکی ناسیونالیستانەی بۆ ئافراندنی شانۆیی هەبووە؛ ئەم بینینەی خۆی لەسەرەوەی تێکستەکەدا بەئاشکرا نووسیوە، دەڵێ: " تیاترۆیا کوردان فەزیلەتا کوردان نۆشی ددەت ".

لەڕووی تەکنیک و ڕەگەزە هونەرییە شانۆییەکانیشەوە، کە لێکۆڵینەوەیەکی فراوانی پێویستە، دەتوانین بەڕاشکاوییەوە بڵێین: ئەم شانۆنامەیە بە یەکێک لە شاکارە هەرە بەرزەکانی ئەدەبی شانۆیی کورد لەقەڵەم دەدرێ. (٢١)

نووسەر لە بەکارهێنانی زماندا هەوڵی داوە زمانێکی ستانداری کوردیی یەکگرتوو دروست بکات.(٢٢) بۆ ئەمەش لە زۆر شوێندا هەردوو دیالێکتە سۆرانی و کرمانجیەکەی تێکەڵ بەیەکتر کردووە، لە هەندێ شوێنی دیکەشدا یەکسەر سۆرانییەکەی بەکارهێناوە: (تۆ بۆچی دەگری)، (مەمۆ دەستی دەگرێت)، (پەردە دەکەوێت)، (قەدری دەگرن)، (خزمەتی بۆ دەکەن)...هتد؛ لە هەندێ شوێنی دیکەشدا وشەی سۆرانیی لەجیاتی وشەی کرمانجی

چاومان بەم زاراوە هونەرییانەی خوارەوە دەکەوێ:(پیەس)، کە بە واتای (شانۆنامە) بەکار هاتووە؛ (تیاترۆ) کە بە واتای (شانۆگەری) بەکار هاتووە، هەروەها زاراوەکانی پەردە، پیەس، ئەشخاص: کسایەتیان، مەجلیس: دیـمەن، مەجلیسا ئەووەڵ ..هتد. ئەم وشانە، کە بۆ یەکەمین جار هاتوونەتە ناو زمانی ئەدەبی کوردیی ئەوسات، دیارە زمانی ستانداری کوردییان دەوڵەمەندتر کردووە، لە هەمان کاتدا نیشانەی ئەوەن کە نووسەر شارەزاییەکی باشی لەو هونەرەدا هەبووە؛ هەروەها نیشان دەدا کە خوێنەرانی کورد و بەشێوەیەکی گشتی جەماوەری کورد، لەو سەردەمەدا شانۆ و شانۆنامەیان ناسیوە، خولیای خوێندنەوەی شانۆنامە و بینینی شانۆگەرییان هەبووە. هەرچۆنێ بێ ئەم زاراوە شانۆییانە(پیەس)، (تیاترۆ)... هتد، وێڕای ڕەگەزە هونەریەکە ـ خۆی، سەرەتای ئەو پەیوەندییە شارستانیەمان بۆ ڕوون دەکاتەوە کە لەنێوان کوردستان و ئەورووپادا، تازە خەریک بوو دروست دەبوو.

ئەو جەنگەی کە نووسەر لە شانۆنامەکەدا بە ناوی «غەزا» دروستی کردووە و مەمی ئالان دەچێ بەشداریی تێدا دەکا، بە شێوەیەکی سمبوولیانە گرێی دەداتەوە بەو ڕاپەرین و شەڕ و شۆڕە ئازادیخوازانەی گەلی کورد کە لە پێناو سەربەخۆیی کوردستاندا دژی ڕژێمی (تورکە لاوەکان) بەرپای کردبوو.

بەڵام ئایا نووسەر لەبەرچی خەباتە نەتەوەییەکەی گەلی کوردی، لەژێر پەردەی جەنگی دینیدا، واتە لەژێر پەردەی «غەزا» دا حەشار داوە؟! ئایا لەبەرچی خەباتە ئازادیخوازە نەتەوەییەکەی خستوتە قاڵبی مێژووییانەی جەنگی سەلاحەددینی ئەییوبی دژ بە «کافرەکان» بۆ ڕزگارکردنی «قودسی شەریف»؟!

بە بڕوای ئێمە، ئەمە دوو هۆی هەیە. پێش هەموو شتێک، دەبینین کە نووسەر مەڵبەندی (چولەمێرگ) واتە مەڵبەندێکی ڕیالیستانەی کردۆتە شوێنی کۆبوونەوەی پێشمەرگەکان، لەهەمان کاتدا بە شێوەیەکی زۆر ڕیالیستانە ژیانی خێزانە کوردەکە و ڕووداوەکانی خستۆتە ڕوو. ئەمەش ئەوە دەگەیەنێ کە نووسەر نەیویستوە شانۆنامەیەکی مێژوویی یان شانۆنامەیەکی داستانی بنووسێت، بەڵکو بە بەکارهێنانی ئەم سـمبوولە مێژووییەی سـەلاحەددینی ئەییووبی، ویستوویەتی ڕۆڵەکانی گەلی کورد لە مێژووی باب و باپیرانی خۆیان ئاگادار بکاتەوە. ویستوویەتی لە خوێنەری کورد بگەیەنێت کە گەلی کوردیش، وەکو گەلانی تورک و عەرەب و فارس، مێژوویەکی دێرینی سەربەخۆی پڕ لە ئازایەتی و سەربەرزیی هەیە. هەڵبەتا ئەم ڕووانینەش، بۆ ئەو سەردەمەی ١٩١٩، لە بواری نووسینی پەخشانی هونەریی کوردیدا ڕووانین و هەڵوێستێکی نوێژەن و تازە بوو: لە هیچ کارێکی ئەدەبیی هاوچاخدا نەخرابووە ڕوو. بەم شێوەیە، نووسەر ویستوویەتی لەژێر پەردەی گێڕانەوەی جەنگی سەلاحەددینی ئەییووبی دا بۆ

هێرش دەکاتە ناوجێگاکە و «مەمی نوستوو» کەڵواژ دەکاتەوە. لەوەدەمەدا، خەزاڵ بە هاواری (مەم) ڕادەچڵەکێ، تەماشا دەکا: دایکی مەم کوڕەکەی خۆی کوشت، تازە زاوای خەزاڵی کوشت، کە دووای چەندین ساڵ، تازە لە پێشمەرگەیی گەڕابۆوە باوەش خەزاڵ.

ئەمە، کورتەی ئەو چیرۆکە تراژیدیەی شانۆنامەکە بوو، کە سێ چارەگە سەدە لەمەوپێش، لە ساڵی ١٩١٩ دا، بە قەڵەمی نووسەرێکی کوردی «نەناسراو» نووسراوە.

شایانی باسە، ناوەڕۆک و بیری ئەم شانۆنامەیە، تاڕادەیەکی یەکجار زۆر، لە ناوەڕۆک و بیری شانۆنامەی (سوء التفاهم) ی نووسەری فەرەنسی ئەلبێرت کاموو دەچێت. هەمان سێ کسایەتی: کوڕێک (Jean) کە دەڕوا سەری خۆی هەڵدەگرێت، دووای بیست ساڵان دەگەڕێتەوە ماڵ؛ دایکێک (دایکی Jean)، کە لە کۆتایی شانۆنامەکەدا بەهەڵە کوڕەکەی خۆی دەکوژێت و فڕێی دەداتە ڕووبارەوە؛ خوشکێک، واتە خوشکی (Jean)، کە لە شانۆنامە کوردییەکەدا خوشک نیە، بەڵکو هاوسەرە. جگە لەوە لە شانۆنامەکەی (ئەلبێرت کاموو) یش دا، هەمان چوتیەتیی چنینی ڕووداو، هەمان شێوەی کارەساتەکان بەرچاو دەکەون. کاتێ کوڕەکە یانی (Jean)، دووای بیست ساڵان دەگەڕێتەوە ماڵ، دایک و خوشکەکەی، کوڕەکەی خۆیان ناناسنەوە، نازانن کوڕەکەی خۆیانە و بەهەڵە دەیکوژن. پاشان، کە لەڕێگای هاوسەری کوڕەکەیانەوە ئاگادار دەکرێنەوە، ئیتر هەردووکیان خۆیان دەکوژن: دایکەکە لە حەژمەتان خۆی فڕێ دەداتە ڕووبارەوە، مارتای خوشکیشی خۆی هەڵدەواسێ. (١٩)

لێرەدا پێویستە پەنجەنومای ئەوە بکەین کە (عەبدولڕەحیم ڕەحمی هەکاری) بە هیچ شێوەیەک ئەم شانۆنامە فەرەنسییەی (ئەلبێرت کاموو) ی نەدیوە. چونکە نووسەری شانۆنامە کوردییەکە، نزیکەی بیست و پێنج ساڵ پێش (ئەلبێرت کاموو) بەرهەمەکەی خۆی نووسیوە، واتە شانۆنامە فەرەنسییەکە بیست و پێنج ساڵ دووای کوردییەکە نووسراوە و لە ساڵی (١٩٤٤) دا بڵاو کراوەتەوە. ئێمە بیرمان بۆ ئەوە دەچێ کە نووسەر (عەبدولڕەحیم ڕەحمی هەکاری) بیری ئەو شانۆنامەیەی لە کەلەپووری میللی کوردەوارییەوە وەرگرتبێ (٢٠) و لە شێوە و تەکنیکی شانۆییدا دایڕشتبێتەوە. هەرچۆنێ بێ، ئەم مەسەلەیە پەیوەندیی بە ئەدەبی بەراوردکارییەوە هەیە، لێی دەگەڕێین بۆ پسپۆڕانی بواری خۆی.

بایەخی ئەم شانۆنامەیە، تەنیا لەوەدا نیە کە بۆ یەکەمین جار لە مێژووی ئەدەبیاتی کوردیدا فۆرمێکی تازە و ڕەگەزێکی هونەریی نوێ بە خوێنەرانی کورد دەناسێنێ، بەڵکو لە ئاستە ڕامیاری و فیکرییەکەشدا بە سەنەد و بەڵگەنامەیەکی زۆر دانسقە لەقەڵەم دەدرێ: بۆ ڕوونکردنەوە و شیکردنەوەی ئەو قۆناغە سیاسی و فیکرییە ساوایەی خەباتی ڕزگاریخوازانەی گەلی کورد لەسەردەمی دووای جەنگی یەکەمی جیهانیدا. لەم تێکستەدا، بۆ یەکەمین جار

ئالان، لە هەڵوێستێکدایە: هەڵبژاردن. مەم دەزگیرانی خەزاڵە و تازەزاوایە، لە هەمان کاتدا شەڕێکی گەورە دەستی پێ کردووە، جەنگێک لەپێناو سەربەخۆیی وڵات. مەم بیر لەوە دەکاتەوە کە وەکو پێشمەرگەیەکی سەرازای کورد بچێتە ئەو جەنگە ڕزگاریخوازە، بەڵام ئەگەر بچێت، ئەوا پێویستە خەزاڵی تازەبووکی یەکشەوەی بەجێ بهێڵێ! چارە چیە؟ بچێت یان نەچێت؟! سەرەتای شانۆنامەکە، بەم نائارامی و مەنەلۆژ و خۆدوواندنەی پاڵەوان دەست پێدەکا.

نووسەر هەر لە سەرەتای شانۆنامەکەوە، پاڵەوانەکەی خستۆتە هەڵوێستەوە: هەڵوێستی هەڵبژاردن. ئەمەش تەکنیکێکی شانۆییانەی هاوچاخ و هەتا بڵێی زیرەکانەیە. هەروەها دەبینین درامای شانۆنامەکەی لەسەر چەند کەرستەیەکی ریالیستانەی ژیانی ڕۆژانەی میللەت و کێشەی سیاسیی کورد هەڵچنیوە. لە لایەکی دیکەشەوە، دراما لەم شانۆنامەیەدا، بەقەدەر ئەوەی کە پەیوەندی بە بابەت و ژیانی دەرەکییەوە هەیە، هێندەش پەیوەندیی بە دەروون و ناخی کەسایەتییەکانەوە هەیە. دراما لەم شانۆنامەیەدا لەسەر بنەمای کێشەیەکی دەروونی، کێشەیەکی ئەخلاقی یا کێشەیەکی فیکریی هاوچەرخەوە هەڵچنراوە؛ ئەم کێشە بە گرێ وگۆڵەش پەیوەندیی بە کەسایەتیی مرۆڤی کورد و سروشتی کۆمەڵگای کوردەوارییەوە هەیە، بە کێشەی داگیرکرانی کوردستانەوە. ئەم دیاردە هونەرییە لە شانۆنامەکەدا، بە یەکێک لە گرنگترین خەسڵەتە هونەرییە بەرزەکانی ئەم شاکارە لە قەڵەم دەدرێ.

لە کۆتایی پەردەی یەکەمدا، دووای مەنەلۆگ و گفتوگۆیەکی دوور و درێژ لەنێوان (مەم) و (خەزال) دا، مەم بڕیار دەدا کە لەم ئەرکە نەتەوەییەی خۆی ڕانەکات. ئیتر دەڕوا، لەپێناو ئازادکردنی ولاتە داگیرکراوەکەیدا دەچێ دەبێتە پێشمەرگە. ئیدی لەمەودووا، ساڵانێکی زۆر دەکەوێتە نێوانیان؛ چیتر ئاگایان لە دەنگوباسی یەکتر نامێنێ.

لە پەردەی دووەمدا - نازانین دووای چەند ساڵ ـ مەم (پاڵەوانی چیرۆکەکە) دەگەڕێتەوە. دووای ئەو هەموو ساڵە، گۆڕانێکی زۆر بە سەر شێوە و ئادگاری مەم دا هاتووە، تا ڕادەیەک کە خەزالی خێزانی، «تەنانەت دایکی مەم خۆیشی لەسەرەتا دا» نایناسێتەوە.

مەم لە گەڕانەوەی خۆیدا، یەکەمجار خەزال دەبینێ. گفتوگۆیەکی کورت لەنێوانیان ڕوو دەدات. دووای ئەو هەموو ساڵ و عەیامە زۆرە، بە تاموبۆی ژن و مێردایەتی و لەشی یەکتر ئاشنا دەبنەوە. دووای ئەوە، هەر لەناو نوێندا خەو دەیانباتەوە و پاشان لە باوەش یەکتردا بێهۆش دەکەرن.

لەو دەمەدا، کاتێ ئەوان لە باوەشی یەکتردا لەناو جێ خەویان لێ کەوتووە، دایکی مەم دەگەڕێتەوە. دەبینێ پیاوێک لەگەڵ خەزالی بووکی لەناوجێ خەوتووە. سەرشۆڕی و تاوانە کە ببینێ پیاوێک دەسدرێژی لە نامووسی بووکەکەی بکات. دەمودەست چەقۆیەکی تیژ دەهێنێ،

لەبارەی شانۆنامە و نووسەری شانۆنامەکە

ئێمە بەداخەوە تاکو ئێستا ساڵی لە دایکبوون و مردنی (عەبدولرەحیم رەحمی هەکاری) مان بۆ ساغ نەکراوەتەوە. تەنیا ئەوەندە دەزانین کە لەماوەی ساڵانی (١٩١٨ - ١٩١٩) لەسەر لاپەڕەکانی گۆڤاری (ژین) دا لە ئەستەمبوڵ، شیعر و چیرۆک و شانۆنامە و وتاری جۆراوجۆری بە زمانی کوردی و تورکی، بەم نازناوانەی خوارەوە بڵاوکردوّتەوە: [عبدالرحیم زاپسو)، (عبدالرحیم افندی، (هکاریلی عبدالرحیم رحمی)، (ژمالا هکاریان).

عەبدولرەحیم رەحمی هەکاری خەڵکی مەڵبەندی (هەکاری) بووە لە کوردستانی تورکیا. لە هەمان سەردەمی بڵاوبوونەوەی گۆڤاری ژین دا، واتە لەنێوان ساڵانی ١٩١٨ - ١٩١٩دا دیوانە شیعرێکی بە ناونیشانی (گازیا وەلات) هەروەها کتێبێکی بە ناونیشانی (عەقیدا کوردان) بڵاوکردوّتەوە. هەندێ ژمارەی گۆڤاری (ژین) و گۆڤاری **کوردستان** (١٩١٩ - ١٩٢٠) پڕۆپاگەندە و گوتاریان لەبارەی (عەقیدا کوردان) بڵاوکردوّتەوە. هەروەها مامۆستا محەممەد ئەمین بوزئارسەلان باسی هەمان ئەو کتێبەی نووسەر و دیوانە شیعرێکیشی کردووە. (١٨)

عەبدولرەحیم رەحمی هەکاری وێڕای **مستەفا شەوقی** یەکێکە لە پێشڕەوانی تازەکردنەوەی شیعری هاوچاخی کوردی. ئەم دوو شاعیرە، لەسەر لاپەڕەکانی گۆڤاری ژین (١٩١٨ - ١٩١٩) و گۆڤاری **کوردستان** دا (١٩١٩ - ١٩٢٠)، واتە چەندین ساڵ بەر لە (شێخ نووری شێخ ساڵح) و (رەشید نەجیب) و (گۆران)، لەژێر کاریگەرێتیی شاعیرە نوێخوازە تورکەکاندا، دەستیان کردوّتە تازەکردنەوی شیعری کوردی و بەرهەمیان بڵاوکردوّتەوە: چ لەڕووی چەندایەتییەوە، چ لەڕووی چۆنییەتییەوە، رۆڵێکی گەورەیان لە بواری تازەکردنەوەی شیعری کوردیدا هەبووە.

ئێمە تاکو ئێستا بۆمان ساغ نەبوّتەوە داخوا ئەم شانۆنامەیە وەختی خۆی لە ئەستەمبوڵ یا لە شارەکانی کوردستاندا خراوەتە سەر شانۆ یان نا؟! ئەوەشمان بۆ ساغ نەکراوەتەوە کە ئایا شانۆنامەنووسی ناوبراو هیچ شانۆنامەیەکی دیکەی بە زمانی کوردی بڵاوکردوتەوە یان نا؟ تەنیا هێندە دەزانین کە ئەم شانۆنامەیە، دوای بڵاوبوونەوەی لە گۆڤاری (ژین) دا، بە شێوەی کتێبێکیش، واتە لە نامیلکەیەکی سەربەخۆدا، چاپ و بڵاوکراوەتەوە.

شانۆنامەی (مەمی ئالان) کە لێرە دا خستوومانەتە سەر ڕێنووسی تازەی کوردی، لە دوو پەردەدا، بە زنجیرە لە دوو ژمارەی (١٥) و (١٦) ی گۆڤاری (ژین) دا لە ئەستەمبوڵ لە ساڵی ٩١٩ دا بڵاوکراوەتەوە. هەڵبەتا ئەوکاتە لە هەموو گۆڤارە ئەدەبیە تورکیەکانیشدا باو بووە؛ شانۆنامە لە دوو یان سێ ژمارەی گۆڤاردا بە زنجیرە بڵاو دەکرایەوە.

هەر کە پەردەی شانۆنامەی (مەمی ئالان) دەکرێتەوە، دەبینین پاڵەوانی شانۆنامە، مەمی

سێ شەممە ٢ ی ئاغستۆسی سالی ١٩٢٧دا بلاوکراوەتەوە. ئەم ڕەخنە شانۆییە، نرخاندن و هەڵسەنگاندنێکی فراوانە لەبارەی ئەو شانۆگەرییەی کە لە قوتابخانەی (زانستی)دا لە سلێمانی، لە ڕۆژی (٢٧) و (٢٨) ی مانگی تەمووزی سالی ١٩٢٧دا پێشکەش بە خەڵکی سلێمانی کرابوو.

پیرەمێردی نەمر، لە هەمان کاتدا، لەسەر لاپەڕەکانی ڕۆژنامەی **ژیانەوە و ژیان دا**، بایەخێکی زۆری دەدایە ناساندنی هونەری شانۆ و دراما بە جەماوەری کورد. لە هەمان ژمارەی ناوبراوی ڕۆژنامەی **ژیان** دا، ڕۆژی سێ شەممەی ٢ ی ئاغستوسی ١٩٢٧، خەڵکی کورد بەم هونەرە شارستانیە ئاشنا دەکات و دەڵێ: (**فەنی تەمسیل، لە هەموو جێگایەکدا ڕەغبەتێکی تەواو و ئیمتیازێکی موناسبی دراوەتێ**؛ حەتتا ئەوانەی کە لەم فەننە بەقیمەتەدا دەسڕۆی و **ئیختیساسیان پەیدا** کردووە، بە کەمالی **ئیحتیرامەوە** یاد و تەقدیر کراون. زیرا ئەم فەننە، **بەسەر ئەخلاقی میللەت، عاداتی مەملەکەت، ئەطوار و ئەفکاری ئینساندا تەئسیرێکی باش ئیجرا دەکات.** جێی سەرنجە کە **پیرەمێرد** دیسانەوە یەکێکە لە یەکەمین ئەو شانۆنامەنووسە کوردانەی . لە کوردستانی عیراق دا . کە شانۆنامەیان بە شێوەی کتێب (واتە لە نامیلکەی سەربەخۆدا) چاپ و بلاوکردبێتەوە.(١٧)

ئێستا بۆمان یەکلا دەبێتەوە کە، بە هەمان شێوەی پیرەمێرد، **عەبدولرەحیم ڕەحمی هەکاری، کە بە یەکەمین شانۆنامەنووسی کورد لە قەڵەم دەدرێت**، ئەویش هەر لەژێر کاریگەرێتیی ئەو ژیانە هونەری و شانۆییەی تورکەکانی ئەستەمبوڵدا بووە.

عەبدولرەحیم ڕەحمی هەکاری، دیارە لەڕێگای گۆڤارە ویژەییە تورکیەکانی وەکو(**ثروت فنون ١٩.٩٩**)، (**شهبال ١٩.٩**)، (**اجتهاد ١٩١٨**)، (**تماشا، مصور تیاترو ١٩١٨**) دا چاوی بەم فۆرمە هونەرییە تازەیەی پیەس (شانۆنامە) کەوتوە، **هەر لەڕێگای ئەو گۆڤارە تورکیانەشەوە بنچینە و بنەماکانی ئەم هونەرە شارستانییە دڵگیرەی ناسیوە**. ویستوویەتی کە ئەم فۆرمە هونەرییە تازەیە، ئەم ڕەگەزە ئەدەبییە نوێیە بخاتە ناو ئەدەبیاتی کوردیشەوە. ڕاستیەکەشی، بەم شانۆنامەیەی مەمی ئالان، کە بە یەکەمین شانۆنامەی نووسراوی کوردی لە قەڵەم دەدرێت، زۆر هونەرمەندانە توانیویەتی بەردی بناغەیەکی پتەو بۆ دەستپێکردنی نووسینی شانۆنامە لە ئەدەبیاتی کوردیدا دابڕێژێت.

کەواتە سەرهەڵدان و بلاوبوونەوەی یەکەمین شانۆنامەی کوردی، مەمی ئالان، بەری داری ئەو ڕووانینە نەوژەن و شارستانییەی عەبدولرەحیم ڕەحمی هەکاری یە، کە لەماوەی سالانی ٨.١٩.١٩١٩دا لەژێر کاریگەرێتیی جموجوڵی شانۆی هاوچاخی تورکەکاندا لە لای نووسەر خەملیبوو.

گۆڤار و گرووپ و قوتابخانە ئەدەبییە نەوژەنـە هاوچەرخە تورکییانەوە. دەیانویست شوێن پێی نووسەرە تورکە نەوژەنەکان هەڵبگرن؛ واتە تەکنیکی تازە، فۆرمی تازە بۆ دەربڕینە ئەدەبیەکانی خۆیان بدۆزنەوە. هەر بۆیەش بە شتێکی سەیر نازانرێت کە دەبینین لەو سەردەمەدا، بۆ یەکەمین جار لە مێژووی ئەدەبیاتی کوردیدا، چەندین ڕەگەز و فۆرمی ئەدەبیی نوێ ـ جگە لە تازەبوونەوەی زمان و تەکنیکی شیعری ـ لەناو ئەدەبیاتی کوردیدا سەرهەڵدەدەن: فۆرمی چیرۆک لە ساڵی ١٩١٣ دا لە گۆڤاری ڕۆژی کورد، فۆرمی پیەس - شانـۆنامە لە ساڵی ١٩١٩ دا لە گۆڤاری ژیـن ... هتد.

کاریگەرێتیی تازەبوونەوەی ئەدەبی تورکەکان بەسەر نووسەرە کوردە گەنجەکاندا، لەو سەردەمەدا هێندە بە زەبر و بەتیـن بووە تەنانەت پڕیشکی گەیشتۆتە کوردستانی عیراقیش. نووسەرانی کوردی عیراق، لەوانە گۆران، شێخ نووری شێخ سالح، ڕەشید نەجیب، ڕەفیق حیلمی، تەنانەت تا سەرەتای ساڵانی سییەکانیش هەر لەژێر کاریگەرێتیی ئەو شەپۆڵەدا بەرهەمەکانی خۆیان نووسیوە. پیرەمێردی نەمر، کە لە ماوەی ساڵانی ١٨٩٧ - ١٩٢٣ دا بۆخۆی لە ئەستەمبوڵ، لەناو جموجوڵە ئەدەبییەکەدا ژیاوە، دەگێڕێتەوە؛ دەڵێ :

« ئێمە زۆرترمان لەوێوە ـ لە ئەستەمبوڵەوە ـ پێگەیشتووین » (١٤)، « یەکەمجار لە ـ ئوططە ـ دراوسـێی ڕەجایی زادە ئەکرەم بەگ و عوششاقی زادە خالید زیا و حسێن ڕەحمی بووم، ڕەزا تۆفیقیشیان پێ ناساندم.(١٥) ئیتر کەوتمە بەهەشتی سەروەتی فنوونەوە »، «ئێواران کە لە ئەستەمبووڵەوە بە واپۆڕ ئەگەڕامەوە بۆ لانەی سەعادەتی خۆم کە ـ ئوططە ـ بوو، وە کە سەروەتی فنوونم لە گۆگرتەی ئەو واپۆڕی سەر دەریای مەرمەڕەیە دا ئەخوێندەوە، تەئسیری ئەو شیعر و ئەدەبیاتە لە سندبادی بەحری زیاتر ئەیخستمە دەریای خولیاوە ». (١٦)

کەواتە پیرەمێرد نەک هەر تەنیا لەژێر کاریگەرێتی شەپۆڵ و ڕەوتی نوێخوازانەی گۆڤاری (سەروەتی فنوون) دا بووە، بەڵکو تەنانەت هاوڕێیەکی زۆر نزیک و دراوسێی شانۆنامەنووسێکی وەکو (ئەکرەم ڕەجایی زادە) و (خالید زیا عوششاقی زادە) و (حسێن ڕەحمی) بووە؛ لە نزیکەوە و ڕاستەوخۆ لە ناوجەرگەی جموجوڵە شانۆییە بەرفراوانەکەی ئەو نووسەرە تورکە نوێخوازانەدا ژیاوە. بۆیە هیچ سەیر نیە کە دەبینین پیرەمێردی شاعیر، لەژێر کاریگەرێتیی ئەو جموجوڵە شانۆییەی ئەو سەردەمەی تورکەکاندا، بە یەکێک لەو نووسەرە کوردانە لەقەڵەم دەدرێ کە بۆ یەکەمین جار لە مێژووی ئەدەبیاتی کوردیدا فۆرمی (پیەس) واتە شـانۆنامەیان لە ئەزموونی ئەدەبیی خۆیاندا تاقی کردبێتەوە و بۆ یەکەمیـن جار ئەم ڕەگەزە هونەرییە ئەوروپییە تازەیەیان بە خوێنەرانی کورد ناساندبێ. بەهەمان شێوە پیـرەمێرد، بۆ یەکەمین جار لە مێژووی ئەدەبیاتی کوردیدا، یەکەمین ڕەخنەی شـانۆیی کوردیی نووسیوە و لە ڕۆژنامەی (ژیـان) دا، لە ڕۆژی

١ ـ گۆڤاری **سەروەتی فنوون** لە ساڵی ١٩٠٩دا، کە لە ئەدەبیاتی تورکیدا بە **قوتابخانەی فەجری ئاتی** ناسراوە. بریتی بوو لە بیست نووسەری گەنجی نەوژەن: (تۆفیق فیکرەت)، (ئەحمەد هاشم)، (یاقووب قادری)، (فوئاد کۆپرلی)، (خالید زیاد ئوششاقی زادە)، (ئەحمەد ئیحسان)، (جەناب شەهابەدین)...هتد.(١٢)

٢ ـ گۆڤاری **گەنج قەلەملار** ـ قەڵەمە گەنجەکان لە ساڵی ١٩٠٨ دا.

سەرنووسەری ئەو گۆڤارە، ڕووناکبیری بە بنچە کورد (زیا گۆکالپ دیاربەکری) بوو. ئەم گۆڤارەش هەر لە کۆتاییدا چووە ژێر کاریگەریتی و ڕەوتی قوتابخانەی **فەجری ئاتی** یەوە.

٣ ـ گۆڤاری **یەنی مەجمووعە** ـ کۆمەڵەی نوێ لە ساڵی ١٩٠٨ دا، کە لەلایەن کۆمەڵەی **ئیتیحاد و تەرەقی** یەوە بڵاو دەبووە.

جگە لە چەندین بڵاوکراوە و گۆڤاری دیکەی وەکو: (شهبال) ١٩٠٩، (اجتهاد) ١٩١٨، (شاعر) ١٩١٨، (ئینجی) ١٩١٩، هەروەها لە هەموویان گرنگتر: گۆڤاری شانۆیی(تماشا مصور تیاترۆ) کە لە هەمان ساڵی دەرچوونی گۆڤاری ژین دا (١٩١٨ - ١٩١٩)، لە شاری ئەستەمبوڵدا بڵاودەکرایەوە؛ تەرخان کرابوو بۆ بڵاوکردنەوەی شانۆنامە و لێکۆڵینەوەی شانۆیی.

هەموو ئەو گۆڤارانە، بە شێوەیەکی گشتی، بایەخێکی تایبەتی و فراوانیان دەدایە بڵاوکردنەوەی تێکستی شانۆیی و وتاری ڕەخنەگرانە لەبارەی دراما و قوتابخانە شانۆییە ئەورووپییە تازەکان. لەسەر لاپەڕەکانی ئەو گۆڤارانەدا، تێکستی شانۆیی و لێکۆڵینەوەی شانۆیی، چ نووسراو و چ تەرجەمەکراوی ئەم نووسەرانەی خوارەوە بەرچاو دەکەون: سەرمەد موختار، حسێن کازم، یووسف زیا، سەنای نەفیس، موحاسیب زادە جەلال، عومەر سەیفەدین، ڕەفیق خالید، ڕەشاد نووری، ئەحمەد نووری ئیبن ڕەفیق..هتد.(١٣)

لەژێر ڕۆشنایی ئەو ڕاستیانەی سەرەوەدا و بە پێی لێکۆڵینەوەی تورکەکان - خۆشیان، بۆمان دەردەکەوێ کە شاری ئەستەمبوڵ لەو سەردەمەدا (١٩٠٨ - ١٩٢٣) جموجوڵێکی شانۆیی فراوانی تێکەوتبوو: چ لەڕووی تێکستی تازەی شانۆییەوە، چ لەڕووی خستنە سەر شانۆی ئەو تێکستانە و پراتیک کردنی هونەری شانۆگەری بە شێوە ڕۆژئاواییە هاوچەرخەکەی.

بێگومان، لەو سەردەمەشدا (١٩٠٨ - ١٩٢٣)، وەک دەزانین، ژمارەیەکی یەکجار زۆر لە نووسەر و ڕووناکبیرانی کورد، لە هەموو پارچەکانی کوردستانەوە، بۆ نموونە **مستەفا شەوقی** لە شاری مهابادی کوردستانی ئێرانەوە؛ **پیرەمێرد** لە کوردستانی عێراقەوە، **ع. ڕەحمی هەکاری** لە کوردستانی تورکیاوە...دەیان نووسەری دیکە، لەو ماوەیەدا لە شاری ئەستەمبوڵ کۆبیوونەوە؛ هەناسەیان لەم ئاووهەوا هونەری و ئەدەبیە ڕەنگین و تازەیەدا هەڵدەمشت: بە شێوەیەکی ڕاستەوخۆ کەوتبوونە ژێر کاریگەریتیی ڕەوت و پێوەندگە جوانیناسییە تازەکانی ئەم

سالی ۱۹.۸ دا مافی بە کوردی نووسین و بڵاوکردنەوەی گۆڤار و ڕۆژنامەیان لە تورکیادا وەدەست هێنا.

ماوەی ساڵانی ۱۹.۸ - ۱۹۲۳ بە قۆناغێکی تازە دەژمێردرێ لە بواری پەرەسەندن و بووژانەوەی ژیانی شانۆیی و هونەری شانۆگەری لە تورکیادا. هەر لەگەڵ هاتنە سەر حوکمی **تورکە لاوەکان** لە ساڵی ۱۹.۸ دا، وردە وردە چەندین گرووپ، کۆمپانیا، کۆمەڵەی شانۆیی تازە لە شاری ئەستەمبوڵدا دامەزران، گرنگترینیان ئەمانە بوون: دارولتەمسیلی عوسمانی، ئەستەمبوڵ کۆمپانیاسی، ئەرتوگروول تیاترۆسی، عوسمانلی دۆتانە جەمعیەتی، سحنەی هەوەس، میناکیان تیاترۆسی، عوسمان تانسی تیاترۆسی، بینەمەجیان تیاترۆسی، عوسمانلی تیاترۆ کلەبی.

ئەم گرووپ و کۆمپانیا شانۆییە تازانە، بەلێشاو، بە گۆڕێکی تازەوە دەستیان کردە دەرهێنان و خستنە سەر شانۆی شانۆنامە ئەورووپییەکان. شانۆگەرییەکانی مولییر و راسین و ئەلکزاندر دوما و ڤیکتۆر هوگۆ سەرلەنوێ ڕەواجێکی فراوانیان لەم بارەیەوە پەیدا کرد.(۹) هەر لەو سەردەمەدا، واتە لە ماوەی چارەگی یەکەمی ئەم سەدەیەدا، بۆ یەکەمین جار لە مێژووی ئەدەبیاتی تورکیدا، سەرتاسەری شاکارە شانۆییەکانی شکسپیر لەلایەن ڕووناکبیری کورد **عەبدوللا جەودەت** تەرجەمە کرانە سەر زمانی تورکی: چ بە شێوەی کتێب، چ لە گۆڤارە عوسمانیەکاندا، بە تایبەتی لە گۆڤاری شەهبال دا (ژمارە ۷ - ۲۵، ساڵی ۱۹.۹) بڵاوکرانەوە. هەروەها لەماوەی ساڵانی ۱۹۱۳ - ۱۹۱٤ دا بۆ یەکەمین جار لە مێژووی ژیانی هونەریی تورکیادا، **ئەکادیمیای هونەری شانۆ لە ئەستەمبوڵ**، بە ناوی **دار البدائع عثمانی** دەکرێتەوە و خوێندکاران (هەڵبەتا لەوانە خەلکی کوردیش) بۆ خوێندنی پراتیک و تیۆری شانۆ ڕووی تێ دەکەن. وێڕای ئەمانەش، کۆمەڵێک نووسەر و شانۆنامەنووسی گەنج لەو ماوەیدا دەرکەوتن و شانۆنامەکانی خۆیان لە شێوەی درامای تازەی ئەورووپیدا، بە کتێب یان لە گۆڤارەکاندا چاپ و بڵاوکردنەوە. ناودارترین شانۆنامەنووسە گەنجەکانی ئەو ماوەیە، ئەمانە بوون: سامی پاشا زادە، عەبدولحەق حامید، جەلال ساهیر، خالید زیا ئوشاقی زادە، جەناب شەهابەدین، حوسێن سوعات، خالید فەخری ئووزانسۆی، یووسف ئورتاج.(۱.)

شان بە شانی هەموو ئەمانەش، کۆمەڵێک گۆڤاری هونەری و ئەدەبی، کە لەژێر تەسیری قوتابخانە ریالیستی و پەرناسی و قوتابخانە هونەرییەکانی دیکەی ئەورووپادا بوون، دەرکەوتن و دەستیان کردە بڵاوکردنەوەی ئەدەبیاتی تازە لە فۆرم و تەکنیکێکی هاوچاخانەی ئەورووپیدا.(۱۱) ئەو گۆڤارانە، بەشێکی فراوانی لاپەڕەکانیان بۆ بڵاوکردنەوەی تێکستی شانۆیی و لێکۆڵینەوەی شانۆیی تەرخان کردبوو. گرنگترین گۆڤارەکان ئەمانە بوون:

ئەلکزاندەر دووماس هونەری شانۆگەری و درامایان، نەک هەر گەیاندە ئاستی نووسین و بڵاوکردنەوە، بەڵکو گۆڕێنکی تازە و ناوەڕۆکێکی هونەری و بەرزیشیان بە جموجوڵی شانۆگەری و نووسینی شانۆنامە بە زمانی تورکی بەخشی.(٤)

یەکەمین شانۆنامە لەبارەی ژیانی گەلی کورد

شایانی باسە، لە گەرمەی ئەو جموجۆڵە شانۆییەی کۆتایی سەدەی نۆزدەهەم لە تورکیادا، یەکێک لەو شانۆنامەنووسانە، **ئەحمەد مەدحەت ئەفەندی** شانۆنامەیەکی بە ناونیشانی (کچە کورد- کورد قزی) لەبارەی ژیانی کوردەکانی کوردستانی تورکیا نووسیوە و لە دەوروبەری ساڵی ١٨٧٧ دا لە شاری ئەستەمبوڵ لەسەر شانۆ پیشانی خەڵک دراوە.(٥)

ئایا دەکرێ ئەم شانۆنامەیە ، بە یەکەمین شانۆگەریی کوردی لەقەڵەم بدرێ ؟

ئێمە نازانین داخوا ئەم شانۆگەرییە بە زمانی کوردی بووە یان بە تورکی، نازانین داخوا نووسەرەکەی، **ئەحمەد مەدحەت ئەفەندی**، بە بنەچە کورد بووە یان هەر تورک، بەڵام سەرچاوەیەکی ئینگلیزی باسی ئەوە دەکا کە ئەم شانۆگەرییە، بە ناونیشانی **کچە کورد - کورد قز**، باسی ژیانی کوردەواریی کردووە؛ هەروەها کەسایەتییەکانی شانۆنامەکەی بە جلوبەرگی کوردییەوە خستوتە سەر شانۆ. (٦) هەروەها شانۆگەریەکی دیکەش بە ناونیشانی (کاوە)، کە ئەفسانەی (کاوەی ئاسنگەر) دەگێڕێتەوە، لە هەمان ساڵدا پیشان دراوە.(٧)

ئێمە لەبەر نەبوونی دۆکیوومەنت، هەروەها لەبەرئەوەی کە دڵنیا نین لەوەی کە ئەو شانۆنامەیە بە زمانی کوردی پێشکەش کرابێ، ناتوانین ئەم شانۆنامەیەی **ئەحمەد مەدحەت ئەفەندی** بە یەکەمین شانۆنامەی کوردی لەقەڵەم بدەین.

هەر چۆنێ بێ، بە درێژایی ئەو سەردەمە و تاکو ساڵی ١٩١٩، ئێمە هیچ تێکستێکی بڵاوکراوەی شانۆییمان بە زمانی کوردی لەبەردەستدا نیە؛ هەروەها هیچ بەڵگەیەکیشمان بەدەستەوە نیە کە لەو سەردەمەدا هیچ شانۆنامەیەکی نووسراو بە زمانی کوردی پیشانی خەڵک درابێ.چونکە نووسەرە کوردەکانی ئەو سەردەمە، تەنانەت رووناکبیرە کوردە هەرە دڵسۆزەکانیش، بۆ نموونە یەکێکی وەکو عەبدوللا جەودەت، تا نیوەی یەکەمی ئەم سەدەیەش شانۆنامە ئەوروپییەکانی هەمیشە وەردەگێڕایە سەر زمانی تورکی، نەک کوردی.(٨)

لە ساڵی ١٩٠٨ بەولاوە

کاریگەریتی ئەدەبیاتی تورکی بەسەر ئەدەبیاتی کوردییەوە، بە شێوە دیار و ڕاستەوخۆکەی، لەوانەیە لە ساڵی ١٩٠٨ بەولاوە دەست پێ بکا. چونکە گەلی کورد، تەنیا لە ساڵی ١٩٠٨ بەولاوە، واتە لەگەڵ هاتنە سەر حوکمی تورکە لاوەکان و دامەزراندنی رژێمی دەستووری لە

ئەدەبیاتی تورکییەوە شێوەی خۆی وەرگرت. لێرەدا هەوڵ دەدەین بە چەند دێڕێک زەمینەی ئەو کاریگەرێتییەی ئەدەبیاتی تورکی بەسەر سەرهەڵدانی یەکەمین شانۆنامەی کوردیدا (١٩١٨ - ١٩١٩) ڕوون بکەینەوە.

تورکەکان، سەبارەت بە نزیکیی ئیمپراتۆریەتەکەیان لە ئەورووپا و هەبوونی پەیوەندیی ڕامیاری و بازرگانی و ڕۆشنبیرییان لەگەڵ ئەورووپا، لە زۆر زووەوە (پێش گەلانی کورد و فارس و عەرەب) توانیویانە پەیوەندی لەگەڵ ژیانی کولتووری و هونەریی ئەورووپا دروست بکەن. لە ماوەی ساڵانی ١٨٣٩ - ١٨٧٦ دا، کە ئەم قۆناغە لە مێژووی دەوڵەتی عوسمانیدا بە قۆناغی تەنزیمات ناسراوە، هەرچی بزووتنەوەیەکی ئایدیۆلۆژی و کولتووری و وێژەیی لە ئەورووپا دروست ببوایە، یەکسەر لە تورکیادا دەنگی دەدایەوە و بڵاو دەبۆوە. بەم شێوەیە، یەکەمین شانۆگەرییە شێوە ڕۆژئاواییەکان بە زمانی تورکی لە ساڵی (١٨٣٩) بەولاوە پیشانی خەڵک دران. شانۆگەرییە تراژیدی، لیریک، کۆمیدیەکان، لەلایەن گرووپ و کۆمپانیا فەرەنسی و ئیتالیەکانەوە، یان لەلایەن بالوێزخانەکانیانەوە ئامادە دەکران و پیشانی جەماوەر دەدران. (٢) ئیتر وردە وردە لە کۆتایی سەدەی نۆزدەهەم بەولاوە " تیاترۆ " بووە یەکێک لە هونەرە جەماوەری و بڵاوەکانی تورکیای عوسمانلی.

ئەم قۆناغەی کۆتایی سەدەی نۆزدەهەم بە قۆناغی بووژانەوەی شانۆگەرییە شێوە ڕۆژئاواییەکان لە قەڵەم دەدرێ لە ژیانی کولتووریی تورکیا دا.(٣) لەم قۆناغەدا، چەند نووسەرێکی تورک، کە پێشتر ماوەیەکی زۆری ژیانی خۆیان لە ئەورووپا و بە تایبەتی لە فەرەنسادا بەسەربردبوو، بە نووسین و بڵاوکردنەوەی شانۆنامەکانیان تەکانێکی گەورەیان دایە داهێنان و پەرسەندنی نووسینی شانۆنامە لە ئەدەبی تورکیدا، لەوانە: ئیبراهیم شیناسی ١٨٢٦-١٨٧١، کە لە ساڵی ١٨٥٨دا یەکەمین شانۆنامەی شێوە ڕۆژاوایی بە زمانی تورکی نووسی و بڵاوی کردەوە، بە ناونیشانی: (شاعیر ئێڤلەمەسی - زەماوەندی شاعیر). ئیتر لەوە بەدووا چەندین نووسەری دیکەش، پەیتا پەیتا شانۆنامەی جۆراوجۆری کۆمیدی، تراژیک، لیریکیان بە زمانی تورکی نووسی و بلاوکردەوە. گرنگترین ئەو شانۆنامەنووسە تورکانەی کۆتایی سەدەی نۆزدەهەم ئەمانە بوون: نامیق کەماڵ ١٨٤٠ - ١٨٨٨، عەلی بەگ ١٨٤٤ - ١٨٩٩، ئەحمەد مەدحەت ئەفەندی ١٨٤٤ - ١٩١٢، شەمسەدین سامی ١٨٥٠ - ١٩٠٤، مەحموود ئەکرەم ڕەجایی زادە ١٨٤٧ - ١٩١٣، محەممەد ڕەفعەت ١٨٥١ - ١٩٠٧، ئەبو زیا تەوفیق ١٨٤٩ - ١٩١٣.

ئەم شانۆنامەنووسە تورکانە لە ڕێگای داهێنانە درامی و شانۆنامە شێوەتازەکانی خۆیانەوە ، هەروەها لەڕێگای وەرگێڕان و ئامادەکردنی شانۆنامەکانی مۆلییێر، ڕاسین ، ڤیکتۆر هوگۆ ،

کورتە پێشەکییەک بۆ سەرهەڵدانی شانۆنامە لە ئەدەبیاتی کوردی دا

فەرهاد پیرباڵ

یەکەمین شانۆنامەی نووسراوی کوردی، مەمێ ئالان، کە بە قەڵەمی عەبدولڕەحیم ڕەحمی هەکاری نووسراوە و لە ساڵی ١٩١٩ لە گۆڤاری ژین دا بڵاوکراوەتەوە؛ بە یەکێک لە نیشانە درەوشاوەکانی تازەبوونەوەی پەخشانی هونەریی کوردی لەقەڵەم دەدرێ. ئەم شانۆنامەیە لەلایەک نیشانەی سەرهەڵدانی درامای هاوچاخی کوردییە، لەلایەکی دیکەشەوە کاریگەرییەتی ئەدەبیات و هونەری ئەورووپیمان بۆ ساغ دەکاتەوە، کە لەڕێگای ئەدەبیاتی تورکە لاوەکانەوە خۆی گەیاندە ناو ئەدەبیاتی کوردییەوە و گوڕ و تەکانێکی نوێخوازانەی بە ئەدەبیاتی هاوچاخمان بەخشی.

هەڵبەتا پێش سەرهەڵدان و بڵاوبوونەوەی ئەم شانۆنامەیە، گەلی کورد وەنەبێ هونەری (تەماشا کردن)و(پیشاندان) و تیاترۆی نەناسیبێ، بەڵکو بە پێچەوانەوە: هەر لە سەردەمە کۆنەکانەوە، وێڕای گەلی فارس و تورک و ئەرمەن، چەندین شێوەی جۆراوجۆری هونەری نواندن و تەماشاکردنی ناسیوە. لە هەموو نواندنە جۆراوجۆرە کۆنەکانی ڕۆژهەڵاتدا(قەرەگۆز، مەیدان ئۆینی، ئۆرتە ئۆینی، خیمەی شەب بازی، عەرووسەک، زۆرخانە ، ڕم بازی، ڕوویەند بازی، جریت بازی ..)، هەروەها لە نواندنە ئایینیـــەکاندا کە زیاتر لە ئێران و لە تورکیای عوسمانیدا باو بوونە، بەشداری کردوە. تەنانەت ئەم چالاکییانە بەشێک بوونە لە ژیانی ڕۆژانە و ڕابواردنی ئاسایی خەڵکی کورد.

گەلی کورد، جگە لەم شێوە نواندنانەی باسمان کردن ، هەندێ شێوە نواندنی شانۆییانەی سەربەخۆشی هەبووە ، لەوانە : میـرمیرێن ، میر و گزیر ، حەکایەتخوانی ...هتد. (١)

کورتەیەکی مێژوویی لەبارەی نووسینی شانۆنامە لەلای تورکەکان

هەڵبەتا وەک دەزانین، زۆر جارانیش لەملا و لەولا ئیشارەتێکی کورتی پێ دراوە: تازەبوونەوەی ئەدەبیاتی کوردی، بۆ یەکەمین جار لەژێر کاریگەرێتی شەپۆلە نوێخوازەکانی

(١٢) مۆرگان، زەوی ناس بوو و لە ساڵەکانی ئاخری سەدەی نۆزدە دا سەفەرێکی لێکۆڵینەوەی کرد بۆ ئێران و ماوەیەکیش بە ناوچەکانی کوردستاندا گەڕا. بڕوانە:

Jacques de Morgan, Mission sientifique en Perse, Tome second, Paris, 1889.

بەشێک لە کتێبەکەی مۆرگان وەرگەڕاوەتە سەر فارسی کە گەشتی کوردستانەکەشی ئەگرێتەبەر. بڕوانە: ژاک دو مورگان، جغرافیای غرب ایران، ترجمه محمد کاظم ودیعی، تبریز، انتشارات چهر، ١٣٣٨ هەتاوی.

(١٣) ئەو کتێبانەی مامۆستایانی ناوبراو پێشکەشی ئەو «دۆست» و «خۆشەویستی کورد!» ەیان کردووە، ئێستا لە کتێبخانەی «سواس» ی لەندەن لە بەشی کتێبەکانی «سۆن» دا پارێزراون و من لەبەر هەندێ لەدەسنووسەکانیان فۆتۆکۆپیم هەڵگرتووە.

(14) The British Library, India and Oriantal collection office, London.

(15) The Library, School of oriental and african studies (S.O.A.S) - London University, London.

چاپخانەی نعمان، نەجەفی پیرۆز، ١٩٧٣، لاپەڕە: سەتوشێست و حەوت.

(٤) سەبارەت بەو کتێبانەی «کلۆدیوس جێمزریچ»، بڕوانە:

Michigan Manuscripts Cathaloge of Persian لە کتێبخانەی بریتانیا، بەشی هیند و ڕۆژهەڵات لە شاری لەندەن (بەرگی سێهەم).

(٥) من نامەیێ کسایەتی «دوکتور سەعید خان» نزم کەمەوە و ڕێزی بێنمە خوارێ. بە پێچەوانە، ژیان و بەسەرهات و کردەوەیم لەو سەردەمەی مێژووی کوردستاندا زۆر بەلاوە گرینگە. ئەوەی لێرەدا لێی ئەدوێم دەوری هێزە ئیستیعمارییەکانە بۆ کەڵک وەرگرتن لە بلیمەتێکی وەک دوکتور سەعید لەمەڕ خێر و قازانجی خۆیان.

سەبارەت بە دوکتور سەعید، بڕوانە:

Cady H. Allen and Jay M. Rassoli, Dr. Sa'eed of Iran, Grand rapids International Publications, Michigan, U.S.A,1957.

(٦) مەبەست، C.J.Edmonds ئینگلیسییە کە کاربەدەستی سیاسی و عەسکەری کوردستانی خواروو بووە لە دەورەی ئینتیدابی عیراقدا.

(٧) Major Soan کاربەدەستی دەوڵەتی ئینگلستان لە کوردستان کە ماوەیەکی زۆر بە نهێنی لەناو خێڵە کوردەکانا ژیا.

(٨) بڕوانە:

Journal of1909. A southern kurdish son in Kermanshahi dialect, by E.B.Soan, the Royal Asiatic society, january

هەروەها بڕوانە:

A short anthology of Guran poetry, by Major E.B. Soan, Journal of the Royal Asiatic Society, january 1921.

(٩) بڕوانە بۆچوونەکەی مامۆستا ئەمین زەکی لەمەڕ «لەهجەی کۆنی ئەردەڵان و شێوەی هەورامی و گۆران» لەسەرچاوەی خوارەوەدا:

محمد امین زکی، خلاصەیەکی تاریخی کورد و کوردستان، جلدی اوڵ (جزمی اوڵ) لە زۆر قەدیمەوە تا دەورەی نادر شا، بەغدا، ١٩٣١، لاپەڕە ٣٠٦.

(١٠) لە مامۆستا محەممەد ڕەسووڵ «هاوار»م بیست و ئەویش لە زمان «شێخ بابە عەلی»یەوە ئەیگێڕایەوە کە ئەو کەسەی وا لە بەرگی یەکەمی کتێبی «شێخ مەحموودی قارەمان»دا ووتراوە هەرچی کتێبی بەنرخی ناو مزگەوتی گەورە (لە سلێمانی) بوو سووتاندی و لەناوی برد، مەیجەر سۆن خۆی بوو.

بڕوانە: م.ر. هاوار، شێخ مەحمودی قارەمان و دەوڵەتەکەی خوارووی کوردستان، بەرگی یەکەم، لەندەن، ١٩٩٠، لاپەڕە ٥١٩.

(١١) بۆ نموونە بڕوانە بۆچوونی مینۆرسکی لەمەڕ شێوەی گۆران لە زمانی کوردی دا لە وتارە ناسراوەکەیا بە ناوی «گۆران»:

V. Minorsky, The Guran, bulliten of the School of oriental and african studies. vol. XI, 1943 - 46, PP. 87 - 103

پاشکۆی سێهەم
ناونیشانی هەردوو کتێبخانەکە

١. کتێبخانەی بریتانیا:

THE BRITISH LIBRARY,
Oriental and india office collections,
197 Blackfriars Rd., - London SEI 8NG
Tel. 412 7000

٢. کتێبخانەی سەر بە مەدرەسەی موتالەعاتی رۆژهەلاّت و ئەفریقا (سواس):

S.O.A.S LIBRARY,
Thornhaugh Street,
Russel Square,
LondonWC1H 0XG - ENGLAND
TEL: 071- 323 6009

* * *

پەراوێزەکان

(١) «چاپەمەنی دەورەیی» م بەرانبەر بە وشەی (Periodicals) داناوە.

(٢) بڕوانە: «کتاب سبز» . مراسلات و مذکرات متعاطیه بین دولت علیّه و دول خارجه، از بدو وقوع جنگ بین الملل. چاپی دووهەم، نشر تاریخ ایران، ١٣٦٣ هەتاوی.
هەروەها بڕوانە: ئەنوەری سوڵتانی، کتێبی سەوز . وەک سەرچاوەیەک بۆ مێژووی کورد، گۆڤاری پەیڤ، ژمارە ١٥، مەڵبەندی رۆشنبیری کورد (لەندەن)، فیبریوەری ١٩٩٢.

(٣) بۆ نموونە، بڕوانە دەقی ئەو نامەی ٢٥/. ١٨٨١/١ کە وەزارەتی کاروباری دەرەوەی ئینگلیز سەبارەت بە لەتکەبەردێکی دزراوە لە شاری «وەرامین» ی ئێران، بۆ سەفارەتەکەی خۆی لە تاران نووسیوە و لە بەرگی ژمارە F.O ٢٨٤/٣٧٦ ساڵی ١٨٨١دا لە: Public Record Office ی شاری لەندەن راگیراوە. لە نامەکەدا، وەزارەتخانە بە زمانی «موزە خانەی بریتانیا» وە داوای لێکردوون بەردنووسەکە وەچەنگ خەن. تەنانەت پێی کوتوون کە بەردەکە ئێستا لە حەوشی کاخی «شا» دا راگیراوە و ٣٠ تا ٤٠ پاوەن قورساییەتی!
نموونەیەکی تر: دوکتۆر کەماڵ مەزهەر لە باسی دەسنووسێکی «شەرەفنامە» دا ئەنووسێ:
«یەکێک بووە لە دەستکەوتە بەنرخەکانی لەشکری روس لە کاتی شەڕی روس و فارس لە سەرەتای سەدەی نۆزدەهەمدا (١٨٢٦. ١٨٢٨) کە لە ئەردەبیلەوە لەگەڵ کتێبخانەی سەفەوییەکاندا گواستویانەتەوە بیتەربورگ.» بڕوانە: شرفنامەی شرفخانی بدلیسی، هەژار کردوویە بە کوردی، کۆڕی زانیاری کورد،

پاشکۆی یەکەم

رۆژنامە و گۆڤاری کوردی کتێبخانەی بریتانیا ـ لەندەن

بە زمانی ژمارە و رەقەم

لەسەرجەمی ئەو ٦ رۆژنامە و گۆڤارەی ناو ئارشیڤی ئەم کتێبخانەیە:
پێنجیان گۆڤار و یەکیان رۆژنامەن، چواریان بە کوردی، یەکیان بە کوردی و عەرەبی و یەکیان بە کوردی و فەرەنسی دەرچوون، چواریان بە کرمانجی ژووروو، یەکیان بە کرمانجی خواروو، یەکیشیان بە کرمانجی خواروو و ژووروو دەرچوون، دوویان لە بەغدا، دوویان لە ئەورووپای رۆژئاوا، یەکیان لە شام و یەکیان لە یەریڤان دەرچوون، یەکیان هەردوو حەوتوو جارێک دەرچووە و پێنجیان شەش مانگ جارێک دەرچوون، یەکیان لە نێوان سالآنی ٤٠ ـ ١٩٣٠، دوویان لە نێوان سالآنی ٧٠ ـ ١٩٦٠، سێ یان لە نێوان سالآنی ٨٥ ـ ١٩٧١ دەرچوون.

پاشکۆی دووهەم

رۆژنامە و گۆڤاری کوردی سەر بە مەدرەسەی موتالەعاتی رۆژهەلآت و ئەفریقا (سواس)

بە زمانی ژمارە و رەقەم

لە سەرجەمی ٣٥ رۆژنامە و گۆڤاری کوردی ئەم کتێبخانەیە (بەپێی دەربڕینی خۆیان):
٢١ یان گۆڤار، ٩ یان رۆژنامە، ١ یان هەم گۆڤار و هەم رۆژنامەا و ٤ یان نادیارەا
١٢ یان حەوتانە دەرچوون، ٣ یان دووحەوتوویی،
٨ یان مانگانە، ٢ یان وەرزی، ٤ یان شەش مانگ و زیاتر، ٦ یان نادیارە.
٢١ یان بە کوردی، ٩ یان بەکوردی و عەرەبی، ١ یان بەکوردی و فارسی، ١ یان کوردی و تورکی، ١ یان کوردی و عەرەبی و تورکی، ١ یان کوردی و فەرەنسی، ١ یان کوردی و فارسی و تورکی
زاراوەی ٢٧ یان کرمانجی خواروو، ٢ یان کرمانجی ژووروو، ٦ یان کرمانجی خواروو و ژووروو،
٣٣ یان بە پیتی عەرەبی و ٢ یان بە ئەلف و بێی لاتین دەرچوون،
٢٩ یان لە عیراق، ٣ لە ئورووپا، ١ لە تاران، ١ لە شام و ١ یان لە میسر و شام و ئەورووپا دەرچووە،
(لە ٢٩ یەکەکەی عیراق، ١٥ یان لە بەغدا، ٧ لە سلێمانی، ٤ لە هەولێر، ١ لە بەغدا و سلێمانی پێکەوە، ١ لە کەرکوک و ١ لە رەواندوز دەرچووە.)
١ یان لە نێوان سالآنی ١٩٢٠ ـ ١٨٩٨ – ١٢ یان لە نێوان سالآنی ١٩٤٠ ـ ١٩٢١
٩ یان لە نێوان سالآنی ١٩٦٠ ـ ١٩٤١– ١٣ یان لە نێوان سالآنی ١٩٨٦ ـ ١٩٦١ دەرچوون.

٦. لە ژمارە ١٥٩ ساڵی ٦ (٣١ تموز ١٩٥٩) تا ژمارە ١٧٦ ساڵی ٦ (٣٠ نیسان ١٩٦٠)
٧. لە ژمارە ١٧٧ ساڵی ٧ (١٤ مایس ١٩٦٠) تا ژمارە ١٨٧ ساڵی ٧ (١٥ تشرین یەکەم ١٩٦٠)
پێناس: Per. 9. 250062

٣٣. هەڵوێست

عینوان: گۆڤارێکی کۆڵینەوەی گشتی یە، وەرزی جارێک دەردەچێ.
خاوەن: سەرەکی نووسین: رەوەند کوردستانی
سکرتێری نووسین: زیبکۆ
جێگا: کۆڵچستێر (ئینگلستان).
زمان: کوردی
زاراوە: کرمانجی خواروو پیت: عەرەبی
ژمارەکانی: لە ژمارە ١ (بەهاری ١٩٨٤) تا ژمارە ٤ (ساڵی ١٩٨٥).
پێناسی سواس: Per. 9. 497116

٣٤. هەولێر (أربیل)

عینوان: رۆژنامەیەکی زانستی وێژەیی حەفتەیی یە لە هەولێر (چاپخانەی ام الربیعین) دەردەچێ.
خاوەن: خاوەندی: کۆمەڵی مامۆستایانی لقی هەولێر
مدیری ادارە: یوسف شێخ یحیی (پاشان جمال جمیل)
زمان: کوردی و عەرەبی
زاراوە: کرمانجی خواروو
پیت: عەرەبی
ژمارەکانی: لە ژمارە ٥٩ (٩ شباط ١٩٥٢) تا ژمارە ٩٩ (٩ کانوونی دوەم ١٩٥٢).
تێبینی: ژمارە ٦٠، ٨٦، ٩٠، ٩١، ٩٢ و ٩٣ ناتەواون.
پێناس: Per.9.L. 250061

٣٥. هیوا

عینوان: گۆڤارێکی ئەدەبی و زانستی یە، مانگێ جارێک دەردەچێ.
خاوەن: خاوەن امتیاز: یانەی سەرکەوتن لە بەغدا
مدیر مسئول: حافظ مصطفی قاضی (لە ژمارە ٨ بەدواوە: دوکتۆر هاشم دۆغرەمەچی)
پارەی ئابوونە بۆ: الأستاذ مکرم الطالبانی ئەنێررێت.
زمان: کوردی
زاراوە: کرمانجی خواروو
پیت: عەرەبی
ژمارەکانی: هەموو ژمارەکان لە ٢ بەرگدا تۆمار کراون:
بەرگی یەکەم: لە ژمارە ١ ساڵی ١ (گەلاوێژ - تموز ١٩٥٧) تا ژمارە ١٢ ساڵی ١ (حوزەیرانی ١٩٥٨)
بەرگی دوەم: لە ژمارە ١ ساڵی ٢ (گەلاوێژ - تموز ١٩٥٨) تا ژمارە ٨ ساڵی ٢ (شوبات ١٩٥٨).
پێناس: Per. 9. 256003

خولی دووەم (ئابی ۱۹۸۰)- ژمارە ٥ خولی دووەم (تشرینی دووەم ۱۹۸۰)
پێناسی سواس: Per. 9. 445106

۳۱ـ هاوار

گۆڤارا کوردی ـ مجلە کردیە
خاوەن: خاوەن و بەرپرسیار: میرجەلادەت بەدرخان.
جێگا: شام (سووریا)، مطبعە الترقي بدمشق
زمان: کوردی و فەرەنسی (بەرهەمی تورکی و عەرەبی و فارسیشی تێدایە)
زاراوە: کرمانجی ژووروو
پیت: لە ژمارە ۱ تا ۲۳ بە هەردوو پیتی عەرەبی و لاتین، لە ژمارە ۲٤ بە دواوە تەنیا بە پیتی لاتین دەچووە
ژمارەکانی: هەموو ژمارەکانی لە لایەن «حەمە رەش رەشۆ» وە چاپی ئۆفسێت کراونەتەوە و دوو نووسخەی لێ ئارشیڤ کراوە (تەواو و ناتەواو)
نوسخەی یەکەم: لە ژمارە ۱ سالی ۱ (۱٥ گولان ۱۹۳۲) تا ژمارە ۲۰ سالی ۱ (۸ ئەیار ۱۹۳۳) کە ناتەواوە.
نوسخەی دووەم: لە ژمارە ۱ سالی ۱ (۱٥ گولان ۱۹۳۲) تا ژمارە ٥۷ سالی ۱۱ (۱٥ ئاگوست ۱۹٤۳) کە تەواوە.
پێناس بۆ هەردوو بەرگەکە (تەواو و ناتەواو):
Per.9. 250065

۳۲ـ هەتاو

عینوان: گۆڤارێکی ویژەیی (ئەدەبی) کوردی یە، جارێ هەر لە ۱٥ رۆژاندا جەلێکی پەخش دەکرێت.
خاوەن: خاوەندی امتیاز و مدیری نووسین و ادارە: گیبوی موکریانی
مدیری بەرپرسیار (مسئول): محامی عزیز آغای دزەیی (لە ایلول ۱۹٥۸ بە دواوە: جەلال قادر)
سەرنووسیار (لە ئەیلولی ۱۹٥۸ بە دواوە): محامی محمد شهاب الدین دباغ
جێگا: هەولێر (شەقامی مظفریە، چاپخانەی کوردستان، ادارەخانەی هەتاو)
زمان: کوردی و عەرەبی
زاراوە: کرمانجی خواروو
پیت: عەرەبی
ژمارەکانی: سەرپاکی ژمارەکانی لە ۷ بەرگدا تومار کراون:
۱ـ لە ژمارە ٥ سالی ۱ (۱٥ تموز ۱۹٥٤) تا ژمارە ۳۰ سالی ۱ (مایس ۱۹٥٥)
۲ـ لە ژمارە ۳۱ سالی ۲ (۲۰ مایس ۱۹٥٥) تا ژمارە ٦۰ سالی ۲ (۳۰ نیسان ۱۹٥٦)
۳ـ لە ژمارە ٦۲ سالی ۳ (۱۰ مایس ۱۹٥٦) تا ژمارە ۹٥ سالی ۳ (۳۰ نیسان ۱۹٥۷)
٤ـ لە ژمارە ۹٦ سالی ٤ (۱۰ مایس ۱۹٥۷) تا ژمارە ۱۳۰ سالی ٤ (۱۰ مایس ۱۹٥۸)
٥ـ لە ژمارە ۱۳۱ سالی ٥ (۲۰ مایس ۱۹٥۸) تا ژمارە ۱٤۹ سالی ٥ (٥ شباط ۱۹٥۹)

سالی ١٩٧٧
بەرگی شەشەم سالی ١٩٧٨ بەرگی هەشتەم
سالی ١٩٨١
بەرگی نۆهەم سالی ١٩٨٢ بەرگی دەهەم
سالی ١٩٨٣
پێناسی سواس: Per.9. 357231

٢٧.گۆڤاری کۆلیجی ئەدەبیات

عینوان: -
جێگا: بەغدا (زانستگای بەغدا)
خاوەن: -
زمان: کوردی
زاراوە: کرمانجی خواروو
پیت: عەرەبی
ژمارە: سێ ژمارەی لێ تۆمار کراوە:
ژمارە ١٨ (سالی ١٩٧٤) ژمارە ١٩ (سالی ١٩٧٦) ژمارە ٢٢ (سالی ١٩٧٨)
پێناسی سواس: Per.9. 357231

٢٨.لاوانی کورد

عینوان: گۆڤارێکی کوردییە لە بەغدا دەردەچێ.
خاوەن: ؟
زمان: کوردی
زاراوە: کرمانجی خواروو
پیت: عەرەبی
ژمارە: سێ ژمارەی لێ تۆمار کراوە و هەریەکە نێوێکی تایبەتی هەیە:
رەوشت و خوو (لاوانی کورد)، چاپخانەی النجاح، ١٩٢٧/١/٣٠- یادگاری لاوان (لاوان)، چاپخانەی کرخ، سالی ١٩٣٣- دیاری لاوان (لاوان)، چاپخانەی بەغداد، سالی ١٩٣٤
پێناسی سواس: Per. 9. 357231

٢٩. مامۆستای کورد

عینوان: دەنگی بەشی کوردی خوێندگەی بەرزی مامۆستایان لە ستۆکهۆلمە.
جێگا: سوئێد (ستۆکهۆلم)
خاوەن: سەرنووسەر: فەرهاد شاکەلی
زمان: کوردی
زاراوە: کرمانجی خواروو و کرمانجی ژووروو
پیت: عەرەبی و لاتین
ژمارە: لە ژمارە ١ (گولانی ١٩٨٥) تا ژمارە ٣ (ئۆکتۆبەری ١٩٨٦)
پێناس: Per. 9.L.513153

٣٠.نووسەری کورد

عینوان: گۆڤاری یەکیەتی نووسەرانی کوردە لە بەغدا دەردەچێ.
خاوەن: سەرۆکی نووسین: د. عزالدین مصطفی رسول
سکرتێری نووسین: محەمەدی مەلاکەریم (لە ژمارە ٣ بەدواوە: مومتاز حەیدەری)
جێگا: بەغدا
زمان: کوردی
زاراوە: کرمانجی خواروو و کرمانجی ژووروو
پیت: عەرەبی
ژمارە: سەرجەم ٥ ژمارەی لێ تۆمار کراوە:
ژمارە ١ خولی دوەم (ئەیاری ١٩٧٩)- ژمارە ٢ خولی دوەم (ئابی ١٩٧٩) - ژمارە ٣ خولی دوەم (مارتی ١٩٨٠)- ژمارە ٤

١٣٥٩ هەتاوی ـ مارس ١٩٨١) تا ژمارە ٩ ساڵی ٢ (ڕێبەندانی ـ ١٣٦٠ هەتاوی ـ فوریه ١٩٨٢)

پێناسی سیواس: Per. 9.393708

٢٥.گەلاوێژ

عینوان: گۆڤارێکی أدبی و ثقافی مانگی کوردی یە، لە بەغدا چاپ دەبێ.

خاوەن: خاوەن امتیاز و مدیری مسئول: ابراهیم احمدی محامی (تا ژمارە ٢ ساڵی ١٩٤٠)

مدیری ادارە: علاء الدین سجاد (ژمارە ٣ و ٤ ساڵی ١٩٤٢)

مدیری مسئول: ابراهیم ادهم مصطفی، مدیری ادارە: علاء الدین سجادی (ژمارە ٦ و ٥ ساڵی ١٩٤٢) مدیری مسئول: محامی فائق توفیق، مدیری ادارە: علاء الدین سجادی (ژمارە ٧ ساڵی ١٩٤٣)

خاوەن امتیاز و مسئول: ابراهیم احمد (ژمارە ١ ساڵی ١٩٤٣)

خاوەنی امتیاز: ابراهیم احمد، مدیر مسئول: محامی فائق توفیق (ژمارە ٥ ساڵی ١٩٤٥)

زمان: کوردی

زاراوە: کرمانجی خواروو

پیت: عەرەبی

ژمارەکانی: سەرجەمی ئەو ژمارانەی لە سواس دا کۆکراونەتەوە لە ٦ بەرگدا تۆمار کراون:

١ـ لە ژمارە ١ ساڵی ١ (کانون اول ١٩٣٩) تا ژمارە ١١ و ١٢ ساڵی ١ (تشرین ١ و ٢ ١٩٤٠)

٢ـ لە ژمارە ١ و ٢ ساڵی ٢ (کانون دوم ١٩٤١) تا ژمارە ١٢ ـ ٩ ساڵی ٢ (ایلول ١٩٤١)

٣ـ لە ژمارە ١ و ٢ ساڵی ٣ (کانون دوم ١٩٤٢) تا ژمارە ١٢ ـ ١١ ساڵی ٣ (تشرین ٢ ساڵی ١٩٤٢)

٤ـ لە ژمارە ٧ ساڵی ٤ (تموز ١٩٤٣) تا ژمارە ٥ ساڵی ٤ (کانون دوم ١٩٤٣)

٥ـ لە ژمارە ١ ساڵی ٥ (کانون دوم ١٩٤٤) تا ژمارە ١٢ ساڵی ٥ (کانون یەکەم ١٩٤٤)

٦ـ لە ژمارە ١ ساڵی ٦ (کانون دوم ١٩٤٥) تا ژمارە ٥ ساڵی ٦ (مایس ١٩٤٥)

پێناسی سواس بۆ هەموو بەرگەکان: Per. 9. 250066

٢٦.گۆڤاری کۆڕی زانیاری کورد

(لە ژمارە ٨ بە دواوە: گۆڤاری کۆڕی زانیاری عیراق ـ دەستەی کورد)

خاوەن: کۆڕی زانیاری کورد

جێگا: بەغدا

زمان: کوردی و عەرەبی

زاراوە: کرمانجی خواروو و ژووروو

پیت: عەرەبی

ژمارەکانی: ١٠ ژمارەی لێ تۆمارکراوە:

بەرگی دوەم (بەشی یەکەم) ساڵی ١٩٧٤

بەرگی دوەم (بەشی دوەم) ساڵی ١٩٧٤

بەرگی سێهەم (بەشی یەکەم) ساڵی ١٩٧٥

بەرگی سێهەم (بەشی دوەم) ساڵی ١٩٧٥

بەرگی چوارەم ساڵی ١٩٧٦ بەرگی پێنجەم

- عێراق
سەرنووسەر: محمد امین احمد
جێگری سەرنووسەر: حسین عارف
سکرتێری نووسین: سردار احمد میران
زاراوە: کرمانجی خواروو و ژووروو
پیت: عەرەبی
ژمارەکان: لە ژمارە ٢١ ساڵی دووەم (حزیران ١٩٨٤) تا ژمارە ٤٣ ساڵی چوارەم (نیسانی ١٩٨٦)
پێناس: Per. 8. l. 510171

٢٣. کوردستان (یەکەمین رۆژنامەی کوردی)

عینوان: جریدیا کردی یە، پازدە رۆژا دە جارەکی تیت نڤیساندن.
خاوەن: صاحب و محرری: بەدرخان پاشا (مقداد مدحت)
لە ژمارە ٣٠ بەدواوە: عبدالرحمان پاشا (برای بەدرخان)
زمان: کوردی (بەرهەمی فارسی و تورکیشی تێدا ئەبینرێت)
زاراوە: کرمانجی ژووروو
پیت: عەرەبی
ژمارە و جێگاکانی: لە ژمارە ١ (٩ نیسان ١٣١٤ هـ) (رۆژا پنجشمی دە ٣٠ ذوالقعدە، سنە ١٣١٥)
تا ژمارە ٥ (٤ حزیران ١٣١٤هـ) لە مصر دەرچووە.
لە ژمارە ٦ (٢٨ ایلول ١٣١٤ هـ) تا ژمارە ١٩ لە جنیڤ (ژنو) دەرچووە.
لە ژمارە ٢٠ (١٦ کانون اول ١٣١٥ هـ) تا ژمارە٢٣ (١١ شباط ١٣١٥ هـ) لە مصر دەرچووە.
ژمارە ٢٤ (١٩ ئاغستۆسی ١٣١٦ هـ) لە لەندەن دەرچووە.
لە ژمارە ٢٥ (١٨ ایلول ١٣١٦ هـ) تا ژمارە ٢٩ (١ تشرین اول ١٣١٧ هـ) لە فۆلکستۆن دەرچووە.
لە ژمارە ٣٠ (١ مارت ١٣١٨ هـ) تا ژمارە ٣٢ (١ نیسان ١٣١٨ هـ) لە جنیڤ دەرچووە.
تایبەتییەکانی: سەرجەمی ژمارەکانی جگە لە ژمارە ١٠ و ١٢ و ١٧ و ١٨ و ١٩ لەلایەن دکتۆر «کەمالْ فوئاد» ـەوە چاپی ئۆفسێت کراون و لە بەرگێکدا کۆکراونەتەوە (ساڵی ١٩٧٢).
لەو چاپە ئۆفسێتە دوو بەرگی لە سواس تۆمار کراون. یەکیان ناتەواوە و لە ژمارە ١ تا ٤ی نیە. بەڵام ئەوی تریان تەواوە.
پێناس بۆ هەردوو بەرگەکە:
1- Per. 9.L. 411082 (تەواو)
2- LPNB-070.172-284516 (ناتەواو)

٢٤. گرشەی کوردستان

عینوان: گۆڤارێکی حەوتانەیە (مانگانە لە ژمارە ٢ دا) لە تاران دەردەچێ.
زمان: کوردی و فارسی
زاراوە: کرمانجی خواروو (بەرهەمی کرمانجی ژووروو و هەروەها گۆرانیشی تێدایە).
پیت: عەرەبی
خاوەن: محمد صالح ابراهیمی موحەممەدی
ژمارەکان: لە ژمارە ١ ساڵی ١ (رەشەمەی

و کۆمەڵایەتی یە بە زمانی کوردی و عەرەبی لە کەرکوک دەردەچیٚ (جاریٚ مانگیٚ جاریٚ دەردەچیٚ).
خاوەن: امتیاز و سەرنووسەری مسئول: عبدالقادر برزنجی
مدیری مالیە: علی باپیر
پیت: عەرەبی
زاراوە: کرمانجی خواروو
ژمارەکانی: تەنیا سیٚ ژمارەی لە سواس تۆمار کراون:
ژمارە ١ ساڵی ١ (کانون دوەم ١٩٥٨) ژمارە ٢ ساڵی ١ (١٥ شباطی ١٩٥٨) ژمارە ٣ ساڵی ١ (مارت ١٩٥٨)
پێناس: Per. 9.L. 475474

٢٠.شۆڕشگێڕ(الثوري)

عینوان:ڕۆژنامەی ناوخۆی پارتی شۆڕشگێری کوردستانە.
خاوەن: پارتی شۆڕشگێری کوردستان.
جێگا: بەغدا
زمان: کوردی و عەرەبی (پاشکۆیەکی بە زمانی عەرەبیش هەیە بەناوی «الملحق العربي»).
زاراوە: کرمانجی خواروو
پیت: عەرەبی
ژمارەکانی: سەرجەمی ژمارەکانی لە ٣ بەرگدا ئارشیڤ کراون:
١. لە ژمارە ٢٢ ساڵی ٣ (کانون دوەم ١٩٧٩) تا ژمارە ٢٧ ساڵی ٣ (حوزەیرانی ١٩٧٩)
٢. لە ژمارە ٢٨ ساڵی ٣ (تەمووزی ١٩٧٩) تا ژمارە ٣٣ ـ ٣٢ ساڵی ٣ (کانوونی یەکەمی ١٩٧٩)
٣. لە ژمارە ٣٤ ساڵی ٤ (کانوونی دوەمی ١٩٨٠) تا ژمارە ٤١ ساڵی ٤ (تشرینی دوەمی ١٩٨٠)
پێناسی سواس: Per. 9.L. 475474

٢١.عیراق

عینوان: پاشکۆی ڕۆژنامەی «عیراق» ـە لە بەغدا بە زمانی کوردیێدەردەچێت.
خاوەن: سەرنووسەر: صالح حیدری (لەژمارە ٣٤ بە دواوە: صلاح الدین سعید)
سەرۆکی دەستەی ئیمتیاز: هاشم حسن
ئەندامانی دەستەی ئیمتیاز: فائق جمیل، محمد رشید جباری، عبدالله موسی و محمد امین محمد.
زاراوە: کرمانجی خواروو و ژووروو
پیت: عەرەبی
ژمارەکان: لە ژمارە ١ (٢١. ٣. ١٩٧٧) تا ژمارە ٤٢ (نیسانی ١٩٨١)
تایبەتییەکانی: لە ژمارە ٤١ بەدواوە بە نێوی «پاشکۆی عیراق» دەرچووە. بە قەوارە ڕۆژنامەیە بەڵام مانگیٚ جارێک بڵاوبۆتەوە.
پێناس: Per. 9.L. 37615

٢٢.کاروان

عینوان: گۆڤارێکی ئەمینداریتی گشتی رۆشنبیری و لاوانە. بە زمانی کوردی و عەرەبی لە هەولێر دەردەچیٚ. مانگانەیە.
خاوەن: ئەمینداریتی گشتی رۆشنبیری و لاوان

پێناسی سواس بۆ هەر سێکیان:
Per. 9.L. 250055

١٨.ژیـــن

عینوان: رۆژنامەیەکی کوردی، ادبی و اجتماعی یە هەموو ٥ شەمۆیەک دەردەچیێ.

جێگا: سلێمانی

خاوەن: خاوەن و مدیر مسئول: تا ژمارە ٦٥٠ بە روونی نەنووسراوە.

لە ژمارە ٦٥١ تا ٧٩١ حاجی توفیق پیرەمێرد

لە ژمارە ١٠١٦ تا ١٦٤٢ ورثەی حاجی توفیق پیرەمێرد

مدیری مسئول: لە ژمارە ١٠١٦ تا ١٢١٣ محامی نوری امین (محمود)

مدیری ادارە و نووسین: لە ژمارە ١٠١٦ تا ١٠٦٩ جمیل صائب

لە ژمارە ١٠٧١ تا ١١٠٣ محامی نوری امین محمود

لە ژمارە ١١٠٤ تا ١١٢١ احمد زرنگ

لە ژمارە ١١٢٢ تا ١٢١٣ گۆران

لە ژمارە ١٢١٥ تا ١٢٢٩ احمد زرنگ

لە ژمارە ١٢٣٠ تا ١٢٥٣ محامی نوری امین و احد زرنگ (پێکەوە)

لە ژمارە ١٢٥٤ تا ١٦٤٢ محامی احمد زرنگ

زمان: کوردی

زاراوە: کرمانجی خواروو

پیت: عەرەبی

ژمارەکانی: هەموو ئەو ژمارانەی لە سواس تۆمارکراون، واتە لە ژمارەی ٦١٦ تا ١٣٨٩ لە شەش بەرگی جیاوازا بەو شێوەیەی خوارەوە کۆ کراونەتەوە:

بەرگی یەکەم: لە ژمارە ٦١٦ سالی ١٥ (٣٠ کانون ٢ سالی ١٩٤١) تا ژمارە ٧٣٢ سالی ١٧ (١٦ کانون اول سالی ١٩٤٣)

بەرگی دوەم: لە ژمارە ٧٣٣ سالی ١٧ (٦ کانون ٢ سالی ١٩٤٤) تا ژمارە ١٠٨٠ سالی ٢٦ (٢٧ کانون اول سالی ١٩٥١). (ناتەواون)

بەرگی سێهەم: لە ژمارە ١٠٨١ سالی ٢٦ (٣ کانون ٢ سالی ١٩٥٢) تا ژمارە ١١٧٩ سالی ٢٨ (٧ کانون اول ١٩٥٣)

بەرگی چوارەم: لە ژمارە ١١٨١ سالی ٢٨ (٤ سالی ١٩٥٣) تا ژمارە ١٢٧٩ سالی ٣٠ (٢٩. ١٢. ١٩٥٥)

بەرگی پێنجەم: لە ژمارە ١٢٨٤ سالی ٣٠ (٩. ٢. ١٩٥٦) تا ژمارە ١٣٢٦ سالی ٣٢ (٢٦. ٩ . ١٩٥٧)

بەرگی شەشەم: لە ژمارە ١٣٢٧ سالی ٣٢ (٣. ١ . ١٩٥٨) تا ژمارە ١٣٨٩ سالی ٣٣ (١٠. ٤. ١٩٥٨)

تەنیا ژمارەی ١٦٤٢ سالی ٣٦ (١٩٦١.٩.٢٥) لە بەرگی شەشەمدا تۆمار کراوە.

روون کردنەوە: (یەکەم ژمارەی «ژین» لە ٧ی تشرینی دوەمی سالی ١٩٣٤هـ. دەرچووە.

پێناسی سواس: Per. 9.L. 250055

١٩.شەفەق

عینوان:گۆڤارێکی نیومانگی ئەدەبی و عیلمی

میلادی) تا ژماره ٢٤ سالی ٧ (٢٣ تموز ١٣٥٠هـ ١٩٣٢ میلادی).
پێناس: Per. 9.250057

١٥ـ ژیان

عینوان: رۆژنامەیەکی کوردیە هەموو شەموانێ دەردەچێ (پاشان: هەموو چوار شەموانێ)
جێگا: سلێمانی ـ بلدیە
خاوەن: محرر: صالح قفتان
زمان: کوردی
زاراوە: کرمانجی خواروو
پیت: عەرەبی
ژمارەکانی: لە ژمارە ١ سالی ١ (١١ ایلول ١٩٣٧) تا ژمارە ٧٣ سالی ٣ (١٦ تموز ١٩٣٩)
پێناس: Per. 9.L. 250056

١٦ـ ژیان

عینوان: رۆژنامەیکی کوردیە هەموو شەموانێ دەردەچێ:
غزتەیەکی کوردیە هەموو شتێک دەنووسێ:
جێگا: سلێمانی (ادارەخانەی لە بنای بلدیە دایە)
خاوەن: خاوەند و مدیر مسئول: ت. پیرەمێرد
زمان: کوردی
زاراوە: کرمانجی خواروو
پیت: عەرەبی
ژمارەکانی: سەرجەمی هەموو ژمارەکانی لە چوار بەرگدا تۆمار کراون:
١. لە ژمارە ١ سالی ١ (٢١ کانون ثانی ١٩٢٦) تا ژمارە ٩٥ سالی ٢ (٢٧ کانون اول ١٩٢٧)
٢. لە ژمارە ٩٦ سالی ٢ (٣کانون ثانی ١٩٢٨) تا ژمارە ٣٩٨ سالی ٩ (١٩ نیسان ١٩٣٤)
٣. لە ژمارە ٤٠٧ سالی ٩ (١٦ ئاغستۆسی ١٩٣٦) تا ژمارە ٤٦٩ سالی ١١ (٢٩ شباط ١٩٣٦)
٤. لە ژمارە ٤٧٠ سالی ١١ (٧ ئازاری ١٩٣٦) تا ژمارە ٥٣٨ سالی ١٢ (٣٠ اوت ١٩٣٧)
تایبەتی یەکانی: بەرگی یەکەمی لەگەڵ رۆژنامەی «ژیانەوە» و «امید استقلال» پێکەوە لە بەرگێکدا تۆمار کراون. پێناسی سواس بۆ هەرسێکیان: Per. 9.L. 250055

١٧ـ ژیانەوە

عینوان: ام غزتەیە، غزتەیەکی حکومتیە هفتەء جارێک دردچێ.
جێگا: سلێمانی ـ چاپخانەی حکوومەت
خاوەن: ؟
زمان: کوردی
زاراوە: کرمانجی خواروو
پیت: عەرەبی
ژمارەکانی: لە ژمارە ١ سالی ١ (١٨ ئاغستۆسی ١٩٢٤) تا ژمارە ٥٠ سالی ٢ (٢٦ تشرین ثانی ١٣٤٣هـ)
تایبەتییەکانی: هەموو ژمارەکان لە گەڵ رۆژنامەی «ژیان» (ژمارە ١ تا ٩٥) و هەروەها لە گەڵ رۆژنامەی «امید استقلال»دا بەیەکەوە لە بەرگێکدا تۆماو کراون.

١١ـ رۆژی کوردستان (شمس کردستان)

عینوان: گۆڤارێکی رۆشنبیری گشتی یە بە زمانی عەرەبی و کوردی، کۆمەڵەی رۆشنبیری کورد لە بەغدا دەری دەکا.

خاوەن: کۆمەڵەی رۆشنبیری کورد

رئیس التحریر: هاشم حسن عقراوی (ئاکرەیی)

سکرتیر التحریر: مصلح مصطفى جلال

پیت: عەرەبی: عەرەبی

ژمارەکان: لە ژمارە ٥٧ (کانون ثانی ـ شباط ١٩٨٠) تا ژمارە ٦٠ (ژمارە ٥٩ ئایار ـ حوزەیران ١٩٨٠)

تایبەتی یەکانی: ژمارەی ٦٠ روون نییە کەی دەرچووە.

پێناس: Per. 9.L. 453326

١٢ـ رۆشنبیری نوێ

عینوان: گۆڤارێکی وەرزی یە بۆ لێکۆڵینەوە، بڵاوکراوەیەکی ئەدەبی رۆشنبیری یە دەزگای رۆشنبیری و بڵاوکردنەوەی کوردی دەری دەکات.

جێگا: بەغدا

خاوەن: دەزگای رۆشنبیری و بڵاوکردنەوەی کوردی ـ عیراق

سەرنووسەر: عثمان محمد فائق (لە ژمارەی ١٠٨ بەدواوە: مصلح جلالی)

جیگری سەرنووسەر: کوردستان موکریانی

زمان: کوردی

زاراوە: کرمانجی خواروو و کرمانجی ژووروو

پیت: عەرەبی

ژمارەکان: لە ژمارە ٥٢ (ئابی ١٩٧٦) تا ژمارە ١١١ (ئەیلولی ١٩٨٦)

پێناس: Per. 9.L. 390958

١٣ـ روناکی

عینوان: گۆڤارێکی هەفتەیی، علمی، اجتماعی و ادبی کوردی یە لە هەولێر دەردەچێ.

خاوەن: خێوی زاری کرمانجی (ادارەخانەی روناکی)

مدیری مسئول: محامی محمد شیت مصطفى

زمان: کوردی

زاراوە: کرمانجی خواروو

پیت: عەرەبی

ژمارەکان: لە ژمارە ١ سالی ١ (٢٤ تشرینی یەکەم ١٩٣٥) تا ژمارە ١١ سالی ١ (١٦ مایس ١٩٣٦)

پێناس: Per. 9. 250057

١٤ـ زاری کرمانجی

عینوان: گۆڤارێکی اجتماعی، تأریخی، فنی، ادەبی کوردیە، مانگی جارێک دەرئەچێ.

خاوەن: صاحب امتیاز و مدیری: سید حسین مکریانی

مدیری ادارە: عبدالرحمن گیو (لە ژمارەکانی دوایی دا: عبدالرحمن).

جیگا: رواندوز

زمان: کوردی

زاراوە: کرمانجی خواروو

پیت: عەرەبی

ژمارەکانی: لە ژمارە ١ سالی ١ (١٢ ذیقعدەالحرام سالی ١٣٤٤هـ ، حزیران ١٩٢٦

زاراوە: کرمانجی خواروو
پیت: عەرەبی
ژمارەکان: لە ژمارە ١ (تموز ـ آب ١٩٧٩) تا ژمارە ٩. ٨ (ئەیلولی ١٩٨٥)
تایبەتی یەکانی: چریکەی کوردستان ـ الملحق العربي بە زمانی عەرەبی سەرجەم چوار ژمارەی لە نێوان سالآنی ١٩٨١ و ١٩٨٦ دەرچووە و پاشکۆی گۆڤارە کوردییەکەیە.
پێناس بۆ هەر دوو گۆڤارە کوردی و عەرەبییەکە: Per. 9. 414548

٨ـ دەنگی گیتی تازە

عینوان: گۆڤارێکی مانگانەیە لە لایەن بەشی پەیوەندی گشتی یەوە لە باڵوێزخانەی بەریتانی لە بەغدا دەرئەهێنرێ. گۆڤارێکی ئەدەبی، خوێندەواری، زمانی، اجتماعی و هەفتەیی کوردی یە.
خاوەن: باڵوێزخانەی بریتانیا لە بەغدا
خاوەنی امتیاز: محامی فایق توفیق
مدیری مسئول: محمد بابان
مدیر ادارە و رئیسی تحریر: حوزنی موکریانی
زمان: کوردی
زاراوە: کرمانجی خواروو
پیت: عەرەبی
ژمارەکان: لە ژمارە ١ سالی یەکەم (تشرینی یەکەم ١٩٤٣) تا ژمارە ٣٤ سالی چوارەم (٢٥ آب ١٩٤٧)
تایبەتی یەکانی: سەرجەمی ژمارەکان لە نێو بەرگدا تۆمار کراون
پێناس: Per. 9.L. 250064

٩ـ دیاری کوردستان (هدیە کوردستان)

عینوان: رۆژنامەیەکە هفتەی جاری بە کوردی و عربی و ترکی لە بەغدا دەرئەچی. غایە و هدفی تیگیشتن و پیگیشتن ملتە. خدمت انسانیتە. تاریخ تأسیس: ١٥ شعبان المظم ١٣٤٣
خاوەن: صاحب امتیاز و سرمحرر: صاحبقران زادە (صلاح زکی آل صاحبقران)
زاراوە: کرمانجی خواروو
پیت: عەرەبی
ژمارەکان: لە ژمارە ١ سالی ١ (چوارشەمو ١١ مارت ١٩٢٥) تا ژمارە ١٦ سالی ٢ (سە شنبە ١١ مایس ١٩٢٦)
پێناس: Per. 9. 250053

١٠ـ رۆژی کوردستان

عینوان: رۆژنامەی هەفتەیی یە لە سلێمانی دەرئەچی
خاوەن: صاحب امتیاز و مدیر مسئول: م. نوری
محرر: علی کمال
زمان: کوردی و ترکی
زاراوە: کرمانجی خواروو
پیت: عەرەبی
تایبەتی یەکانی: هەموو ژمارەکان لە لایەن «جەمال خەزنەدار»ەوە کۆ کراونەتەوە و لە سالی ١٩٧٣ لە بەغدا بە شێوەی ئۆفسێت دووبارە چاپ کراونەتەوە.
پێناس:
Per.9. 389969

زمان: کوردی
زاراوە: کرمانجی خواروو
پیت: عەرەبی
ژمارەکانی: لە ژمارە ١ سالی ١ (شەشی ئەیلول ١٩٤٢) تا ژمارە ٣٠ سالی ٢ (بیست و یەکی ئەیلولی ١٩٤٣)
پێناس: Per. 9.I 226998

٤-بەیان

عینوان: گۆڤارێکی مانگانەی ئەدەبی یە، دەزگای رۆشنبیری و بلاوکردنەوەی کوردی وەزارەتی رۆشنبیری و راگەیاندنی عیراق دەری دەکا.
خاوەن: وەزارەتی رۆشنبیری و راگەیاندنی عیراق. سەرەکی ئەنجومەنی کارگێڕی و سەرنووسەر: مصلح جلالی
سکرتێری نووسین: محمود زامدار (شبات ١٩٨٤)، مختار فائق (کانوونی ١ سالی ١٩٨٤)، اکرم محمود سمین (ایلول ١٩٨٥)، فوآد حسین احمد (کانونی ٢ سالی ١٩٨٦)
جێگا: بەغدا
زمان: کوردی و عەرەبی
زاراوە: کرمانجی خواروو و کرمانجی ژووروو
پیت: عەرەبی
ژمارەکان: لە ژمارە ٨٧ (حوزەیرانی ١٩٨٣) تا ژمارە ١١٩ (ئایاری ١٩٨٦). «هەندێک لە ژمارەکان ناتەواون».
پێناس: Per. 9.L. 491163

٥-پێشکوتن (سلیمانی)

عینوان: لە چاپخانەی حکومت لە سلیمانی هفتەء جارێک دەردەچیت
خاوەن: ؟
جێگا: سلیمانی
زمان: کوردی
زاراوە: کرمانجی خواروو
پیت: عەرەبی
ژمارەکان: لە ژمارە ١ سالی ١ (٢٩ی اپریل ١٩٢٠. تا ژمارە ١١٣ سالی ٣ (٢٢ی جون ١٩٢٢)
پێناس: Per. 9.L. 8234

٦-پێشکەوتن (التقدم)

عینوان: گۆڤارێکی هەفتەیی گشتی یە، هەموو بەیانی شەممویان بە عەرەبی و کوردی لە بەغدا دەردەچێ.
خاوەن: مدیر و مسئول: محمد البریفکانی
رئیس التحریر: محامی یونس الصباغ
زاراوە: کرمانجی خواروو
پیت: عەرەبی
ژمارەکانی: لە ژمارە ١ سالی ١ (شباط ١٩٥٨) تا ژمارە ١٧ سالی ١ (حزیران ١٩٥٨)
پێناس: Per.9. 472918

٧-چریکەی کوردستان

عینوان: گۆڤارێکی روشنبیری گشتی یە
جیگا: ئورروپای رۆژئاوا
زمان: کوردی

بەشی دووهەم

رۆژنامە و گۆڤاری کوردی لە کتێبخانەی مەدرەسەی موتالەعاتی رۆژهەلاْت و ئەفریقا (سواس)، لەندەن

١.امید استقلال

عینوان: غزتەیەکی رەسمی یە، هفتەء جاریک دەردەچی. سیاسی، ادبی، اجتماعی.

خاوەن: خواجه افندیزادە احمد صبری

جێگا: سلێمانی

زمان: کوردی

زاراوە: کرمانجی خواروو

پیت: عەرەبی

ژمارەکانی: لە ژمارە ١ (٩ صفر ١٣٤٢هـ / ٢ ایلول ١٣٣٩ ی رۆمی) تا ژمارە ٢٥ سالْی ١ (١١ شوال ١٣٤٢هـ / ١٥ مایسی ١٣٤٠ ی رۆمی).

تێبینی: لە گەلْ رۆژنامەی «ژیان» (بەرگی یەکەم) و هەروەها رۆژنامەی «ژیانەوە»، پێکەوە تۆمار کراون.

پێناسی سواس بۆ هەر سێکیان:

Per. 9.L. 250055

٢.«بانگ کوردستان»

عینوان: غزتەیەکی حُرّ و سربست ملّی یە، علمی، ادبی، اجتماعی. هفتەء جارێک دردچی.

خاوەن: صاحب امتیاز و مدیر مسئول و سرمحرّر: مصطفی پاشا.

محرّر: علی کمال و م. نوری (پاشان: مصطفی شوقی)، محرّر تورکی: رفیق حلمی

مدیر ادارە: کریم رستم

جێگای دەرچوونی گۆڤارەکە: بەغدا و سلێمانی

(ژمارە ١ لە سلیمانی دەرچووە، بەلاْم لە ژمارەی ٢٨ کانون الثانی ١٩٢٦ دا جێگای ادارە بەغدا نووسراوە)

زمان: کوردی و فارسی و تورکی

زاراوە: کرمانجی خواروو

پیت: عەرەبی

ژمارەکانی: لە ژمارە ١ سالْی ١ (٢ی ئاغستۆسی ١٩٢٢) تا ژمارە ١٧ سالْی ؟ (١ی نیسانی ١٩٢٦)

تایبەتیەکەی: سەرجەمی ژمارەکانی لە لایەن «جەمال خەزنەدار»ەوە لە سالْی ١٩٧٤ لە بەغدا بە ئۆفسێت چاپ کراونەتەوە و لە بەرگێکدا وەکو کراون.

پێناسی سواس: Per.9.389968

٣.بلاْوکردنەوەی هەفتەیی دەنگ و باس

عینوان: ـ

خاوەن: مدیریەتی عەلاقاتی گشتی سەفارەتی بریتانیا لە بەغدا

تایبەتییەکانی: بەرگی یازدەهەم و دوازدەهەم بە ناوی «گۆڤاری کۆڕی زانیاری عیراق ـ دەستەی کورد » ەوە چاپ کراوە.
پێناس: بۆ بەرگی دوهەم (بەشی ١ و ٢) 14997 m2 بۆ پاشماوەی بەرگەکان:
14997 m3

٤.نووسەری کورد

عینوان: گۆڤاری یەکیەتی نووسەرانی کوردە.
خاوەن: یەکیەتی نووسەرانی کورد. سەرۆکی نووسین: عزالدین مصطفی رسوول
سکرتێری نووسین: محمد مەلا کەریم (لە ژمارە ٣ بە دواوە: مومتاز حەیدەری)
جێگا: بەغدا
زمان: کوردی و فەرەنسی
زاراوە: کرمانجی خواروو و کرمانجی ژووروو
پیت: عەرەبی
ژمارەکانی: لە ژمارە ١ خولی دووەم (ئەیاری ١٩٧٩) تا ژمارە ٦ خولی دوەم (شوباتی ١٩٨١)
پێناس: 14997 m5

٥.هاوار

عینوان: گۆڤاری کوردی ـ مجلە کردیە
خاوەن: خاوەن و بەرپرسیار: میرجەلادەت بەدرخان
جێگا: شام (سووریا)
زمان: کوردی و فەرانسەیی
زاراوە: کرمانجی ژووروو
پیت: لاتین
ژمارەکانی: لە ژمارە ٢٤ سالی ٢ (یەکی ئاوریل ١٩٣٤) تا ژمارە ٥٧ سالی ١١ (١٥ ئوگوستی ١٩٤٣)
پێناس: 14997 m4

٦.هەویا ولات

عینوان: دەنگی کۆمەلی خوێندکارانی کورد لە ئوروپا
خاوەن: ادیتۆر و بەرپرس: حەم رەش رەشۆ
جێگا: ؟ (ئورووپای رۆژئاوا)
زمان: کوردی
زاراوە: کرمانجی ژووروو
پیت: لاتین
ژمارەکانی: لە ژمارە ١ سالی ١ (سالی ١٩٦٣) تا ژمارە ٣ سالی ١ (سالی ١٩٦٥)
پێناس: 14997 e.17

بەشی یەکەم
رۆژنامە و گۆڤاری کوردی لە کتێبخانەی بریتانیا (لەندەن)

١.چیا

عینوان: گۆڤاری فەرهەنگی کوردی

ادیتۆر و بەرپرس: حەمە رەش رەشۆ

جێگا: ئەڵمانیای رۆژئاوا

زمان: کوردی

زاراوە: کرمانجی ژووروو

پیت: لاتین

ژمارەکانی: سەرجەم، هەشت ژمارەی بە چاپی ئۆفسێت لێ چاپ کراوەتەوە و لە بەرگێکدا وەکۆکراوە:

لە ژمارە ١ ساڵی ١ (گەلاڕێزان ـ نوامبر ١٩٦٥) تا ژمارە ٨ ساڵی ٥ (بەفرانبار ـ دیسامبر ١٩٧٠)

پێناس: 14997 m 1

٢. ریێ یا تازە

عینوان: ئۆرگانی کۆمیتەی ناوەندی پارتی کمۆنیستی ئەرمەنستانی سۆڤیەتە. ژ سالا ١٩٣٠ نەشر دبێ، حەفتێ دووجار دەرتێ.

خاوەن: کومیتەی ناوەندی پارتی کمۆنیستی ئەرمەنستانی سۆڤیەت.

جێگا: یەریڤان

زمان: کوردی

زاراوە: کرمانجی ژووروو

پیت: ئیسلاوی (رووسی)

ژمارەکانی: لە ژمارە ١ ساڵی ١٩٧٢ تا ئاخری ساڵی ١٩٨٦ هەموو ژمارەکانی لە ئارشیف دا هەن. بەڵام هەندێ ناتەواوییان تیا بەرچاوئەکەوێ،

بەم شێوەیە:

ساڵی ١٩٨١ دە ژمارە - ساڵی ١٩٨٢ یەک ژمارە - ساڵی ١٩٨٣ حەوت ژمارە - ساڵی ١٩٨٤ چوار ژمارە - ساڵی ١٩٨٥ هەشت ژمارە

پێناس: o.p.989

٣. گۆڤاری کۆڕی زانیاری کورد

عینوان: گۆڤاری کۆڕی زانیاری کورد

خاوەن: کۆڕی زانیاری کورد

جێگا: بەغدا

زمان: کوردی و عەرەبی

زاراوە: کرمانجی خواروو و ژووروو

پیت: عەرەبی

ژمارەکانی: سەرجەم ٩ ژمارەی لێ تۆمار کراوە:

١. بەرگی دوهەم (بەشی یەکەم) ساڵی ١٩٧٤
٢. بەرگی دوهەم (بەشی دوهەم) ساڵی ١٩٧٤
٣. بەرگی سێیەم (بەشی یەکەم) ساڵی ١٩٧٥
٤. بەرگی سێیەم (بەشی دوەم) ساڵی ١٩٧٥
٥. بەرگی چوارەم ساڵی ١٩٧٦
٦. بەرگی پێنجەم ساڵی ١٩٧٧
٧. بەرگی شەشەم ساڵی ١٩٧٨
٨. بەرگی یازدەهەم ساڵی ١٩٨٤
٩. بەرگی دوازدەهەم ساڵی ١٩٨٥

ح) تاریخ: ئەمە لە راستیدا تاریخی یەکەمین و دوایین ژمارەی چاپەمەنییەکە نیە، بەڵکو تەنیا تاریخی ئەو ژمارانەیە کە لەو کتێبخانە تایبەتەدا راگیراون.

خ) پیت: نیاز لەم خاڵە ئەوە بووە روون کرێتەوە کە چاپەمەنییەکە بە کام پیت :عەرەبی، لاتین یا...) نووسراوە.

د) پێناس: بریتییە لەو ژمارەیەی کە کتێبخانەکە داویە بەو چاپەمەنییە تایبەتە و خوێنەر کاتێ سەری کتێبخانەکە بدات، بەپێی ئەم پێناسە ئەیدۆزێتەوە.

هیوادارم ئەم کارە بچووکەی من یارمەتی ئەوانە بدات وا خەریکی تۆژینەوەن لە مێژووی رۆژنامەگەری کوردی و رۆژێک لە رۆژان مێژوویەکی بابەتی بۆ ئەم لایەنە گرینگەی ژیانی فەرهەنگی گەلەکەمان بنووسرێ.

ئەنوەر سوڵتانی

پاییزی ١٩٩١

بەسەرداچوونەوەیم دەست نەکەوتووە. هەر بۆیەش ئەو گۆڤار و رۆژنامانەی نەگرتۆتەبەر کە دوای ئەو تاریخە گەیشتوونەتە کتێبخانەکان (باسەرە و سروە و هیوای چاپی ئەنستیتۆ کورد و پەیڤ و...).

دوو کتێبخانەکەی شاری لەندەن بریتین لە:

١) کتێبخانەی بریتانیا (بەشی هیند و رۆژهەڵات)، (١٤)

٢) کتێبخانەی مەدرەسەی موتالەعاتی رۆژهەڵات و ئەفریقا (سواس)، سەربە زانستگەی لەندەن. (١٥)

لەکاتی نووسینی ئەم کارەی بەردەست ـ واتە لە پایزی ساڵی ١٩٨٦ دا بەگشتی کتێبخانەی بریتانیا ٦ و ئەوی تریان ٣٥ رۆژنامە و گۆڤاری کوردی تێدا بووە. دوو گۆڤار، واتە «هاوار» و «گۆڤاری کۆڕی زانیاری کورد» لە هەردوو کتێبخانەکەدا هەبوون، کەوابوو، سەرجەم، ٣٩ رۆژنامە یا گۆڤاری کوردی لەو دوو کتێبخانەیەدا راگیراون.

من لەم کارەی بەردەستدا، کۆمەڵێک زانیاریم لەسەر هەر کام لەو رۆژنامە گۆڤارانە کۆکردۆتەوە و خستومەتە بەرچاوی خوێنەر. بۆ ئەوەش کە باسەکە درێژ نەبێتەوە، زانیارییەکانم «کلاسە» کردووە و لە چەند خاڵی سەرەکی دا پوختەم کردوونەتەوە. خاڵەکانیش بریتین لە:

ئـ) ناوی رۆژنامە یا گۆڤارەکە.

ب) عینوان (گۆڤار یا رۆژنامە، حەوتەیی یا مانگانە، ئەدەبی یا کۆمەلایەتی و هتد...).

پ) ناوی خاوەن (بەرپرس، کارگێڕ، سەرنووسەر و ...).

لەباسی عینوان و ناوی خاوەندا من پشتم بەو زانیارییانە بەستووە کە چاپەمەنییەکە خۆی داویە بەدەستەوە و ئەگەر لە ژمارەیەکەوە بۆ ژمارەیەکی تر، ناوی سەرنووسەر یا بەرپرس گۆڕابێت، ئەوا ناوی سەرجەمیانم نووسیوە. هەروەها، شێوەی نووسینی چاپەمەنییەکەم پاراستووە و وەک خۆیم هێشتۆتەوە. دیارە ئەم رێنووسەی ئێستای زمانی کوردی رێگایەکی بڕیوە تا لە شێوە نووسینی فارسی جیابێتەوە واتە، جیابوونەوە هەنگاو بە هەنگاو بووە. گۆڤار و رۆژنامەی کۆنی کوردی کە پێش ئەم شێوە چەسپاوەی ئێستا نووسرابن، ئاوێنەی ئەو کۆششەی ئەدیب و نووسەری کوردن لە پێناو پێکهێنانی رێنووسی سەربەخۆی کوردی دا و من دەستم لە کاریان وەرنەداوە: «پیشکوتن» م نەکردووە بە «پێشکەوتن»، «محرر»م بە «نووسەر» نەگۆڕیوە و «گۆڤار» م لە جیاتی «غزتە» دانەناوە.

ت) زمان: واتە، جگە لە کوردی چاپەمەنییەکە بە چ زمانێکی تریش نووسراوە.

ج) زاراوە: باسی ئەو زاراوە کوردییانەیە کە رۆژنامەکەیان پێ نووسراوە.

چ) جێگا: لە کام شار و کامە وڵات رۆژنامە یا گۆڤارەکە دەرچووە.

کاری هاویەشی کوردی دڵسۆزی پێ دەوێ تا ڕۆژێک لە ڕۆژان هەموو ئەو گەنجینە قیمەتییانەمان لە عەمبار و سەررەفەی کتێبخانانی دەرەوە ئاشکرا کرێن و بخرێنە بەردەم خوێندەواری کورد لە ناوخۆی وڵات.

مێژووی ڕاستەقینەی ڕۆژنامەگەری کوردیش، تەنیا وەختێک ئەنووسرێ کە هەموو ئەو بابەتە لە یەک دابڕاوانە، کۆکرێنەوە یا خود زانیاری پێویست لەسەر یەک یەکیان دەست بخرێ.

یەکێ لەو وڵاتانەی کە کانگای کتێب و چاپەمەنی کوردییە، ئینگلستانە. ئینگلیزەکان لە ساڵانی نیوەی سەدەی بیستەم و لە دەورەی «ئینتیدابی عیراقدا»، بە شێوەیەکی ڕەسمی، سیاسەت و ژیانی کۆمەڵایەتی و فەرهەنگی کوردستانی خواروویان بەڕێوە بردووە و دەورێکی گرینگیان لە ژیانی ڕۆشنبیری کوردستانا گێڕاوە.

هەروەها ئینگلیزەکان بەهۆی چەند کاربەدەستی شارەزای زمان و مێژووی کوردەوە (وەک سۆن و ئەدمۆنس و ...) توانیویانە تێکەڵاوی کاری فەرهەنگی و ڕۆشنبیری کورد بن و لە سەر کورد شت بنووسن و لە گۆڤار و ڕۆژنامەکانی ئینگلستانا بڵاوی کەنەوە.

هەر لەو ساڵانەدا، زۆرێک لە نووسەر و قەڵەم بەدەستانی کورد، ڕاستەوخۆ لە ئینگلیزەکان نزیک بوونەتەوە و کاری هاوبەشی ئەدەبییان لەگەڵ کردوون (تەوفیق وەهبی)، یا زمانی کوردییان فێرکردوون (ڕەفیق حیلمی)، یا کتێب و بەرهەمی نووسراوی خۆیان پێشکەش کردوون (ئەمین زەکی) یا خود هەرچەشنە کتێب و گۆڤار و ڕۆژنامەیەکیان بەهی خۆیان و هی کەسی ترەوە وەگیر کەوتبێ بۆ ناردوون (بەشیر موشیر). (١٣)

ئەم چەشنە چاپەمەنییانە زۆربەی زۆریان لە ئەنجاما سەریان لە ئینگلستان دەرهێناوە و لە چەند کتێبخانەی سەرەکی ئەو وڵاتەدا ڕاگیراون. من خۆم، ئاگاداری ئەوتۆم لە کتێبخانەی «ئاکسفۆرد» و «کەمبریج» و «ئەدینبورۆ» نیە بەڵام بابەتی کوردی ناو دوو کتێبخانەی سەرەکی لەندەنم بە ووردی پشکنیوە و شارەزای ناوەڕۆکیان هەم.

بەداخەوە کتێب و نامیلکەی کوردی ناو ئەو دوو کتێبخانەیە، هەر ئەوانەن وا بەگشتی لەبەردەستی هەموومان دا هەن و بابەتی نایابیان تیا بەرچاو ناکەوێ. بەپێچەوانە، خەزێنەی ڕۆژنامە کوردییەکان دەوڵەمەندە و نوسخەی چەندەها چاپەمەنی دەورەیی کوردییان بە تازە و کۆنەوە تێدا پارێزراوە.

ئەم ووتارە، بە نیازی ناساندنی گۆڤار و ڕۆژنامەی کوردی ناو ئەو دوو کتێبخانەیە نووسراوە بەو ئامانجەش کە یارمەتی خوێنەوی ئاسایی و هەروەها توێژێنەری بابەتی «ڕۆژنامەگەری کوردی» بدات و کەرەسەیەک بێت بۆ نووسینی مێژووی ڕاستەقینەی ڕۆژنامەگەری لە وڵاتەکەماندا.

لە ڕاستیدا، کارەکە لە پایزی ساڵی ١٩٨٦ دا ئەنجام بووە و من ئیتر مەجالی

ئەو «ئەدمۆنس» ـەی کتێبی لەسەر کورد ئەنووسی و دەرسی زمانی کوردی لە زانستگەی لەندەن (مەدرەسەی موتاعەلاتی شەرقی و ئەفریقا) ئەووتەوە، هەر ئەدمۆنسەکەی «شەڕی ئاوباریک» بوو کە شێخی بەردەقارەمانی بە برینداری ئەسیر کرد و هەڵی داشتە هیندوستان. هەر ئەو ئەدمۆنسەش بوو کە خۆی و سیاسەتی «بریتانیای مەزن»، داریان لە گیانی خەباتی گەلی کورد دا و گەورەترین دەرفەتی مێژووییان لە دەستی سەند و هیوای سەربەخۆیی و سەربەستییان لە دڵی دا تاساند.

«مەیجەرسۆن» یش کە بۆچوونی لەسەر بنەچەکەی کورد و بنەڕەتی زمانی کوردی، (٨) لای بەشێک لە رووناکبیرانی کوردەوە وەرگیراوە،(٩) هەر ئەو «سۆن» ـەیە کە زاراوەکانی باشووری کوردستان ئەداتە پاڵ زمانی بێگانە و یەکیەتی گەل و یەکپارچەیی خاکەکەمان ئەباتە ژێر پرسیار. هەر ئەو «سۆن» ـەشە کە پاش داگیرکردنەوەی سلێمانی و ئاوارەکردنی شێخ مەحمودی نەمر، وەربووە کتێبە دەسنووسە کوردییەکان و هەمووی لە کوورەی مزگەوتا کردنە دەستەچیلەی ئاگر. (١٠)

«نیکیتین» و «مینۆرسکی» رووسیش جیاوازییەکی ئەوتۆیان لەگەڵ ئەمانا نەبوو. ئەوانیش کارگێڕ و کاربەدەستی دەوڵەتی خۆیان بوون و هەرچی لەسەر کوردیان نووسی، لەپێناو بەرژەوەندی سیاسی خۆیانا بوو. (١١)

«ئۆسکارمان» ی ئاڵمانیش لە کوردستان، وەدوای کڵاوی لاری «بەیت و باوی» ی کوردی نەکەوتبوو، ئەویش بەشەماڵی بۆ ئەڵمانیا بوو. ئەو ئاڵمانیایەی لە دابەشکردنی موستەعمەراتدا سەری بێ کڵاو مابووەوە و بە شوێن بەشەماڵدا ئەگەڕا.

خۆ «ژاک دو مۆرگان» ی فەرەنسی و خانمیشی بۆ خاتری چاوی کەژاڵی کەس وێڵی ئەو شاخ وکێوانە نەبوون. ئەوانیش بۆنی نەوت مەستی کردبوون و «مەشمووریەتی زانستییانە» یان هەر بەو نیازە نووسی کە رێگای دۆزینەوەی نەوت و کانگای تر بۆ دەوڵەتەکەیان خۆش کەن.(١٢)

جانەگەر ئەویان «بەیتی کوردی» لە موکریان وەکۆ کرد و ئەمیان «جوغرافیای رۆژئاوای ئێران» ی نووسی، ئەمانە و هیچ شتێکی تر نابنە هۆی ئەوەی ئێمەی کورد خۆمان نەناسین و دۆست لە نەیار جیا نەکەینەوە و راستەقینەی رووداوەکان لە پشت پەردەی رەنگاوڕەنگی پروپاگەندەوە نەبینین.

بەشێکی زۆر لە رۆژنامە و گۆڤار، واتە «چاپەمەنی دەورەیی» کوردی ـ بەکۆن و نوێوە ـ لە کتێبخانە و ئارشیڤەکانی وڵاتانی ئەورووپی پارێزراون. بەداخەوە زۆربەی ئەو چاپەمەنییانە بەربڵاو لەیەک دابڕاون. هەرکام کەوتونەتە کتێبخانەیەک ولە شارێک و وڵاتێک راگیراون.

دۆزینەوە و کۆکردنەوەی پەرەپەرەی ئەو رۆژنامە و گۆڤارانە، ئەرکێکی پیرۆزە و هەرەوەز و

فەرانسا و ئاڵمان لە سەرووی ئەم چەشنە دەوڵەتانەوەن. بەلام ولاتە ئەورووپاییەکانی تر ـ بەرۆژئاوا و رۆژهەلاتەوە و هەروەها ولاتە یەکگرتووەکانی ئەمریکا و تەنانەت هیندوستانیش کە موستەعمەرەی ئینگلیس بووە، هەرکام بەش بەحالی خۆ، کانگەیەکن بۆ ئەو ئاسەوار و بەڵگەنامانە.

زۆربەی زۆری ئەو بابەتانە،یا لە لایەن گەڕاڵ و موژدەدەری ئایینییەوە یا خود راستەوخۆ لە لایەن کاربەدەستی باڵوێزخانەکانەوە (بە پێی بەرنامە و بە پشتیوانی هێزی دەوڵەتی و عەسکەری) براونەتە ئورووپا و ئەمریکا. (۳)

خۆ تالان و بڕۆکەش تەنیا کتێب و کاغەزی نەگەرتۆتەبەر، هەر کەوناریەکی مێژوویی، لەبەردی شوورەی «ئاشوور»ەوە بیگرە تا مردووی مۆمیایی کراوی میسر و زێڕی «زێویە»ی کوردستان و سواڵەتی چین و داری هیند و ئاسەواڵە و تاشەبەردی ئێرە و ئەوێ، هەرچی کەوتبێتە چنگیان، ئەورووپا، بگرە هاتم!

«ریچ»، نوێنەری کۆمپانیای «هیندی رۆژهەلات» لە بەغدا و هاودەم و هاوسوحبەتی «مەحمود پاشای جاف» لە تاقە سەفەرێکی بۆ لەندەن، ۳۹۲ کتێبی دەسنووسی فارسی لەگەڵ خۆیا هانی و بە «موزەخانەی بریتانیا»ی فرۆشتن. کەی؟ ساڵی ۱۸۲۰ ی زایینی!(٤)

ئەورووپاییەکان، ئەم «ریچ» و قیچەی خۆیان کەم بوو، دارە دەستی ناوخۆییشیان دروست ئەکرد تا وەک دەلال بەریان ئەدانە ولات تا کەونارایان بۆ کۆکەنەوە. «میرزا سەعیدی کوردستانی»، هەر ئەو سیاسەتە هەڵی گرت و لە ئاخری سەدەی نۆزدە و سەرەتای سەدەی بیستەما لە «سنە»وە بردیە سوێد و ئینگلستان. لەوێ، دوو ساڵیان دەرسی کالێج پێخوێند ئینجا گەڕاندیانەوە کوردستان. چەند ساڵ دواتر، میرزا سەعید کە ئەمجار، «دوکتو سەعید خان» ی پێ ئەووترا، «قەباڵەکانی هەورامان» ی هێنا و لەگەڵ گەلێ شتی ترا بە «موزەخانەی بریتانیا» ی سپاردن.(٥)

سەرەڕای ئەو راستییە زەقانەش، بەداخەوە کەم نین ئەو کوردانەی کە دزی و فزی بێگانان لە کەلەپووری نەتەوایەتیمان بە خزمەت دائەنێن و ئەفەرموون گوایە ئەگەر کسانی وەک «ریچ» و «ئەدمۆنس» (٦) و «سۆن» (٧) نەبوایەن، لەوەی کە هەشمانە ئەبووین و لە کەونارا و بەڵگەی کۆن هیچمان بە چنگەوە نەئەما.

هەرچەند ئەو بۆچوونە رەنگێکی لە راستی پێوەیە، بەلام بالەبیرمان نەچێ کە هەر نوێنەر و گەڕاڵ و موژدەدەرێکی ئایینی یا کاربەدەستێکی سیاسی ئەورووپا هاتبێتە ولاتانی ئاسیا و ئەفریقا و بەگشتی، جیهانی سێهەم، تاجرێک بووە کە پرێسکەی خێرو بێری بەستووە و بۆ «ولاتی ماک»ی بەرێ کردووە. نەبینراوە یەکێ لەم چەشنە کسانە تەنیا بە نیازی خزمەتگوزاری و کاری فەرهەنگی رووی کردبێتە ولاتی ئێمەمانان.

ڕۆژنامه و گۆڤاری کوردی له کتێبخانه‌کانی شاری له‌نده‌ن

ئه‌نوه‌ر سولْتانی

جگه له سه‌رچاوه‌ی ناوخۆیی، به‌شێکی زۆر له کتێب و به‌ڵگه‌نامه‌ی نووسراوی مێژوویی، هه‌روه‌ها ڕۆژنامه و گۆڤار و «چاپه‌مه‌نی ده‌وره‌یی» (١) کوردی، له دوو سه‌رچاوه‌ی سه‌ره‌کی ده‌س ئه‌که‌ون:

١) دامودەزگای میری ولاْتانی داگیرکه‌ری کوردستان ـ به‌تایبه‌ت ئێران و تورکیا. سه‌رچاوه‌یه‌کی گرینگن بۆ به‌ڵگه‌نامه‌ی مێژوویی، سیاسی و کۆمه‌لاْیه‌تی گه‌لی کورد. به‌لاْم ڕق بوونه‌وه‌ی سیستمه‌که له کورد و په‌یڕه‌وکردنی سیاسه‌تی کوێرکردنه‌وه‌ی سه‌رچاوه‌کانی سه‌ربه‌خۆیی سیاسی و فه‌رهه‌نگی گه‌لی کورد له لایه‌ک و له لایه‌کی تریشه‌وه به‌رچاوته‌نگی کاربه‌ده‌ستانی ده‌وڵه‌ت و پاشکه‌وتوویی کۆمه‌ڵگا به‌گشتی؛ ئه‌مانه بوونه‌ته هۆی له‌ناوچوونی به‌شێکی زۆر له‌و که‌له‌پووره و ئه‌وانه‌ش که‌ماون، وه‌ها له کورد چوونه‌ته پشتی شێر، که ده‌ستی دڵسۆزانی گه‌له‌که‌مانیان ناگاتێ و ڕه‌نگه بۆ ماوه‌یه‌کی دوور و درێژ له غه‌ریبیدا بمێنێته‌وه.

نموونه‌یه‌کی ئه‌م به‌ڵگه‌نامانه، «کتێبی سه‌وز» ی وه‌زاره‌تی کاروباری ده‌ره‌وه‌ی ئێرانه که سێ له چواریه‌شی ناوه‌ڕۆکیان ، په‌یوه‌ندی به ڕووداوه‌کانی کوردستانه‌وه هه‌یه و زۆر لایه‌نی تاریکی ژیانی کۆمه‌لاْیه‌تی و سیاسی گه‌لی کوردیان به‌تایبه‌ت له‌به‌شی ڕۆژئاوا و باکووری ڕۆژئاوای ئێران ڕوون کردۆته‌وه. (٢)

٢) ولاْتانی ئه‌ورووپایی و ئه‌مریکا له ماوه‌ی سه‌ده‌کانی ١٨ و ١٩ و ٢٠ دا، یا ڕاسته‌وخۆ ده‌ستیان به‌سه‌ر ئه‌و ولاْتانه‌ی ناوچه‌ی ڕۆژهه‌لاْتی ناوه‌ڕاستا گرتووه که کوردستان به‌شێک بووه له خاکه‌که‌یان؛ یا هه‌ر به‌هۆی کاربه‌ده‌ستی باڵوێزخانه‌کانیانه‌وه، خۆیان له کاروباری ئه‌و ولاْتانه هه‌ڵقوتاندووه و جیا له هه‌موو چه‌وساندنه‌وه و تالاْن و بردنی خێر و بێر، که‌له‌پووری فه‌رهه‌نگی که‌ونارا و کتێب و نووسراوه‌ی کۆن و هه‌روه‌ها ڕۆژنامه و گۆڤاریشیان ڕاگوێستووه و ئارشیڤ و کتێبخانه‌ی خۆیان پێ ده‌وڵه‌مه‌ند کردووه.

دیاره به‌پێی ڕاده‌ی توانای سیاسی و عه‌سکه‌ری له‌ناوچه‌دا، ولاْتانی ئینگلیس و ڕووسیا و

بێت و بچێته بەغدا. بەو جۆرە بۆمان دەرئەکەوێ هەروەکو چۆن ئەدمۆنسیش چاوەروانی ئەکرد چاوپڕایە (لۆزان) و لە لۆزاندا (سیڤەر) نێژرا و مافی کورد پێشێل کرا...

لە کۆتایی ئەم باسەدا حەزم کرد ئەم چەند دێڕە بخەمە بەرچاوی خوێندەواران کە لەو راپۆرتەی حکومەتی بریتانیا لە ساڵی ۱۹۲۱دا ناردبوی بۆ (عصبة الامم) کە لە پێشدا لێی دواین:

«لەکاتی گفتوگۆی لۆزان بە هیچ جۆرێک باسی ئەوە نەکرا ناوی دروست بوونی حکومەتێکی کوردی بهێنرێ و ئیتر لەوساوە وا حساب بۆ کوردستان کرا کە ئەبێ بەشێک بێ لە عیراق و بیرکردنەوە لە پێکهێنانی حکومەتێکی کوردی لە خوارووی کوردستان جگە لە رووی ئابوورییەوە ئەو پێکهێنانە شتێکی راست نەبوو. چونکە ئەبوە هۆی کێشە و هەرا و نارێکییەکی هەمیشەیی لە گەڵ حکومەتەکانی دراوسێی عیراقدا کە ئەوانیش هەریەکەیان لە گەڵ کوردی ناوخۆیانا کێشەیەکی تایبەتییان هەیە و سەرەڕای ئەمانە هەمووی، دروست بوونی حکومەتێکی کوردی پێویستی بە یەکبوون هەبوو کە ئەو یەکبوونە لە ناو کوردەکانا نەبوو».

سەیرە ئیمڕۆ ئەڵێی دوێنێ یە و دوێنێش ئەڵێی ئیمڕۆیە...کێشەی حەفتا ساڵ لەمەوبەر هەروەکو خۆی ماوە و کورد لەم گێژاوەدا لوول ئەخوا و تووشی (کارەساتێکی جوگرافی بوە) کە تێکۆشانێکی زۆری بێوچانی ئەوێ بۆ رزگارکردنی لەو گێژاوە سەختەی تێی کەوتوە.

بریار درا سلێمانی بە بەشێک لە عراق بژمێردرێ. لە هەموو کەس داخ لە دڵتر بەرامبەر بە دەرچوونی ئەو بەیانە (ئەدمۆنس) وە کە بە ئاشکرا لە کتێبەکەیدا (کورد، عرب، تورک – ترجمە جرجیس فتح اللە – بەغدا، ١٩٧١) بە ئاشکرا دەڵێ:

«ساتێک ئەو بەیانە دووقۆڵییە دەرچوو کە کوردەکان بۆیان هەیە حکومەتێک دروست بکەن، شتێک بوو زۆرم پێ ناخۆش بوو، بەلاّم ئیتر چاوەڕوانیە (لزوان) بۆ ئەوەی بزانرێ بە پێی ئەوە چ بریارێک ئەدرێ».

ئەدمۆنس لە کتێبەکەیدا باسی چالاکی خۆی ئەکا بۆ پووچکردنەوەی ناوەرۆکی ئەو بەیانە و ئەڵێ:

«کە بەیانەکە دەرچوو، چوومە کەرکوک. شێخ عەبولکەریمی قادر کەرەم و بەگزادەی جاف و هەندێ کوردی تر نامەیان بۆ ناردم کە پێوەندیان بە شێخ مەحموودەوە نەماوە، چونکە پێوەندی لە گەڵ تورکەکاندا پەیدا کردوە. بەپەلە داوام کرد ئەو بەیانە بکرێ بە کوردی و بنێردرێت بۆ کوردە موعتەدیلەکان، نەک بۆ شێخ مەحموود. کاربەدەستان ئەوەیان بە باش زانی و بریار درا ئیتر (چیمن) ئەوامر لە منەوە وەربگرێ (چیمن لەو رۆژانەدا ئەفسەری سیاسی بوە لە سلێمانیدا). لە ١٩٢٢/١٢/٢٢ دا کەرکوکم بەجێ هێشت و بەیانەکەم خستە گیرفانمەوە و چوومە (حموت تەغار) بۆ لای دارا بەگ. دوای ئەوە چوومە (بەهرام بەگی) کە بارەگای شێخەکانی تاڵەبانی بوو لەوێ.(چکال) کە برا گەورە بوو لە گەڵ دوو براکەی تریدا (غالب) و (رەشید)، هەر سێکیان پەشیمانی خۆیان دەربڕی بەرامبەر بەچوونیان بۆ لای شێخ مەحمود و دوای ئەوە چوومە قادر کەرەم بۆ لای شێخ عەبدولکەریم».

ئەدمۆنس لە کۆتایی ئەو باسەدا قین و بوغزی خۆی بەرامبەر بەو بەیانە بە ئاشکرا بەم جۆرەی خوارەوە دەردەبڕێ:

« بەیانەکەم بە تەرجەمە کراوی برد بۆ شیخ عەبولقادری قادر کەرەم. بەلاّم لە راستیدا پڕ بەدڵ ئەوەم ئێجگار پێ خۆش بوو هەندێ لێپرسراوی تریش لە بەغدا هەروەکو من ئەو بەیانەیان بەدڵ نەبوو و پێیان ناخۆش بوو کە بە شێوەیەکی رەسمی بلاّو کرابۆوە (کە بێگومان مس بیل یەکێک بوە لەوانە). لەدوای قادر کەرەم چوومە توزخوماتو، کفری، طاوق بۆ ئەوەی لەوێش هەمان بەیان بلاّو بکرێتەوە»..

لە راستیدا ئەو هەموو هەڵپە و پەلاماردان و دڵگیر بوون و پێ ناخۆش بوونەی ئەدمنس و ئەو پەلەقاژەیەی کردبووی کە بۆخۆی بە دەستی خۆی ئەو بەیانەی ئەگەیاند بە دۆست و ناسیاوەکانی بۆ ئەوەی لە گەڵ دەرچوونی ئەو بەیانەشدا بە دەم هەڕەشەی ئەوەیان لێ بکا کە لە شێخ مەحمود نزیک نەکەونەوە و بەشداری نەکەن لەو وەفدەی کە ئەبوایە بۆ ئەو مەبەستە پێک

مەسەلەی کورد بکەن و هەموو ئەندامانی وەفدەکە هەتا تەوقی سەریان پرچەک بوون. ئوتێلێکی بچووکیان بۆ تەرخان کرا. بە پێی قسەی (میجر نویل) داخوازی و بۆچوونی ئەو وەفدە زۆر باش و بەجێ بوو و لەوانە نەبوو کە قبوڵ نەکرێن. ئەو وەفدە بە تەمای ئەوەن چاویان بە (ملک فیصل) و سیر پریس کوکیس، مەندوبی سامی بکەوێ».

دەربارەی چوونی ئەو وەفدە بۆ بەغدا لە شێخ بابا عەلی شێخ مەحمودم پرسی. لە وەرامدا ووتی:

«ساتێک ئەو وەفدە پێک هات و چوو بۆ بەغدا خەڵک تۆزێک ئاهی پیا هاتەوە و هومێدیان پەیدا کرد کە ئینگلیزەکان رەنگە بیر و رای خۆیان راست کردبێتەوە بەرامبەر بە کورد. باوکم داوای لە کاربەدەستانی دەوڵەتەکەی خواروی کوردستان کرد کە بە پرس و راوێژی زۆرترین کسی ناوچەکە لەوانەی لێی هاتبوون وەفدێک رێک بخرێ و بنێردرێ بۆ بەغدا بۆ ئەوەی ئەو بەیانە لە نووسینی سەرکاغەزەوە بکرێ بە کردەوە و ئەنجامێکی هەبێ و باوکم لەگەڵ ئەو وەفدەدا نامەیەکی بە فارسی ناردبوو بۆ ئەدمۆنس بۆ ئەوەی لە بەغدا کاروباری وەفدەکە ئاسان بکا و دەورێکی خێر ببینێت بۆ ئەوەی دوبارە ناوچەکە تووشی شەڕ و ناخۆشی نەبێت. بەڵام دەرکەوت ئەو بەیانەی لەو رۆژانەدا دەرچوو شتێکی رواڵەت بوە و ئینگلیزەکان بە پاکی نەجوولاونەتەوە. ئەدمۆنسیش لە وەرامی نامەکەی باوکمدا بە فارسی نوسیبووی: «این خر سطحی (نیازی لە سەید ئەحمەدی مەرەخس بوە) با ما آمده و استقلال بی حمایه و بی وصایه میخواهد». یانی ئەو کەرە بێ مێشکە لە گەڵمان هاتوە و داوای سەربەخۆییەکی تەواو ئەکا.

دوکتور مصطفی جعفر فرج الله لە کتێبەکەیدا (عبدالمحسن السعدون - دوره في تأريخ العراق السياسي، چاپی بەغدا، ١٩٨٨) دەربارەی مەبەستی دەرچوونی ئەو بەیانە لە لاپەرە (١٠٤)ی کتێبەکەیدا ئەڵێ:

«ساتێک پرۆتۆکۆلی نێوان بریتانیا و عیراق لە ١٩٢٣/٤/٢٠ دا مۆر کرا لەوەدا بە تەواوی دەرکەوت کە بەشداربوونی حکومەتی بریتانیا لەو بەیانە دوو قۆڵییە دا تەنها شتێک بوە بۆ چاووراو. چونکە لە دوای دەرچونی ئەو پرۆتۆکۆلە، ئیتر وا بڕیار درا ناوچەی سلێمانی بە تەواوی و بە یەجگاری بخرێتە سەر عیراق و لەو پرۆتۆکۆلە دا هەستی نەتەوایەتی کورد پشتگوێ خرا و مەندوبی سامی لە ١٩٢٣/٥/٤ دا داوای لە حکومەتی عراق کرد کە پێشنیازی خۆی دەسنیشان بکا دەربارەی چۆنیەتی بەرێوەبردنی کاروبار لە کوردستاندا. (وەکو نووسەر لەو کتێبەیدا ئەڵێ: ئەو نامە و باسە لە مەلەفاتی بلاطی مەلکی عیراقدا هەیە کە ژمارەی فایلەکە (٥/٢ ی رۆژی ١٩٢٣/٢/٥) یە. بۆ وەرامی ئەو پرسیارەی مەندوبی سامی لیژنەیەک پێک هات کە ناجی السویدی (وەزیری عدلیە) و نوری سەعید (وەکیلی وەزیری دفاع) ی تیا بوو.

کوردانەی بگەیەنن کە سەر بەخۆیان بوون (ئینگلیز ئەوانەیان بە کوردی موعتەدیل ناوبردوە)، لە شێخ مەحمود دوور بکەونەوە و ویستویەتی بەو بەیانە تێیان بگەیێنێت کە ئەوی بەتەنگ کورد و مافی کوردەوە بێ بریتانیایە، نەک شێخ مەحمود. ئینگلیزەکان لەو رۆژانەدا لە رێگەی پیاوەکانیانەوە بڵاویان ئەکردەوە کە شێخ مەحمود کۆسپێکی سەرەکییە بۆ دەسگیر نەبوونی مافی کورد.

شێخ رەئوفی شێخ مەحمود لە یادداشتە چاپ نەکراوەکانیا دەربارەی ئەو بەیانە دووقۆڵییە ئەڵێ:

«کە ئەو بەیانە دەرچوو لە سلێمانیدا، بڕیاردرا بە رەزامەندی هەموو لایەک وەفدێک لە پیاوە ناسراوەکانی کورد بنێردرێت بۆ بەغدا کە لە ئەنجامدا ئەو وەفدە بە سەرۆکایەتی سەید ئەحمەدی مەرەخەس و ئەندامەکانی حاجی مستەفا پاشا یامولکی و حەمە ئاغای عەبدولرەحمان ئاغا و کەریم بەگی فەتاح بەگی جاف و چەند کەسێکی تر پێک هات و چونە بەغدا و لەوێ چەند رۆژێک مانەوە بۆ ئەوەی چاویان بە مەندوبی سامی و کاربەدەستانی حکومەتی عیراق بکەوێ بۆ دانانی پرۆگرامێک بۆ بەجێ هێنانی ئەو بەیانە. بەڵام مەندوبی سامی دەستی پێکردن و رێگەی نەدا ئەو وەفدە بچێتە لای و لە ئەنجامدا بە وەفدەکە وترا کە ئەو بەیانە بۆ هەموو کورد دەرچوە نەک بۆ شێخ مەحمود کە ئێوە نوێنەری ئەون و با نوێنەری هەموو کورد کۆ ببنەوە و لە سەر دانانی وەفدێک رێک بکەون ئەوسا با ئەو وەفدە بێتە بەغدا... چەند جارێکی تریش وەفدەکە تەقەلای بینینی مەندوبی سامی دا بەڵام بێسوود بوو. (ئینگلیزەکان لە هەندێ ناوچەدا وەکو ناوچەکانی بادینان مەزبەتەیان بە پیاوەکانی خۆیان کردەوە کە لەو مەزبەتانەدا ووتبویان ئێمە سەر بە عێراقین و نامانەوێ لێی جیا ببینەوە».

هەروەکو ئەوەی شێخ رەئوف باسی کردوە، بۆ بەجێهێنانی ئەو مەرجەی مەندوبی سامی ئاخۆ لەو رۆژانەدا ئەبوایە چۆن و بە چ جۆرێک ئەو وەفدە یەکگرتوە پێک بهاتایە لە کاتێکدا کە ئینگلیز خۆی مەبەستی نەبوە ئەو وەفدە پێک بێ و هەر خۆشی پیاوەکانی خۆی راسپاردوە کە مەزبەتە بکەنەوە و بڵێن نامانەوێ لە عیراق جیاببینەوە؟؟!

ئینگلیزەکان لەو رۆژانەدا بۆ بەربەرچی داخوازییەکانی ئەو وەفدەی کە نێردرابوون بۆ بەغدا رۆژنامەکانی بەغدایان هان ئەدا کە دژی حکومەتەکەی خواروی کوردستان بە سەرکردایەتی شێخ مەحمود بنوسن و بە گاڵتە پێکردنەوە باسی ئەو حکومەتەیان کردوە...

مس بیل لە کتێبەکەیدا (فصول من تاریخ العراق القریب ـ ترجمە جعفر الخیاط ـ بیروت، چاپی ١٩٧١) دەربارەی ئەو وەفدە ئەڵێ:

«وەفدێک لە سلێمانییەوە هاتن بۆ بەغدا کە لە (١٤) کەس پێک هاتبوو بۆئەوەی باسی

وا دەزانیٚ کە شیٚخ محمود و هاوکارەکانی کە لەو رۆژانەدا حکومەتیٚکی سەربەخۆی بچوکیان لە ناوچەی سلیٚمانیدا دروست کردبوو ئەنجومەنی وەزیرانیان هەبوە و کار و باری خۆیان بەریٚک و پیٚکی بردوە بەریٚوە، وائەزانریٚ لەو رۆژانە دا تاوانبار بوون چونکە نەیان توانیبوو سوود لەو هەل و دەرفەتە وەربگرن و نەیان توانیبوو لە پیٚناوی سوودی میللەت و ولأتەکەیانا هەر وەکو (ملک فیصل) و دار و دەستەکەی بە پیٚی ئاوازی زورِنا و دەهۆڵی ئەو رۆژانەی ئینگلیز هەلٚپەرِن و هەمویان نەزان و سەرکیٚش و سەرچلٚ لیٚنەهاتوو بوون و زیانیٚکی زۆر گەورەیان گەیاندبوو بە میللەتی کورد لە خوارووی کوردستاندا.

باجاریٚ لە پیٚشدا باسی مەبەست لە دەرچوونی ئەو بەیانە بکەین کە بۆمان دەرئەکەویٚ ئەو بەیانە تەنها هەر مەرەکەبی سەرکاغەز و شتیٚکی روالٚەت بوە و بە نیازیٚکی پاک دەرنەچوە و هەروەکو پارەیەکی قەلٚب وابوە ئینگلیزەکان لەو رۆژانەدا ویستویانە بیخەنە گیرفانی ئەو کوردانەوە کە سەر بە خۆیان بوون، بۆ ئەوەی میٚشکیان بەنج بکەن و پیٚیان بلٚیٚن ئینگلیز کوردی لەبیر نەچۆتەوە.

بەکورتی دەتوانین بلٚیٚین:

١- دەرچوونی ئەو بەیانە جۆرە هەرِەشە کردنیٚک بوە لە تورکەکان کە لەو رۆژانەدا بنکەیان لە ناوچەی رەواندز دا هەبوە و دەستەلأتیان لە ناوچەکانی پژدەر و رانیە و هەندیٚ شویٚنی تریش هەبوە و ئینگلیز بەدەرکردنی ئەو بەیانە ویستویەتی لە تورک بگەیەنیٚت کە ئەگەر دەسبەرداری ویلایەتی موصل نەبیٚت ئەوا حکومەتیٚکی کوردی لە خوارووی کوردستاندا پیٚک ئەهیٚنیٚت کە ئەمە ئەبیٚتە بناغەیەک بۆ راپەرِینی کوردەکانی تورکیاش کە لە راستیدا تورکەکان لە هەمو شتیٚک زۆرتر لەوە ترسابوون.

٢- لە لایەکی تریشەوە ئینگلیز دەیزانی کوردەکان کەم و زۆر ئاگاداری گفت و گۆکانی (لۆزان) بون و کورد لەوەدا ترسی ئەوەی هەبوە کە باسی کورد و مافی کورد پشت گویٚ بخریٚ. بۆیە کوردەکان لەو رۆژانەدا لە هەلٚویٚستی ئینگلیز و لە پاشگەزبوونەوەی ئینگلیز بەرامبەر بە مافی کورد لە پەیمانی (سیڤەر) دا بیٚزار بوبون و بەلٚگەیەکی زۆر بچووک بۆ ئەو ئەگاداربوونەوە ئەوە بوە کە رۆژنامەیەکی وەکو (رۆژی کوردستان) کە ئورگانی دەولٚەتەکەی شیٚخ مەحمود بوە لە سلیٚمانیدا لە ژمارە (٦) ی رۆژی ١٩٢٢/١١/١٥ دا باسیٚکی تیادا بلأودەکاتەوە و بیٚزاری خۆی دەربرِیوە بەرامبەر بە گفت و گۆکانی (لۆزان) کە ویستراوە باسی کورد دیزە بە خۆنە بکریٚ و ئەو رۆژنامەیە داوای لە حکومەتی کوردستان و لە میللەتی کورد کردوە کە وریا بن و کەمتەرخەم نەبن بەرامبەر بەو هەلٚویٚستە پرمەترسییەی ئەو رۆژانە.

ئینگلیز بۆ ئەم مەبەستانە و بۆ دامرکاندنەوەی ئەو بیٚزاربوونەی کورد و بۆ ئەوەی لەو

جگە لەو هەڵوێستەی سۆڤیەت کە لەو رۆژانەدا کەمالیبەکانی بە هێزی ئازادیخواز ژماردبوو، فەرنسا و ئیتالیاش بێزار بوون بەرامبەر بە سیاسەتی ئینگلیز کە ئەیویست بە تەنها «میسۆ پۆتامیا» و نەوتەکەی بۆخۆی مسۆگەر بکا و ئەو دوو دەوڵەتە لە کۆبوونەوەکان ببوون بە لایەنگری تورکەکان و ئەمریکاییەکانیش داوای بەشە نەوتیان ئەکرد لە «میسو پۆتامیا» و ویلایەتی موصڵدا کە ئەمانە هەموویان وایان لە تورکەکان کردبوو کە هەست بکەن تای تەرازوی خۆیان قورسترە وەک لەوەی ئینگلیز بەرامبەر بە ویلایەتی موصل . بۆیە کەوتنە پڕوپاگەندەکردن و «شێخی سنووسی» یان بردە سەرسنوور و بە ناوی ئیسلامەتییەوە داوای رزگار کردنی ویلایەتی موصلیان پێ بڵاو کردەوە و لە ناوچەی رەواندز دا توانیبوویان بنکەیەک بە سەرکردایەتی عەلی شەفیق (یوزدمیر) دابنێن کە ژمارەیەک لە سەرەک عەشیرەتەکانی کورد لەوانەی کە لە رەفتاری ئەفسەرە سیاسییەکانی ئینگلیز بێزار بوبوون. ئەوانە لە (یوزدمیر) کۆبونەوە و لەو ناوچانەدا دەستەلاتێکی زۆریان پەیدا کرد و ئینگلیز هەستی بەوە کردبوو کە چار نەبوو یا ئەبوایە بەشەڕ یان لە رێگەی دیپلۆماسییەوە چارەسەری ئەو کێشەیە بکا. بۆ ئەو مەبەستە لە مانگی کانونی یەکەمی ساڵی ١٩٢٢ دا حکومەتی بریتانیا و عیراق بەیانێکی دووقۆڵییان دەرکرد کە ئەو بەیانە بە بەیانی (کریسمس) ناسراوە. وەکو لەو راپۆرتەی کە حکومەتی بریتانیا لە ساڵی ١٩٢١ دا ناردویەتی بۆ (عصبە الامم) لە ژێر ناوی:

Special report: Progress of Iraq during period 1920-1931

دەقی ئەو بەیانەیە وەکو راپۆرتەکە بڵاوی کردۆتەوە :

His Britanic Majesty's gouvernment and the gouvernment of Iraq recognised the right of the Kurdish living within the boundaries of Iraq to set up a Kurdish gouvernment within which they wish to extend and will send responsible delegate to economic and political relations with his Britanic gouvernment and the gouvernment of Iraq.

ئەمەی خوارەوە وەرگێڕاوی ئەو بەیانە بە کوردی:

« حکومەتی خاوەن شکۆی بریتانیا و حکومەتی عیراق دان بە مافی ئەو کوردانە دا ئەنێن کە لە ناو چوارچێوەی سنوورەکانی عیراقدان بۆ ئەوەی حکومەتێکی کوردی پێک بهێنن و ئومێدەوارن ئەو کوردانە بە زووترین کات لە ناو خۆیانا لەسەر شێوەی ئەو حکومەتە رێک بکەون کە ئەویستری دروست بکرێ و دەستنیشانی سنوور بکەن و نوێنەری دەستەلات پێدراوی خۆیان بنێرن بۆ بەغدا بۆ ئەوەی دەس بکەن بە گفت و گۆ دەربارەی پێوندیی ئابووری و سیاسی لە گەڵ حکومەتی خاوەن شکۆی بریتانیا و حکومەتی عیراق».

لە راستیدا ئەوی ئیمرۆ ئەو بەیانە دووقۆڵییە بخوێنێتەوە و بە تەواوەتی نەچێتە بنج و بناوانی هۆ و مەبەست لە دەرچوونی ئەو بەیانە و چۆنیەتی پوچەڵکردنی ناوەرۆکی ئەو بەیانە،

بەیانی حکومەتی بریتانیا و عیراق لە ساڵی ۱۹۲۲دا دەربارەی حکومەتی خواروی کوردستان

هاوار

کە ئینگلیزەکان بۆیان دەرکەوت کە بە ئاسانی و بە بێ شەڕ ناتوانن وا لە تورکمەنییەکان بکەن کە دەستبەرداری ویلایەتی موصل بن، ئیتر لە ساڵی ۱۹۲۲دا دەستیان کرد بە کێشانی نەخشەیەکی تایبەتی بۆئەوەی بە پێی ئەو نەخشەیە لە ڕێگەی دیپلۆماسییەوە تورکەکان والێبکەن کە واز لە کوردستان (کە ئەوسا بە زۆری لە باسەکانا بە ناوی ویلایەتی موصلەوە ناوی هاتوە) بهێنن.

سیاسەتمەدارانی بریتانیا لە ڕێڕەوی گفت و گۆکانیانا لەگەڵ تورکەکاندا دایان بە گوێ یاندا کە ئەتوانرێ چاو بخشرێتەوە بە پەیمانی سیڤر دا و واز لەوە بهێنرێ کە حکومەتێکی ئۆتۆنۆمی لە خواروی کوردستاندا بۆ کورد پێک بهێنرێ (کە تورکە کەمالییەکان زۆر لە دروست بوونی ئەو حکومەتە ترسا بوون)، بە مەرجێک تورکەکانیش دان بەوەدا بنێن کە ویلایەتی موصل بەشێک ئەبێ لە عیراق و دان بە هێڵی (بروکسل) دا بنێن وەکو هێڵێکی سنووری نێوانی تورکیا و عراق.

بەڵام تورکەکان لەو ڕۆژانەدا خۆیان کۆکردبۆوە و توانیبوویان بە سەر ئەرمەنییەکانا زاڵ بن و بە درۆ کوردەکانی تورکیایان وا لێ کردبوو بڕوایان پێ بکەن کە لە دوای دەرکردنی یۆنان لە رۆژئاوای تورکیا ئەوسا ئەوانیش مافی کورد ئەدەن و ئەوە بوو، لە پاش ماوەیەک، بە سەر یۆنانییەکاندا بە یارمەتی هێزی کورد سەرکەوتن و هێزەکانی خۆیان بەرامبەر بە یۆنان کێشایەوە و توانیبویان لە گەڵ سۆڤیەتدا دۆستایەتی و پێوەندییەکی گەرم و گوڕ پەیدا بکەن و سۆڤیەت یارمەتییەکی زۆری کەمالییەکانی دا بە پارە و بە چەک و کەمالییەکانیش بۆ ماوەیەک ئیجازەی حزبی شیوعی تورکیان دا بە سەرۆکایەت (حقی بهیج) کە کابرایەکی طورانی بوە هەتا ئەو کاتەی مەبەستەکانی خۆیان هێنایە دی، ئەوسا ئیجازەی حزبی شیوعییان هەڵوەشاندەوە.

مامۆستا هەژار: عەرز بکەم، ئەز کارم بە رابردوو هەیە. عیرفان لە رابردوو دا، بەراستی عیرفان بووە، حاڵ و هەوایەکی تایبەتی هەبووە. وەک ئاگادارن لە رابردوو دا، عورەفایەکی گەورە هەڵکەوتوون و هەبوون کە بەراستی دەکری بێژین عارف بوون. بەڵام ئەوەی کە ئەمڕۆ لە ناوچەکە دا باوە بە بڕوای من دوکانێکە دایان ناوە و هیچی دیکە نییە.

کەیهانی فەرهەنگی: بەڕێزتان، لەگەڵ وەرگێڕی توانا و کارامە (کاک محەممەدی قازی) ئاشنایەتیتان هەیە؟

مامۆستا هەژار: بەڵێ، ئەو خۆشەویستە بەڕێزە، جگەلەوە کە هاوشاریمە، دۆستێکی نزیکیشمە. بەدەگمەن چەن رۆژ لە مەویەر پێکەوە بووین. دوو جڵدی لە یادداشتی بیرەوەرییەکانی کەسایەتی لە لای منن، بڕیارە جڵدی سێوەمیشم داتێ. بە راستی جگە لەوەی وەرگێڕێکی لێ هاتوو و کارامەیە، نووسەرێکی هەڵکەوتەشە.

کەیهانی فەرهەنگی: ئێوە کە سالانی ساڵ لە وڵاتانی عەرەبی و لە ناو کۆمەڵ و کۆڕگەلی وان دا ژیاون، لە شاعیرانی عەرەب لە گەڵ کەسیان شوناسیتان هەیە؟

مامۆستا هەژار: عەرز بکەم، ئەز لە گەڵ بەرەی لاو و گەنجی ئێستای وڵاتانی عەرەبی ئاشناییەکی ئەوتۆم نییە، بەڵام لە تەک شایەری بناقدەنگی عەرەب (محەممەد مهدی جەواهیری) زۆر دۆست بووم. شاعیرێکی باش بوو، نازانم ماوە یان نا؟ هەروەها (ئەحمەد سافی نەجەفی)م دەناسی، لە گەڵ (محەممەد سالح بەحرولعلوم) دا دۆستایەتیم هەبوو. قەسیدەیەکی جوان و رازاوەی هەیە.

کەیهانی فەرهەنگی: لە گەڵ مامۆستا شەوقی، شاعیری مەزنی کورد چۆن بووی؟

مامۆستا هەژار: مامۆستا شەوقی لە میسری دەژیا. بە داخەوە کاتێ ئاشنایەتیم بە فەرهەنگ و زمانی عەرەبی پەیدا کرد، ئەو مردبوو. لە دەور و بەری ساڵی (١٩٣٥) دا کۆچی دوایی کرد.

وەرگێڕانی کوردی: ١٣٧٦/٦/٣٠
١٩٨٧/٧/٢١

زۆریان ریز لێ گرتووه. بەڵام ئەگەر بە من بایە ئەو خەڵاتەم دەدا بە (عەولاَ پەشێو). بە بڕوای من، ئەو لە ناو شاعیرانی نوێ ویژی کورد دا هەڵکەوتەیە و جێی فرە بەرزە.

کەیهانی فەرهەنگی: لە نووسەرانی کورد، واتە ئەوانەی کە تەنیا شوێنەواری نووسین و پەخشانیان هەیە کامەیان زێتر پەسند دەکەی؟ هەروەسا لەم بوارە دا ئێوەی بەرێز خۆتان خێوی ئاسەراری فارسی و عەرەبی هەن؟

مامۆستا هەژار: سەبارەت بە کوتی هەوەڵی پرسیارەکە دەبێ بڵێم، ئێمە نووسەری باش و هەڵکەوتەمان هەیە کە بە هۆی کەمی زانست و زانیاری خۆم ناکرێ باسیان بکەم. بەڵام دەکرێ دیاردە بۆ نووسەری ناوبەدەنگ (مامۆستا مەلا عەبدولکەریمی بیارە) مەشهور بە (مەدەریس) و کورەکەی (کاکە حەمە)، (دوکتۆر کەمال مەزهەر)، (مەلا شوکور مستەفا) و (مەسعود محەمەد) بکرێ.

بەڵاَن دەربارەی کەرتی دووەمی پرسین، دەبێ بێژم، نەخێر، ئەز خێوی وەها شوێنەوارێک بەو زمانانە نیم. تەنیا وتارەگەڵێکم بە عەرەبی و فارسی بۆ رۆژنامەکان نووسیوە. با دیاردە بۆ ئەوەش بکەم، کاتی خۆی دەمەویست شیعری فارسی بێژم. دۆستێک (رەحمەت لە قەبری بابی!) پێی گوتم: ئەوە چدەکەی؟! هەرچی لە هازا و توانات دابێ و ئەنجامی دەی و بە هەر قوناخێ لەم ڕێبازە دا بگەی، ناتوانی ببی بەحافز...بەراستیش هەر وابوویە، شیعری حافز لە کوێ و شیعری ئێمەمانانی هەژار لە کوێ؟ هەر لە ئاو لە دەساونگ کوتان دەچێ.

کەیهانی فەرهەنگی: مامۆستا، بە سەرنج دان لەم راستییە کە ئێوە زاڵن بە سەر زاراوەکانی زمانی کوردی، هەروا هەستی شیعری کە هەتانە کێهە زاراوەی کوردی بۆ شیعر بە باشتر و لە زاران خۆشتر دەزانن؟

مامۆستا هەژار: یەکێک لە زاراوە کوردییەکان هەورامییە، لەباری شیعرییەوە لە زاراوەکانی دیکە ناسکتر و لە زاران خۆشترە و بۆ شیعر وتن چێترە. شاعیری مەزنی کوردیش (مەولەوی) هەر بەم زاراڤەی شیعر گوتوە، کە ناسکی و زەرافەتی شیعری بەوپەڕی بەرزی گەیاندوە.

کەیهانی فەرهەنگی: کارێکمان بە رابردوو نیە، ئێستا دەبینین چەشنە عیرفانێک لە کوردستان دا بوّتە باو، یەک دەبێتە خەلیفە و یەک دەبێتە شێخ...بیر و باوەڕی ئێوە لەم روانگەوە چلۆنە؟

کێش و بێکێشی دا شیعری باش هەبوە و هەیە. ئەز ئەمەی بە هەڵتوقینی کارگ لە بەهاران دا دەشبێنم. لە وەرزی بەهار دا هەزاران جۆرە قارچگ هەڵدەژێ، بەلأن هەر تەنیا جورێکیان خواردەمەنییە و دەخورێ. شیعریش هەر کات پەیام رەسان بێ و شوێن لە سەر کەس و گەل و کۆمەڵ دانێ، ئەوە شیعری چاکە. جا تۆفیری نییە چ لە شەقل و قەواری نوێ دابێ یان لە سەر رێچکە و شێوازی کۆن.

ئێستا لەناو عەرەباندا شاعیری نوێ وێژ هەن کە بە راستی خاس شیعر ئێژن. هەروا لە ئێرانی خۆمان دا، کەسەگەلی واهەن کە ناکرێ نەکوڵییان لێ بکرێ. با ئەوەش بڵێم کە رووسەکان بە ماکسیم گورکی ئەڵێن شاعیر، لە کاتێکا دەزانین ئەو شاعیر نەبووە، بەلأن چونکە لە گوفت ولەفتی دا ناسکی و قەشەنگی شیعر هەیە و پرمانا و جوانن بە شاعیر و هۆزانی دەدەنە قەڵەم.

کەیهانی فەرهەنگی: ئێوەی بەرێز، لە ناو زاراوەگەلی جۆربەجۆری کوردیدا، زۆرتر بەکام شێوە ئاسەواری شیعر و پەخشانتان هەیە؟

ماموٚستا هەژار: زیندەتر بە زمانی زگماکم کە شێوەی دەورویەری بوکانە. ئەڵبەتە توفیر نێوان ئەم زاراوە و ئەو زارگۆیە نییە، بەلأم دەزانن بە راهات پیاو بە سەر زمانی زگماکی دا زاڵتر و بەدەستوبردتر دەبێ.

کەیهانی فەرهەنگی: لە شاعیرانی کورد، جا چ کۆن و چ نوێ، هۆگریتان بە کامییان پتر هەیە؟

ماموٚستا هەژار: ئێوە ئەگەر بچنە ناو باغێکی پڕبەروبوێ، هەموو جۆرە میوەی تێدابێ، لە هەموو میوەکان دەچێژن و زار شیرن دەکەن و خۆشتان لێیان دێ. بەلأم بە لێبڕاوەییەوە ناتوانن بێژن کامیان لە کامیان چێتر و خاسترە. هەڵبەت چەند کەسێکی پێشوون هەیە کە جیا لەم باسەن وەک (مەولەوی کورد)، (ئەحمەدی خانی)، (ئەحمەدی جزیری) و (نالی)، کە ئەوان جێگە لە بەرزانن و لە بەرامبەر هەستی بەرزیان دەبێ کرنۆش ببرێ. هەروەها (وەفایی)، (سالم)، (کوردی)، (شیخ رەزا) و (حاجی قادر) و کێ و کێی دیکەش هەن کە هەر لەم پێژە بەرزە دان و لە شیعر و هونەری شیعری دا کارامە و لێهاتوون. بەلأم لە سەردەمی خۆیدا، بە پێچەوانەی زۆرکەسان، ئەز هوگری (عەولاٌ پەشێو) م و کارەکانی پەسند دەکەم. ماوەیەک لە عیراق بوو، ئێستا بیستوومە لە (لیبی) بوتە ماموٚستا. (شێرکۆ بێکەس) یشمان هەیە کە لەم دووایانەدا خەلأتێکی دە هەزار دۆلأری وەرگرتوە و لە (ئیتالیا) نازناوی (هاوشار) یان پێ بەخشیوە و

شانازی ئێمەیە. گوتم: ئەگەر کەسێک هەبێ و بتوانێ چوارینەکانی وەک خۆی وەرگێڕێتەوە سەر زمانی کوردی دەکرێ چاپی کەن؟

لە وەڵامدا گوتی: دەزانم مەبەستت خۆتە، بیستوومە خەیامت کردوّتە کوردی، کارێکی جوان و پەسند و شایستەیە. بەڵام دەبێ پێت بڵێم و بۆت روون کەمەوە کە سیاسەتی (شا) ئەوەیە کە نابێ هەتا یەک وشەش بە کوردی چاپ بکرێ. دەشێ کوردی لە رادیۆ بڵاوکرێتەوە، بەڵان چاپی بقەیە. بەڵام ئێستە بار و زروف گۆڕاوە، زۆرباش بووە، گۆڤاری مانگانەی سروە لە تیراژی (١٥) هەزار دانە دا چاپ و بڵاو دەبێتەوە. هێندێکمیش کتێب هەن لە لایەن ئەم مەکۆیەوە چاپکراون، هەروەسا هێندێ کتێبی کۆن و نایابیشیان دیسان لە چاپ داوەتەوە. بە گشتی تیکۆشان و کردەوەی ئەم ناوەندە بۆ چاپ و بڵاوکردنەوەی پەرتووکە. کتێبخانەیەکیشیان هەیە و کتێبی تری تێدا دەفرۆشن.

گەیهانی فەرهەنگی: هەتا ئەو جێگایەی ئێمە شارەزاین و دیومانە، ئەدەبیاتی کوردی زۆرتر پڕژاوەتە سەر شیعر و هەڵبەست. ئێوە لەم بارەوە چ ئێژن؟

مامۆستا هەژار: عەرز بکەم، بەداخەوە کورد نووسینی نەبووە، جێی لەناو خەڵکدا نەکردوّتەوە. هەر بەم هۆیەشەوە، شیعر بۆتە شۆڕەسواری ئەم مەیدانە. کۆمەڵانی خەڵکیش پێشوازییان لێ کردوە. شیعر و هۆزان هەمیشە ئەم تایبەتەندییەی هەیە کە بە هاسانی لە بەردەکرێ و لە بیر مێشکاندا جێگیر دەبێ و دەمێنێتەوە. تەنانەت کەس گەلی دەرس نەخان و بێسەواتیش هۆگریان هەیە کە شیعر ببیێن و شیعر لەبەرکەن. لەم رووەوە میللەتێکی کە ئەدەبی نووسینی کزولاواز بوویێ و بەم چەشنە و شێوەی شایەدوبایەد نووسین و پەخشانی نەبێ، رێ بو مەیدانی شیعر هەموار دەبێ. بەڵان لەوکاتەوە کە رێ دراوە لە عێراقی دا بە کوردی بنووسن، نووسەری باشیش پەیدا بوون. قوڵیان لە نووسینی هەڵماڵیوە و ئاسەرارێکی بێوێنەیان پێشکەش بە کۆمەڵگای وێژە و ئەدەبی کوردی کردوە.

گەیهانی فەرهەنگی: بە ناوی شاعرێک، بیر و راتان سەبارەت بە شیعری نوێ چییە؟

مامۆستا هەژار: وەک دەزانن لەمێژساڵە ئەم باسە لە ئارا دایە و قسە لە شیعری کۆن و نوێ دەکرێ. لە سەر ئەم باوەڕەم ئێمە دەبێ سەرنج بدەینە مانای شیعر و ناوەڕۆکی هەڵبەست، نە کێش ومێش! ئێوەش دەزانن کە هەموو شیعرە کلاسیکەکانی ئێمە پڕمانا و جوان و قەشەنگ و لەسەر دڵان نین. شیعری نوێی واش هەیە کە هەر ناکرێ پێی بێژی شیعر. واتە ناتوانین بڵێین چاکی و خراپی شیعر پێوەندی بە کۆن و نوێیە وە هەیە. لە هەموو زەمان و دەورانێکدا، لە

واندانەوە دا دەگەیشتە وشەی (علی الرأس) قەڵس و تورە دەبوو و دەیکوت: کوڕی سینا هیچی نەزانیوە چونکە ئێمە لە عەرەبی دا مانایەکمان بۆ (علی الرأس) نییە! ئەز لە وەڵاما گوتم: ئەگەر ئەو کابرایە کورد بایە، یان کوردی زانیبایە، قەت قسەی وای نەدەکرد و وای بیر نەدەکردەوە.کە ئیبنی سینا هیچی نەزانیوە، هەڵەی کردوە. من چونکە کوردیم دەزانی و هەم عەرەبی و هەتا رادەیەکیش فارسی، ئەم گرێ پوچکەم کردەوە.

ئەوەی کە هیچ گومانی تێدا نییە، ئەوەیە کە کوڕی سینا لە عەرەبی دا زۆر چازان بووە، دەساوێژ ئەم شێوە رەمز و مەتەڵۆک نووسیەیە کە بەکاری هانیوە. ئەم کارەشی بۆیە کردوە هەتا ئاسەواری لێ نەدزن، چونکە ئەو کات شوێنەواردزین زۆر باوبووە.

رۆژێکی مامۆستا (جەمیل رۆژبەیانی) هاتبووە لام. با ئەوەش بوشم کە مامۆستا رۆژبەیانی یەکێکە لە عەرەبی زانانی هەرە مەزن و لەم بوارە دا ئەز بە شاگردی دەشێم. کە هاتبووە لام چەند دێڕێکم لە (قانون) بۆ خوێندەوە. گوتم وەریگێڕە و دیاری بکە (ضمیر - ئاوالناو) ەکەی کامەیە؟ چەند جارێکی خوێندەوە و سەرەوژوری کرد، توورە بوو و فڕێی دا و کوتی ئەمە عەرەبی نییە، وەرگێڕانی کارێکی ئێجگار چەتوون و دژوارە. بە من کە هیچ، پێم وایە بە هیچ کەس ناچێتەوە سەریەک. بە هەرحاڵ ئەوێ رۆژێ مامۆستا رۆیی و پاش چەند رۆژان چوومە دیتنی مامۆستا رۆژبەیانی و وەرگێڕاوی چەند دێرە گۆڕینم پێشان دا و کوتم: مامۆستا بزانە چم بە چ کردوە؟ با ئەوەش بڵێم عەرەبیێکەشم لە ژێر وەرگێڕاوەکە نووسی بوو. مامۆستا رۆژبەیانی سەرنجێکی دایە و خوێندییەوە و راما، کوتی ئەتۆ لە هەڵدانی مەتەڵۆکە کارامە بووی؟ گوتم لە دەورانی فەقییایەتی دا بەڵێ. مامۆستا فەرموویان ئەمە عەرەبی نییە، رەمز و مەتەڵۆکەیە!! مەبەستم لەم قسانە ئەمە بوو، عەرەبیێکەی (قانون) زۆر سەختە و منیش بە کاوەخۆ وەرم گێڕاوە..

کەیهانی فەرهەنگی: مامۆستا بیستوومانە، ناوەندێک بەناوی ناوەندی بڵاوکەرەوەی (صلاح الدین ایوبی) چێ بووە، ئەگەر دەلوێ لە بارەی کاروباری ئەم ناوەندەوە راڤێو بکەن؟

مامۆستا هەژار: بەڵێ وەها ناوەندێک لە ورمێ ساز بووە، یەکێک لە دۆستانم بە ناوی (کاک هێمن) لەوێ کاری دەکرد و گۆڤاری (سروە)ی دەرخست، بەڵام هێشتا (٥) ژمارەی ئەم گۆڤارە بڵاونەبوبۆوە کە بەداخەوە عەمری خودێی کرد، ئێستاش کاک (ئەحمەدی قازی) لە وێ یە. هەنگاوێکی زۆر باش و بەکەڵکە.

لەبیرمە ئەو کات کە چوارینەی (خەیام) م وەرگێڕابووە سەر زمانی کوردی، رۆژێکی لە جیرانێکم پرسی: بە بڕوای وە عومەری خەیام چ جۆرە شاعرێکە؟ کوتی: عومەری خەیام هۆی

١١ - **فەرهەنگی فارسی - کوردی** کە لە فەرهەنگی عەمیدم کەڵک وەرگرتوە، هێشتا چاپ نەکراوە.

١٢ - **یەک لە پەنای خاڵ و سیفری بێ پرانەوە**، لە نووسراوەکانی دوکتۆر عەلی شەریعەتییە و لە فارسی را کراوەتە کوردی و بنیادی سازەندەگی چاپ و بلاْوی کردوْتەوە.

١٣ - **ئاریێ برا، وا ڕاپرا**، لە ئاسەواری دوکتۆر عەلی شەریعەتییە و دەقی کوردییەکەی بنیادی سازەندەگی چاپی کردوە.

١٤ - **عیرفان، بەرامبەری، ئازادی**. بەرهەمی دوکتۆر عەلی شەریعەتییە و کردومەتە کوردی و چاپەمەنی سروش چاپ و بلاْوی کردوْتەوە.

١٥ - **دایە، باوە، کێ خراوە؟** نووسەری دوکتۆر عەلی شەریعەتییە، کردوومەتە کوردی و (سروش) چاپی کردوە.

١٦ - **شەرحی دیوانی مەلای جزیری**، بە زمانی کوردی شەرح و راڤە کراوە و چاپەمەنی (سروش) بلاْوی کردۆتەوە.

١٧ - **(قانون)** ی ئیبن سینا، لە عەرەبی را کراوەتە فارسی و سێ جلْدی لێ چاپ کراوە و پاشماوەکەشی لە چاپەمەنی (سروش) دا چاوەڕوانی نۆرەی چاپە.

١٨ - **وەرگیرانی بەشێکی سەرەکی لە کتێبی (آثار البلاد و اخبار العباد)** لە عەرەبییەوە بۆ فارسی کە لە ساڵی (١٣٦٧) دا لە تاران چاپ و بلاْو بوْتەوە.

کەیهانی فەرهەنگی: هۆ و ئەنگیزەی ئێوە لە وەرگێڕانی (قانون) چبوو و تا چ رادەیەک لە زەمینەی پزشکی دا شارەزان؟

ماموستا هەژار: (ئەم بەشەی وەلاْمەکەی مام هەژار کرتۆک کردوەش) ئەز هیچ چەشنە شارەزایێکی ئەوتۆی زانستی پزشکیم نییە. لە سەر پێشنیاری دوکتۆر فەرەهوەشی قۆڵم لەم کارە هەڵماڵی. با ئەوەش بڵێم، پێم وایە ئەگەر کورد نەبام هەرگیز نەمدەتوانی ئەم کارە مسەرکەم و ئەنجام دەم، چونکە زۆر دەمبێژی کوردی هەیە کە کوڕی سینا کەڵکی لێ وەرگرتوون. ناڵێم ئەبو عەلی سینا کورد بووە، بەلاْم بە هۆی بوونی لە هەمەدان و هاموشۆی لە گەڵ کوردان، چ بە راهات و چ لە باری کاروبارییەوە، زۆری سوود بینیوە لە واژەگەلێک کە لە عەرەبی دا هەر نین، وەک وشەی ماست و زۆر دەمبێژی تری کوردەواری...

لە زانستگە دا، ئوستادێک هەبوو بە ناوی ئوستاد (موسلیح) کە لە (قانون) یشی سەردەخورا و هەتا رادەیەک وەستا بوو. رۆژێکی کوتی کەسێک لە زانستگەی (فەواد) ی میسرەوە هاتبووە ئێرە دەرس وێژی بکا. بەلاْم زۆر بێمەبالات بوو. کوتم چۆن؟ کوتی هەرکات لە

بانگهێشتنی یەکیەتی نووسەرانی رووسیە بوو کە هێندێ لە بەرهەمەکانی منیان وەرگێڕابوو و دەیانەویست هەق و مافی وانم دەنێ. هەر بۆیەش چوومە ئەو ولأتە. ئەوەش لە کاتێکدا بوو کە دەمزانی کمونیستەکانی عێراق و سوریە خۆشیان ناوێم. نزیکەی ساڵێک لە مۆسکۆ و شارەکانی دیکەی سۆڤیەت دا گەڕام، باکو و ئۆزبەکستان و چەند جێی ترم لە نزیکەوە بینی. لەوێ (٦٠) هەزار روبلیان هەق و مافی بەرهەمی وەرگێڕاو دامێ و داوایان کرد لەوێ بمێنمەوە. بەلأن هەروەک عەرزم کردن پێم خۆش نەبوو لەوێ سەقامگیر بم. هەر کە کارویاری دەرمان و تیمارم دوایی هات گەڕامەوە.

گەیهانی فەرهەنگی: ئایا پێڕستی شوێنەوارەکانی خۆتان لە لایە؟

ماموستا هەژار: بەڵێ شوێنەوارەکانم بریتین لە:

١ - **ئاڵەکۆک**، لە ساڵی (١٣٢٥)ی هەتاوی لە تەورێزێ چاپ کراوە.

٢ - **بەیتی سەرەمەڕ**، لە ساڵی ١٩٥٧ی زایینی لە شامێ چاپ کراوە.

٣ - **مەم و زین**، کە هی هۆزانڤانی هەرە مەزنی کورد (خانی) یە و بە زاراوەی کرمانجی هۆنراوەتەوە. لە راستیدا، ئەز لە کوردی کرمانجییەوە کردوومەتە کوردی موکری هەتا هۆگرانی باشتر کەڵکی لێوەرگرن. ئەم پەرتووکە لە ساڵی (١٩٦٠) ی زایینی لە بەغدایە هاتۆتە چاپ کرن و لە ساڵی (١٣٥٨) لە لە تارانیش چاپ کراوەتەوە.

٤ - دیوانەکەم بەناوی (**بۆ کوردستان**) دوو جار لە ساڵی ٦٦ - ١٩٦٩ چاپ بۆتەوە و لە ساڵی (١٣٥٨) یش دا لە تارانێ ئۆفسێت کراوەتەوە.

٥ - **خەیامی کوردی**، لەئەوەڵ ڕا لە ساڵی (١٩٦٨) دا چاپ بووە. با ئەمەش بێژم ئەم کتێبە هەتا ئەمڕۆ (٣) جاریش بێ رای من چاپ کراوەتەوە!

٦ - **شەرەفنامە**، ئەمەم لە فارسی را وەرگێڕاوەتە سەر کوردی کە مێژووی کوردە و نووسەری (شەرەفخانی بدلیسی) یە. کەرەتی پێشین لە ساڵی (١٩٧٣) لە نەجەفی ئەشرەف و پاشین لە ساڵی (١٩٨١) لە تارانێ چاپ کراوە.

٧ - **هۆزی گاوان** (عشیرە جاوان) لە عەرەبی وەرگێڕدراوە و لە ساڵی (١٩٧٣) لە بەغدایە چاپ بووە.

٨ - **مێژووی سولەیمانیە**، لە عەرەبی را کراوەتە فارسی و چاپ نەبووە.

٩ - **پێوەندی فەرهەنگی نێوان ئێران و میسر** (روابط فرهنگی ایران و مصر) لە عەرەبی را کراوەتە فارسی و چاپ نەبوە.

١٠ - **مێژووی ئەردەلأن**، لە فارسییەوە کراوەتە کوردی و چاوەڕوانی چاپە.

وا هەڵۆی مردنە راوی کردم — راویەتاڵی منە، هاکا مردم
مردنیش هێندە نە سوک و سانا — سەری لێ گێژە هەزاران زانا
چم بەسەردێ کە نەمام و مردم — پەری بەربایەک و خۆڵی وردم
گیان بەرەو کوێ دەفڕێ رون نیە بۆم — تۆ بڵێی بچتەوە لای باوە هەڵۆم؟
تۆ بڵێی راوێ هەبێ لەو بەرزە؟ — پاش هەمو چەرمەسەری ئەم عەرزە؟
داخم ئەو رازە لە بن سەرپۆشە — سەفەری نابەڵەدی ناخۆشە
دڵ و دیدەم کە بە دنیا فێرە — چەندی پێم بکرێ دەمێنم لێرە
ژین گەلێ شیرنە فیزی ناوی — بۆ مەبەست سەردەنەوێنم تاوێ
چاری ئەم دەردە لە لای قالاوە — گەرچی زۆر پیرە بە لاوی ماوە
دەچمە لای و بەوە چم لێ نایە — رەشییە و ئاوی ژیانی لایە *

* شیعری هەڵۆ ناتەواوە و هەر بە ناتەواویش لە گۆڤارەکەدا چاپ کراوە. (ئ ـ ش)

* * * *

رێم کەوتە گوڵستانەوە لای بولبولی مەست — بە چریکەیێ پێی وتم گەلێ راز و مەبەست
تا گوڵ نەوەریوە، تا لەشت نەبوە بە گڵ — وەک گوڵ بە، دەمی دەم بە بزە و پیاڵە بەدەست
«چون بلبل مست راه در بستان یافت — روی گل و جام باده را خندان یافت
آمد بزبان حال در گوشم گفت: — دریاب که عمر رفته را نتوان یافت»

* * * *

وابزانە جیهان بە ئارەزوی تۆ دەگەڕێ — ئەم چەرخ و خولەی هەموی بە فوی تۆ دەگەڕێ
وابزانە کە سەد ساڵیش ژیای پاشان چی؟ — مەرگێکە لە هەر جێگە لە دوی تۆ دەگەڕێ
«چون چرخ به کام یک خردمند نگشت — تو خواه فلک هفت شمر، خواهی هشت
چون باید مرد و آرزوها همه هشت — چه مور خورد به گور و چ گرگ به دشت»

* * * *

لەو کۆشک و سەرایەدا کە جەم جامی گرت — رێوی ترەکیوە مامز ئارامی گرت
بارام کە هەمو ژیانی خۆی گۆڕی دەگرت — دیتت بە چ جۆرێ گۆڕ بارامی گرت؟
« این قصر که جمشید در او جام گرفت — روبه بچه کرد و آهو آرام گرفت
بهرام که گور میگرفتی همه عمر — دیدی که چگونه گور بهرام گرفت؟»

کەیهانی فەرهەنگی: سەفەرێکی کە چوونە سوڤیەت بۆ تیمار و دەرمان کردن بوو؟

مامۆستا هەژار: تیمار و دەرمان بەشێک لەم سەفەرە بوو. بەڵام لە بنەڕەتا، لە سەر

کوردی وەک (سروە) دەرچێ، خۆی نیشاندەری دەررون پاکی کاربەدەستانە. لە رژێمی پێشوودا تەنانەت نەدەکرا هەر بیریش لە شتی وەها بکرێتەوە. ئەو کات رۆژنامەیەک بە ناوی (کوردستان) بلاودەبۆوە، بەلاَن نە لە ئێرانێدا. ئەز چەند ژمارەیەکی ئەم رۆژنامەم لە (بەغدا) و مەسکۆی دا دی. ئێستا زروف گۆڕاوە، کتێب گەلێکی زۆری کوردی چاپ و بلاودەبنەوە. ئەلبەتە هیوامە لە داهاتوو لەمەش چاتر و باشتر بێ.

کەیهانی فەرهەنگی: بێزەحمەت، مامۆستا هەژار هۆنراوەیەکی خۆتان، یان شیعرێکی کە بەدڵتانە بخوێننەوە. بە تایبەت لەوانەی کە پێتان وایە لە زەرافەت و ناسکی دا هاوتای هەڵبەستی حافزن.

مامۆستا هەژار: ئەگەر ماوەو لە سەر بێ، سێ چوارینی خەیامتان بۆ دەخوێنمەوە کە کردومنە کوردی، لە گەڵ وەرگێڕاوی هەڵبەستی (هەڵۆ) ی پوشکین کە بیستومە کراوەتە فارسیش.

بەلاَم با دیاردە بۆ ئەوەش بکەم، ئەز قەت نەمگوتوە شیعرم بە ناسکی و لوسکی شیعری حافزە، بەڵکو مەبەستم ئەوە بوو کە لە باغچەی شیعری هۆزانێت کوردیشدا، هەڵبەستی زۆر ناسک و لە سەر دلاَن و قەشەنگ و پڕهەست هەیە کە دەستی کەمیان لە باشترین غەزەلەکانی فارسی نییە. بۆ نمونە دەتوانین دیاردە بۆ شیعرەکانی (مەولەوی کورد) بکەین.

من هێندە هۆگر و ئەوینداری حافزم کە شانازی بە شیعرەکانییەوە دەکەم. وەک نموونە لە ناسکی و زەرافەتی خەیاڵ دا دەیانخەمە بەرباس، بە بڕوای من لە هەموو چەرخی گیتی دا شاعیرێکی تر وەک حافز نییە و لەفی پەیدا نابێ. حافز هێندە مەزنە کە سەرەڕای ئەوەی ئەو هەموو کتێب و وتار و گوتارەیان لە سەر نووسیوە، هێشتاش بەشێکی گەورەی بیروئەندیشەی هەروا بە تاریک و لێڵی ماوەتەوە.

پایزە، دار و دەوەن رەنگ زەردە
با تەز و سەردە، بە تۆز و گەردە
دیارە لای شەختەیە، ناخوش خەوەری
دارە خۆی دەرنێ، خەزەڵ هەڵدەوەرێ
هەررە رەشپۆش و بە گریە و نالە
سەرەتای شیوەنی مەرگی سالە
بە گژەی سەردی هەناسەی کەژ و کۆ
ژینی خۆی هاتەوە بیر پیرەهەڵۆ
داخەکەم بۆ گڕ و تینی جوانیم
ئەو دەمەی چۆن و چبوم، بۆ وا نیم؟
هێز و سۆمای نیە باڵ و چاوم
ماومەوە گردە نشین بێ راوم
دورە گۆشت پۆڕ و کەوم، وەردەکەوم
گۆشتە نێچیرێ مەگەر بێتە خەوم
پیریە پایزی وەرزی ژیانە
وردی هەنگاوی بەرەو گۆڕ نانە

کەیهانی فەرهەنگی: ئێستا زمان و ئەدەبیاتی کوردی لە چ پلە و بوارێک دایە، بە تایبەتی لە بەرامبەر زمان و ئەدەبیاتی فارسیدا؟

مامۆستا هەژار: دەزانن کە پێش راپەڕینی ئیسلامی، نە لە ئێرانی و نە لە جێگەلی تردا، هەرگیز ماوەی گەشەونەشەی نەدراوە، هەمیشە ئەم دەرەن لەسەر گەلاً بووە، بەلاَم وێڕای ئەوەش ئەدەبی کوردی زۆر پڕبار و دەوڵەمەند و لۆرانە وەدا ئاسەوارێکی یەکجار گرنگ و پڕبایەخمان هەیە، تەنانەت لە ناو ئەدیبەکانمان، کەس گەلێ هەن وەک (مەولەوی کوردی) هەورامان کە بەراستی دەکرێ بێژم لە (ئەسکار وایلد) و نموونەی تریان بەرزترن و تەنانەت دەکرێ بگوترێ لە (حافز) یش بێ دەسەوەسانتر نەبووە، بەلاَن چونکە کەسگەلی ناکورد، ناسیاوێکی ئەوتۆیان لە تەکییاندا نەبووە، تێگەیاندنی ئەم مەبەستە کەمێ دژوارە. ئێوە بیچم و کەسانی فەرهەنگی و ئەدەبی کورد ناس ناکەن، لانی کەم وەک ئێمە نایان ناسن، ئێمە ئەوان باش دەناسین، شوێنەوارەکانیان دەناسین، ئاشنایەتیمان لەگەڵیاندا هەیە و بە خوێندنەوەی ئاسەواریان زۆر کەیف خۆش دەبین و خۆشمان دەوێن. بێگومان ئەگەر ئاسەواری ئەم چەشنە کەسانە وەرگەردرێن و چاپ کرێن، وێچون و تریکیان لەگەڵ شوێنەواری ئەدەبی فارسی بە جوانی و قەشنگی دێتە بەرچاو.

زمانی کوردی فرە بەربلاَوە، هۆیەکشی پەراکەندەگی و بلاَوی ناوچەکەیە لەباری جوغرافییەوە، کە بۆتە هۆی پەیدابوونی زاراوەگەلی جۆربەجۆر. هەر ئەم بووار و دۆخە تایبەتییەی ناوچەکەش بوّتە هۆی پاراستنی لە دەس بێگانە و هەندەری. بەلاَم زمانی فارسی شوێنێکی زۆری گەلانی بێگانەی کەوتوّتەناو، بە تایبەت عەرەبی و تورکی. بەلەپیش چاوگرتنی ئەو راستییە، کە ئەز لە مەیدانی فەرهەنگ و وەشە دا کار دەکەم، وشە گەلێکی زۆرم دۆزیوەتەوە کە عەرەبی یان تورکین و جێگریشیان لە زمانی فارسی دا نیە، بەلاَن زمانی کوردی وا نییە. بۆ هەر واژەیەک چەندین وشەمانای هەیە کە بەداخەوە لەم بەربلاَوی و وبرینەش کەڵکێک وەرناگیرێ. نازانم بۆ دەبێ ناوی زۆربەی گژوگیای دەرمانیمان عەرەبی یان یۆنانی بێ؟ و لە ناوی کوردی ئەم گژوگیایانە کەڵک وەرنەگیرێ؟ جارێکی ئەم باسەم لە مەکۆی بلاَوکەرەوەی زانستگەی تاران هێناگۆڕێ، بڕیار درا بۆ کۆکردنەوەی ئەم جورە ناوانە تاقمێک بنێرنە کوردستان، بەلاَم لە کردەوە دا هەنگاوێک هەڵنەگیرا.

رەنگە بێ جێ نەبێ مەبەستێکتان بۆ بگێڕمەوە. ماوەیەک لەمەو پێش (سەدام) هەڕەشەی لە نووسەوانی کورد کردبوو کە هەقیان نییە لە نووسراوەکانییان دا لە وشەگەلی وێکچووی کوردی - فارسی کەڵک وەرگرن، دەنا تاوان دەدرێن و خامەخەش دەکرێن.

ئێستا لە ئێراندا، بارودۆخ زۆر باشە، هەر ئەوەی کە ماوەیان داوە بلاَوکراوە و چاپەمەنی

گەڕانی ناوشار، سەرێکیش لە گۆڕستانی شارەکە دەدا. کاتێ سەرنج دەداتە نووسراوەی کێلەکان، دەبینێ مردوی ئەم شارە زۆر کەم تەمەنن و لاتی زۆریان لە یەکسالی دا مردوون. زۆری پێ سەیروسەمەرە دەبێ. لە یەکێک دەپرسێ ئەم گرێ پوچکەی بۆ هەڵدا؟ کابرا دەبێژێ، لەم شارەدا باوە، لە مردوی سەری مەرگ دەپرسن چ مەودایەکی ژیانت دڵخوازانە ژیاوی و خۆشت رابواردوە؟ جامرۆی سەرەمەرگ هەرچی گوتی ئەو ماوەیەی لە سەر کێلی مەزاری دەنووسرێ! (جەبر) کەمێ رادەمێنێ و دەڵێ توخودا هەرکات ئەز مردم بنووسن لە سەر کێلی قەبرم، ئەم کابرایە هەر لە دایک بوو مرد، ژیانی منیش وەک ژیانی (جەبر) وایە.

بەڵام دەربارەی کاروبارێکی کە لە بەغدایە کردومە، دەبێ عەرزتان بکەم لە پێشدا خەریکی وردیلەکاری کەم دەرئامەت بووم. بەڵام کاتێ لە (لوبنان) ێ گەڕامەوە توانیم کارگەلی لە زەمینەی وەرگێڕاندا گیربێنم و لەم بوارەدا، کتێب گەلێکی عەرەبی کە لە مەدرەسان دەخوێندرا وەرم گێڕانە سەر زمانی کوردی و جاروباریش وتار و گوتارم دەنووسی. هەتا واهات کۆڕی زانیاری پێک هات و ئەمنیان بە ئەندامی سەرەکی هەڵبژارد. جگە لەمانەش، ماوەیەکیش خەریکی کاروباری وێنەگرتن بووم.

کەیهانی فەرهەنگی: لەبیرتانە لەو ماوەیە دا چەند کتێبتان وەرگێڕاوە، یان چاپو کردوە؟

مامۆستا هەژار: بەڵێ، هێندێ لەو کتێبانەی کاری گشتیلانە بوون. یانی کتێبێکیان دەدا بە چەند کەس کە پێکەوە وەریگێڕن. بێجگە لەم چەشنەکارانە، کتێبی (شەرەفنامە) م وەرگێڕا و هەر لەوێ چاپ کرا، هەروەسا نامیلکەیەک کە (مستەفا جەواد) بە ناوی (هۆزی گاوان) نووسیبووی و باسەکەی دەگەڕێتەوە بۆ سەردەمی (ئەلقادروبیللای عەباسی)، وەرم گێڕا و چاپ بوو، وێڕای ئەمانەش دیوانی شیعرەکانیشم چاپ کرد، ئەم دیوانە دو جاران لە ئێرانێ بە ئۆفسێت و جارێکیش لە ئورپایە چاپ و بڵاو بۆتەوە. چوارینەکانی (خەیام) یشم لە سەر هەمان کێش وەرگێڕا کوردی. بێگومان دەزانن ئەوە کارێکی ئێجگار چەتوون و دژوارە و زەحمەتێکی زۆری دەوێ، بەڵام سەرەڕای ئەوەش (٢٥٠) چوارینەم کردە کوردی و لە عیراقێ چاپ کرا. پاشان بینیم کە چەند کەسێک بێ ئیزنی من ئەو چوارینە گۆڕینەیان چاپ کردوتەوە، بە خۆم کوت هەیاران ئێستا کە خەڵک وادەکا ئەی بۆخوم بۆ چاپی نەکەمەوە؟ لەم رووەوە نامەیەکم بۆ کاربەدەستانی لێپرسراو نووسی، بەڵان تانەهۆ وەڵامی نەدراتەوە، لەم دووایانەشدا بینیم کە بڵاوکەرەوەیەک چوارینەی خەیامی بە (٣٠) زمان چاپ و بڵاو کردوتەوە، بەڵان بزانم لەبۆ بەرسیڤی نامەی من نادەنەوە؟!

کەیهانی فەرهەنگی: مامۆستا بێگومان ئاشنایەتیان لەگەڵ ڕێبازی گۆڤارەکەمان هەیە، بە ڕاهات ئەوەڵین پرسیارمان ئەوەیە کە کورت و کرمانجی کورتە بەسەرهاتی خۆتمان بۆ باس بکەی!؟

مامۆستا هەژار: سەربووری من هێندە گرنگ و شنەفتەنی نییە، ئەز لە ساڵی (١٣٠٠) ی هەتاوی لە شاری (مەهاباد) لە دایک بووم. سەردەمی مێرمنداڵی لە حوجرە و مەدرەسەی ئایینی دا دەرسم خوێندوە. تازە پێم نابوە چاخی گەنجی، لەگەڵ ماڵباتیم پەرەوازەی گوندێکی دەور و بەری (بۆکان) بەناوی (تەرەغە) بووم. ئەو زەمان بە هۆی جیاوازگەری و تۆفیرنان و ستەمێکی زۆری کە لە لایەن ڕژێمەوە دەکرا، تووشی کاروباری سیاسی بووم و ناچار لە (٢٤) ساڵی دا رامکردە عێراقێ. لەوێ نەخۆش کەوتم، چەرمەسەری و نارەحەتێکی زۆرم بینی. پاشان چوومە (لوبنان)، نزیک دوو ساڵ لەوێ بووم. سێ ساڵانیش لە (سوریا) ژیام، هەتا کودەتای (عەبدولکەریم قاسم) لە عێراقێ چێ بوو. ئەز گەڕامەوە وێندەرێ. لەم کەینە و بەینەدا، تووشی (مەلا مستەفا بارزانی) بووم، یەکدرمان ناسییەوە. کاتێ شەڕ لەگەڵ عێراق و ڕژێمی (سەدام) هاتە گۆڕێ، بە نووسین لە چاپەمەنی دا و لە ڕادیۆ دا نەیاری خۆم نیشان دا و سەرەنجام پاش گێرە و کێشەیەکی زۆر ناچار بووم بگەڕێمەوە ئێرانێ. بەڵام لێرەکانەش، ڕژێمی شا منی مەحکوم بە ئیعدام کردبوو. دۆستان ناوێژیان کرد و ویستیان ئەم رایە هەڵوەشێنەوە. بەڵێن شا وتبووی بوورین لە گۆڕێ دا نییە و حوکمی پەروەندە دەبێ چێ بێ.

ئەز لە بەغدایە ئەندامی کۆڕێکی زانستی بووم. کاروبارم زۆر باش بوو. کتێبخانەیەکی باش و دەوڵەمەندم هەبوو. بەڵام کاتێ هاتمەوە ئێرانێ زۆر شپرزە و هەژار و دەستەنگ بووم. بەم هۆیە ماڵێکیان دامێ، بۆ دابین کردنی بژیوی ڕۆژانە ناچاربووم دەست بدەمە کارێک و کارێک ئەنجام بدەم. لەم بووارە دا بوو کە پێشنیاری وەرگێڕانی (قانون) یان پێکردم...

پاش سەرکەوتنی ڕاپەڕینی ئیسلامی، لێیان پرسیم چدەکەی؟ گوتم خەریکی وەرگێڕانی (قانون) وچێکردنی فەرهەنگێکی (کوردی - فارسی) م، ئەگەر پێتان خۆشە هەتا درێژە بەکارم بدەم؟ کارم درێژە پێدا و (قانون) م وەرگێڕا سەرزمانی فارسی، سێ جلدی لێ چاپ بووە، چوارەشی لە داهاتوو دا چاپ دەبێ.

کەیهانی فەرهەنگی: لە بەسەرهات و ژیانت کورت بووی، بەڵێن پێن خۆشە زێدەتر باسی خوێندن و کاروبارێکی کە لە بەغدایە خەریکی بووی بکەی.

مامۆستا هەژار: ئەگەر ڕاتان لەسەربێ نەزیلەیەکتان بۆ دەگێڕمەوە کە پڕ بە پێستی بەسەرهاتی منە. ڕۆژێک لە ڕۆژان، پیاوێکی عەرەب بەناوی (جەبر) دەچتە شارێک، وێڕای

وتوویژ لەگەڵ مامۆستا هەژار

ئەحمەدی شەریفی

«کەیهانی فەرهەنگی» یەکێک لە گۆڤارە مانگانەکانی هەرە باش و بەرزی ئەدەبییە کە لە تاران دەردەچێ، لە ژمارەی (٥) ی ساڵی (٥) ی خۆیدا، کە لە خەرمانانی ساڵی (١٣٦٧) ی هەتاوی بەرامبەر بە سپتامبری (١٩٨٨) ی زایینی دەرچووە، وتوویژێکی لەگەڵ مامۆستا هەژار پێک هێناوە، کە دەقی ئەم وتوویژەم کردوە بە کوردی.

«کەیهانی فەرهەنگی» پێش دەست پێکردنی ئەم گوتوبێژە، کورتە سەرەتایەکی دەربارەی کەسایەتی مام هەژار نووسیوە و لەمدا هاتووە: کەیهانی فەرهەنگی تێکۆشاوە هەرچەند کورتیش بێ، هەنگاوێک بۆ «پتر» ناساندنی زانا و شاعیری مەزن و هەڵکەوتەی کورد، ئوستاد (عەبدولرەحمانی شەرەفکەندی) مەشهور بە (هەژار) هەڵگرێ، جێگای بەختیارییە، کاتێ ئێمە چووینە لای، پاش قەیرانێکی پڕ ئاڵوگۆڕ، خەریکی خزمەتی فەرهەنگی بوو. ئێمە لەم دووانەدا باسی شوێنەوارەکانیشی دەکەین. یەکێک لە کارە هەرە گرنگەکانی (مام هەژار) وەرگێڕانی کتێبی حەرت جلدی (قانون) ی (ئیبن سینا) یە کە هەتا ئێستا سێ بەرگی لێ چاپ و بلاو بۆتەوە. لەم بارە دا کە چۆن بوو، دەستی داوەتە وەرگێڕانی ئەم پەرتوکە بە زمانی فارسی کوتیان: «عەرەبێکی چۆڵگەرد، لە چادر و رەشماڵی میوانخانەی شێخەکەیدا سوێند دەخوا، لە دونیا دا هیچ شتێک لە هەڵوا خۆشتر نییە. (هەڵوا چەشنە شیرینییەکە کە لە خورما دروست دەکرێ) لێی دەپرسن هەڵوات خواردە؟ ئێژێ نا! بەڵام حەمەدی ئامۆزام کوتە کاغەزێکی دۆزیبۆوە کە هەڵوای تێوە پێچرابوو، لستبوویەوە! مام هەژار ئەم نەزیلەیە دەکاتە بیانوو بۆ وەرگێڕانی (قانون)...



هیوامان وابوو دۆسیەیەکی تایبەت بە بۆنەی کۆچی دوایی مامۆستا هەژار لە گۆڤاری هیوا دا بکەینەوە، بەڵام بەداخەوە ـ لەبەر چەندین هۆ ـ ئەم پرۆژە خنجیلانەیە دوا کەوت. لەسۆنگەی ئەمەدا داوای لێبووردن لە خوێنەرانمان دەکەین. ئاشکرایە، هەموو بەرهەمێکی فراوان و سەرتاپاگیر کە شایستەی پایە و ڕۆڵی ڕووناکبیرێکی گەورەی وەکو مامۆستا هەژار بێت، پێویستی بە کاری هەمەلایەنە و هاوبەش هەیە. هیوادارین کە لە داهاتوودا بتوانین ئەم پرۆژەیە جێ بە جێ بکەین.

دەستەی نووسەرانی هیوا

ناوەڕۆک

بەشی کرمانجی خواروو

وتوویژ لە گەڵ مامۆستا هەژار، *ئەحمەدی شەریفی* ٧

بەیانی حکومەتی بریتانی و عیراق لە سالی ١٩٢٢ دا دەربارەی حکومەتی خوارووی کوردستان، *هاوار* ٢٠

رۆژنامە و گۆڤاری کوردی لە کتێبخانەکانی شاری لەندەن، *ئەنوەر سوڵتانی* ٢٧

کورتە پێشەکییەک بۆ سەرهەڵدانی شانۆنامە لە ئەدەبیاتی کوردی دا، *فەرهاد پیرباڵ* ٥١

مێژووی کوردناسی لە دانمارک، *ڕێبوار سیوەیلی* ٧٤

جێگای کوردستان لە سەفەرنامەی ناسر خوسرەو دا، *مەنسووری تۆکمەچی* ٨٠

کورتەیەک لە ژیانی تۆماس ستێبیر ئیلیەت و شیعرێکی وەرگێڕدراو، *نەزەندبەگی خانی* ٨٦

رامان، موحسین *ئەحمەد عومەر* ٩٧

بەشی کرمانجی ژووروو

گهاشتانا من ئا مالا محەممەد عەلی وانلی، *نورەدین زازا* ٥

ئەولیا چەلەبی ل دیاربەکرێ، *ڕەشۆ زیلان* ٢١

چل سالیا بیرانینا میر جەلادەت بەدرخان، *کۆنێ ڕەش* ٤٢

وەلاتێ خەریبی یێ...، *محەممەد ئوزون* ٤٦

ژنا شڤێن، *هانری لاوسۆن «وەرگێرانی: شاهینێ بەکر سۆرەکلی»* ٦١

کاربدەست، *فەرهادێ چەلەبی* ٦٩

عەمەر، *جۆیس بلۆ* ٧٢

کرمانج د دەولەتا دنیێدا
ئایا ب چ وەجهی مانە مەحروم ؟
بیلجملە ژبۆ چ بوونە مەحکووم ؟

ئەحمەدی خانی
(سەدەی حەڤدەیەم)

هیوا

گۆڤارێکی رووناکبیریی گشتییە

ژماره ٨ - هاوینی ١٩٩٢

Enstîtuya Kurdî

Enstîtuya Kûrdî malbendeke çandiya serbixwe ye. Di sebata 1983 bi destê ronakbîrine kurd ên ji her aliyên Kurdistanê, hatiye danîn. Amanca wê beşdarbûna şerê ji bo parastin û pêşvebirina çanda gelê kurd e.

Civandina gencîneyên çanda kurdî, çêkirina ferheng û rêzimanên kurdî, lêgerînên li ser edebiyat, pîşe û dîroka kurdî, çapkirina kovar û kitêbên kurdî, pêkanîna kaset, sêlik û fîlmên kurdî şaxên bingehiyên xebata wê ne. Karekî wê yi serekeyê din jî nasandina çanda kurdî bi gelên cihanê ye.

Enstîtu dixwaze bibe cîgehekî xebatê ji bo hemû zimannas, nivîskar, dîroknas, hinermend, pîşekar û ronakbîrên kurd û dostên gelê me.. Ew ji bo jiyan û pêşveçûna xwe, hewcê alîkarî û tevkariya her Kurdê welatparêz e.

Hîmdarên Enstîtuya Kurdî :

CEGERXWÎN, Ordîxanê CELÎL, Heciyê CINDÎ, Yilmaz GÜNEY, HEJAR, KENDAL, Qanatê KURDO, REMZÎ, Osman SEBRÎ, Îsmet Şerîf VANLÎ, Tewfîq WEHBÎ, Nûredîn ZAZA.

ئەنستیتووی کورد

ئەنستیتووی کورد مەڵبەندێکی کولتووریی سەربەخۆیە. لە مانگی فێڤرییەی ١٩٨٣ دا بە کۆششی چەندین رووناکبیری کوردی هەموو پارچەکانی کوردستان دامەزرا. ئامانجی بەشداربوونە لە خەبات بۆ پاراستن و پەرەپێدانی کولتووری گەلی کورد.

کۆکردنەوەی گەنجینەی کولتووریی کورد، نووسینی فەرهەنگ و رێزمانی کوردی، لێکۆڵینەوە لەبارەی وێژە و هونەر و مێژووی کورد، چاپکردنی گۆڤار و کتێبی کوردی، ئامادەکردنی کاسێت و قەوان و فیلمی کوردی، ئەمانە بنچینەی چالاکیەکانی ئەنستیتوون.

ئەنستیتوو دەیەوێ ببێ بە جێگای کارکردن بۆ هەموو زماناس، نووسەر، مێژووناس، هونەرمەند و رووناکبیری و دۆستی کورد.

بۆ مانەوەی و پەرەسەندنی، ئەنستیتوو پێویستی بە هاوکاری و بەشداربوونی هەموو کوردێکی نیشتیمانپەروەر هەیە.

هیوا

گۆڤارێکی ڕووناکبیریی گشتییە

ژمارە ٨ – هاوینی ١٩٩٢